
# NÛDEM

No 20 1996



Kovara Hunerî, Edebî û Çandî

# Nûdem WERGER derket!




**Di vê hejmarê de:**


4 NÛDEM WERGER - Firat Ceweri

6 ÇÎN Û EDEBIYAT - Ivar Lo - Johansson -Werger: Süleyman Demir

19 ŞIÎR DI SALÊN 2000'Î DE - Pablo Neruda -Werger: Dr. Poloço

22 NIRXANDINA HELBESTÊ - Seamus Heaney- Werger: Şahînê B. Sorekli

42 ŞAHÊ KEMANÊ - Birgitta Bergman - Werger: Zinarê Xamo

51 ÇIMA KOMPÛTER NIKARIN PIRTÛKAN WERGERÎNIN
Peter Gärdenfors Werger: Arif Zêrevan

58 MIROVÊN ŞIKEFTAN - Yaşar Kemal Werger: Felat Dilgeş

94 LAŞÊ NIVÎSKAR - Marguerite Duras

96 ÇÊXOVÊ HERDEMÎ - Sofia Grigoryeva - Werger: Hesenê Metê

101 LI SER ŞIKÊ - Francis Bacon Werger: Beyhanî Şahîn

107 MURATHAN MUNGAN - B. Fundermann û H. Kalkan Werger: Z. Xamo

119 JI WAN RE BIBÊJE BILA MIN NEKUJIN - Juan Rulfo Werger: F. Ceweri

126 JI RÛPELÊN NENASKIRÎ YÊN ROJHILATNASIYA POLONÎ -
Jan Reychman Werger: Sidqî Hirori

142 SARTRE LI SER SARTRE - Michel Contat

147 EWRÊ REŞ Ê LI SER TIRKIYEYÊ - Yaşar Kemal Werger: F. Dilgeş

159 NE DEMA KIRÎN Û FIROTINA GULAN E - Erdal Öz

164 ÎLYADA - Homeros Werger: Süleyman Demir

184 KURD DI TARÎXA TEBERÎ DE - Werger: Emîn Narozî

213 JI EFLATÛN - Werger: Faxir Mamedî

214 HEVPEYVÎN BI MARQUEZ RE - Plino A. Mendoza - Werger: F. Ceweri

226 ALBERT CAMUS Û ANTONIO DE SAINT - EXUPÉRY - Fawaz Husên

232 JACK LONDON - Mustafa Aydogan

236 DOSTOYEVSKÎ Û JOHN STEINBECK


www.nefewe.com

# NÛDEM

Kovara huneri, edebî û çandî

*

Xwedî û berpirsiyarê giştî
*(Chief Editor)*

**Firat Ceweri**

*

Hejmar 20, sal 5
Zivistan: 1996

*

Şerdên abonetiyê (salek)
Swêd: 190 Sek
Welatên din: 50 $
Institution 260 Sek

*

Postgiro: 636 36 25-2
ISSN: 1103-1964

*

Wêneya bergê: Jean-Honoré Fragonard, keçika ku dixwîne, 1776, 81 x 65 cm

*

Pergala berg û rûpelan: Nûdem

*

NÛDEM kovareke serbixwe û Kurdistanî ye, ferqiyetê naxe navbera nêrîn û îdeolojiyên kurdan, ji dijminatiya kes û rêkxistinan dûr e, rûpelên wê ji hemû nivîskarên kurd re vekirî ne.




**Adres:**
**NÛDEM**
**Termov. 52 2tr.**
**176 77 Järfälla-Sweden**


# NAVEROK


**4** NÛDEM BÛ PÊNC SALÎ ◆ **Firat Ceweri**
**6** RIYA NÛDEMÊ RAST E Û QENC E ◆ **Wezîrê Eşo**
**9** SÊ ŞIÎR JI ◆ **Rojen Barnas**
**10** KOVARA NÛDEMÊ DI JIYANA KURDAN DE TIŞTEKÎ GELEKÎ NÛ YE ◆ **Nacî Kutlay**
**11** PANORAMA ◆ **Hesenê Metê**
**18** ŞIÎREK JI ◆ **Hîvî Berwarî**
**21** DÎROKA EDEBIYATA FRANSÎ ◆ **Fawaz Husên**
**33** HEY SULTANÊ FÎLAN, EZ ZIMANÊ XWE DIXWAZIM! ◆ **M. Aydogan**
**41** SILAV LI NÛDEMÊ ◆ **Rojan Hazim**
**42** TOLSTOY ◆ **Carolina De Maegd** Werger: **Derwêş M. Ferho**
**47** LI ÇANDA XWE XWEDÎ DERKEVIN ◆ **Nûra Cewarî**
**53** MILPANÎ ◆ **Sidqî Hirorî**
**59** SIGMUND FREUD ◆ **Laleş Qaso**
**63** KEÇA TUMAS ◆ **Migirdiç Margosyan** Werger: **Zinarê Xamo**
**68** NÛJENTÎ Û NÛDEM ◆ **Cemil Gundogan**
**70** DEMSALA NEQIŞANDÎ ◆ **Abbas Alkan**
**77** DI WARÊ KOVARVANIYÊ DE MERHALEYEKE NÛ ◆ **Zana Farqînî**
**79** DU ŞIÎR JI ◆ **Arjen Arî**
**81** ESPERANTO ◆ **Lars Forsman û Süleyman Demîr**
**87** VEGERE WERE ◆ **Tosinê Reşîd**
**90** GOETHE WEK PEDAGOGÊ ZIMÊN ◆ **Gunnar Hård** Werger: **Mustafa Cizîrî**
**95** XEMÊ Û XEMGÎN ◆ **Şefîk Kaya**
**104** NELSON MANDELA ◆ **Mihemed Dehsiwar**
**117** HER BIJÎ NÛDEM ◆ **A. Balî**
**118** EZ Û ŞALÛL ◆ **Abbas M. Abbas**
**120** 20:EMÎN HEJMARA NÛDEMÊ PÎROZ BE! ◆ **Weşanên Sarayê**
**121** ŞELALE ◆ **Müslüm Yücel**
**122** RONIYA BI PÎVANA RONAHIYÊ ◆ **Sabah Kara**
**123** LÊRMANTOV ◆ **Husên Hebeş**
**127** AFRÎKA... ◆ Werger: **Şahînê B. Soreklî**
**131** PÊNCSALIYA NÛDEMÊ PÎROZ BE! ◆ **Kemal Görgü**
**132** MÎLÎTARÎZEKIRINA SOSYALÎZMÊ ◆ **Şerefxan Cizîrî**
**139** LETÎF HELMET ◆ **Xelîl Duhokî**
**156** EDEBIYAT XEMILA ZIMAN E ◆ **Rojan Hazim**
**162** KOÇ, MIRIN Û ZAYIN ◆ **Mehmed Uzun**
**176** PÊNCSALIYA NÛDEMÊ PÎROZ BE! ◆ **Gulîstan Perwer**
**177** XELATGIRA ÎSAL WISLAWA SZYMBORSKA ◆ **Nûdem**
**178** BÎST HEJMARÊN NÛDEMÊ

# Nûdem bû pênc salî!



Firat Ceweri

Gotinek heye, dibêje; "destpêkirina karekî nîvîkirina wî karî ye." Ya giring ew e ku mirov dest bi kar bike. Gava mirov dest bi karekî bike û di ser re jî ji bo ku mirov jê hez kiriye mirov dest pê kiriye, divê, heta ji mirov bê mirov wî karî bibe serî. Di pêvajoya kar de, gelek zehmetî dikarin derkevin hemberî mirov; gelek kelemên ne di hesêb de dikarin têkevin nava lingên mirov; lê huner ew e ku mirov zora zehmetî û keleman bibe. Zora zehmetî û keleman jî, ancax mirov bikaribe bi xebateke gurtir, bi baweriyeke xurttir û bi têkoşîneke bêwestan bibe. Gava zora zehmetî û keleman diçe, mirov nêzîkî armanca xwe dibe, mirov ber bi serketinê ve diçe. Ji ber ku di destpêka karekî de, an jî di destpêka lîstikekê de serketin armanc e; destpêka kar nêzîkbûna armancê ye. Gihîştina armancê serfiraziyek e, serfirazî xwestina mirovatiyê ye. Loma, karekî ku dest pê bibe, divê nîvcî nemîne. Gava karek nîvcî dimîne, an jî berê kar û xebatê xuya nabe, ew nexuyabûn û bênetîcetî, bêhêvîtiyekê li dû xwe dihêle, cesareta nifşê ku li dû tê, dişikîne, hêviya wan diçilimisîne.

Destpêka Nûdemê, geşkirina hêviyên çilmisî û xurtkirina cesareta nivşê nû bû. Lê cesareta derxistina Nûdemê bi hêvî û baweriyeke xurt ve girêdayî

bû. Hêvî û baweriya xurt ez ajotim ser derxistina kovara Nûdemê.

Mîna destpêka her karî, destpêka Nûdemê jî pir bi dijwarî derbas bû. Pirsa aborî, tunebûna xwendevanên zimanê kurdî, li biyanîstanê derketina Nûdemê, rewşa kurdan ya siyasî, bûn sebebên zehmetiyên dijwar. Lê kêm zêde em ji van celebzehmetiyan haydar bûn. Ji bo temendirêjiya Nûdemê heta ji me hat em bi bêhnfirehî tevegeriyan, heta ji me hat em li riyên lihevhatinê geriyan, heta ji me hat em ji dijminatiya kes û rêkxistinan reviyan, heta ji me hat me destê dostaniyê dirêjî kurdan kir, heta ji me hat me ferqiyet nexist navbera rêkxistinên kurdan, heta ji me hat em serbixwe û Kurdistanî man. Me tu carî nexwest em neyînîtiyê di nava kurdan de belav bikin, me tu carî nexwest em bibin meydana şer û pevçûnan, me tu carî nexwest em hêvî û baweriya nivşê nû bişikînin, me tu carî nexwest em tovê neyartiyê di nava nivîskar û partiyên kurdan de bireşînin. Heta ji me hat, me xwest em kurdan teşwîqî xwendin û nivîsandina kurdî bikin, heta ji me hat me xwest em ziman û edebiyata kurdî bi kurdan bidin hezkirin, heta ji me hat me xwest em edebiyata kurdî aktuel bihêlin, heta ji me hat me xwest em jiyaneke edebî û hunermendî biafirînin, heta ji me hat em li hemberî dostên ku neyartiya me kirin jî, bi sebir û bi dostanî tevgeriyan.

Erê, Nûdem bi vê hejmarê bîsthejmarî û pêncsaliya xwe dadigire. Wê bi hezaran rûpelên kulturî û edebî li dû xwe hiştin, wê bi dehan navên nû gîhandin, ew bû dengê bi sedan nivîskarên kurd.

Ez dixwazim di vir de mikur werim ku nameyên xwendevanan yên germ û bi gotinên dostanî ve tijî, di berdewamkirina karê me de hêvî û baweriyeke xurt dane me. Piştgiriya nivîskar û aboneyan em li ser lingan hiştin. Me bi zanebûn tu carî gazina kirîzên aborî, tunebûna xwendevanan û rewşa kambax ya edebiyata kurdî nekir. Me tu carî, li ber kesî destê alîkariya aborî venegirt. Lê tu kesî jî, ji bo alîkariyeke aborî li deriyê me nexist. Tu dewlemendî, tu halxweşî, tu partî û rêkxistinê rojekê alîkariyeke madî bi me nekir. Tu hêzê ji bo belavkirin û firotina Nûdemê destê alîkariyê dirêjî me nekir. Lê em hêvîdar in, wê di pêvajoya pênc salên pêşiya me de, rewşa kurdan ya siyasî were guhertin û em ê bikaribin kovara xwe li welêt, li nava welatiyên xwe derxin.

Kurdo! Kurdê! destê alîkariyê dirêjî Nûdemê bike! Nûdem ya te ye, ya zimanê te ye, ya edebiyata te ye!

Bi hêviya Nûdemeke xurttir ez nûsala we ji dil pîroz dikim...

# Riya Nûdemê riyeke rast û qenc e!



*Wezîrê Eşo*

Piştî hatina Bêljîkayê min kovara "Nûdemê" dît û xwend. Di dest xwe da, weke dibêjin, huba wê firî dilê min û ji wira weke germayike xweş û şîrîn tamarên min va bezî û li temamiya bedena min geriya. Ez piştî wê bûme maşoq û muhtacê "Nûdemê". Çavên min li riya wê diqerime heta hejmareke nuh distînim. Hela hê du salan pêş da di dilê min de ev fikir, ev nêt sêwirî: nameyekê ji berpirsiyarê wê, Firat Cewerî re binivîsim û şikirbûn, şêkirandin û spasdariya xwe jê ra bêjim ji bo weşandina kovareke weha xweş. Hema wê hingê ev fikir sewdê min de şêwirî û min xwe bi xwe xwe got: Em rewşenbîr û xasma nivîskar û rojnamevanê Kurd carna gazinê xwe dikin ku xwendevanên me gelekî kêm in. Lê "Nûdem" û mesela min nefsa vê fikrê înkar dikin. Ne ku xwendevanên me kêm in. Helbet, ew ji rûyê yazî-miqedera gelê me ya giran û tal da heye. Lê tiştên xwendinê yên xweş û balkêş kêm in. Lê min ew nêt û xwestina xwe zeman da nanî serî. Ez pirr şa me, ku îro mecal û ma'na miyaserkirina vê nêta dilê min çêbûye: Pênc salên weşandina "Nûdemê" ronahî dîtina hejmara wê ya 20'an tam bûn.

"Nûdem" îro bû hobeliya û ez weke nivîskarekî Kurd xwe digihînim dengê bi hezaran xwendevanên Kurd û bi dil û can, bi hesîneke şabûnê "Nûdema" me û berpirsiyarê wê pîroz û bimbarek dikim û ji wan re pêşketin û destanînên hê jî mezintir û nuh dixwazim. Riya ku "Nûdem" xwe pê girtiye ya rast û qenc e. Gelê me yê bindest pirr hewceyî weşaneke weha ye. Kovareke xwerû bi Kurdî û Kurdiya wê jî pirr zelal û şîrîn. Her tenê kovar û rojnameyên weke "Nûdemê" dikarin riya pêşketina edebiyat û çanda Kurdî xurt bikin. Zar û zimanê me yê edebî dewlemend bikin û gelê me hişyar bikin. Em her tenê bi weşanên weke "Nûdemê" dikarin şoreşa çandê bikin. Bêî xebatên weke Nûdemê, şoreşa azadiyê, têkoşîna çekdariyê nikarin hemû taqên gelê Kurd bikin nava goveka xwe.

Helbet, kêmasiyên "Nûdemê" jî hene, lê ew her tenê bi şîretan nayên hilanînê. Her tenê bi domkirina weşandina xwe û bi alîkariya me hemû rojnamevan, nivîskar û zanayên Kurdan "Nûdem" dikare bigihîje hêlanên nuh. De bira, weke gelê me dibêje, "Nûdem" ji me ra bibe hezar salî û di nava zemanê nêzîk de li Kurdistana rizgar û serbixwe weşandina xwe dom bike.

# Xelata Nobel

*Rojen Barnas*

Xelatên Nobel belav kirin
Îsal jî mîna her sal
Li layiqa
  li bikêra
      li zana...
Li usûlê
  bi pergal.

Xelatên Nobel yên
Fizîkê, kimyayê, ekonomiyê
Edebiyat û aştî
Bijişkî yaxud fizyolojî
Yek bi yek gihîştin xwediyên xwe
Bi dilxweşî
  qedirzanî
      dilbijî.

Em bêpar mabûn ji roja pêşî
Dê bêpar bimana ku wisa bima
Mala wan ava ku l' me fikirîn
Lê zêde kirin duduyê nû
Ya "nemirovî" dan cîranê me
Para me jî
  ya "birakujî".



www.nefewe.com

# Bireve ji bona Xwedê

Gidiyo bireve heta ji te tê
Ev ne yarî ye, ne henek
Gidiyo bireve
Bireve ji bona Xwedê

Berikê namliya vê tifinga
Mirinvereşa destê tifingbaz
Herçend ji Tehranê, ji Şamê
Hatibe ji Bexdê an ji Anqerê
Dîsa jî yê nîşangir
Ne biyanî ye û ne jî dijmin
Birayê te yî j' dê û bavê
Birayê te bi xwe ye,
emirkin!

Birayê te yî mêrxas, palewan
Ku pilingê l' meydana şerê xas
ê birakujiyê,
bi nav û nîşan
Berê tifingê kirye sînga te
Xwe bide alî gidî
Nebî... nebî...
Firsetê bidî

Xwe bide alî gidî, korbiyo!
Xwe bide alî ji bona Xwedê
Ji kezeba şewitî berdide
Keysa birakujiyê tu medê!

www.nefewe.com

# Çi şên bû...

Giya jî êdî hêşîn nabe
Li wê mêrga ku em dileystin
Li wê çayira bi bejnek bilind.

Ew dehlên ku gamêş lê winda dibûn
Axek qumandî ye; keçel û tazî
Qijik zû va hêla û çû
Gumgumok jî êdî pê ne razî

"Hawar" gotinek bêmane maye
"Gazî" pûç î vala ji naverokê
Ne kirîv, ne xinamî, ne pismam
Kes nema ye ku deng biçê, bê
Li vê devera şên a demekê.

Çi şên bû vê dera ha
Çi şên bû...

*Rojen Barnas*

# Kovara Nûdemê di jiyana kurdan de tiştekî gelekî nû ye!



*Nacî Kutlay*

Bi ya min, kovara Nûdemê di jiyana kurdan de tiştekî gelekî nû ye, ez dikarim bi hêsanî bibêjim ku wê di jiyana kurdan ya kulturî û edebî de reformek kiriye. Ez wê ji dil pîroz dikim. Hûn ya rastî bixwazin ez di destpêkê de di şikê de bûm, ku wê çawa tiştekî weha mezin û giran here serî. Lê we zora hemû şikan bir û we ev karê mezin bire serî. Nûdem, rengekî nû da edebiyata kurdî, ew li ser edebiyata kurdî bi formeke nû û modern rawestiya, herweha wê edebiyata cîhanê jî bi kurdan da naskirin. Ev tiştekî gelekî girîng e. Ji xwe ji bo kurdan, kultur û edebiyat pir girîng e, kultur îdentîtet e, we jî qîmet da girîngiya kultur û edebiyatê. Heta niha tiştên kurdan ku dibûn, bêtir siyasî bûn, zêde cih ji edebiyat û kulturê re tunebû, lê Nûdemê ev tradisyon şikand û ziman, kultur û edebiyata kurdî bi kurdan da hezkirin. Nûdem ji bo edebiyata kurdî bû modeleke gelekî baş; wê cih da her kesî, ew li ser şiîr, çîrok, roman, rexne, bîranîn û gelek mijarên din rawestiya. Ez dixwazim di vir de kovara Wergerê, Nûdem WERGER jî bi bîr bînim. Nûdem WERGER bi rastî jî li ba kurdan tişteki nû ye, lê pir girîng e. Ew ê di pêş de qîmeta wê xuya bibe. Ez di pêncsaliya Nûdemê de, wê ji dil û can pîroz dikim û ez hêvîdar im wê Nûdem her dem bijî.

# Panorama

*Hesenê Metê*



Ev mala dostê min jî weke gelek malên xortan li ber lingan e. Lê dostê min êdî ne xort e. Bi gotineke din, xelekên salmeziniyê li binê çavên wî bazin girêdane û qermiçên salên çelî li eniyê dane der. Ev dibe payiza şanzdehan ku wî xortaniya xwe li zozanekî hênik daniye û ji wan deverina dûr anuha li bakurê dunyayê disitire. Lê ku meriv ji vî dostê min lava bike û bixwaze ew qala jiyana koçeriyê bike, bê çewtî û bê kêmasî ew ê jî bi awayekî wusa jîndar çêlî wan reng û nexşên zozanan bike ku meriv ê bibêje qeyê ev tenê şanzdeh saetên wî ne ji wan deverina hatiye.

Serê vê êvarê û anuha jî bêyî ku ez jê lava bikim ew bi xwe pesnê wan deveran dide: çêlî hênikiya zom û kepiran, behsa zelaliya ava kaniyên zinaran, qala rûniştina li binê kon û reşmalên koçeran, behsa xweşdengê ba û şalûran, çêlî efsûniya wan şevên zozanan dike û dibê:

– Ji wan şevên ba me nûr dibare, ronahî dibare. Li wir her ku şev pîr û tarî dibe, mîna ku meriv lazût bavêje ser sêleke sor, hejmara sitêran jî ewqas pir dibin. Wusa pir û wusa zêde dibin ku êdî li wan şevên asimanên ba me buhusteke ciyê vala jî namîne. Di şevên herî tarî de jî meriv

dikane di ronahiya wan dę bimeşe. Meriv têr nabe ku li wan binêre. Meriv dixwaze bi çavekî vekirî rakeve. Ku meriv wusa hûr û bi baldarî li sitêrekê binêre piştî çend hilman hêsir ê bi çavên meriv bikeve.

Bi van gotinan re hêsir bi çavên dostê min jî dikeve, serê xwe dike ber xwe, bi deng û rengekî melankolî didomîne û dibêje:

– Xwedêyo, ew zozanên me bi bilindiya xwe, bi asêbûna xwe, bi harmoniya xwe ewqas rengîn û ewqas xweş in ku li wan deran nan û av jî nakeve bîra merivan. Meriv hêz û xurtiya dîwarekî di xwe de dibîne. Li wan deran pêwîstiya merivan ji qanûn û hukumatan nabe, li wan deverina meriv dikane bêyî Xwedê û pêxemberan jî bijîn!

Li vir dostê min bi pêjnên tevlihev bi min dide zanîn ku ew ê îşev bi dê û bavê xwe re bipeyive. Li ber telefona xwe teypek jî amade kiriye ku dûre car bi car guhdariya dengê dê û bavê xwe bike, guhdarî bike û bi wan reng û nexşên zozanan sermest bibe, sermest bibe û êşa van şanzdeh payizan ji kula dilê xwe derbike.

Bi kêfxweşiyeke veşartî ji piyala xwe wê qulta dawîn jî ber bi min bilind dike, beriya ku ber bi devê xwe bibe, bi çavên avî li min dinêre û hew. Lê ew ava ku di çavên dostê min de diçirûske, diyar dike ku anuha ev pêjnên wî çiqasî germ in. Bi germiya van pêjnan destê xwe ber bi min vedigire û dibêje:

– Ca bifikire, piştî ewqas sal ez ê bi dê û bavê xwe re bipeyivim. Û di demên weha de pêjnên seyr, pêjnên wusa xweş û tevlihev li merivan radibin ku nîgara wan nayê vegotinê, ezbenî! Heta nuha min nexwest ez bi wan re têkevime têkiliyên nêzîk û pê serê wan bêşînim. Carekê tenê... belê, cara pêşîn dema ku min xwe gihande vir, min ji mamostê xwe î kevn re nameyek tenê şand ku bi wan ragêhîne... bi wan ragêhîne ku ez baş im û hew. Ji bo ku bi başiya min bawer bikin, wê çaxê min wêneyekî xwe jî xiste ber namê. Lê min debar nekir û piştî ewqas salên di ser şandina wê namê re ev bû cara duduyan ku ez bi mamostê xwe î kevn re ketim têkiliyê, lê vê carê bi telefon û axaftineke pir kurt. Nizanim çima... lê ez têgêhîştim ku ez nikanim zêdetir bi wî re bipeyivim. Tenê min jê daxwaz kir ku ew bişîne pey dê û bavê min û li gor gotina me, ez ê îşev bi wan re bipeyivim. Lê tew birayê min î piçûk, Xwedêyo! Dema ku ez ji wan deverina derketim, ew şêrînekî çarsalî bû û anuha jî Xwedê dizane ketiye salên...

Dengê telefonê vê hevoka dostê min nîvecî dihêle, radibe bi zimanekî telefonî bersiva deng dide û tavilê têderdixe ku mamostê wî yê kevn e. Piştî ku kurt û hindik li wî jî dipirse, jê daxwaz dike ku ew telefonê bide bavê wî. Di vê navberê de destê xwe davêje bişkokeke teypê, pêlî dereke telefonê jî dike û bi dilpekîn dipê. Ew dengê ji aliyê din î telefonê li vir li ba me jî bilind dibe û êdî ez jî dibîhizim. Dest û lêvên dostê min dilerizin, çavên wî di kortikên xwe de nahewin her dilîzikin. Li aliyê din î

telefonê dengê pilepila jinekê tê û dibê:

– Faro, ez bi qurbana te bim, Faro!

– Dayê, tu çawa î dayê, ez Faro me.

– Ez bi qurbana te û dengê te bim, Faro.

– Tu çawa î, dayê, tu sax û silamet î, dako?

– Ez bi qurbana saxî û silametiya te bim, Faro, dengê te kete guhê min...

Li vir peyvikên diya Faro bi kelagiriyekê diqurmiçin, sivik dibin, wenda dibin û tenê dengê hîskîneke dilşewat tê bihîstinê. Mîna ku tîna wî dilê şewutî ji çar hezar kîlometran bigêhîje vî dostê min, ez dibînim bê anuha di çi rewşê de ye. Ez dibînim ku serê wî tije, devê wî tije, dilê wî tije û çavên wî tije ne. Diya wî bi deng digirî, lêvên dostê min dilerizin, firnikên pozên wî pêl didin û bi gewriyeke tijî:

– Telefonê dayne, dako... dayne ez ê ji vir vekim, dibêje û çawa ku ew jinên diltenik di ser miriyan de digirîn, ev dostê min jî wusa di ser telefonê de xwar bûye û wusa digirî. Ji bo ku ew rihet bigirî ez radibim û derdikevim balkona mala wî.

Dema ku derbasî hundur dibim, dibînim ku dostê min têr çavên xwe guvişandine û av jê vala kirine. Çavên wî sor, ruyê wî geş û bi min wusa tê ku di van çend hilman de tevgerên der û hundurê wî jî hatine guhertin. Pîştî ku cixara xwe divemirîne bi îcaze dîsa dadide telefonê û numero bi numero nêzîkî diya xwe dibe. Dengê diya wî tê, wan gotinên bi qasekî berê dubare dike, dirêj dike, zêde dike û dibê:

– Diya te bi reben be, Faro! Diya te bi pepûk be, Faro... ka te negot, berxê min, tu çawa î kêfa te?

– Tu nizanî, dako, tu nizanî bê anuha çi pêjn li min rabûne û ez çiqasî kêfxweş im!

– Ez bi qurbana te û kêfxweşiya te bim, Faro.

– Mamoste da zanîn ku bavê min nehatiye, ew çawa ye çima nehatiye, Dînoyê piçûk çawa ye?

– Bi qurbana serê we bim, Faro. Bavê te sax weke pîvaz e. Me Dîno î birayê te zewucand. Jina wî bi zarok nexweş e.

– Maşallah, na xwe êdî Dîno bûye mêr! Xwedê kiribe we şayiyeke bi dilê wî li dar xistibe. Xwezî ez jî li wir bûyama û di dîlana wî de min jî du ling li erdê bixista.

– Ez bi qurbana te û wan herdu lingên te bim, Faro! Lê ew kêf û şayiya ku tu dibêjî êdî li van deran nemaye ku! Em çûn me bêdeng bûka xwe siwar kir û... me siwar kir û dîsa bêdeng me hanî.

– Ax dako, tu nizanî bê anuha min çiqasî bêriya we û wan deverina kiriye!

– Ez bi qurbana te û wê axîna te bim, Faro. Lê çima heta nuha deng ji te dernediket? Te çima nedigot bila diya min were ser têlê? Mêze... anuha mirina Xwedê jî li ser çavan. Min dengê te bihîst bes e.

– Min digot... dako, min nedixwest... min bi mamoste da zanîn ku ez baş im û bila hûn mereqa min nekin. Dûre min mêze kir ku nabe, min rabû jê daxwaz kir ku bişîne pey we. Min dizanî bû ku di van deman de ji we hinek... ji we hinek ê ji zozanan dakevin, êdî wexta rezan e. Ma we dest

bi rezan nekiriye, dayê?

– Me dest pê kiriye, Faroyê min. Ev heye deh roj ku me dest pê kiriye. Hûn pengizîn. Me kes nîne û em pê re nagêhînin, berxê min. Ji rezê jorîn heta nuha me tenê aliyê bayê barîn quraftiye, me pênc niqre şîre kelandiye û yê din jî hîn li dar e. Rezê jêrîn me hîn tew dest pê nekiriye.

– Tu dizanî, dako... Anuha dema ku tu weha dipeyivî rasterast ew bêhna kerga me tê min. Mîna ku anuha min li ber argûnê niqra şîrê pal dabe, tîna agirê êzingên çiyayê me dide min.

– Ez bi qurbana te û tîna wî agirî bim, Faro. Rebenê min Faro! Te qala agir û argûnê kergê kir... pêr, sibê zû dema ez çûm kergê, li kergê di ber agirê tefiyayî re du xortan pal dabûne lûlên tifingên xwe û dihênijîn. Pêşiyê ez tirsiyam lê dûre dilê min bi wan şewutî. Xort bûn. Çavên xwe vekirin, rabûn rûniştin û gotin:

«– Netirse, metê.» Dûre pirs kirin ka min alîkariyeke wan divê an ne. Diya wan bi reben be!

«– Metê bi qurbana we be! Ne hewce ye hûn alîkariya min bikin, lê Xwedê dizane anuha hûn birçî ne.» min got û ew pel û pincara ku bi min re bû, min hanî danî ber wan. Dema ku wan nan dixwarin, tu ketî bîra min, Faroyê min. Ji wan yek mîna te şermok bû. Dilê min êşiya, hêsir bi çavên min ketin û rabûm ji kergê derketim ku ji xwe re bi dilê xwe nan bixwin. Bi êvarê re me tûrê pişta wan jî ji nan û pêxwarinê dagirt, bavê te hespên mala Demo hanîn, ew herdu xortana girtin newal û newal ber bi zozanan birin. Te pirsa bavê xwe kir... bavê te hîn venegeriyaye.

– Çima hespên mala Demo, ma hespên me, Şînboza min?...

– Bi qurbana te û Şînboza te bim, Faro. Ma hesp û Şînboz hiştin! Xwedê ji wan re nehêle! Ka êdî nayê bîra min jî bê kîjan sal bû, bi çend salan piştî wendabûna te û ji van deveran, rojeke ji buhara paşîn, erê buhareke ji wan salan bû, Dîno î birayê te bi girî hat ber çîtên kon û got:

«– Cendirman li ber şikeftên jorîn hespên me dane ber tifingan û Şînboz jî ketiye.» Bavê te li ber dilê wî da û got:

«– Xem nake, meriv ji bona mehînekê ewqasî nagirîn.» Lê wî her dikire kûrekûr û di nava giriyê xwe de digot:

«– Mîna ku kekê Faro hatibe kuştin, ez pê dêşim.» Piştî ku bavê te lê hêrs bû û gotê:

«– Careke din çêlî kuştina Faro meke!» wî jî êdî qala Şînboza te nekir.

Mîna dîwarê ku kevirek jê bikeve û ji hêza xwe wenda bike, li vir gwînê dostê min jî tê guhertin, lê bêyî ku zêde li xwe bide der dibê:

– Xwedê dizane bê anuha çi xweşmêr ji Dîno derketiye. Te qala zewaca wî kir, dayê, lê te negot ka bi kê re zewuciye?

– Me keça mala Şêrko jê re hanî, Şêrkoyê Seyrika bavfile. Keçikek şîrpak e. Wek ku min got anuha jî bi zarok nexweş e û li bendî rojan e. Beriya ku Dîno î birayê te ji vir veqete bi me da zanîn ku dergûş law be,

em navê te lê bikin. Lê êdî Xwedê dizane bê ew ê çi çêbibe.

– Ka bisekine, Dîno veqetiya çû kuderê?

– De ka ez çi dizanim, Faroyê min... nizanim, tifing havête milê xwe û ew jî çû serê çiyan.

– Tifing ji kuderê hanî, tifinga çi? Ma bavê min tiştek negote wî?

– Ez bi qurbana te û aqilê te bim, Faro. Bi Xwedê bavê te gelekî bi wî de ket û jê re got:

«– Wusa neke, jina te bi tenê ye, diya te pîr û ez kal im êdî. Faro jî ne li vir e.» Lê wî guh neda bavê te û bi ya xwe kir. Rabû bîst kavir jî dan ber xwe û birin firotanê. Dûre me dît tifingek di milê wî de û hat. Bavê te lê hêrs bû û gotê:

«– Serhişkiyê meke û serê me neke xezebekê.» Lê mîna ku tu ji kevirekî re bibêjî, tew nediket serê wî. Tifinga xwe digirt, li pêşberî bavê te rûdinişt û jê re digot:

«– Divê ez bikim, heval! Ku ez û yekî wekî min neke, ma kî ê were ji me re şer bike!» Mîna ku bixwaze pê bavê te hêrs bike, qondaxa tifinga xwe jî li erdê dixist û.... û wek vî dengbêjê mûşî bi sitran digot:

*«– Ez Ferzende me û Ferzende me û Ferzende me.*

*Ez bavê Elfesiya, siwarê Zinawir, xwediyê Kuçikçapliyê me...»*

– Bavê min î reben! Bi tena serê xwe çawa ewqas pez...

– Bi qurbana te û bavê... Ma tu qala çi dikî, Faroyê min, me pez nîne ku! Me pez nîne êdî, berxê min. Piştî çûyîna Dîno û çiyan, hukmatê em gelekî êşandin, digotin: "Ka Dîno li kuderê ye, bînin!" Ji bona wî bavê te şilfûtazî dikirin û li wan zoman digerandin. Bavê te gelekî li ber xwe diket. Di ser min de dikire pilepil û digot:

«– Van zarokên te ez rezîl kirim. Pîvanên eşîriyê nemane, pîvanên piçûk û meziniyê nemane, lawê min î naşî radibe ji min re dibêje: heval. Cendirmên ku me di xewnên şevên nîvê şevan de jî li van deran nedîtibûn... ew cendirmên ku li zozanan me tenê ji devên dengbêjan bihîstibûn anuha tên min şilfûtazî dikin û di nava zom û reşmalên eşîrê de digerînin. Poz û guhên min bihata jêkirin çêtir bû ji vê yekê.» Wek ku min got pir li ber xwe diket. Dûre jî rabû hemû pezên zozanî firotin û em daketin gund.

– Na xwe we zozan berdan û hûn êdî naçin?

– Ez bi qurbana te û zonanan bim, Faro. Êdî xelk nikanin li gundan bisitirin, ma em ê çawa bikanibin li zozanan bimînin, berxê min!

– Bê pez û bêyî bayê zozanan nuha bavê min çi dike! Tê bîra min dema em li sibehên payizên pêşîn bi dengê kewên zinarên pêş zoman radibûn, min didît bê bavê min çiqasî bextiyar e. Li binê guvîja girê Singorê rûdinişt, mîna ku bixwaze wan hemû bêhn û bayê zozanan bidewusîne hundurê xwe, dûrûdirêj hilm vedida, ji kêfxweşî vedigeriya ser min û digot:

«– Faroyê min, ku ez rojekê bimirim, li binê vê dara guvîjê min veşêrin. Li vir me-

riv baştir bi mana karê Xwedê dizane. Meriv dizane ku Xwedê hertişt bi mane afirandiye.»

– Ez bi qurbana dengê te û Xwedê bim, Faro. Ma zozan maye. Hemû şewutandin, kirin rijik, kirin pîşo û berdan. Ji wan deveran anuha tenê bêhna barût û şewatê, bêhna xwîn û laşên virnî tê. Tiştek li wan deverina nemaye û... ne min got, anuha jî em li gund in.

– Dako heyran, de qet nebe... ji bona Xwedê ji min re hinekî qala merivên me, qala gund û şêniyan bike.

– Ez bi qurbana te û navê Xwedê bim, Faro! Ma ez ji te re qala çiyê gund bikim, Faroyê min. De gund gundê berê ye û... lê wekîdin em bibêjin hertişt... ne hertişt lê gelek tişt guheriye û bi me nû ye: şîn û şayî, bext û marîfet tiştekî berê nemaye... berf û barana ku dibare jî êdî ne weke berê ye, Xwedê dizane bê çima lê îsal berf û baraneke reş dibarî. De qeyê dawiya hunera Yezdanê Pak hatiye. Ha... ji Faroyê xwe re bibêjim, Berot î gavan pir behsa te dike. Hîn jî pesnê çêyî û başiya te dide û dibê:

«– Faro xwediyê xwîneke pêxemberane ye.» Vê buharê şevekê hat mala me, ji ber pişta xwe gurozek pere derxist, dirêjî bavê te kir û got:

«– Ev perên ha Faro dabûne min. Di wextekê de min bi deyn jê xwestibû. Hezar carî mala wî ava!» Bavê te destê wî ji xwe dûr xist û gotê:

«– Bila ji te re be.» Lê wî li bavê te vegerand û got:

«– Na, ku çend sal berê bûya min ê bigirta, lê anuha pêwîstiya min ji van peran tuneye û ez jî didime te.» Bavê te dîsa nexwest bigire, lê wî gotinên xwe ducar kirin û got:

«– Şikir ji Xwedê re rewşa min baş e, îro ji min bêtir pêwîstiya te bi van peran heye.»

– Pêwîstiya wî çima ji peran tuneye, başiya rewşa gavanekî çawa dibe?

– Ji xwe re bûye mamûr, qoriçî ye.

Li vir çavên dostê min bi tirs û şikebarî mezin dibin, reng û dengê wî têne guhertin û mîna ku anuha ruyê diya xwe jî li ser numeroyên telefonê bibîne, destê xwe ber bi wir dirêj dike û dibêje:

– Ka bisekine, te got, qoriçî?

– Lêê... de êdî ew jî bêminet ji xwe re pariyek nan dixwe, ah!

– Ma ew jî nan e, dako, xwezila dîsa gavanî bikira, bi heft xwezilan dîsa şêniyên gund jê re nan û dan berhev bikira û wî ev karê ha nekira. Nanê sîxuriyê!

– Na, na... ma giliyê kesekî nake ku! Bi Xwedê carekê bavê te jî devê debancê da ber simbêla wî û jê re got:

«– Ku tu navê xortekî bînî ser zimanê xwe, ez ê vî zimanê te jêkim û bavêjim ber kûçikan!» Wî jî li bavê te vegerand û gotê:

«– Ma tiştekî weha tu çawa ji min dipêy? Ez naxwazim nînoga xortekî jî li kevirekî bikeve.» De êdî ez nizanim, Faroyê min... lê dibêjin, ku wî û xalê te î Kenyaz jî tifing negirta ew ê hukmatê gundê me jî bişewutanda.

– Xalê min î Kenyaz?! Wî jî...

– Ez bi qurbana te xalê te bim, Faro. Erê welle... tifingek bi milê wî de jî kirine. Hukumatê gotiye... gotiye ji du kesan kêmtir nabe.

Vê carê mîna dîwarê ku yek bi yek kevir jê bikeve li vir gwînê dostê min jî divemire, diguhere û bi dengekî bêçare, bi dengekî nîvçe dibêje:

– Tiştên weha ne tiştên henekan e, dayê. Di tiştên weha de xwîn heye, kuştin heye, şewat û wêranî heye. Meriv çawa... çawa Berot î gavan û xalê min î Kenyaz tifinga hukmatê davêjine milên xwe! Ku bi destê hukmatê bihatana kuştin ez ê zêde li ber neketama, lê tirsa min ew e ku vê carê jî bi destê xortan werin kuştin.

– Na, ez bi qurbana te û xortan bim, na... dibêjin xort jî pê dizanin. Dîno î birayê te ji hevalan re gotiye. Gotiye: Ew ne merivên kuştinê ne.

– Ez dibîhîsim ku êdî tu jî çêlî hevalan dikî, dako.

– É ez bi qurbana te û hevalan bim, ma ez çi bikim. Herkes dibêjin heval û êdî ez jî wusa dibêjim.

– Dako heyran, tu dev ji hertiştî berde. Lê anuha serê vê êvara payizê û piştî vê axaftina me keleke wusa bi dilê min ketiye ku...

– Ez bi qurbana te û wê kela dilê te bim, Faro.

– Ka tu nizanî bê anuha çi daxwaz li min rabûye, dako!

– Bi qurbana te û daxwaza te bim, Faro.

– Daxwaza min... dako heyran, sibe êvarê, li ser kergê, saet li duwanzdehê şevê li ser sekûka paş mahsera me hinekî pal bide û bila berê te li bakur be. Di ber sipîndara me ya paş kergê re li pozê çiyayê jorîn bi baldarî binêre. Dûre tu ê bibînî ku bi qasî sê misasan di ser pozê çiyê re li asiman sê sitêr berwar û di rêza hev de hene. Di ser wan sitêrên berwar re bi qasî bilindiya xaniyekî duqat sitêreke din heye, bi rengekî sor î agirî ye. Heta demekê wusa hûr hûr lê binêre. A di wê gavê de ez ê jî li vir çavên xwe bidim hev û wan ji te re bişînim. Dixwazim tu bi wan çavên min li wê sitêrê binêrî. Bi gotineke din wusa binêre mîna ku tu di wê gavê de bi van çavên min li wan dinêrî.

– Ez bi qurbana te û wan çavên te bim, Faro. Ez bi qurbana wê sitêra te bim, Faro! Wek ku min ji te re got, erê me dest bi rezan kiriye lê em êdî bi şev naçin ser rezan ku! Em bi şev naçin ser kergan, berxê min... em bi royê re derdikevin û bi royê re wenda dibin. Ma kî diwêre êdî karûbarê rezan bi şev bike, Faroyê min! Ma...

Piştî şanzdeh payizan û piştî vê axaftina bi diya xwe re mîna ku satileke ava wan kaniyên zozanên bilind di ser dostê min de birije û bêwext wî bike kevir, anuha di ser çogên xwe de xwar bûye û bêdeng, bêliv rûnişitiye. Di vê rûniştinê de, ku serê wî bilind û pişta wî jî rast bûya meriv ê rasterast bigota ew di seremoniya medîtasyoneke bûdîstî de ye. ■



www.netewe.com

# Bi du rûçikên reş me tu dîtî!



*Hîvî Berwarî*

Wê gava din
di navbera guhertina maça û sersala
Di navbera kujtin û geşkirina çemala
berî pêkdadana pêkên meyê
Rûdana fehêtiyekê hemêz kirin.
Lûrîna tûjiyê nêçîra xelkî
rêça siwarçakên xewnên min
ji aqarê mest û serxweşiyê zivrandin
Şeva tarî tilbiçav.
Hêdî..hêdî
qesta balgehê min kir û
hate giliyê
Rûmet nêrgiza (Cizîrî)
Bêjin Newroza (Pîremêrî)
dem roniya Zîna (Xanî)



www.netewe.com

Şeng û şepala (Cigerxwînî)
Xweziyên wê yên di xwînê werbûyî
melûl û jar
Ya ji kirêtiyeka mezin ditirsît
ji şermezariyên rojên goyîna vediçiniqît
Muhra eniya Lolo û Mîtan
taca (Qazî)
qîbleya şêxê (Pîran)
Xewna duhî ya (şêx Mehmûdî)
Doza îro ya Kemal Pîr û Leyla Zana
saza Mehemed arifê Cizîrî
jê dibarin pejî û jan
Wey wax welat!
Ez çi bêjim bo du rûçikên reş?!
Li sîmayê doza giran
ew şajina kep-bilind
xemla aşiqan
kamlana wê û vejînê
li şergeha azadiyê riswa kir
Sîngê wê gola xwînê ye
miştî bêdadî û zorî kir
Eniya wê ferşa sofiyan e
dirûşmê kin û kujtinê li ser kir
Rûpelên rûyên wê
Şûpa pencên du goran e
Şûna daxên du biran e
Bo dîrokê sernişîv virêkir
Li cîhana vê xatûnê talan e û
ya di pêlên xwînê werbûyî
Paytext yê guhuşî ye
ne dan û ne standin e
ezman yê di devî da hatî

Pirç tevnekî aloz e dil pê diêşît
Bejna Ciwanê jî teşî ye, bigre û bikêşe
Her yek ji xwe re badide û dirêse
Heyv ya şirr bûyî
Stêrik yên zîz bûyî
Esman bixwe
di nîvê ra du perçe ye
Kursî jî giran bûne diterse
ha dê bişkêt
Talan e û tevlihevî ye
Qiral ji Qiral re dibêje: wêve here
Erş di bin lingan de dihijyêt!
Duhî!
bo serhildaneka rast
sed ser diçûne kumekî
Lê dîsa dubare
îro siwar dijîn û peya dimirin
Serwer û rêzanan
Helebçe û Enfal binax kirin
Hêjî Burca-Belek
Kela Dimdim hembêz nekiribû
Mehabad û Amedê
qada nîşaniyê tam nekiribû
Helgord û Agirî
bi hevra
çavên rojê maç nekiribûn
Simkoyê Şikak û Bedirxanî
li koçka babîniyê silav nekiribû
silav nekiribû.

# Dîroka edebiyata fransî

## Sedsala hivdehan an serdema Louisê XIV'an

*Dr. Fawaz Husên*



Edebiyata sedsala hivdehan li Fransayê di navbera demên kevin û nû de pirek e. Du daxwaz di vê rawestegehê de digihêjin hev, bi hev re dijîn û bêguman li hev kêr dikin. Nivîskar û rewşenbîr ji alîyekî li demên rabirdû û çûyî, li Renessansa sedsala şanzdehan, li demên Yûnana afsanan û li dîroka Roma kevnare dinêrin û dixwazin hawê wan bikin, ji alîyekî din, ew dixwazin zimanekî dewlemend û çandeke neteweyî û fireh biafirînin û hîsên serdema xwe bi gewde bikin. Ronahiya xurt ya sedsala hîjdehan gelek caran vê sedsala hivdehan dixe bin siya xwe lê, gava mirov li vê sedsalê hûr dibe, ew pêrgî çandeke rengareng û dewlemend dibe. Nivîskarên vê serdemê deriyine nû di rûyê zimên û çanda fransî de vedikin. Ew ferheng û rewşenbîriyê bi pêş ve dibin. Navên wek Corneille, Racine, Descartes, La Bruyère, Pascal, Molière, La Fontaine û hwd dewlemendbûna vê demê bi xurtî ber bi çav dikin. Nivîskarên vê demê, nêzîkî sêsed salî piştî mirina xwe, hêna di destgeha dibistan û xwendegehên navend û bilind de rûmeteke mezin di nava dîroka pêşveçûna edebiyatê de distînin. Bêguman gelek navên din he-

ne wek yên Théophile de Viau, Scarron, Madame de La Fayette, Madame de Sévigné û hwd û her nav, her nivîskar, çi jin çi mêr, cîhaneke bi serê xwe ye, di dîroka raman û çandê de gaveke girîng e. Ew bi berhemên xwe deriyên sedsalên din vedikin.

Rewşa edebiyata fransî ya sedsala hivdehan bêguman gelekî bi bûyerên civakî, dîrokî û siyasî ve girêdayî ye. Ew bi navên keyên mîna Louisê Sêzdehan û nemaze Louisê Çardehan û wezîrên mîna Richelieu û Mazarin ve girêdayî ye. Kardinal Richelieu (Kardînal yek ji endamên herî bilind e di destgeha Papayê û kelîsa katolîkî de) ji sala 1622'an ta 1442'an bingeha huner û çandeke berfireh ji bo Fransayê ava dike. Ew Akademiya fransî di sala 1635'an de saz dike û pêşxistin û xweşikirina edebiyat û zimanê fransî dike armanca vê akademiyê.

Di bin selala Bourbonan de, Fransa li Europayê dibe hêzeke ji nav hêzên herî xurt. Eger gelê fransî birçîbûn û tazîbûnê dibîne, daxwazên keyên fransî bêpîvan mezin in. Ji sala 1560'î ta 1715'an hejmara gelê fransî hergav nêzîkî bîst milyonan dimîne. Ne cengên bêdawîn, ne nexweşiyên pir û ne belengazî dihêlin ku ev milet rojên xweş bibîne. Nezanî hêna pir xurt e û kesên ku bi zimanê fransî dikarin bixwînin an dikarin navê xwe îmze bikin hêna pir kêm in. Lê navê Fransayê ciyekî pir mezin digire û helbest, roman û şano ber xwe fireh dikin û cur û babetên wan boş û dewlemend dibin. Hemû sedsala hivdehan bi navê Louisê Çardehan tê girêdan, ligel ku ev key ji sala 1661'ê ta 1715'an li ser textê qiraliyê ye. Ev sedsal bi Henriyê Çaran, bi lawê yî Louisê Sêzdehan û nemaze bi wezîrê mezin Richelieu jî girêdayî ye.

## Henriyê Çaran û dawiya şerên oldarî

Di dirêjahiya sedsala şanzdehan de şerê birakujî di navbera filehên katolîk û protestant de şerekî dijwar e. Katolîkên ku bi kelîsa Romayê re ne ji protestantan xurtir û pirtir in. Ew stemkarî û meqeresiyê li wan dikin û nahêlin ku ew bi azadî li ser axa Fransayê bijîn û bi karûbarên rêya nû rabin. Ji sala 1589 ta 1610'an Henriyê Çaran hukum dike. Ew di sala 1598'an de aşîtiyê di navbera van herdu hêzên filetiyê de bigewde dike. Ew destûrê dide ku hemû filehên Fransayê wek biran bijîn. Di nav hivdeh milyonên fransiyan de tenê milyon û du sed û pêncî hezar protestant hene. Ev peymana bi navê Peymana Nantes-ê dihêle ku protestant bigihêjin mafên xwe û bi azadî li perestgehên xwe limêja xwe bikin. Pêkanîna aşitiyê piştî wan şerên dirêj û nemaze coşîna kînê bêguman ne tiştekî hêsan e. Henriyê Çaran bi vê Peymana Nantesê ji bo cara yekemîn, di sala 1598 an de, bingehên dewleteke ewropayî li ser azadiya baweriyan ava dike. Ev peyman nêzîkî heştê salî dirêj dike. Paşê, ji ber gelek sedemên siyasî û aborî, Louîsê Çardehan, piştî ku ji protestantên li weletên din, nemaze li Holendayê û li Îngilîstanê, bêhnteng dibe, ew di sala 1685an de vê peymanê dişikîne. Ew



*Henriyê Çaran*

protestantan dûrî sînorên Fransa katolîkî dixe û wan li Ewropayê belav dike.

Dema qiraliya Henriyê Çaran ta qiraliya Louisê Sêzdehan di dîroka edebiyata fransî de demeke bi serê xwe ye. Ji 1594'an ta 1615'an edebiyata renesansê edebiyata klasîkî diparêze. Nivîskarên dawiya sedsala şanzdehan dîtin û şêweyên hunerî yên nivîskarên destpêka sedsala hivdehan û paşê yê nivîskarên klasîk amede dikin.

**Dema Louisê Sêzdehan**

Gava Henriyê Çaran di sala 1610'an de tê kuştin, lawê wî Louisê Sêzdehan hêna nehsalî ye û nikare. Mariya Medecis, Şahkevanî, di şûna lawê xwe de bi wezîrê xwe Concini fermandariyê dike. Bayê fermandariyê wê mest dike û ew dil dike ciyê xwe xweş bike û wilo berdewam bike. Ji ber vê yekê, Louisê Sêzdehan di 1617'an de bêgav dibe Concini bide kuştin û diya xwe, bi zorê, bide alî. Ji sala 1624'an ta 1642'an, Richelieu dibe wezîrê wî û key û wezîr, bi zanebûn sînorên desthilatiya qiraliya mutleq li Fransayê xurtir dikin. Ew kesên ku çavên xwe berdidin desthilatiyê dûr dixînin, an berbat dikin. Di vê demê de desthilatiya malbata qiralî û nijadbilindan qels dibe. Ta ku her tişt bi rêk û pêk be, li gor siyaseta wî û key be, Richelieu guh dide rewşa aborî, leşkerî û hunerî. Ew polîs û sîxurên xwe pirtir dike. Ew hefsarê hemû şêweyên fermandariyê zeft dike. Ew edebiyata fransî xurt dike ta ku ew ne kêmî ya îngilîzî û îtalî be. Ew ji bo "Bedewkirina zimên" Akademiya Fransî di sala 1635'an de saz dike. Ji nêzîkahî, ew çavnêriya berhemên çandî û pêşveçûna hizr û dîtinan dike. Di vê demê de her berhem gerek bi dilê qiraliya mutleq be û bi destûra wê çap bibe.

Piştî mirina Louisê Sêzdehan, kevaniya wî Anne ya Otrîşê bi alîkariya wezîrê xwe Mazarin fermandariyê dike. Ji ber cengên bêserî û bêbinî, nexweşiyên pir û zîvariyê, gel serê xwe bilind dike. Agirê cenga gelêrî di 1648'an de gûr dibe. Gel li jiyanek xweştir digere û xandar jî di vê navberê de dixwazin desthilatiya xwe xurtir bikin û ya qirêl û wezîrê wî kêmtir bikin. Ev şerê bi navê "La fronde" di sala 1653'an de dişike û Fransa bêtir ber bi qiraliya mutleq û bêpayan ya Louisê Çardehan diçe.

Di nîvê pêşîn yê vê sedsaliyê de katolîk dîsa pir xurt dibin û bi çavekî sor li hebûna protestantan li Fransayê û li welatên der û dora xwe dinerin.

Di warê nivîsandin û afirandina berhemên edebî de, pêşketineke mezin peyda dibe. Hemû babetên nivîsandinê û nemaze babeta şanogeriyê xurt û berfireh dibin. Edebiyata fransî nema kêmî ya îngilîzî an îtalî ye ligel ku zimanê fransî hêna baş rûneniştiye. Richelieu dikare di gora xwe de, di kelîsa xwendegeha Sorbonnê de razê ji ber ku daxwaza wî ber bi cîhbûyînê diçe û Akademiya fransî herdem heye.

**Louisê Çardehan an qiraliya mutleq (1661-1715)**

Desthilatiya Louisê Çardehan ji 1661'an dest pê dike û pêncî û çar salan, ta 1715'an, ta sala mirina wî dirêj dike. Gava Louisê Çardehan dibe key, ew berdide hemû nijadbilindên mezin. Ew bi tenha serê xwe, bêyî serokwezîr jî, fermandariya xwe li ser nozdeh milyonî dike. Ew dibêje: "Dewlet ez im" û ew tenê Xwedê di ser xwe re dibîne. Ew ji nav gel an ji nav kesên ku nû bûne xan peyên xwe heldibijêre. Ew Colbert



www.netewe.com

dike wezîrê aboriyê û karên hundir, Louvois dike yê ceng û berevaniyê. Colbert desthilatiya keyê xwe di warê kargeh û bazirganiyê de berfireh dike. Ew alîkariya xwedanên kargehan dike ta ku ew berên xwe ber bi welatên din bişînin. Hîsa neteweyî ya aborî dest pê dike. Louisê Çardehan di 1662'an de êrîşî Holandayê dike. Ew dixwaze başûrî vî welatî bixe bin destê xwe ta ku bazirganên Amsterdamê û gemiyên wan bes di rûyê bazirganên fransî de rawestin. Ji ber vî şerî û şerên din ên dijî dewletên protestantî, kîna Louisê Çardehan li ser protestantan xurtir dibe û di sala 1685'an de ew Peymana Nantesê radike. Ew berdide protestantan. Ew dixwaze ku kelîsa fransî, wek ya îngilîzî, ji kelîsa Romayê cihê bibe. Lê belê ew bi ser nakeve ji ber ku kelîseya fransî ji mêj ve bi serokatiya Papayê Romayê ve girêdayî ye.

Ji alî rewşa civakî gundî hemû wek berê di bin sawa birçîbûnê û dana bacê de dijîn. Burjwazî ji ber qelsbûyîna xandaran xurtir dibin û ciyên xwe di desthilatiyê de dibînin. Louisê Çardehan dîwana xwe di 1682'an de ji navenda Parîsê, ji Louverê, bar dike, dibe Versaillesê.

Di sedsala hivdehan de li Fransayê ceng li jor e, li jêr e, li rojhilat e, li roj ava ye. Di sala 1688an cengeke cîhanî deh salan dest pê dike û ew Ewropayê serobinî dike. Ji aliyekî de protestant di kesên Prûs û Alman û Ingilîsan de û ji aliyekî din katolîkên Embaratoriyê, Savoieyê, Espanyayê hemû dijî dewleta fransî rabin. Navê vê cengê dibe Peymana Augsbourgê. Di vê cengê de li Ewropayê bi sed hezaran mirov têne kuştin.

Louisê Çardehan ji sala 1701'ê ta 1614'an dest bi cenga Xilafeta Espanyayê dike. Gava Charles-ê Duduyan yê Habsbourgî dixwaze torneyê Louisê Çardehan bixe şûna xwe, hemû dunyaya otrîşî û almanî dijî wî radibin. Ev cenga dirêj bi milyonan dikuje. Zora Louisê Çardehan naçe û piştî pêncî û çar salan ji qiraliyê ew dimire.

Ji vê sedsalê navên nivîskarên mezin bilind dibin, nivîskarên wek Corneille, Racine, Pascal, Descartes, La Fontaine, Molière, La Bruyère, Perrault. Roman bingehên xwe saz dike, şano bi hemû babet û şêweyên xwe dewlemend dibe, raman û baweriyên felsefî ronahiya sedsala hîjdehan amede dikin. Eger di vê lêkolînê de şano ciyekî mezin distîne, ev yek nayê gotin ku babetên wek romanê, helbestê, rexnegiriyê, nivîsa felsefî di vê sedsalê de ciyekî kêmtir digirin. Berî sedsala hîjdehan, fîlîzofên wek Descartes, Pascal di vê sedsalê de lêkolînên zaniyarî û rewşenbîrî pêş dixin û nivîskarên wek La Bruyère û La Fontaine berî Montesquieu û Voltaire li ser dan û standinên mirov û civakan bi dirêjayî diramin. Romanên herdu Kevaniyan la Fayette û Sévigné şêweyên romanê pêş dixin û rêya romanên Marivaux û Abbé Prévost vedikin. La Bruyère û La Fontaine li ser cir û xuyên mirovan kûr dibin û çi bi rengekî cidî, çi bi rengekî kendar, ew bingeha civaka sedsalê bi gewde dikin û berhemên nemir ava di-



*Louisê çardehan*

kin.

Bi kurtî, sedsala hivdehan, Sedsala Mezin e, sedsala tevlihevî û dewlemendiya hemû şêweyên nivîsandinê ye.

## I - Sedsala hivdehan û şêweyên hunerî û edebî.

### Şêweya barok

Gotina "barok" bi xwe ji bo mîrwaran tê bikaranîn gava ew xwar û ne grover bin. Ev peyv di destpêkê de di warê avahîsaziyê de û paşê di yê nivîsandinê de tê bikaranîn. Di dema Henriyê Çaran û Louisê Sêzdehan de, ew li edebiyata fransî dibe. Ev bayê hanê ji Italiyayê tê. Li Fransayê, di babeta helbestê de, ew di berhemên D'Aubigné de bi gewde dibe û bêtir di hunera şanogeriyê de xuya dibe. Di berhemên barok de, bûyerên têkel tevlihev dibin, sînor di navbera rastî û xewn û bûyerên nedîtî de radibin. Berhemên barokî li ser pêkanînên azad û tevliheviyên têkel ava dibin.

### Şêweya xweşîperestiyê ango "Précisité"

Ev tevgera civakî, sincî û rewşenbîrî ji jiyana rojane dûr e. Ew li tiştên xweşik û giranbuha digere. Bi saya zimanekî dewlemend, xweşik û taybetî bûyerên jiyanê xweşik dibin, cîhana afirandî di nav xweşikbûnê de dilive. Ev tevger di nav jinên malmezin de ciyê xwe dibîne û belav dibe. Jinên ku bi azadî û serxwebûna jinan bang dikin li dora xwe "mirovê rind", mirovê xwediyê hîsên bilind û tenik dicivînin. Li gor dîtina wan têrê nake ku mirov ji malmezinan be. Malmezinahî û xandariya rastîn di dan û standinên mirovan de ne, di gotin û tevgerên wan de ne, di zimanê wan yê şîrîn û xweşik de ne. şahkarên vê tevgerê bêtir di helbest û romanê de cihê xwe digirin.

### Şêweya klasîk

Navê klasîkê bi serdem û qiraliya Louisê Çardehan tê girêdan. Lê "klasîk" bi rastî bingehên xwe di salên 1620-1630 de datîne. Zimanê fransî ji aliyê peyv û telefuz û rêzimên de hêna rûneniştiye. Armanca akademiya fransî ew e ku ew bingeha zimanê fransî xurt û dewlemend bike. Akademî biryara çêkirina Ferhenga akademiyê di sala 1639'an de dide. Piştî pêncî û pênc salan, ango di sala 1694'an de, nû ev ferheng tev û çap dibe. Rêzkirina gotinên vê ferhengê ne li gor alfabêtê ye lê li gor reh û bingeha gotinan e. Di sala 1718'an de Ferhenga akademiyê ya duduyan çap dibe û vê carê, gotin li gor tîpên alfabêtê rêzkirî ne. Di navbera salên 1635 û 1640'î de çend kesên ku bi zanyariya edebiyatê dizanin bingeha beşên edebî datînin. Ew sînor û pîvanên şêweyên wek helbestê, şanoya komîk, şanoya trajîk diyar dikin. Di nêzîkahiya sala 1660î de, destgeha klasîk saz dibe, Boileau bingeha wê pêşkêş dike û destgeha wê rave dike. Mirov dikare helbet bipirse ka destgeh û

teoriya klasîk çawan e, klasîkî çi ye.

**Klasîkî çi ye?**

Bernava "klasîk" ji sala 1548'an de tê bikaranîn. Meneya wê li gor serdem û sedsalan tê gurhertin û fireh dibe. Ew ji gotina latînî: "Classicus" hatiye û bi fransî dibe : "de première classe", ango "ji sinifa pêşîn".

Ji sedsala şanzdehan ta hijdehan ew tê bikaranîn bi meneya tiştê ku gerek mirov bide dû, tiştê ku mirov gerek ji xwe re bike pîvan û rêber. Ew tê meneya "tiştê ku di sinifê de, di bernameya "klassê" de, ango sinifê de tê xwendin" jî.

Di sedsala hîjdehan de gotina "klasîk" tê bikaranîn bi meneya demên kevnare ên Yûnanî û Romaniyan. Ev dem tên nasîn wek bingeha çand û ferhengê. Gava mirov dibêje "zimanên klasîk" ew dibêje zimanê yûnanî û latînî. Edebiyata klasîkî dibe çanda kevnare, ew tê nasîn wek edebiyata tersî edebiyata nûjen.

Di destpêka sedsala nozdehan de, gotina "klasîkî" tê bikaranîn gava dibe behsa nivîskarên sedsala hivdehan. Ev gotin û romantîk dibin tersî hev.

Nivîskarên sedsala hivdehan nizanin ku ev bernava hanê ê li wan bibe ta ku ew ji nivîskarên romantîk bên nasîn. Gotina kurdî ya li hember vê gotina latînî tê bikaranîn di baweriya min de, gotina"kevneşop" e.

- Warê klasîkê (kevneşopiyê) mejî û aqil e. Ew dijminê xeyalê ye.

Li gor parêzgerên vê şêweya nivisandinê, berhemên edebî divên li ser dîtinên aqilane saz bibin û rê nedin hîsên malwêran û coşana xeyalê.

- Tenê rengekî xweşikbûna mutleq heye. Giranbuhabûn û mezinbûna berhemê herdem bi vê pîvana xweşikbûnê girêdayî ye. Çiqas bermeheke edebî nêzîkî vê pîvanê be, ew ê wiqasî biserketî be.

- Destgeha klasîk li gor xwezayê bike. Ew guh dide xuyê mirovan, bingeha daxwaz û hîsên wan.

- Berhem gerek ne dûrî aqilane be, ew gerek li gor dil û mejiyê xwendevan û temaşegeran be.

- Di warê şanoyê de, şano gerek tenê rojekê, derekê û bûyerekê pêşkêşî temaşegeran bide. Berhem gerek hêsan be, rûmet û hezkirina qencî û pakdameniyê di nava mirovan de xurtir bike.

- Rêberên nivîskarên klasîk bêtir nivîskarên demên kevnare ên Grek û Roma latînî ne.

Tevgera klasîk kêfxweşiya xwendevan û temaşegeran ji xwe re dike nîşan. Nivîskar an hunermend bi tenha serê xwe najî. Ew di nava civatekê de ye û armanca wî jî gerek civat be. Gel hêna ji warê nivîsandinê gelekî dûr e û kesên bi zimanê fransî xweş dizanin hêna pir kêm in. Piraniya kesên ku dixwînîn an diçin temaşexanan, xandar û burjiwaziyên sedsalê ne. Ev kes ji tiştên xweş lihevhatî û bi pîvan hez dikin. Rewşenbîrên sedsalê jî gerek xwe nêzîkî hîs û daxwazên wan bikin û berhemên bi rêk û

pêk biafirînîn û pêşkêş bikin.

### Sedsala hivdehan û beşên şanoyî

Ji sedsala hivdehan re tê gotin Sedsala Mezin, Sedsala Kevneşopiyê. Li Fransayê, di kêm sedsalan de wiqas babet û şêweyên nivîsandinê digihêjine hev. Roman, helbest û şano berên xwe fireh dikin û destgeh pir dibin. Rewşa şanoyê di her sî salên pêşîn ên sedsala hivdehan de li hember şanoya înglîzî an îtalî gelekî qels e. Sedemên vê qelsbûnê bêguman cengên pir in û nemaze şerê gelêrî di navbera filehên katolîk û protestant de ye. Di van salan de li Fransayê şanoyên bi rastî mezin hêna tunene. Li Parîsê gişî tenê şanoya Hotel de Bourgogne bi cîh e. Hemû grûpên din bêgav in hergav li bajaran bigerin. Li şanoxana dîwana qiralî şanoyên sivik ji bo kêfanînê tên lîstin. Desthilatên oldarî û siyasî bi çavine ne baş li lîstikên şanoyê dinêrin û tiştên ne li gor siyaseta wan be di cîh de qedexe dikin û digirin.

Lê li dora salên 30'î, her tişt tê guhertin û Richelieu di bin sêwana xwe ya oldarî û siyasî de şanoyê diparêze û rê li ber wê vedike ku ew berfireh bibe. Ji Fransayê re bêguman hunereke xurt û mezin divê. Richelieu dizane jî ku bi saya şanogeriyê ew ê desthilatiya qiraliya mutleq û ya xwe bêtir bi hêz bike. Di sala 1629'an de Louisê Sêzdehan grûpa xwe çêdike û di sala 1630'î de Richelieu eywaneke mezin ji qesra xwe dike şanoxane. Di 1641'an de ew şanoxana herî mezin li Fransayê vedike.

Di van salan de şano gelekî dewlemend dibe. Hemû şêweyên şanogeriyê peyda dibin, çi bi hev re, çi li dû hev, çi dijî hev. Wilo jî mirov dibîne ku eger sedsal bi şanogeriya barok û trajî-komediyê dest pê dike, trajedî û komedî di perçê duduyan de xurtir dibin û ji nav hev derdikevin. Gelek xort ji çîna burjiwazî xwe ji can û dil didin şanogeriyê û nivîskarên wek Corneille, Racine, Molière berhemên mezin diaferînin û deriyine nû di rûyê şanoyê de vedikin. Çar rengên şanoyê di sedsala hivdehan de berfireh dibin: Pastoral, traje-komedî, trajedî, komedî.

### Her çar beşên şanoyê

Piştî ku Henriyê Çaran di sala 1610'an de tê kuştin, şano di bîst-sî salên pêşîn ên sedsalê de qels dibe. Piştî hatina Richelieu de sala 1624'an de pêşveçûnek peyda dibe. Richelieu Kardînal e, ango mirovekî bilind de di destgeha kelîsa katolîk de. Ew ciyekî gelekî mezin di bûyerên serekîn ên dîroka fransî ya sedsala hivdehan de dilîze. Desthilata siyasî û ya oldarî di kesê wî de bi gewde dibin û wilo jî ew dikare hîsa neteweyî û qiraliya mutleq xurt bike. Tevgerek çê dibe û rewşa ferhengî dîsa xweş dibe. Ji nû ve, şano, çi li Parîsê, çi li serbajarên herêman, vedinije. Piştî ku Richelieu beşekî ji qesra xwe dike şanoxane, şano, nemaze ji çîna têr re dibe perçeyek ji jiyana bilind. Temaşaxane pir dibin û çar beşên şanogeriyê di vê sedsalê de eşkere dibin.

**1- Şanoya pastoral an şivanî**

Ev rengê şanogeriya barok ji Îtaliya û Espaniyayê tê. Ew bi saya keykevaniyê Marie de Médecis û wezîrê wê Mazarin li Fransayê belav dibe. Keykevanî û wezîrê wê bang hemwelatiyê xwe dikin û hunerpêş û bazîgerên îtalyayî vî rengê nû pêşkêşî çîna bilind dikin. Naveroka vê şanoyê herdem hezkirin e, evîna di navbera şivan û bêrîvanan de ye. Bûyer herdem bi kêfxweşiyê teva dibin. Evîna rind zora astengan dibe û her evîndar bi evîna xwe bextewer dibe, her kes bi yara xwe şa dibe. Hîsên dilovanî û pakiyê bi ser daxwazên nizim ên laşan dikevin. Di der û doreke gelekî xweş de, di nava dar û şînkahiyê de, dil bi hev şa dibin, mîna kevokan dixwînin. Di buhuştê de dildarên hîsbilind digihêjên miradên xwe.

Babeta şanoya şivanî ciyê xwe di destgeha barok de dibîne ji ber ku barok pîvanên rêk û pêk ji xwe re nake serêş. Babeta barok dijî destgehên hişk e. Azadiya afirandinê jê re mebest e. Guhertinên pir, tevliheviyên şêweyên nivîsandinê di hinava eynî berhemê de, salixdanên xweşik û dirêj, ev hemû nîşanên berhemên barok in.

**2- Şanoya trajî-komedî**

Gotina trajî-komedî bi xwe kevin e û ji dema Latîniyan de tê bikaranîn. Gava di berhemên şanoyê de jiyana Xwedayên yûnaniyan û romaniyan, an jî ya qeheremanên mezin dikeve nava bûyer û tevgerên kendar, ev navê trajî-komediyê li wan berheman tê kirin. Di sedsala hivdehan de ev cûrê şanoyê di nav salên 1630'î û 1640'î de gelekî xurt dibe û Corneille bi berhema xwe Le Cid dibe serok û nimayendeyê wê. Trajî-komedî mijarên xwe ji romanên qehremaniyê derdixîne. Qehremanî û evîn dibin herdu depên deriyê vê hunerê. Ji bo namûsê, ji bo evînê an ji bo parastina qiraliyê xwîn dirije. Dengê aqilmendiyê herdem bi ser yê dil dikeve. Payana van şanoyan bi tersî trajediyan xemtije payaneke xweş e. Çavnebarî, dijminayetî, zikreşî, şer û evîn di tevnê berhemê de bûyeran ber bi tevbûna wan dajon. Armanca guhertinên mezin di nava berhemê de hergav kişandina bala temaşegeran e. Bûyer û encambûna wan gerek li temaşegeran kêr bikin û rêya rindiyê nîşanî wan bidin.

Şanoyeke weha azad bêguman nikare xwe bi destgehên hişk û teng ên destgeha kevneşop bigire. Lê serdem ber bi pîvanên rêk û pêk diçe. Nivîskar divê hustuwê xwe li ber van pîvanan xwar bike. Corneille vê demê ji jiyana rewşebîrî li Fransayê bi berhema xwe Le Cid bi gewde dike.

Destgeh û lengerên şanoya klasîk di nîvê pêşîn ji sedsala hivdehan de ciyên xwe bi gihiştî nagirin. Di nîvê duduyan de sînor di nav babetên şanoyê de eşkere dibin. Di dema Louisê Çardehan de trajedî û komedî, ango şanoya xemtije û kendar ji hev cihê dibin û her yek bi bingeh û destgeha xwe ciyê xwe di jiyana gelê fransî de digire. Sînor di navbera babetên şanoyê de eşkeretir dibin.



www.netewe.com

### 3- Komedî an şanoya kendar

Ev şano jî li ser bingeha evînê ava ye. Kesên ku ew pêşkêş dike ji çîna gelerî ne, ji burciwaziya biçûk in. Gelek caran kesên komediyê gundî ne, gundiyên ku ne ji mêj ve têr xwarine û bûne bajarvanî. Di komediyê de, çi bi awakî eşkere, çi bi awakî veşartî, nivîskar qerfê xwe bi sazgeha civatê dike û biçûkatiyên kesan dide temaşegeran. Ev babet bi xwe ji Îtaliya û ji Espaniyayê tê Fransayê û ciyê xwe, di civata fransî ya destpêka sedsalê û di navenda wê de, digire. Gava Corneille dest bi nivîsandinê dike, ew bi komediyê dest pê dike, bi trajî-komediyê berdewam dike, û bi trajediyê tev dike.

### 4- Trajedî an dema Racine

Trajedî behsa Xwedayên demên kevin, pehlewanên nîvxwedê nîvmirov, şah û padîşahên demên nû û kevnare, malbatên xandar û mezin dike. Ew ji danûstandên çîna gelî dûr e. Ew bi rêk û pêk e, bi pîvan e û di sedsala kevneşopiyê de hunera herî rûmetgiran e.

Piştî ku Corneille Le Cid di sala 1637'an de dinivîsîne, ji alîkî pesnê wî tê kirin û ji alîkî rexne li wî û berhema wî dibin. Di çapemeniya wê demê de tê nivîsîn ku Coreille destgeha şanogeriya klasîk bi cîh nake. Corneillle bi xwe, hêna di bin dîtinên barok de ye û bi "azadî" bûyer û dem û cîh tevlihev dike. Akademiya fransî biryarnamekê di derheqa Le Cid dide û wê bê rûmet dike. Akademiya fransî dibêje ku Corneille her sê stûnên trajediyê bi cîh nayêne. Di serdema Louisê Çardehan de, şano dibe bi destgeh û pîvanên hişk be. Corneille di vî warî de bi ser nakeve û trajedî, bi rastî, bi saya Racine digihêje hemû bedewbûn û giranbuhayiya xwe.

Di nîvê duduyan yê sedsala hivdehan de, rê li fantasiyan zêde û hest û hîsên barok teng dibin. Racine di hunermediya xwe de gelekî bi ser dikeve ji ber ku ew trajediyê bi hêsanî diafirîne. Ew hemû daxwazên hunereke klasîk ji serdem û keyê xwe re bi gewde dike.

### Komedî an şanoya kendar

Komedî di destpêka xwe de tenê bi meneya "berhemeke şanogerî" tê. Li bal yûnaniyan, komediya kevin şanoyek e li ser bajarvaniyên Atênayê ye. Ew wan tev navên wan derdixe ser sehnê. Di komediya navê de ew bêyî navên xwe derdikevin. Di komediya nû de kesên ser sehnê xeyalî ne.

Li Fransayê jî pêşî ev gotin tê bikaranîn wek peyva "şanoyê", "piyesa şanogerî". Ew meneya ken û tinazan nade. Ew paşê dibe komediyeke taybetî û daxwaza wê dibe ken û kêfanîna temaşevanan.

Rûmeta Molière di vê serdemê de bêguman ji ya Corneille an Racine ne kêmtir e. Ew Fransayê dikenîne û gelek kesan, nemaze oldar û sextekaran bêrûmet dike. Ew bi hêza şanoya kendar rastiya mirovan dide xuyakirin. Ew dibe textorê civatê û tiliya

www.netewe.com

xwe dixe kewara felebazî û nexweşiyan.

Şanoya kendar mijar û "lehengên" xwe ji jiyana gelêrî hildibijêre. Ew bêguman bi saya Molière bi ser dikeve û dibe hunereke giranbuha û rûmetbilind. Hunereke ne kêmî babeta trajediyê.

**Destgeha her sê yekaniyên şanoyê**

Trajedî çi ye û çima wiqas rexne li Corneille tên kirin? Pîvanên biserketina trajediyê çi ne? Stûnên vê hunera bilind çi ne?

Gava mirov şanoya kevin dixwîne, pirsa pîvanan her gav amade ye. Li gor ruhê sedsala hivdehan, şano gerek xwedî destgehên hişk û bi rêk û pêk be. Sê yakaniyên şanoya kevin hene :

**Yekaniya demê**

Bûyerên berhemê gerek bêtirî bîst û çar saetan dirêj nekin. Di kêmtirî rojekê de gerek her tişt biqede. Perda sehneyê bi derketina rojê bilind dibe û berî ku roj bi gihiştî biçe ava, gerek her tişt tev bibe. Tiştên ku temaşevan dibînin, tenê tiştên ku dikarin di rojekê de çê bibin, kêmtir û ne bêtir.

**Yekaniya cîh**

Ji ber ku bûyer tenê ya rojekê ye, gerek cîh jî, ji rabûna perdê ta daketina wê neyê guhertin. Di serdema Louisê Sêzdehan de cîh bi sînorên bajar û hawîrdora bajêr tê girêdan. Di destgeha kevneşopiyê de nivîskarên berhemên şanogeriyê dikarin hinekî dora xwe biguherînin lê hemû cîh gerek nêzîkî hev bin. Ji sala 1640'î, ciyê trajediyê tengtir dibe. Ew piraniya caran dibe eywana qesrekê.

**Yekaniya bûyerê**

Di demeke kurt de û di ciyekî der û dor girtî de, mijara şanoyê gerek sade û hêsan be. Kitekitên bûyerê li pêş in û eger giringiya wan hebe ew di nav axifitina bazîgeran de tên naskirin. Trajedî li der û dora pirsekê tenê digere û bi lez wê çareser dike.

Di şanoya klasîk de mijar û babetên şanoyê gerek baklêş û giran bin. Pirsên mezin têne kirin û şano gerek bersivên wan bide. Daxwaza trajediyê ew e ku ew dilê temaşegeran bi qehremanan bişewitîne. Ew tirsê jî dixe nava wan ta ku ew xwe nêzîkî rewşeke dijwar û xemtije nekin. Trajedî bala mirovan dikişîne ser aloziyên jiyanê. Ew riya dijwar şanî wan dide ta ku ew xwe jê dûr bixin û jiyaneke sadetir û aramtir bijîn.■



www.nefelwe.com

# Hey Sultanê Fîlan, ez zimanê xwe dixwazim!

*Mustafa Aydogan*



Sultanê Fîlan fîlekî ji keweki gewr gewrtir, gir û bi heybet bû. Li ser textê xwe rûniştibû û li bende qasidê xwe bû. Di her tevgera wî de xuya dibû ku ew nikarîbû di cîhê xwe de rawestiya.

Piştî kurte-demekê qasidê wî, Serkumikê berz hat. Ev çûkê han serokê hudhudan (Silêmanê dunikil) bû. Xuya bû ku baskên wî yên fireh, reş û sipî westiyabûn. Kumika wî ya dirêj ku li ser serê wî û li dor situyê wî mîna kevanekê bilind bûbû, mişmişî bû. " (rûp.1)

Pirtûkekê weha dest pê kiribû. Li gor destpêka pirtûkê qasid hatibû. Ev qasid qasidê ku Sultanê Fîlan bi meraqeke mezin li bende wî û "mizgîniya" wî ya "xêrê" bû. Hatina qasidê Sultanê Fîlan û vezelandin û lihevxistina baskên wî yên ku pelên dara çinarê kil kiribûn, ji bo sultên mizgîniyek û ji bo gêrîkan destpêka felaketa ku heta nuha berdewam e, bû. Her ku qasidê Sultên Serkumikê Berz, behsa xweşbûna welatê gêrîkan û medeniyeta ku li wî welatî hatibû avakirin kiribû, meraqa Sultên bêtir bûbû û pêvajoya talankirina welatê gêrîkan nêzîktir bûbû.

Serkumikê Berz li welatê wan heft mehan mabû. Gêrîkan bi xwarin û



www.nefel.com

vexwarineke bêqusûr mahzûbaniyeke baş kiribû. Ew ji mahzûbaniya wan têr nebûbû. Piştî li dor Sultanê Fîlan sê caran firiyabû û bi vê firê re sê xelekên mişmişî çêkiribûn û xwe li ser dara li ber bêvila Sultên danîbû, tev gellek tiştên din behsa vê mahzûbaniyê jî kiribû.

Serkumikê Berz gotibû û Sultanê ku ji kêfa av bi dêv ketibû, di cihê xwe de neseknîbû. Tevî heyecana ku hemû laşê wî dabû ber xwe jî li gotinên Serkumikê Berz bi meraqeke berlênayêgirtin ve guhdarî kiribû.

"Bajarin ava kirine, qet ne pirse sultanê min, di bin erdê de... Bajarin medenî, bi heybet. Embarên wan sal duwanzdeh meh heta ber dev bi xwarin, hunguv, gewhera kulîlkan, zad û bi kêzikên mirî ve dagirtîne. Paytextên xwe tam di orta deştan de ava kirine. Ev deşt ji sahîlên Nîlê jî ji Çukurovayê jî hîn bi berekettir in. Aliyê bakur ê vî welatî hemû daristan e. Daristaneke weha ye ku piling têkevê nema dikare ji nav derkeve. Aliyê başûr jî sal duwanzdeh meh tev şênkayî ye. Deşteke fireh û heta çav bibîne rast û sal duwanzdeh meh heta ber dev bi kulîlkan ve dagirtî... Rojhilatê wê şûv, rojavayê wê şûv, tu can lê biçînî, tu çûkan lê biçînî, tu gêrîkan lê biçînî dê şîn bibe. " (rûp.6)

Sultên ji aliyekî ve guhê xwe dabû Serkumikê Berz û ji aliyê din ve jî li planên ji bo bidestxistina van na'metan, fikirîbû. Di dawiyê de jî biryara xwe dabû. Bi emrê wî hemû fîl civiyabûn. Wî bi cidiyeteke mezin berê xwe bi fîlan vekiribû, halan di wan de hildabû û gotibû: "... Dilê leşkerên fîlan bi kesî naşewite. Leşkerên fîlan ji bo paraztina dewleta fîlan a herî dawiyê, êşê nêzîkî dilê xwe jî nakin. Fîlno, birayên min, ev şerrê we yê mezin î yekem e. Ger em di vî şerrî de bi ser bikevin, em ê bibin hakîmê dinyayê." (rûp.12)

".... Ger em di vî şerrê îroj de, li hember gêrîkên ku dijminatiya me dikin û êrîşî welatê me dikin, tam bi ser nekevin, dîrok, dîroka fîlan dê me qet efû neke. Filno, birayên min, leşkerên min, ger di vî şerrê îroj de, gêrîkên ku dixwazin xwîna me vexwin, zora me bibin, dê yekî jî ji me nehêlin. Ew ê me hemuyan bixwin. Neslê fîlan dê ji ser ruyê dinyayê rabe. Ji ber vê yekê, fîlno, birayên min, leşkerên min, divê em di vî şerrê îroj de bi ser bikevin û li welatê gêrîkan kevir li ser kevir nehêlin. " (rûp.14)

Û fîlan li gor emrê Sultên, bi xezebeke mezin ve berê xwe da welatê gêrîkan. Serê sibehê bû. Fîlan xezeba xwe bi ser gêrîkan de rijand. Di nav vê xezebê de, toz û dûman tevî hevdu bûn. Mijeke reş xwe bera ser welatê gêrîkan da. Xwîn herikî, serî firiyan. Gêrîk tevî avahiyên xwe di bin lingên fîlan de pelçiqîn. Gava roj çû ava, nêviyê gêrîkan bi emrê Sultanê Fîlan xatir ji dinyaya gewrik xwestibû û hevwelatiyên xwe yên ku bi birîndarî û perîşanî xwe bi zorê avêtibû bextê çiyayên bilind, li dû xwe hiştibûn.

Sultan gîhaştibû armanca xwe. Leşkerên wî li welêt kevir li ser kevir nehiştibû. Piştî



*Yaşar Kemal li dijî asîmîlasiyonê îsyan dike*

vê yekê, Sultên şerr rawestand û ji bo anîna pêşevanên gêrîkan emir da Silêmanê Dunikil. Sultên bi zimanê gêrîkan nizanîbû. Gêrîkan ji zimanê Sultên qet fahm nedikir. Ne bi saya tercumaniya Serkumikê Berz bûya, ne gêrîkan dê merama Sultên fahm bikira û ne jî Sultên dê tu mahne bida gotinên gêrîkan.

Ji ber vê yekê Sultên ji Serkumikê Berz re weha got: "Dengê wan çi ecêb e. Ji vizînekê ziravtir e, ne weha? Çi dibêjin? Wek ku dibêjin, ji bo min wergerînî û gotinên min jî

ji bo wan wergerînî." (rûp.18)

Ji nav gêrîkan yekî rîhsor ê ku bi hesinkeriya xwe nav dabû, tehamulî heqaretên vî çiyayê zulmê, vî xwînxwarê bi heybet nake. Piştî gefan li Sultên dixwe û soza heyfhilanînê dide, xwe ji ser baskê Serkumikê Berz diavêje erdê û berê xwe dide çiyayên dost. Piştî reva wî û gotinên wî yên ku serîtewandinê qebûl nakin, gêrîkên li ba Sultên man, nerm bûn û şertên wî qebûl kirin. Mahneya vê peymana ku bi darê zorê hatibû qebûlkirin, bi gotinên gêrîkê ku dilqê wî pirr ecêb bû, ji hemû gêrîkan re dihat îlankirin.

"... Em mirin, neteweyê gêrîkan êdî qediya. Neteweyê me yê ku di tu demên dîrokê de nehatibû êsîrkirin, bû êsîrê fîlan." (rûp.44)

Hemû gêrîk hesinkerê rîhsor meraq dikin û ji Xwedê hêvî dikin ku ew sax mabe.

Sultanê Fîlan êdî hakîmê welatê gêrîkan bû. Lê ev hakîmiyet dê çawa bihata paraztin û berdewamkirin? Sultan li ser vê pirsê difikire û geh bi xwe û geh jî bi alîkariya şêwirdarê xwe Serkumikê Berz ve siyaseta ji bo berdewamiya îqtîdara xwe ya li welatê gêrîkan ava dike. Di vê pêvajoyê de xetên bingehîn yên siyaseta ku dê li hember gêrîkan bête meşandin, diyar dibin.

"... Ger em bikaribin gêrîkbûna wan bi wan bidin jibîrkirin, ev ê bê mahneya ku me hertişt qezenc kiriye." (rûp.50)

" Berê divê em wan bikin panzdeh, bîst, çil, hezar perçe, dû re jî divê her perçe bibe dijminê herî mezin ê perçeyê din. Gêrîkên ku perçe bûne tu carî nikarin bibin hêz û ew ê heta dawiyê jî êsîr bimînin." (rûp.53)

Gêrîk li gor vê siyasetê tên seferberkirin. Her gêrîk mîna ku nuh xwe keşif dike û ji bo nîşan bide ku ew îmana xwe bi teoriya Sultên a di derheqa eslê gêrîkan de hatiye avakirin tîne, dest bi înkarkirina xwe dike. Nemaze gêrîkên rîhzer ên ku ji aliyê Sultên ve mîna hevkarên fîlan hatine tayinkirin, beriya herkesî dest bi fîlbûna xwe dikin û ji bo bi gêrîkên din jî bidin qebûlkirin, dibêjin:

" Her gêrîkek fîlek e." (rûp.58)

" ... Em di eslê xwe de, fîlên ku Sultanê Fîlan em ji ber gunehên me xistine derpiyên gêrîkan e. Eslê me û bapîrên me fîl in. ....Ger em bi awayekî sadiq bixebitin, Sultanê Fîlan dê me dîsa bike fîl." (rûp.60)

"... Eslê me bapîrên me fîl in. Em vê dawiyê bûne gêrîkên zerik ên biçûk." (rûp.62)

Lê tev vê jî dilê Sultên bi tirs e. Hesinkerê rîhsor tevî hemû hewildanan, hîn jî nehatiye peydekirin. Peyvên wî ji bîra Sultên neçûne. Navê wî bi qasî ku hêviyê dide gêrîkan, ew qas jî Sultên dixe tayê. Sultan ji bo gêrîkan bi her awayî êsîr bike da ku ew dîsa nikaribin gêrîkbûna xwe bi bîr bînin, bi konsantreyeke mezin dixebite. Ew êdî berê xwe dide zimanê gêrîkan û dixwaze ji berdêla vî zimanî, gêrîk bi fîlî yanî bi zimanê fîlan bipeyivin. Ji ber vê yekê ji şêwirdarê xwe re dibêje: "Karê me yê yekem, divê em gêrîkan fêrî fîlî bikin. Zimanê gêrîkan tune ye, ger hebe jî têr nake, te fahm kir?

Ger hebe jî sê-çar peyv in. Bi sê-çar peyvan jî li vê dinyayê nayê jiyîn. Li dinyayê bi tenê zimanek heye, ew jî zimanê fîlan e. (rûp.64)

" Pirsa herî sereke, pirsa zimên e. Vê ji bîr nekin. Ew ê berê zimanê xwe ji bîr bikin û gêrîkbûna xwe wenda bikin û ew ê ji dil bixwazin bibin fîl. Ew ê bê rawestan fîlan teqlîd bikin. Dê di dilê her gêrîkekî de daxwaza ku bibe sultanekî fîlan bi cîh bibe. Ji berdêla ku mirov serê gêrîkan jê bike, ya rasttir ew e ku mirov zimanên wan jê bike." (rûp.70)

Sultanê Fîlan di bin ronahiya vê fikrê de, li her deverê dibistanên fîlan vedike. Ji bo fêrbûna fîlî seferberiyeke mezin dest pê dike. Ji van dibistanan gêrîkên birêvebir ên ku fîlî bi qasî zimanê xwe fêr bûne, derdikevin.

" Ji aliyekî ve ji ber kar, ji aliyê din ve jî ji ber birêvebirên gêrîkfîl ên nuh ku ji dibistana fîlan bûne fîl û derketine û fîlî bi qasî zimanê bav û kalan fêr bûne, gêrîk ne tu tiştî dibîne, ne difikire û ne dibihîse." (rûp.221)

Di dawiyê de hesinkerê bi nav û deng ê rîhsor î kullek pêşevaniya gêrîkan dike û gava agirê azadiyê ji serê çiyayekî bilind tîna xwe dide deştê, hesinkerê pêşevan derdikeve hember Sultanê Fîlan û jê re dibêje: " Ez hesinkerê kullek im. .... Me ji îroj û pê ve serxwebûna xwe îlan kir." (rûp.258)

Ev pirtûk pirtûka Yaşar Kemal e. Navê wê, "Sultanê Fîlan û Gêrîkê Rîhsor î kullek" e. Vê pirtûkê ez nizanim bê ji bo çi, bi qasî ku tê xwestin, bala mirovan nekişandiye ser xwe. Belkî jî ji ber ku li ser wê "Pirtûka Zarokan" hatibû nivîsandin, nemaze bala mezinan nekişandiye. Min ji zû de dest bi wergera wê kiribû, lê min ew heta nuha neqedandiye. Nemaze piştî munaqeşeya di ATV'yê (Meydana Siyasetê-25.10.1996) de û hem lênerînên Yaşar Kemal ên di warê pirsa Kurd de û hem jî piştî wê rojê munaqeşeyên li ser Yaşar Kemal tên kirin, bûn sedema ku ez berê vê nivîsê binivîsînim û dû re jî li wergera vê pirtûkê ecele bikim. Ez hêvî dikim ku ez ê wê di demeke nêzîk de bigihînim destê xwendevanên Kurd.

Li gor gellekan, lênerînên Yaşar Kemal ên ku ev du-sê salên vê dawiyê di masmedyayê de derdikevin û yên wê rojê di ATV'yê de hatin pêşkêşkirin, tiştekî nuh bû. Ev nivîs bi alîkariya vê pirtûkê, dixwaze bide nîşandan ku ew ne tiştekî nuh bû. Yaşar Kemal ji zû de weha difikire û ev di pirtûkên wî de xuya dibe. Gava em bala xwe bidin munaqeşeya ku di ATV'yê de hat kirin jî em ê pirr bi rehetî bikaribin di navbera lênerînên ku wê rojê hatin diyarkirin û bi kêmanî tiştên ku bi alîkariya fîlan û gêrîkan tên zimên de, paraleliyekê tesbît bikin. Ger mirov bala xwe bide wan notên ku min ji pirtûkê wergirtine, mirov dê vê yekê pirr baş bibîne.

Yaşar Kemal di vê pirtûkê de, ji aliyekî ve xwestiye motîfên çînî derxîne pêş û ji aliyê din ve jî ji pirseke taybetî wek welat pirsa

Kurdistanê, wek netewe pirsa neteweyê Kurd û wek ziman jî pirsa zimanê Kurdî hereket bike û mêtingehkariyê di tevaya dinyayê de bîne zimên. Lê tevî hebûna van motîfan jî ez nikarim bibêjim ku Yaşar Kemal di vî warî de bi ser ketiye. Tevî hewildanên di vî warî de jî dîroka danûstendinên di nav dewleta Tirkiyeyê û bakurê Kurdistanê de ji ber çavan nehatiye xerakirin. Dîroka zulm û zora li vî perçeyê welatê me ku hemû pêvajoyên pêşveçûna vî gelî xistine bin tesîra xwe, ji dîroka gêrîkan ne cudatir e. Ji xwe Yaşar Kemal jî di hevpeyvîna ku Erdal Öz pê re çêkiribû de (17.01.1977), di pirtûkê de temaya şerrê rizgarîxwazî û serxwebûnê înkar nake. Her di eynî hevpeyvînê de Yaşara Kemal weha dibêje: "Di vê romanê de, Fîl ji bo şexsiyeta gêrîkan û jêhatîbûna wan ji destê wan bistînin, berê dixwazin zimanê wan bi wan bidin jibîrkirin. Dibistana fîlan vedikin. Dibistana ku gêrîkan dike fîl. Em li Tirkiyeyê tiştên ku durbê manzaraya ku di vê romanê de dide, hertim dikarin bibînin. Ma li Tirkiyeyê dibistanên ku gêrîkan dikin fîl hindik in?"

Di vê pirtûka Yaşar Kemal de welatê fîlan cuda ye û welatê gêrîkan cuda ye. Neteweyek bi navê neteweyê fîlan heye û neteweyê din jî neteweyê gêrîkan e. Zimanê fîlan cuda ye û zimanê gêrîkan cuda ye. Yanî rastiyek tê zimên. Rastiyek tê bilêvkirin; welat-netewe-ziman.

Ger tevî motîfên rîhsor û rîhzeran jî şerrê çînî yê di hundurê welatekî de bûya, ger şerrê rastîtî û çepîtiyê bûya, dê tercumaniya Silêmanê Dunikil ne pêwîst bûya. Temaya vê pirtûkê çi qas berê xwe bide tevaya dinyayê û xwe mîna pirseke giştî nîşan bide jî pirr diyar e ku bingeh, kaniya îlhamê danûstendinên dewleta Tirkiye û bakurê Kurdistanê ye. Ma Yaşar Kemalê ku di bin tesîra zulma li ser zimanê Kurdî de mezin bûye, di vê pirtûkê de li ser hewildanên jibîrkirina zimanên gêrîkan, li ser dibistanên ku ji bo gêrîkan bikin fîl hatine vekirin raneweste, dê çawa bikaribe behsa dîroka mêtingehkirina welatekî bike? Ev şerr tevî hemû hewildanên ku dixwazin zelaliya temayê şolî bikin jî ne şerrê ku li hemû dinyayê li dijî zulmê tê meşandinê ye. Belkî hin assosiyasyon, hin mesajên ku ji vê taybetiyê ber bi bi tevahiyê ve fireh dibin û xusûsiyetên muşterek ên pêvajoyên metingehkirina welatên cuda, tên ber çavan. Lê di pirtûkê de baş diyar e ku li her deverê gêrîk tune ne. Mesela li dorhêla Nîlê, li Çukurovayê gêrîk tune ne. Ji ber ku li jor jî hat diyarkirin ku erdê welatê gêrîkan devereke taybetî ye û hem ji Nîlê û hem jî ji Çukurovayê bi berekettir e. Ma gelo di jiyana hemû neteweyên bindest de hesinkerekî efsanewî heye? Ma mirov dikare bibêje ku Yaşar Kemal ev hesinkerê pêşevanê gêrîkan bi tesadufî hilbijartiye? Ma gelo ji bo çi hesinker û ne tu meslekekî din? Ji derveyî ku di her pirtûkeke wî de şopeke destanên Kurdan bi rehetî tê dîtin, mirov çawa dikare bifikire ku haya Yaşar Kemalê di nav

destanan de mezin bûye û di warê destanan de bi qasî ku Evdalê Zeynikê bi Homeros re muqayese bike bi bawerî dipeyive, ji destana Kawayê hesinker tune ye? Haya Yaşar Kemal jê heye û wî bi zanebûn hesinkerek kiriye pêşevanê gêrîkan.

Yaşar Kemal di ATV'yê de jî bê tirs realîteyek anî zimên; welat-netewe- ziman. Navê Kurdistanê bê tirs û bê sansur gellek caran telafuz kir û her di eynî programê de got ku ez li Kurdistanê hatime dinyayê.

Yaşar Kemal her di ATV'yê de got: " Heta ku nêzî bîst milyon Kurd ji hemû mafên xwe bê par bin, li Tirkiyeyê demokrasî ne mumkun e. Em derewan dikin. "

Paraleliyek di nav vê tesbîtê û tiştên ku di pirtûkê de ji aliyê Sultanê Fîlan tên kirin hene. Ev derewên dewletê di pirtûkê de jî para Sultanê Fîlan in. Bê Sultanê Fîlan çi qas rast nabêje, dewleta Tirk jî ew qas rast nabêje. Bê çawa yên ku êrîşî welatê fîlan dikin, dixwazin dewleta wan a herî dawiyê perçe bikin, zimanê wan ji ortê rakin ne gêrîk bûn, di têkiliya dewleta Tirk û Kurdan de jî ne Kurd in. Fîl çi qas gunehkar bin, dewleta Tirk jî ew qas gunehkar e. Gêrîk çi qas mezlûm bin, Kurd jî ew qas mezlûm in. Gêrîk çi qas fîl bin, Kurd jî ew qas Tirk in.

Mirov dikare di gellek waran de wek Yaşar Kemal nefikire, ev gellek tebîî ye. Divê li lênerînên wî yên ku di televîzyonê de li ser Mustafa Kemal diyar bûn, rexne bên girtin. Mirov hêvî dikir ku Yaşar Kemalê li hember zulmê serî radike, di vî warî de jî rastiya ku divê bête dîtin bibîne. Yaşar Kemalê ku di vê pirtûkê de çavên xwe ji zulma Sultanê Fîlan re nagire, çawa dikare rastiya di warê Atatürk de nebîne? Yaşar Kemalê ku dibêje " Dinya tê guhertin, lê Ankara nayê guhertin", divê ji bo peydekirina mîmarê vê neguhertinê, hebekî din hewil bide. "Mustafa Kemal neteweyek afirand. Gava Mustafa Kemal neteweyekî ava dike, dê ji bo pêşdebirina kultura li kêleka xwe jî alîkariyê bike.... Ger Mustafa Kemal sax bûya, ev meseleya Kurdan dê nebûya bela serê Tirkiyeyê." (ATV) Pirsa mezin di nav Atatürkê ku di serê Yaşar Kemal û yê ku Kurdan di pêvajoya dîroka xwe de, hertim darê wî yê zorê li ser serê xwe dîtiye de derdikeve ortê. Atatürkê di serê Yaşar Kemal de heye; Atatürkekî ku hebûna Kurdan nas dike, ji bo Kurd welatê xwe bi xwe îdare bikin alîkariyê dike, ji bo pêşdebirina zimanê Kurdî piştgiriyê dike... Divê bête gotin ku tu problema Kurdan bi Atatürkekî weha re tune ye. Lê problem ev e ku ev Atatürk ne ew Atatürkê ku hemû serîhildanên Kurdan di dema wî de bi qetlîamên mezin hatine pelçiqandin e. Ma gelo dêwê edebiyatê bi xwe nizane ku hivdeh-hîjdeh salên vê zulma ku li jêr bi gotinên wî jî tê tesbîtkirin, di dema Atatürk de çêbûye. Ma gava Peymana Lozana ku şertên zulma îroj a ku li ser ziman û kulturê heye amade kir, hat îmzekirin serokê Tirkiyeyê ne Atatürk bû?

Pirseke din jî di warê Kurdbûn an Tirkbûna Yaşar Kemal de tê holê. Ji bo min

Tirkbûn an Kurdbûna Yaşar Kemal ji tiştên ku Yaşar Kemal dibêje ne girîngtir in. Ez li dij im ku civat bibe du alî; yên ku dibêjin Yaşar Kemal Kurd e û yên ku dibêjin Tirk e. Ger Kurdbûna Yaşar Kemal pirr eşkere be û ew dîsa bibêje ku "Ez Tirk im", ez ê wê gavê heq bidim wan kesên ku di vî warî de rexneyan lê digrin. Lê ez ê dîsa bibêjim ku Yaşar Kemalê însan, min ji Yaşar Kemalê Kurd an ê Tirk bêtir elaqadar dike. Tevî ku tiştên di vî warî de tên gotin, min jî nerehet dikin, lê ya girîng ew e ku bê Yaşar Kemal di derheqa rastiya welatê me û zulma li welatê me de heye, çi dibêje. Kurdbûn an Tirkbûna wî ne tiştekî li hêjayiya gotinên wî zêde dike û ne jî jê kêm dike. Ji ber ku li Tirkiyeyê gellek kes hene, hem dibêjin em Kurd in û hem jî alîkarên berdewama vê zulmê ne. Divê em tevî ku di rexneyên xwe de texsîriyê nekin, li vê rastiyê jî miqate bin. Ez li hember Yaşar Kemalê ku dibêje; " Ez bi du tiştan mezin bûm. Yanî min hem ta'ma zimanê Kurdî stend û hem jî ya zimanê Tirkî. Lê ez nuha bi Kurdî nafikirim, bi Tirkî difikirim. Ez nivîskarekî Tirk im. Min bi Kurdî nenivîsandiye. Ez ne nivîskarê zimanê Kurdî me. Îmkanên min ên nivîsandinê çênebûn", danûstandineke bi tolerans pêşniyarî civatê dikim.

Yaşar Kemalê ku vê rastiyê tîne zimên, ji aliyê din ve bi qasî Koroxliyê ku serî li hember zulma Begê Boluyê radike, bi mêrxasî li dijî asîmîlasyonê derdikeve. Lê binihêrin bê Yaşar Kemalê însan çi dibêje;

" Ji bo çi ev heftê sal in ku Kurd asîmîle nebûn? Nufûsa Kurdan ji sisiyan yekê Anadoluyê ye. Hun nikarin civakeke weha mezin asîmîle bikin. Hêza tu kesî têra vê nake. Û têrê nekirê. Xwendin û nivîsandina wan ji destên wan stendin. Pirtûkên wan, rojnameyên wan ji destên wan stendin. Hertiştên wan ji destên wan stendin. Lê li aliyê din, kultureke gel ya muazam pêş ket. Kultureke ku ji Evdalê Zeynikê, Memê Alan û Ahmedê Xanî tê - nuha li dinyayê yek li Kirgizîstanê destana Manastirê ye û ya din jî destana Homerîk heye- hîn jî li nav Kurdan dijî. Kurdan zor da wê derê. Nuha li ba Kurdan bi hezaran, bi sed hezaran çîrok û destan hene. Ji ber ku tu çareyeke wan a din tune bû. Ji ber ku kultura wan a nivîskî nedidan wan, dibistanên wan nedidan wan. "

Piştî vê dewlemendiya kultura Kurdan, Yaşar Kemal baweriya xwe bi berdewamiya jiyana vê kulturê tîne. "Ne Tirkiye, hun deh qatê dinyayê, Amerîka, Rûsya û Çînê bikin yek jî ji bo ji ortêrakirinê, hêza kesî têrê nake. Tu kes nikare ne vê kulturê û ne jî vî zimanî ji destên wan bistîne."

Ger birêvebirina Tirkiyeyê di destê Yaşar Kemal de bûya, wî dê çi bikira?

" Min ê bigota, werin birano. Me heftê salî gellek xerabî bi we kir. Me xwest, em kultura we ji ortê rakin, we asîmîle bikin. Hun ne dîn in. Hun naxwazin vî welatî perçe bikin. Ji we re kultura we. Ma pereyên we tune ne? Ji we re. Hun jî bacê di-

din, bila li Anadoluyê mozaîkeke kulturê derkeve." (ATV-25.10.1996)

Di warê çareserkirina vê pirsê de, di nav Kurdan de jî fikrên cuda hene. Gellek kes dikarin wek Yaşar Kemal jî nefikirin. Lê ji van gotinan jî diyar dibe ku bê divê Kurd xwe li ser çi bêtir konsantre bikin û nehêle munaqeşeya di warê eslê miroveкî de, siya xwe bera ser vê perspektîva ku divê di ronahiyê de bête hiştin, bide.

Baş e derdê Yaşar Kemalê nivîskar çi ye?

" Çi derdê min bi siyasetê re heye? Welatê min û gelê min di talûkeyê de ye. Ji ber vê yekê, yê ku serê xwe nexe ortê, ne zilam e, ne mirov e, ne hevwelatî ye."

Yaşar Kemal bi vê helwêsta xwe, li Tirkiyeyê ji bo paraztina rûmeta ronakbîriyê, numûneyek e. Ew sembola ku edebiyat û edebiyatvan nikarin li hember bûyerên li welatê wan rûdidin û zulma ku tê meşandin, laqayt bimîne, ye. Pirtûka li ser Sultanê Fîlan û gêrîkan, dîroka zulm û tirsê radixe ber çavan. Gotinên Yaşar Kemal tevî tirsa heyî, bê tirs êrîşî zulmê kirin e.

Li gor Yaşar Kemalê ku li hember zulma li ser zimanê Kurdî heye, îsyan dike, Kurd çi dixwazin?

" Kurd dibêje; ez zimanê xwe dixwazim. Zimanê xwe xwestin, mafê mirov yê herî mezin e."

Hey Sultanê Fîlan, guhê xwe bide Yaşar Kemal! Ez zimanê xwe dixwazim! ■

# Silav li Nûdemê!

*Rojan Hazim*

Bo Firat Ceweri, editorê Nûdemê!

Nûdem, bi vê hejmarê ve, digihe hejmara 20an. Di jîyana weşangerîyê da, bêyî navbir domandina weşanê, bi serê xwe karekî girîng e. Di vê prosesê da, 20 hejmarên bi rêk û pêkî hatine weşandin etabeke serkevtî ye. Vêca Nûdemê ev etaba pêşîn, digel çend kêm û kasîyên biçûk, bi serfirazî borand. Nûdemê, di van 20 hejmaran da xizmeteke mezin bo bizava pêşve birina edebiyat û zimanê kurdî kir û hem ji alîyê form û estetîkê, hem jî ji alîyê naverokê ve dereceya kalîteyê girt û eve di her hejmara xwe da jî pêşve bir. Hêvî û daxwaza me ew e, ku Nûdem di etaba nû da jî, hem ji alîyê form û estetîkê, hem jî ji alîyê naverokê ve gavên pêşvetir biavêje, xwe di her hejmarê da nû ve bike û di jîyana xwe ya weşanê da serkevtî be. Nûdem, hêjayî pîrozkirinê ye. Silav li Nûdemê! Silav li kedkarên zimanî û edebiyatê!

# Tolstoy li Moskovayê


*Carolina De Maegd*
*Wergera ji flamanî: Derwêş M. Ferho*

Li tarexe herî xweş li navenda Moskovayê, di kuçeya Povarski de jimar 5, xaniyekî bedew ku di sala 1802 de ji bo prens Dolgorûkî hatiye ava kirin. Vî xaniyê arîstokratîk li ser Lev Tolstoy weha tesîr kiriye ku wî ew mîna model bijart ji bo xaniyê malbata Rostov di romana xwe ya bi navê Şerr û Aştî de.

Dema bolşewîkan paş Şoreşa Cotmehê di sala 1917 de dixwestin çîna esîl ji Rûsya dûr bixin, dîsa qesra di Dolgorûkî ma. Xuya ye ev sembola esîlên Rusya xweşa Stalîn çû ku ew kire hevdîtina îdeal ji bo nivîskarên Sovyetê. Di qesrê de Komîteya Navendî ya Yekitiya Nivîskarên, ku Bûlgakov di romana xwe ya naskirî de çîroka Hoste û Margarîta nivîsiye, cî girt.

Bi sedan nivîskar di qesra kevn de, ku xwaringeh û çayxane ciyê ramanên nuh bûn, rojên xwe dibihurandin. Her cara ku me dixwest bi nivîskarekî re li vê qesrê hevdîtinek kiribane, em şaş dibûn çawa nivîskarên Sovyetê zêde dixwarin û divexwarin. Xuya bû ku li vira mal ji aqil bi hêztir bû.

Dema ku di dema havînê de divegeriyane qesra kevn, em dibûne şahidê ku dema nuh ya Rûsya dixwaze vegere dema kevnare ya arîstokrasiyê. Ev ne bes ji tamîra serayên dewletiyên berê, lê ji çûyîna melîke Romanov bi komikek muhafizên xwe ji bo baloya bi navê Gola Qazan kete tiyatroya Nemirovitsh-Dantsjenko jî xuya dikir. Bê guman, wê jî mala di



kuçeya Povarski de nas kiribû. Li ber deriyê textînî û cîlakirî yê qesrê dergehvanekî lihevhatî diraweste. Ew lîwana bi hunerekî bedew hatiye çêkirin ku diçe xwaringehê şanî me dike. Ew ciyê tijî û xebatkarên ku gelek caran xeberên ne xweş di ber xwe de dibêjin, tiştek ji eslê xwe yê berê winda ne kiriye. Hunduriyê wira di bêdengiyê de, karaktera xwe ya arîstokratîk dîsa stendiye. Xebatkarên xwedî tecrûbe me dibin ser maseyeke nixumandî û wê ji me re bi xweştirîn xwarinên Rûsî dideynin. "Ev hê jî mala nivîskaran e?", bi meraq em dipirsin. "Em vira ji wan kirê dikin" bersiv e. "Lê em nivîskaran bêje li vira nabînin. Xwarina vira ji bo wan gelekî giran e. Bazirganê dewletî û merivên ji bankan têne vira."

Dema me odeyên din ji mala nivîskaran ziyaret dikir, ku berê konferans, film, civînên agahdariyê û tiştên din dihatin amadekirin, bêdengiyke kûr hebû. Bes çend wêneyên nivîskaran xaniyê nivîskaran li bîra meriv dihişt. Me wêneyê Lev Nikolayeviç Tolstoy, ku ne mîna nivîskarên din "eşqî kêf" yên sovyetî bû, ne dît.

Tolstoy vegetaryenekî hişk bû ku ne alkol divexwar û ne jî cixare dikişand. Nivîskarê 53 salî dest bi wê jiyana xwe ya xwezayî di 1881 de di dema şevên dirêj yên zivistanî li Moskovayê kir.

Jina wî bû sedema jiyana wî ya bêdilî li Moskovayê. Jina wî mayîna wan li Moskovayê ji bo perwerdekirina zarokên wan girîng didît.

Tolstoy, ku bi karaktera xwe ya bi berhem hez ji milkê xwe yê fereh li Yasnaya Polyana dikir, ji jiyana xwe ya Moskovayê dilşikestî bû. Xwezayiya (teybetiya) wî ya dijwar, wê dema ku wî krîzeke moralî û dînî dibihurand, bêriya xwezaya paqij ya Rûsî dikir.

Dema wî di bihara sala 1882 de li Moskovayê xaniyekî pirr bedew bi bexçeyekî xweş dikarî bikire, Tolstoy jiyaneke bi erd ve girêdayî jî pêk anî. Dema me ev erdê bi hunerî hatiye xweşkirin ziyaret kir baweriya me zêdetir bû. Ji dokumentên arşîvan xuya dike ku ev xanî, li tara kevn Xamovniki, di navbera salên 1800 û 1805 de hatiye avakirin. Ew tar hînga weke navenda hunerê xwe yê hîvastina kincan ji bo Kremlîn navdar bû. Di dema Tolstoy de li wira karxanên cihê ku dengê destpêka kar ew saet 5ê serê sibehê hişyar dikir hebûn.

Danûstendina Tolstoy bi karkerên karxanê re ji bo wî, di wê dema gera îstîqameta merovaniyê, dibû bingehê raman (fikir) kirina wî. Jiyana karmendan jî ji bo wî tiştekî meraq û girîng bû.

Tolstoy, xwedî erd bû û alîkariya karkerên xwe li nav erd dikir. Ew ji vî aliyê xwe de naskirî bû. Lê pirr kes Tolstoy mîna karmendekî nas dikin. Wî paş pensiyona xwe (emeklilik) ji sala 1884 û paş de dest bi solkeriyê kir. Di nav cizme û potînên ku wî çekir de yên şaîr A. Fet di oda wî ya xebatê de xweşik raxistî ne.

Di lîwanê de hê jî bîsîklêt dimîne. Tolstoy di 67 saliya xwe de hînî ajotina wê bû û bi wê bîsîklêtê digeriya. Weke merivekî sportîf yê modern, Lev Nikolayeviç serê her sibehê bi "halter"ên parastî, tedrîbên xwe dikir. Pirr caran jî ew mîna siwarekî li hevhatî di kuçeyên Moskow re dibihurt. Di zivistanan de meriv ew didît ku bi zarokên xwe re li ser qeşayê (berf) dixijiqî.

Mala mezin ku ji şanzdeh ode li qatê erdê û qatê yekê, lîwana fereh, nîşana jiyaneke serketî ye. Tesîra jîrbûn û xurtbûna Soya Andereyevna di rastkirina vê malê de, mîna jina xwedî gotinê, xweş xuyaye.

Sofya 18 salî bû dema ku Tolstoyê 34 salî pê re zewicî. Weke jineke xort ji Moskovayê ew biqasî bîst salan bi mêrê xwe re li bajarê Yasnaya Polyana jiya. Li wira wê hem pirr alîkariya mêrê xwe kir û hem jî dayiktiyeke bê gotin ji sêzdeh zarokên xwe re di-

www.netewe.com

kir. Di dawî de ew ji jiyana nav xwezayê de bînteng bû. Wê di bîranînên xwe de li ser wê jiyanê weha digot: "hemî hêza aqilê min di wê tenhabûnê de difetisîn".

Dema ew li Moskovayê bi cî bûn Sofya û keçên wê ciyê xwe di nava sosyeta Moskovayê de girtin. Wê rojekê di heftê de mazûlvaniya mêvanan di mala xwe de dikir. Pirr tiştên wan mêvandarî û hevdîtinan hê jî dimînin û wan bîranînan xweş dikin.

Şevên mûzîkê yên herî naskirî bûn. Merivên mîna Raxmanînov, Rimski-Korsakov, Skryabin û Taneyev li wira berhemên xwe pêşkêş kirine. Pirr kes şahid e ku Lev Nikolayeviç bi agahdariyeke xurt li mûzîkê guhdarî dikir. Rûyê wî yê qermiçî vedibû, çavên wî weha şah dibûn ku di hin caran de hêstir dihatin jêr.

Hêza melodiyên mûzîkê ku Tolstoy weke "daxwaza hisê ya nazik" digot tesîreke mezin li ser Tolstoy dikir. Hin caran wî dixwest vê hisa xwe li hember mûzîkê nede xuya kirin lê jê ne dihat. Wî di pirtûka biyografiya xwe de li ser vê yekê weha gotiye. "Mûzîk min ji kesayetiya minî heye dûr dixe û dibe rewşeke din ku ti elaqetê min pê re nîne".

Ew ne tesadûfî ye ku Tolstoy navê helbesteke xwe ji berhemeke Beetthoven distîne. Biyografê wî A. Goldenveyzer dide xuyakirin bê çiqasî tesîra dijwar ya Beethoven li ser Tolstoy heye. Tolstoy ji vê rastiyê aciz bû, ji sedema ku wî ne dixwest bixe bin tesîra kesekî. Ev kesayetiya wî ya dijwar di dema lîstika satrancê de nerm dibû. Wî hez dikir bi yekî hoste re bilîze. Bi lîstika xwe ya her tim bi êrîş wî dixwest di aliyê psîkolojîk de tesîrê li berberê xwe bike.

Li mala Tolstoy, bê guman, gelek nivîskarên Rûs jî dibûn mêvan. Di nav wan mêvanan de kesên mîna Çexov, Bûnîn, Gorkî, Leskov, Ostrovskî, Garşîn û Korolenko hebûn. Heger yek ji wan dihat, li îwanê semawera çayê didanîn ser masê. Paş saeta çayê sifra xwarinê dihate rastkirinê. Li ser sifrê, pirraniya caran, Tolstoy bixwe berhemek ji lîteratûrê, hin caran ji xebata xwe, dixwend.

Portreyên Tolstoy, xanima wî û keçên wî hunerê pirraniya hunermendên Rûs nîşan dikin. Mîna: Repin, Serov û L. Pasternak.

Beşek ji hebûna malbata Tolstoy di muzeya Tolstoy de li kuçeya Kropotkint e. Di mala arîstokratan de jî hewa dema Tolstoy heye. Di sala 1911 de bi alîkariya Bûnîn, Bryoesov, Gorkî û Stanîslavskî ji aliyê "Hevalên Tolstoy" ev xanî hate kirîn û mîna muze serrastkirin.

Li wira bi sedan berhemên Tolstoy peyde dibin. Bi awayekî hosteyî berhemên wî û jiyana wî têne pêşandan. Dilehayî em li li elementên otobiyografiya wî û nivîsarên li ser kesan ji civaka lîteratûrê dinêrin.

Ji bo romana xwe ya bi navê Şerr û Aştî binivîse bêhesab xebat û nivîsar li hev dayine hev.

Nivîsarên bi dest ku dijwar têne xwendin tijî xêzik û xetên reşkirî û rastkirî ne. Herweha di dema ku roman qediya bû, nivîskar hê jî hin cî rast dikir.

Lê xebata bi sebir ya xanima Tolstoy, ku bi destnivîs e û heft caran ji romana wî mezintir e, nayê pêşandan.

Di mala tara Xamovniki de maseya ku Sofya Andreyevna li serê nivîsarnên mêrê xwe yên rastkirî dinivîsandin disekine. Ew mase di odeya razanê de li qatê ser erdê ye. Di salên 1880 de Sofya bi xwe berhemên Tolstoy diweşandin. Bi wî awayî wê alîkariya aboriya malê dikir.

Odeya xebata Tolstoy di koşeyekê ji qatê yekê de ye. Qerebalix nedihate vê odeya ku li bexçeyê dora malê dinêre. Di vê odeyê de nivîskar her roj saet ji 9 heta 15 kar dikir. Di navbera van saetan de wî qet nedixwest werê aciz kirin.

Di odeya xebata wî de li ber pencera çepê maseya nivîsandinê heye ku hemî cîhazên ji karê wî re pêwîst in û binikên mûmê dimînin. Tolstoy xebata di bin ronahiya mûmê de hez dikir. Herçend e çavên wî kêmasî di wan de hebû jî wî nedixwest berçavikan bide ber çavên xwe. Wê ji lingên maseya xwe parçeyek qut kiribû ku ew bikare nivîsarên xwe bi rihetî bixwîne.

Dîwanekî fereh ji çermê reş, bi maseyeke din ji bo xebatê li koşeya din rawestaye. Ew di dema ji xebatê bînteng bû diçû li wira dirûnişt û bîranînên xwe û notên din dinivîsandin. Di nava van bîranîn û nivîsarên wî de meriv baş dibîne ku ew di wê demê de di bin çi dijwariyên psîkolojîk û krîza olî de bû.

Di dema xwe ya Moskovayê de ev hunermendê mezin giha dereceya moralîstekî dijwar û pêxemberekî îsyankar. Wî di hemberê neheqiyên di nava civakê de bi awayekî vekirî têkoşîn dikir, ew dijî kilîseya dewletê ya ortodoks, ku bi belavkirina agahdariya ne rast û mîstîk baweriya xiristiyanîzmê hunda dikir, bû. Tolstoy li oleke nuh ku "şahbûnê ne di jiyana pey re lê di vê jiyana îro de" bide, ji xwe re digeriya. Kilîseya Ortodoks ew ji sedema vê yekê hermono kir.

Di odeya xwe ya bêdeng de Tolstoy gelek nivîsar li ser fîlozofî-olê nivîsandine. Meriv dikare xwe bi hezkirina civaka li dora xwe, paqijiya dilê xwe, başî û biberhemiya xwe pêş keve, bi ser bikeve û di nava xwe de azad be. Di nava vê baweriyê de Tolstoy ma'neya herî rast didît. Herçend e wî huner her tim di xizmeta moral (etîk) de dîtibe jî wî romanên xwe, mîna Mirina Ovan Ilitç, Serhildan û hwd. li ser berberî û nexweşiyên civakê li ser hîmê dijwariyan nivîsîne.


Di bihara 1901 de malbata Tolstoy bi temamî ji xaniyê di kuçeya Xamovnîkî der diçin. Ev yek di dema ku serkariya kilîseya Ortodoks Tolstoy hermono dike.

Tolstoy, salekê berî mirina xwe, ewê careke din bi kurtayî, mala xwe ya li Moskovayê ziyaret bike. Paş mirina wî xanima wî ev mal firote serkariya bajarê Moskovayê.

Hundiurê malê weha hatibû parastin ku zarokên wî yên mezin paş salan di demeke ziyareta malê de weha digotin: "Tu dibê dê û bavê me qasekî çûne derve..." ■

# Li çanda xwe xwedî derkevin

*Nûra Cewarî*



Gelek caran pîşezanên dîrokê li serpêhatiya miletê me ecêbmayî dimînin. Bi hezarsalan bê dewleta yekbûyî, pir caran bê înstîtûtê neteweyî, piştî evqas şer û serhildanan, piştî evqas kuştin û lêdanê, piştî evqas rev û bezê dîsa jî em dijîn, dîsa jî em kurdayetiyê xwedî dikin. Eva yeka tiştekî nebînayî ye, ber ku gelek miletê cînarê kurdan, ku dewletê wan jî hebûne ber qeziya tap nekirine, heliyane, winda bûne.

Dostekî kurdan yê hêja, nivîskarê Îngîlîz Jêyms Oldrîc di romana xwe ya "Dîplomat" da dinivîse, wekî di dinê de du millet hene, ku dikarin bêne kuştin, lê tu caran nayêne rayê, ew kurd û îrlandî ne.

Ji gişan re eyan e, ku îro ruhê miletiyê ku me xwedî dike, xîret, xwenaskirin û hişyarbûnê pêşda tîne. Û berî her tiştî helbet, ew ruh ziman, dîrok û çanda neteweyî va qewat digire. Û çawa pelewanê Romaya kevnar berî ku herine şer ser erdê xwe velezyane û ji erdê welatê xwe hêz, qewat hildane, wisa jî em û kurdên ku ji welat dûr dijîn qewat, sihet, kurdeyatî ji çanda xwe, zargotin û sazbendiyê hildidin û em ê hê jî hil-

din. Lê gelo çanda me - ziman, zargotin, sazbendî di çi halî de ne, heta kengî wê xizmeta me bikin û em ê çawa xwedîtiyê li hebûna xwe bikin.

Belê, pêşiyên me bi hezarsalan ew hebûna me ya dewlemend parastine û gîhandine rojên me. Îro her kurdek dikare bi çanda xwe serbilind bibe, bi destan û çîrok, bi stran û dîlan, bi xalî û emenî, bi xemil û xişirên kurdî serbilind bibe.

Lê dijminê me zor û hov bûne, pir caran xwestine ruhê me jî bistînin, zimanê me, edebiyata me ya klasîk ji me veşêrin, stran û govendên me, cil û tevnên me bikin yên xwe. Ji talebextan ra pir caran, pir tişt ji wan re li hev hatine jî. Îro bi hezaran kurd zimanê xwe, çanda xwe nizanin, bi hezaran kurdan kurdayetî winda kirine.

Û di gelek pirsên çanda xwe de jî em bi derengî ketine. Weke bêndera ku xwedî ne li ser be, wê çawa be? Her kesî ji xwe re biriye û niha jî dibin. Bi rastî em talan dibin. Di vê derecê de jî, çawa di derecê zordestî, stemkarî, hovîtiyê de miletê cînar namerd û bêşerm bûne. Gelek caran bi radiyo û televîzyonên xwe, di konsêrt û festîvalan de ew stran, awaz û govendên kurdan dikine yên xwe. Ji talebexta ra di vê derecê de gelek dengbêj, sazbend û hunermendên kurd xizmeta wan dikin. Ew stranên kurdî werdigerînin zimanê miletê cînar û distirên, ew awazên kurdî ji bo komên wan yên folklorî lêdixin. Ev mirovên han ji alîkî miletê me talan dikin, ji aliyê din ve xizmeta neyaran dikin.

Miletê cînar bi taybetî ji salên 1960'î destpêkirî xalî û emenî, têr, ben û pişt, çek û xişir ji nava kurdan berev kirin û îro ew di muzeyên xwe de wek yên xwe nîşan dikin. Wan ji me zûtir nirxê çanda me, hostatiya hunermendiya me texmîn kirin. Pêşekzanê wan ji me zûtir gihîştine gund û zozanên me. Û ya ecêb ew e, ku piraniya gelê me, pir caran merivên welatperwer û zane jî girîngiya vê pirsê baş texmîn nakin. Em pir caran ji bîra dikin, ku tevî windakirina ziman û çanda neteweyî ruhê neteweyî di me da vedimire, qewata xwe winda dike û em jî pê ra dihelin.

Rast e, her tim jî di nav gelê me da pêşewitî û ronakbîr hebûne, ku li wê dewlemendiya me xwedî derketine, berav kirine, parastine. Lê ji bo welatekî weke Kurdistanê, gelekî wek gelê kurd, jimara wan pir kêm bûye. Û îro eger em wî barî tenê li ser milên wan bihêlin, em ê pir tiştan winda bikin.

Karê parastina ziman û çanda me ne karekî pir zor e. Me gelek şahî û cejnên kevneşopî dîtine, gelek çîrok û metelok bihîstine, em dikarin wan bi nivîsar biparêzin. Em di dewrana teknîka bilind de dijîn, em dikarin foto û vîdêokamêra ji bo parastina hebûna xwe bidin kêranînê.

Îro em bi şabûn dikarin bibêjin jî, ku parastina çanda me wisa jî merivên nexwandina teybetî va - ne kurdzan mijûl dibin. Ew girîngiya parastina çanda neteweyî baş texmîn dikin. Rast e ji me re ew jî kêm in, pir nîn e, lê bi xebata wan ve xuya dibe ku

her kesê welatperwer dikare bi berevkirina nimûnên çanda xwe va mijûl bibe, bi nivîsar û resim, bi vîdeo û fotokamêra, bi magnîtofona. Û tiştên ku îro bêne berevkirin wê bibin qinyatiyeke baş, ne tenê ji bo xebatên lêgerînên zanyariyê û îzbatiyê; lê belê wisa jî ji bo kêrarîna pratîkê - terbetkirina silsileta bi çîrok, destan, metelikê nivîsar, bi reqas û sazbendiyê ser şirîtê vîdêo û magnîtafona nivîsar, bi kitêbên miletzaniyê yên çapkirî.

Çanda me ya neteweyî pircûre û pirçiqil e. Ew bi taybetî ya kêranînê û ruhaniyê ye. Di nava wan de ne: tevn, xanî, ziyaret, mezelê me, kinc, çek û xişir, derman û xwarin yê neteweyî, cejn, edet, tiyatro, reqas, lîstikên me yên biçûk û mezinan, zargotin û sazbendî... Her milet berî gişka bi dîrok û bi çanda xwe serbilind e. Lê sed heyf dîrok, ziman û edebiyata me, çanda neteweyî hindik hatine naskirinê, pêra jî gelek tişt roj bi roj winda dibin, ji me dibin, têne jibîrkirin. Û ji bo em zû talan nebin, ziman û çanda xwe ji bîr nekin, "tirkê çiya", "koçer" û "nezan" nemînin divê em xwedîtiyê li çanda xwe bikin û xizmeta kultura xwe bikin.

Em ê li vir şirovekeye kûr ya şaxên çanda neteweyî bi temamî nekin. Meremê me taglîfkirina guhdariya xwendevan ya li ser pirsên çanda me ye.

Di nava çanda me ya kêranînê de tevnê neteweyî bi reng û nexşê xwe yên xisûsî ve cihekî hêja digirin. Gelê me li rojhilatê eyan bûye çawa hostê tevna ye. Emenî, kulav, xalîçe, têr, kurtik, gorê bi têlê rîse çêkirî timê di malên kurdan de hene û ew û kurdan bi xwe xemilandine. Heta niha di gundan de malên wisa tunene ku tevn tê de nebin, ku stêrê wana bi emenî neyêne girtin, ku qîzên berzewac ji cihêzê xwe re gorên spî yên nexş çênekin, ku mêvanên ezîz bi cil û gorên rîs yên reng - rengî ve xelat nekin. Çend sal berê li Amerîkayê bi destê pêşekzanê Amêrîkayê fotoalboma xalîçên kurdan yê mezin çap bû. Em pê hesiyan, ku vê dawiyê dîsa li wir li ser çanda kurdan yên bi wî cûreyî konferans çêbûne. Hostatiya tevnçêkirinê di nava me de hê baş dimîne û hê gelek albom û berevokên nexşên kurdan dikarin bêne hazirkirin, yên ku paşwextiyê wê bibine qinyatine baş ji bo zanyariyê. Lê bi kollêksiyên nimûnên tevnan yên berevkirina hê gelek pirsên zanyariyê dikarin safî bibin.

Em nikarin bibêjin, ku kurd di aliyê çêkirina xanî, ziyaret, heykel û mezelan de hostên eyan bûne, lê dîsa jî karibûne tiştên hêja û bedew çêbikin, yên ku li ser axa kurdan hatine dîtin û di sedsala navîn de hatine çêkirin. Pêşekzan dibêjin, ku di mezelên êzdiyan de hîna xeysetên zerdeştiyê hatine parastin. Em wî guman nînin, ku ji bo arkeologên kurd qinyatê lêgerîna pir baş li ser erdê kurdan henin. Ji me ve xuyaye xebatek di derheqa hostatiya xanîavakirinê ku înjenyor Nezîm Casim ji Kurdistana Îraqê sala 1972 - û li bajarê Kîyêvê nivîsîye û bi xweykirina tezê wî xebata dereca doktoriyê

stendiye. Di rojên me da çiqas gund, mal, ziyaret û mezelên kurdan xerab dibin. Qet nebe divê şiklê wan bi foto û vîdêokamêra bêne kişandin û parastin.

Roj bi roj xişir û cilên neteweyî ji bîr dibin û nayên bikaranîn. Wexta ku em li şiklên berî 50 - 60`î dinihêrin, em li xemla jin û bûkên kurdan ecêbmayî dimînin. Wan çiqasî ji morîkan û bi taybetî ji xişirên zîv hezkirine. Di dîrokê de her xişirên biçûk û mezin henin. Ew hostatiya xişirçêkirê kurdan eyan dikin û bi rastî her yek ji wan xizêm, polik, guhar, kember... hêjayî lêgerînê zanyariyê ne.

Di salê 1970 - 75'an de li gundê kurdan li komara Sovyeta berê bikirçîyê xişirên jinan yên zîv xuya kirin. Ji bo kevaniyên kurdan ew xişir ne tiştên mezin bûn û wan bi hêsanî xişirên xwe difrotin. Paşê ew xişirên berevkirî muzeyên miletên cînar xemilandin. Lê pirsên - ew xişir ji ku ne, kê çêkirine? ne hatine danînê.

Dilê me wisa jî temûl nade, wexta em cilên kurdan yên nevçê Kurdistanê yên cûda di muzexanên welatên cînar de dibînin.

Hêdî - hêdî ji deba me wisa jî hacetên xebata kevin - meşk, dolab, kam, cot, conî û tiştên din pê ra jî firaxên malê - kaxik, cêr, kûzên ji heriya sor çêkirî, kevçiyên zîv û darîn, sîtilên biçûk û mezin têne jibîrkirin.

Wisa jî gelek hacetên sazbendiyê hatine û têne jibîrkirin. Îro jî hacetên sezbendiyê di nav kurdên Ermenîstanê de mane, fîqe, zurne tên bi karanîn. Tulum, ku carina jêre dibêjin, çalemeşk, bilûr - hatine jibîrkirin. Ji hacetên sazbendiyê di nava kurdan de wisa jî gelek belabûyî bûne çongûr, tar, saz, kemen, kemençe. Gelek cûre defên biçûk û mezin hebûne. Di rojên me da şayada tembûr cîkî hêja digire. Lê îro êdî di nava deba me de di şûna hacetên sazbendiyê yê neteweyî yê modern - Îonîka, org ciyê xwe digirin. Ev hacetên modern çiqas jî baş bin, dîsa jî nexşê sazbendiya neteweyî yê xisûsî nikarin eyan bikin.

Çêkirina hacetên sazbendiyê yê neteweyî va - keman, tembûr, dengbêjê eyan Temo li Parîsê mijûl dibû û di mala xwe de mûzeyeke biçûk ya hacetên sazbendiyê çêkiribû.

Li paytexta Gurcistanê - Tibîlîsê, di sala 1980'ê de mala êtnografiya kurdan Lamara Farêda me mûzeyeke biçûk ya xişirên jinan dîtiye. Muze û arşîva dewlemend mala xwe da binelyê gundên Şahûmyanê li Ermenîstanê Ezîzê Miraz çêkiribû. Ezîz bi pêşekê xwe ve zootêknîkê bi xwendina orte. Bi hezkirina mezin û li ser kîsê xwe wî tiştên bihagiran - cilên neteweyî, xişirên zîv, tevn, fraq, hacetên şer, yên xebatê, yên sazbendiyê û gelek tiştên din di odeke mezin da berev kiribû û bi kubarî û gelek tiştên din di odeke mezin da berev kiribû û bi kubarî nîşan dikir û şirove dikir. Di odeyeke biçûk de jî wî dokûmêntên ronakbirên kurdên Ermenîstanê - Hecîyê Cindî, Erebê Şemo û yên mayî tiştên ku wan kêr anîbûn berev kiribûn.

Haya me jê heye ku li Almanyayê Feqîyê

Teyran nimûnên êtnografiya kurdan yên baş berevkirine û diparêze.

Çanda miletiyê ya kêranînê wisa jî doxtiriya neteweyî. Doxtiriya cihanê eyan kiriye, ku saxlemiya maryara zanebûna derman neteweyî gelek ferz in. Pir caran, me li ser xwe jî texmîn kiriye, bi xwarinên miletên din em aciz bûne, nexweş jî ketine û heta me girara kurdî ya bi mast û pûng nexwariye em pak nebûne. Li Ermenîstanê, bajarê Gumriyê doktorekî kurd Torînê Ahmet wisa jî pirsê doktoriya mijûl e, ka dermana çawa çêdikin, çawa bi kar tînin. Çend meselên wisa wî di rojnameya "Riya Teze" de daye çapkirin.

Li paytexta Qazaxistanê li bajarê Alma - Atayê Helîme Xanim bi xwarinên neteweyî ve mijûl dibû, dixwast berevoka xwarinên kurdî bi resim û şirovekirinan hazir bike.

Bi texmîna me çanda kurdan ya ruhaniyê hê dewlemend e.

Cejn û adetên kurdan gelek in, di derheqa wan de hindik hatine nivîsandin, pê re jî gelek tişt têne jibîrkirin. Eyan in çend kitêbên miletzaniyê ku Mele Mehmûdê Beyazidî, Emînê Evdal, T. Arîstova nivîsîne, li ku derheqa adet û cejnan de bi tomerî hatine nivîsarê. Gelek ferz e nivîsara cejnan bi hûrgilî: kengê cejn derbaz dikin, cilên çawa li xwe dikin, çi xwarinan çêdikin, çi dibêjin û distirên, malên xwe çawa dixemilînin...

Di nava kurdên Ermenîstanê de gelek cejnên olî û gelêrî hebûne û hinek ji wan têne parastin. Ji wan cejnan in: "Rojiyê êzdiyan", "Rojiyên Şêxsimê", "Rojiyên Xidirnebî", "Cejna Çilê Mêran", "Rojiyên Melekzeydînê", "Heylêman", "Beran Berdan", "Berodan", "Gulheyran", Rojên ziyaretê. Bi ser da jî zêde dibin şayî û şînên me bi edetên neteweyî. Di nava wan da bi rastî gelek êlemêntên hêna pûtperestiyê û zerdeştiyê hatine parastin. Û li benda nivîsandin û lêgerînên zanyariyê ne.

Lê çiqas lîstikên me yên mezinan û biçûkan, çiqas nimûnên tiyatroya miletiyê winda bûne. Xuyaye ku di cejnên kurdan de pir caran tiyatro nîşan dane. Keç û xort bi cilên reng - rengî va bi nîşandayîna tiyatroya dorberê xwe mijûl kirine, ew dane kenandin. Bi texmîna me kes bi tiyatroya neteweyî va mijûl nebûye. Ji kitêba K. Êyûbî û Î. Simîrnovayê derheqa zaravê kurdan yê mûkrî da em pê dihesin ku di nava kurdên Îranê de lîstika têatrê bi navê "Mîrmîrên" hebûye. Li cem kurdên Ermenîstanê "Kose geldî", "Rûvî" hebûne. Bi texmîna me nimûnên têatra me ya neteweyî hê temam winda nebûne û hê gelek dikarin bêne dîtin û nîşandan.

Reqasê kurdan yên bedewîn pir in, percûre ne. Gelek caran pêşekzan û ronakbîrên miletên din li ser hostatiya reqasvanên me ecêbmayî mane. Ronakbîrên ermeniyan yê mezin X. Abovyan nivîsîye ku: "...Di nava reqasên kurdan da ewqas agir, şewat heye, ku eger hestuyê reqasçîya ne kurdî bin wê bişikên". Henin pêşekzan jî ku dinivîsin wekî reqasên kurdan tunebûna, wan ew reqas ji miletên cînar hildane.

Reqasên berê yê giran, li êlêmêntên çetin bîr dikin û ji bo pêşekzanên miletên din jî hînbûn, nivîsar û hildana reqasê me çetin nîne. Tiştekî baş e, ku reqasên me niha bi vîdêokamêrayê têne kişandin, têne parastin. Baş dibe jî ku li ser şirîtên vîdêokasêtan bê nivîsarê navê reqasan, ew reqas yê kîjan navçê ne, reqasçî ji ku ne, hetanî pêşekzanên me yên neteweyî pêşta tên.

Sertaca habûna me ya neteweyî zargotin û sazbendî ye. Nimûnên zargotinê, sazbendîyê bi rastî ruh, xeyset û jîyana me bi rengên neteweyî yê geş va tînin ber çevan. Di wextê me da îdî pêşekzanên profesyonal henin, ku bi folklora me va mijûl dibin, nimûnên folklorê berev dikin, xebatên zanyariyê ser dinivîsin, çap dikin. Çawa edebîyatzan û şaîr Çerkezê Reş dinvîse bavê folklorzaniya kurdan Hecîyê Cindî ye. H. Cindî di dereca berevkirin, nivîsar, çapkirin û lêkolînên zanyariyê da xebateke pir mezin kirîye. Çend kitêbên H. Cindî yê folkloriyê ye bihagiran bîr bînin: "Folklora kurmancî" çap bûye sala 1936 - a, "Destana "Ker û Kulikê Slêmanê Slîvî" s. 1946 - a/têza xwe ya doktoriyê wî li ser vê destanê nivîsîye/, "Destanên kurdî" s. 1955, pênc cildên hikayatên gelê kurd, di salên cihê cihê de, "Metelok û meselokên gelê kurd" sala 1986-a. Pey H. Cindî ra tên C. Celîl, N. Cewarî. Sala par li paytexta Ermenîstanê - Yêrêvanê konsêrvatorya bi dîploma dereca bilind folklorîst sazbendzan Zozan Osmanî xelas kir. Têza wê ya dîplomayê li ser stranên kurdî bû.

Di dereca nivîsara nimûnên sazbendîya me da berî çend salan di kovara "Roja Nû" da hatîye nivîsarê, em naweşînin.


Me fikrê xwe li ser çanda xwe nivîsîn, pêra jî wan meriyan yên ku bi pirsên çanda me va mijûl in xebatên biçûk û mezin di vê derecê da kirine bîr anîn.

Mixabin, di derheqa xebatên ku li Kurdîstana başûr hatine kirin me negot, ji ber ku em baş nizanin.

Bi texmîna me wexta ku em bi xemxurî xweyitî li hebûna xwe bikin û çawa neteweyî mayîn - rûs, ermenî, yunan..., li ku dijîn, çi qewla da jî dijîn berî her tiştî di derheqa çanda xwe da difikirin, mekteb, dêr, kitêbxanên xwe saz dikin, kurd jî, çawa li welêt, wisa jî li derveyî welêt û îlahî yên ku mecalên demokrasiyê dijîn, divê di derheqa çanda xwe de, di derheqa zîyaret, kitêbxana miletiyê da bifikirin, mûzêyên neteweyî saz bikin û yên sereke di derheqa zayîna zarokên xwe da bifikirin ji bo pêşerojê wan bikin kadroyên neteweyî. ■

# Milpanî

*Sidqî Hirorî*



We..! Eve kî ye? Çi xwe mezin dike. Ho yê biçûk û weha bejna xwe ba dide. Tamaşa bikeyê çi yê difinbilind e. Ew pîremêrê hanê pêşve rabû û destê xwe danî ser singa xwe û xwe ji bo wî çemand jî! Ev dê kî be weha yê... pêşmergeyên hanê jî ji rûniştina xwe rabûn û bû silav û ezbenî ezbeniya wan. Ez her roj sed cara di ber wan re diborim û hema bi kutteki silavê li min vedigerînin. Ev çi ye, mamoste Selîm jî ji cihê xwe livî... çû berahîka wî. Wey. Ew jî xwe bo wî diçemîne. Ew çi dibêjeyê?! Ezbenî! Mamoste Selîm weha dibêje vî xurtî... biborin zarokî, bawer bikin bi çavan mirov nikare bibêje ku jiyê wî bêtir ji deh sala ye. Herê herê, mamoste Selîm, ev mirovê zana û şehreza û temenê wî 59 sal, ew jî mîna hemûyan dike û xwe bi awayekî vekirî ji bo zarokê hanê pir dişkêne. De lo belkî eqlê me kurdan hatibe serê me û em buhaya zarokan dizanin û wan didin pêşiya xwe. Nexêr, evana bê tam kir, mamoste Selîm vê bo zarokên xwe nake evca bo yekî biyanî. Tên bideyê çi li ber xizmeta wî ye! Ev mamoste Selîmê ku çayê jî bo xwe çê nake û zarokekî dwazde salî ku kurê pêşmergeyekî hejar e li ber xizmeta wî ye û

mehaneyek ji zarokî re dihête xerickirin bona ku çayê û xwarinê jêre çê bike û odeya wî paqij bike û digel xizmetên ku mamoste jê dixwaze bike.

Eve ez hatime vê bingeha serekî ya pêşmergeyan û ez tiştine hişbir dibînim. Her kesekê hema hindî serê derzîkê berpirsyarî û desthilat kete destan çend pêşmergeyek deyhane ber xizmeta xwe û dane dû xwe. Heke mirov rexneyê jî li wan bigre dê bêjin her çi kesekê du reşreşk xwendin hat û xwe li ser serê me kir şoreşger. Ew berevaniyê ji xwe dikin û dibêjin ku pir karê wan heye û divêt kesek karên din, mîna xwarin çêkirinê, xwarin deynanê, aman şûştinê, cil şûştinê, û gelek tiştên din li batî wan ji wan re bike, ji bilî ku heresiya wan jî bikin û di çûn û hatin û derketin û şeran de, di rex û dorên wan de bin, wan biparêzin û xizmeta wan bikin. Hema axa û şêxên serdemekê jî û bermayên wan yên niha wisa nin.

Ew çi şefellihên zelaman in li dormandorî kepra mamoste Selîmî? Ha... her weçku ew reşekên wî kurî ne! Lê cilên pêşmergeyan li ber in. Bi Xudê ez naçim wê derê, ji ber ku ez biçim jî ez xwe bo wî naçemînim û neku paşî bibe hevrikatiya min bi wan re û ez nizanim ka ew çi kes e û ka çi pê çêdibe û pê çênabe. Eve ez çi dibêjim xwe! Ne herê, ez jî di nav xwe de, di kûratiyên xwe de, yê girêdayî vê çendê me, heke ez boçî ditirsim biçim wê derê, ma hema ez wî nas nakim, ma qey divêt ez kesekî nas bikim da ku paşî bizanim ka dê çawa qedrê wî girim û ka dê bi çi awa silav bikimê? Ma danûstandina di navbera mirovan de li ser bingeha hindê dihête kirin ku mirov e yan li ser bingeha reftara wî yan li ser bingeha rewşa wî ya civakî û abûrî dihête kirin? Eve çi felsefe ye ez dikim, ha nûrhe rabû, zarok û xizmetçiyên wî ji cihê xwe livîn û çûn. Deriyê tirimbêla toyotayê jê re vedikin, diyar e ya wî ye û xuya ye wê hanê jî şoferê wî ye. Hey pa ez lezê li tiştan dikim, pa belkî yê pêçêbûyî be û pareyên wî pir bin? Bes ma hema yê pêçêbûyî be, ma dê hosa wî firînin, ma hemû tişt pare û samanê dinyayê ye, pa ka mirovînî û birayînî û biraxwîşkînî û kurdînî?

Kak Selîm bi tenê ma. Da biçim vê kulê ji dilê xwe derbikim û jê bipirsim ka ew çi zaro bû:

– Erê kak Selîm ew çi zarokê maqûl bû niha ji vê derê çûyî?

– Hey mala te ava qey te nezanî ew kî bû?

– Nexêr, eve cara yekem e ez wî dibînim.

– Ew Mehemed bû kurê şêx Salihê Çavşîn.

– Herê herê, we em birin ve binê jêhelî, hemû ji qesta ye.

– Çi ji qesta ye?

– Êdî mirov di we nagehe. Hûn dibêjin pêşkeftinxwazî û hûn dibêjin nabe em bidin dû kevneperês û paşkeftiyan, hûn dibêjin divê em dev ji tiştên xerab, ji kevne rewişt û tîtalan berbidin û hûn bo gelek kar û dîtin û tiştan dibêjin nabe û hemû tişt jî bo we û li cem we dibin û diqewimin. Pirsa we jî mîna meseleya wî melayî lê dihêt; ku mela li mizgeftê ba şîret li nivêjkeran di-

kirin û dema diçû mala xwe, bi wê ya wî li mizgeftê gotî nedikir, ku kesekî ji wan nivêjkeran di mala xwe de mîna wî kiriba ew bi kafir û jirêderketî dihat binavkirin û melayî jî şaşik û cibeya wî berevanî jê dikir.

– Wesa jî stûr neke, ev ne weku wî nimûneyê te ye. Eve kurê şêx Salihî ye û dinya hemû wî nas dike. Şêx Salihî qenciyeke mezin li me kiriye û em hê jî ji başiyên wî bê behir nebûne. Nabe em wê qenciya wî ji bîr bikin.

– Babo qenciya şêxê li ser ser û herdu çavên min û divê mirov yê nankor nebe. Lê heval, nabe em rê bidin ku qencî û çakiyên hinekan me bindest bikin û me ji xwe re bikin xizmetkar. Dê, hema me got em wî mafî didin şêxî, ma evî çi ye? Hema ji ber ku kurê wî ye, evca dê em pêyên wî deynin ser serên xwe!? Ew dixwaze di nav me de, digel me, weku me, bê cudahî û bê xwe li ser me mezinkirin bijî, wey li ser kulovanka serê min. Lê ez vê bawer nakim ji ber ku ji livîna wî xuya ye ku yê difinbilind û servala ye û her weku dixwaze, bi navê babê xwe, xwe li ser me gewre bike û weha xwe di rojekê ji rojan de bike serkêşê me û em jî jê re bibêjin belê ezbenî, we ye ezbenî... û hefsarê me di destên wî de be û me ji xwe re bikarbîne.

– Eve te çi ye tu îmro weha harbûyî? Tu gelek kûr çûye vê pirsê, çavê te li te be heke dê bor te bi xwe re bibe.

– Pa heke em xwe nedin borî, dê em çawan xwe li ber sîpel û gerdavan bigrin? Pa ev çi serhildan û şoreşkirin e we ji me re gotî û we xistiye ser û mejiyên me û niha em jî, bi wî awayê we, dixin ser û mejiyên hinekên din?

Ez bi axiftina kak Selîmî pir herişîm û li ber xwe keftim. Eve heyamek e ez û ew û sê hevalên din di beşekê, di rêxistineke siyasî de kar dikin. Ew sih û pênc salan ji min mezintir e û demeke dirêj e di nav xebata siyasî û çekdariya kurdî de ye. Bi vê reftar û axiftina xwe mamoste li ber çavên min keft û ew peyv û şîretên wî, yên ku min bê hizirkirin guhê xwe didayê, li cem min bê buha man. Divê ez êdî bi hêsanî her tiştekî nexim di serê xwe de û nabe ez bi gotina her kesekî bikim heta ku ji başî û durustiya wan gotin û dîtinan piştrast nebim. Ez di xema hindê de me, em di nav van pêşmergeyên sade û dilsoz û xwefîdakar de hind qelew diaxivin û em çarêka wan şîret û gotin û sozan jî bi cî naînin. Em rojê sedcarkî bi zimanê xwe êrişî axa û derebeg û şêx û melayên xerab dibin û bi pêşkeftina civakî bang dikin. Li aliyê din jî, em cihê wan xweş dikin. Kurê axayî dikin axa, yan axayekî dihavêjin da ku cihê axayekî din xweş bikin yan da ku axayetiyeke modern li bin navê siyasetmedariyê û partayetiyê durust bikin, ew jî her ew şepik û her ew bejn e û ez jî bindest û kurmancê caran im.

Duhî, heval Dijwarî di semînera xwe de li ser tevgera guhertinkariyê di civaka kurdî de, ew çende destnîşan kir, lê a niha min ew gotina wî fêhim kir. Wî rast digot dema ku gotî: "hêş gelek verêj û bermayên derebagatî û paşvemanê di kesîniya mirovê kurd de perçivîn e û heta niha jî û bi arîka-

riya faktorine din dibine egera mukumkirina peywendiyên civakî yên kevnar û bi nebaşî kardikine ser her bizaveke civakî û siyasî di komela me de."

Erê gelî mamostayîno! Heke hûn vê hemûyê baş dizanin pa eve çi xwe werbadan e? Dê hema eve hûn û ji xwe dest pê bikin...ma kê dest li we girtine? Yan rûha bistehî û xwefîdakariyê li nik we nîne?! Mamoste Selîm bi xwe kadirekî kevn e û dersan di warê dîrok û siyaset û civaknasî û tevgerên civakî de dibêje me û ew bi xwe jî li ber zarokekî, weha reftar dike. Ne ji ber ku divêt yê xweşkên be û digel mezinan mezin be û digel zarokan zarok be, ne ji ber ku divêt hurmeta zarokî bihête girtin û danûstandina xweş û bi hevaltî pê re bihête kirin. Nexêr, ev hemû li gorê nîne, lê gişt ji ber hindê ye çinkî Mihemed ku navê wî zarokî ye kurê filan gire gir û kenkeneyî ye. Heke çima digel zarokên din weha raftar nakin. Çima digel kesên di jiyê xwe de yan ji xwe mezintir û pir xizmet kirî weha bi başî reftar nakin. Dê dawiya dawî vî kesî li ser me har bikin û dê welê kin ku em di dwarojeke nêzîk de newêrin xwe ji ber wî bilivînin. Belê dê ho bi hêsanî axayekî moderin ji me re çêbikin û dê weha me bine ve binê jêhelî.

Erê gelo, heke dê ew her weha bikin, çima narûnin malên xwe, da cwamêrekî din xwe bide ber van pirsan, belkî riyeke çêtir û bi xêr û bêrtir peyda bike. Lo ezo xişîmo eve ez çi dibêjim. Ew wisa bi hêsanî xwe nadin paş û weha bê şer û teqe req riyê nadin kesekî din. Pirs ji hindê kûrtir e, bi reh û rîşal e, derd e û çare û rêçare jê re divên. Ya ez niha têdigehim ew e ku ev, ya ku em bi vî rengî dikin, ne çi rêçare ye, ev xulîpêwerî ye. Gava ku mirov dibêje wan "de babo werin em hewil bidin ya me pê çêdibe ji wan dîtin û gotinên baş û li gor ji desthatina me em bicîbînin" ew dê bêjin " hê zû ye û hê miletê me negehiştiye wê pileyê û malê me eve ye, ma em çi bikin. Divê em pê qayil bibin." Eve, ne niha, lê demekî dirêj e dihêt gotin û sed hezar bare dibe, ya kevn e û me ji cihê em lê nalivîne. De were bi zanîn yekî li ser serê xwe bike mêtinkar û heke wî mêtinkarî jî bîva xwe li nik me dît evca dê kî belaya wî ji me vebike. Ez yekê dizanim; em bi xişîmî û sadeyî û nezanîna xwe, xwe bindest û perîşan dikin.

" Xwe bêguman dê yek ji yê din dewlemendtir yan hejartir be û wekheviya sed der sedî zehmet e rojekê ji rojan, li vê cîhana me, cihê xwe bigre. Lê divê mirov hertim bizav û xebatê bike bona ku hindî bikaribe mêtinkariya kedxwaran li ser kedkaran kêmtir bike û wekheviya civakî, di her warekî de be bila bibe, bêtir lêbike" her di dawiya eynî semînera duhî de maoste û kak û heval û seyda Dijwarî – kes li vê derê nikare bi navî bi tenê heta bangî hevalê xwe yê nêzîk jî bike û divê peyvek ji van peyvên rêzdariyê berî navî bihête bikaranîn û ji ber hindê jî ez wan hemûyan rêz dikim- ev digot. Ew weha dibêje û yek pêngavê jî, di parktîkê de, ber bi hindê nahavêje û her xwuha me hejar û bindestan jî dibe berhem bo ber koşa ziktilêran. Dapîra min ya hejar û bê didan jî bi parîkê bi tursî yê



www.netewe.com

nanê xwe yê req razîbû û parzînê wê yê ji xeman jî pir her li pişta wê bû û digel hindê jî digot babê min: "kurê min, çavên xwe vebike, ya Xudê dide divê tu pê razîbibî. Çav pênerabûn nebaş e û dilê xwe nebe malê çi kesekî. Diyar e Xudê axa ji wî rengî dîtine, lewma ew zengîn kirine. Kurê min pêyên xwe hindî berka xwe dirêj bike û bi wê ya ku Xudê dide te qayîl bibe." Û weha dapîrê parzînkê xeman nehavêt. Xudama koçkê bû, cilşo û amanşoya mala xatûnê bû, xizmetkara bejin ziravan bû. Ku nevî çirkekî yan nevî çirkeke axayî jî di ber re buhurî ba, diviyaba xwe havêtiba destên wî yan destên wê û mirç mirç maçîkiribaya wan û digot eve bereket e ...nûrhe ye û dapîr di wê rewşê de ma û bi wê pergalê çû û mir û niha jî me bi neviyên xudama navmala axayî nav dikin.

Niha zanayên me û pêşkeftinxwazên me yên li vî cihî jî her eynî gotinên dapîra min, lê bi awayekî moderin û bi peyvên ciwan û teyisî dibêjin û bi ezmanekî diplomasiyane û pirî xapandin di guhên me de dirêjin. Nexêr, divê em rê nedin ku hejarî û bindestî xwe di lingên me biwerîne. Ez dê gotin û kiryarên wan pîvim û nahêlim bê hilsengandin derbas bibin. Dê tila xwe dirêjkime wî yê dibêje û napêje, yê dizane û çavan û guhan digire û xwe xişîm dike û xwe tê nagehîne û çi diqewime jî bila biqewime. Ez dizanim ya min bi tenê çi ya wisa pê ve nahêt. Dibe ku kêfa hinekan pê bihêt û dilên wan pê xweş bibin û kulîlkên hêviyan li cem wan geş bibin û dibe jî ji ber hindê gelek hing û dirb bi min bikevin. Lê yan dê serê xwe şor bikim yan dê bilind bikim û ez dê ya duwê bikim û çi rûdide bila rûbide. Ez nizanim çima ev dewlemend û parmendên me jî xwe wekî me nadin ber xebata netewî. Xwe em serbikevin û dewleteke me çê bibe jî, em dê bibin karker û karmend di kargeh û fabrîqeyên wan de. Ez hê li cem Selîmî me – vêcarê navî bi tursî bikardiînim û çi dibe bila bibe- û berdewam im li ser vê gêngaşeya xwe ya navxweyî. Tirimbêl vedigere ve. Vê carê kurê şêxê tê de nîne. Şofêr bi tenê ye, jê peya dibe û li ber derê tirimbêlê radiweste û Selîm jî ji cihê xwe radibe û diçe bo nik wî. Şofêr, vê carê ne weku cara pêşîn e, vê carê bi livîn û axiftina xwe bêtir weku kurê şêxî dihêt pêşavên min. Niha ew axftina kurdî ya ku dibêje "xulamên axa jî axa ne" dihête bîra min.

– Xêre kak Mîrza, Selîm ji şofêrî dipirse.

– Ezbenî ya gotî tu îşev mêhvanê malê yî bo ser şîvê, şofêrî di bin lêvan re dibêje Selîmî.

– Wey li ser herdu çavan, Selîm vê dibêje û destê xwe datîne ser sînga xwe.

Şofêr di cih de li tirimbêla xwe siwar dibe û diçe. Çavên mamosteyî bi çavên min dikevin, her weçku dizane ez dê çi bibêjim, ku nêzîkî min dibe, bi dengekî pir nizim dibêje:

– Mirov neşêt ji ber şêxî gotina kurê wî li erdî bide, weha berevaniyê ji xwe dike.

– Û semînera îşev, ez dibêjim Selîmî. Min hemû heval agadar kirine ku îşev amade bibin bo guhdarîkirinê li semînera te ya li ser "şoreşên kurdî û ders jê wergirti-

nê".

– Semîner dihête paşxistin.

– Goşt û mirîşk û pelava ziktilêran nahên paşxistin û sed qatî xweştir in ji nîska vê derê û rûniştina digel hevalan.

– Ev te xêr e tu evro ho harbûyî û di bin xwe de çûyî. Divêt tu bizanî ku gotin û kirin ne yek in. Te divêt tu jî bi min re were.

– Ew ya mayî, ji bo ku wenekî ez tila xwe dirêjbikime kêmasiyên te, dê min jî weku xwe lê bikî?

Selîm ji nik min bi xeyidîn diçe. Ez jî pir li ber xwe dikevim. Di van gavan de Îbrahîmê kadir dihêt û çiwar pêşmerge li dû wî ne û silav dike û dibêje:

– Êvarîbaş seyda.

– Êvarîbaş, lê navê min ne seyda ye û tu baş dizanî ku navê min Dildar e, ez lê vedigerînim.

– Mamoste divêt mirovên rewşenbîr û xwende û kadir di nav pêşmergeyan de weha bang bikine yekûdu bona ku xelik jî weha bikin û hurmetê bo mirovî bigrin û wisa dê hurmetê bo gotina me jî bigrin û dê weha em bikarin wan birîvebibin, Îbrahîm weku kesekî baweriyeke mezin bi gotinên xwe heyî diaxive.

– Pa ez bi xwe dê bêjim te Îbrahîm û ez wî mafî jî nadim te ku tû ji bilî Dildarî bi navekî din bangî min bikî.

– Mamoste, wisa nîne û xelkê me hez dike ku mezinekî wan hebe ku serhefsarê wan bigre û wan birêvbibe û heke wesa nebe dê ev xelke ji destên me derbikeve û em nikarin şoreşê bikin.

– Berêxwebideyê, heke hemûyan, yên li dewrûbera min, her roj seda cara xwe ji bo min çemand û gotin min ezbenî û seyda û mamoste û xizmet û xulamtiya min kir, dê rojek hêt ku ez tê de xwe li ser serên wan bikim zep zepe û xwe li ser wan mezin bikim û li cihê ku bibim faktoreke arîkar ji bo azadkirina wan, ez wan bindest bikim.

– Ev ne rast e û em bes bi wî şêweyî dikarin vî miletî birêvebibin û azad bikin.

– Te tiştek xistiye serê xwe û te rûha guhdarîkirin û standina tiştên din nîne, lê niha were da em ji van hevalan bipirsin ka ew çi dibêjin, digel wê pêşniyariya xwe ez bangî çend hevalekên pêşmerge, ku li wan nêzîkan in, dikim.

Ku ew heval dihên ez pirsyara xwe bi vî awayî datînim ber wan:

– Birano, Îbrahîm dixwaze em bibêjin wî seyda yan mamoste yan ezbenî. Evca pirsyara min ji we ew e, erê hûn çawa dixwazin; ku hûn bibêjin min Dildar, bira û ez jî her bi navên we û bi peyva bira gazî we bikin û em digel hevûdu weku heval û birayan bin yan hûn jî digel gotina Îbrahîmî ne?

– Nexêr, ew yekser û zû vê bersivê didin. Em dixwazin em weku bira û havalan bin û bi navan bangî hevûdu bikin.

Îbrahîm bi vê reftara min û bersiva hevalan dierine û bê xatir xwestin ji nik me diçe û gêleşoka wî jî bi dû wî dikeve.

Dêh, ezo milpano ji gotin û hizra xwe nehê xwarê û qadê bernede ka dê gehînî kûderê. ■

# Sigmund Freud

*Laleş Qaso*

Di nav miletên paşdemayî de cihê îdeolojiyê her tim ji yê zanistê bilindtir bûye. Desthilatdaran dem bi dem îdeolojî mîna daqmoqekî ji êgir, raberî zanistê xebitandine û nehiştine ku civak xwe di gevzekên zanistê de biwejîne. Eger ne ji îdeolojiyan ba, kî dizane belkî îro dinya li gora îro, pêncsed salî an hezar salî pêşdetir bûya.

Pirên rewşenbîrên kurdan û cîhanê, rastiya zanista Freud pir dereng fêm kirin. Van rewşenbîran heta ku sîstema şorevî têk neçûye, Freud bi awayê ku Lenîn û peydûkên wî digot;"Freud şarlatanê burjuwazî ye! Ev şarlatan ji navikê û berjêr de difikire!" nitirandine û herwiha dijminayî pê re kirine. Balkêş e ku ji aliyekî de komînîst wê xwendina pirtûkên wî qedexe bikin û ji aliyekî de faşîst jî wê van pirtûkan bişewitînin! Komînîst û faşîst di derbarê teoriyên Freud de her tim wek hev axivîne û êrîş birine ser. Belê Freud jî êrîşên wan di tewê polîtîkayê de helsegane dike û bi coşeke mezin xebata xwe ya buhabilind didomîne. Bi rastî jî ne Lenîn alim bû û ne jî leninîzm bi xwe îlm e. Lenîn siyasetgerekî zana bû. Pirtûkên ku wî nivîsîne, derî Ampîrîokrîtîsîzm hemû li ser siyasetê û polîtîkayê ne. Pirtûka wî ya bi navê Ampîrîokrîtîsîzm jî çendî îlmî ye, divê mirov li ser devjenkê bike. Lenînîzm tiştek e û marksîzm tiştek e. Ji ber ku mijara me ne li ser Lenîn û kominîzma ku wî damezirandibû, ji devê komînîstên îtalî tenê em ê gotinekê bibêjin û derbas bibin:"Eger

heta ku tu bibî çil salî û tu nebî kominîst, tu ehmeqî. Û eger ji çilî û pêde tu bibî kominîst, tu dîsa jî ehmeqî!"

Însan çi ye û ne çi ye? Însan hîn bûye însan gelo? Însan wê çawa bigihên silûmên însaniyetê û karibin wek bira digel hevûdin bijîn? Gelo bi rastî însan tiştekî wilo ye ku ji danheva hemû tiş û loda sebeban pêk hatiye? Yanî dibêjim ku hebûna min pirsebeb e û di bin van pirsebeban de bêhejmar tişt hene; ma rast e gelo? Hin feylezof, "însan gurê însên e" dibêjin. Însan çawa dikare bibe gurê xwe! Însan geh gur e, dikuje, geh şemûsqantireke, ketûber lotikan dide, geh conega ye, poşan di vir û wir werdike, geh cin e, dixapîne, geh berdoşekçî û kurtêlxwur e û hwd. Însan ji însên çi dixwaze? Însan ji xwe çi dixwaze? Însan çi ye? Însan çima hev dixwin? Însanan çima dojeh û bihuşt çêkirin û hevdu birin dinyeyeke kesnedîtî û li wê dinyaya kesnedîtî jî ketin pêxêla hev? Leşker û polisên xwe rêyî wir kirin. Leşker û polis li her derê eşqiya bûn! Çima ew dinya lewitandin? Çima li wê dinyayê dadgeh çêkirin? Dadgeh remza pêxwasiya însên bû. Zanista Freud bersiva van pirsan hemiyan dide. Freud di derheqa însên de me bi gelek tiştan agadar dike. Me xwe di lenînîzmê de yextiyar kir. Belê me hîç Freud nas nekir. Nehiştin ku em wî nas bikin, da em wan nasnekin!

Freud bi mînakek xwe, însên wek çiyayekî ji qeşê dinitirîne. Li gor wî, beşê çiyê î herî mezin di binê avê de bû û alimdaran jî tenê aliyê çiyê î diyar didîtin. Di zanista psîkolojiyê de keşfa Freud ya herî mezin ev e ku, aliyê însên yê nediyar bi ronahiyeke pertav derxist holê. Hemû teoriyên wî li ser vê keşfê saz bûne. Freud bi dû ku vî çiyayê binavkirî keşf dike, yanî terefên însên yên veşirtî dibîne, xwe berdide binê çiyê û di kûraya avê de xebatên arkeolojîk dike. Wî, bi vê xebatê hem bêhn û qewet da feylezofên ku digotin,"ji ber ku ez difikirim ez heme, an ji ber ku ez heme ez difikirim," û hem jî bi îlmî peyitand ku ji vê pir mestir "bi fikrên nefikar jî ez (ego) heme" Yanî nakokiya di navbera raman û hebûnê de derxist holê; sê alî însan girt berxwe û ji hev fesiland. Li gor wî, însan ne weke ku xuya dikir, wilo bû. Raman û lênerînên însên ên heşkere, rastiya însên ya esasî nedida dest. Çimkî, bê ku ev însan li xwe hayî bûba bi sedan, bi hezaran, belkî bi deh hezaran di bin zanyariya wî de veşirtî bûyer hebûn; vî însanî ew ê di bin bandora van bûyeran de bifikiriya û keftûlept bikira. Yanî însanê ku berê ji teref civatê bi namûs dihate zanîn, bi vê keşfa Freud derket meydanê ku hîç jî ne wilo bû. Tîtikî bû. Tîtik carna dibiriqe, carna dikeve rengê erdê û carna jî di ling de diçikile. Di pişt namûsa pirnamûs de, bênamûsiyek mezin hebûye; belê ev bênamûsî ya hîç heşkere nebûye ya jî mîna rewrewkan vedaye û derbas bûye. Bi rastî di vir de ez naxwazim xwe bi nav teoriyên Freud de ewqasî berdim. Çimkî, hem civata me û hem jî rewşenbîrên vê civatê bi giştî hîn jî îllellah in!

Sigmund Freud di şeşê gulana sala



www.netewe.com



1856'an de li Çekoslovakiya bajarê Freîberk hatiye dinyayê. Bavê wî tacirê hiriyê bû; cuhûyekî jîr û dolemend bû. Bi dû çêbûna Freud bi çar salan, mala xwe bar dike Viyanayê û Freud li vî bajarî bi xwendinkirin dide.

Freud 17 salî lîseyê bi dereca herî serketî diqedîne. Di pêvajoka xwendina xwe ya lîseyê de ji bilî zimanê xwe yê zikmakî elmanî, xwe hînî zimanê îngilîzî, frensî, spanî û îtalî jî dike. Dema ku lîseyê dixwîne, hewesa xwe berdide ser hiqûq û tibê. Destê wî ji herduyan nabe. Eger hiqûq bixwenda wê ji fenê dûr ketiba, dinyaya însên nas nekira, na eger tib bixwenda vê carê jî wê hiqûq ji dest çûba û nikarîba heq û hiqûqê însên biparasta. Dixwze hiqûq û tibê digel hev bixwîne. Belê rojekê beşdarî konferansek ku li ser siruştê ye, dibe. Freud di bin tesîra vê konferansê de dimîne; tibê hildibijêre û di sala 1873'an de li Unîversîta Viyana dest bi xwendinê dike.

Freud ji sala 1876'an heta 1882'an li Enstîtuya Fizyolojiya Viyanayê digel Dr. Bruck re dixebite. Di sala1881'ê de dîploma doktoriyê distîne.

Di sala 1882'an de bi Martha Bernays re dergîstî dibe. Û li Viyana nexweşxana Krankenhaus heta sala 1885'an li ser anatomiya mejî lêkolînê dike. Li vê nexweşxanê doktorê navdar Josef Breuer nas dike. Weke ku Freud jî dibêje ev doktor, ji Freud re dibe pîber, xebatên wî yên zanistî pêşde dibe û heta li ser şexsiyeta wî jî roleke mezin dilîze.

www.netewe.com

Nexweşekî Josef bi navê"Anna O" bala Freud dikşîne. Anna carcaran kirîzên giran derbas dike; di van kêlîkên kirîzan de bi carekê ve felc dibe û ji zimên dibile. Josef, Anna hîpnotîze dike û diaxivîne. Anna dest bi jiyana xwe ya raborî dike... Bi kurtî, bûyera Anna mejiyê Freud geş dike û di damezrandina teoriya wî ya psîkanalîztî de, dibe yekem pêngava pêşî.

Di sala 1885'an de li unîversîtê dersê dide. Dîsa di vê salê de diçe Parîsê û bi nevrologê herî navdar Jean Martîn Charcot re rûdinê. Freud bi dû ku ji Jean hînî tedawîkirina hîsterî-îsterî (nexweşiya sinîr) û metodên hîpnotîzmayê dibe, di sala 1886'an de dîsa vedigere Viyanayê û li Enstîtuya Kassowîtzê li ser norolojiyê heta sala 1893'an dixebite. Di hindurê pêvajoka van salan de, di felca mejiyê zarokan de hin bûyerên veşirtî dibîne. Ji ber vê hindê psîkopatolojî bala wî dikşîne û hêdî bi hêdî ji norolojiyê bi dûr dikeve.

Di sala 1886'an de dizewice.

Di sala 1902'an de dibe profesor.

Di sala 1906'an de Freud, Alferd Adler û Gustav Jung digel hev li ser pêşvebirina zanista psîkolojiyê dest bi xebatên berfireh dikin.

Di sala 1908'an de Freud li Salzburgê beşdarî cîvîna psîkanalîztên navnetewî dibe.

Di sala 1909'an de Freud û Jung ji bo konferansekê diçin Emerîkayê.

Di sala 1910'an de teoriya narsîzmê dinivîsîne.

Di sala 1911'an de nakokî dikeve nav wî û Adler; ji hev vediqetin.

Di sala 1914'an de ew û Jung jî ji hev vediqetin.

Di sala 1930'î de xelata Goethe distîne.

Di sala 1933'an de Hîtler pirtûkên wî li Berlînê darîçavê xelkê dişewitîne.

Di navbera salên 1934-38'an de Freud pirtûkekê bi navê Mûsa û Yekxwedayî dinivîsîne. Ev pirtûka wî ya dawî ye.

Di sala 1938'an de gava Hîtler Awusturyê dagîr dike, Freud ji Viyana bazdide Londrayê. Li vî bajarî di 23 îlona sala 1939'an de, bi awayê ku wê tucarî êdî nema vê dinyaya bi Xweda û Şeytan bibîne, çavên xwe digire û derbasî nav pêlên tarîxê dibe.

Di jiyana xwe de wî tucarî li himberî kevneperestiyê serî netewandiye. Freud taceke zêrîn bû dibêjim ji ber ku, wî barê dinyayê ji cin û pîrebokên duling sivik kir. Berî wî, dinya tije pîrebok, cin û ewliya bûn! Însan çawa mexlûq bû? bi me da naskirin. Berhemên wî ên zanistî ji bîst û sê cildan pêk tên. Ji bilî van berheman wekî din jî, wî di gelek kovar û rojnameyan de nîv-îlmî û nîv-siyasî gotar nivîsandine. Ew beşdarî pir konferansan bûye. Freud di nav psîkologên dinyayê de psîkologê herî mezin tê qebûlkirin. Ji bilî teoriyên wî ên ku di kiryarê de bi rastiya xwe hatine peyitandin, hin teoriyên wî ên nepeyitandî jî ku wê psîgologan bi sed salan mijûl bike, hene. ■

# Keça Tumas

*Migirdîç Margosyan*

*Wergera ji tirkî: Zinarê Xamo*



Me jî wek we, wek wan û wek hinekan got "dunya wiha ye" û xwest ku ew tiştên we û yên wek we berî nuha bi salan kiribûn, biceribînin. Ka bêyî ku em gotinê zêde vir de wê de bibin û bînin, em kin bibirin. Wek hûn dizanin gava meriv gotinê zêde dirêj dike ji tamê derdikeve, bîn dide. Belê, me got tam wexta wê ye û em zewicîn.

Zewaca me zewaceke basît û alelade bû. Lê hewce bû ku berê şertên wê werin hazirkirin û wer jî bû. Ya rast hazirkirina zemîna şertan hinekî jî girêdayî min bû, bibê nebê ez jî zilam bûm û li alî me pirr normal e ku divê gava pêşî ji alî mêr ve bête avêtin. Ji xwe tu sebeb tunebû ku ez jî rabim bi hawakî din bikim. Di dawiya dawî de, wek hinekên din ya jî wek we, me jî eynî tişt kir.

Çîroka me jî hema hema dişibe ya we, di nabêna wê û ya we de tu ferqeke mezin tuneye, ji xwe ne mumkûn e hebe jî. Ji ber ku hurmeta min ji urf û adetên me re hebû, eynî wek we, wek bavê min. Çawa nebe ez jî ji neslê bavê me'yê Adem bûm. Piştî ku bavê me Adem jî roj hat bi

diya me Hewa re zewicî, ma çima min'ê bipa, çima ez'ê li bende bimama ?

Min nepa. Ji xwe heta şanzde saliya xwe bi payinê ruh ji min kişiyabû, ma min'ê hîn jî bipa ? Erê kesên ku digotin, "xwediyê sebrê, mîrê Misrê" pirr bûn, lê ya rast min pirr guh nedida gotinên wiha, aqilê min gotinên wiha qet nedibirî.

Wan rojana tiştê ku aqilê min dibirî ev bû: Piştî ku ez jî wek bavê xwe pantorê dirêj li xwe dikim, wê gavê ez jî dikanim bizewicim. Çima ewê nebuya! êdî wext bû û hata tu nema bû ku dereng buya jî, divê min fikrên xwe yên li ser vê meselê ji hinekan re bigota...

Li alî me, gava mezin dihatin ba hev û diketin şêwr û mişêwran, qaîde ew bû ku divê yên biçûk bi hawakî bêdeng li wan guhdarî bikirana. Ya na, sîleyek li kortika hustuyê te diket û tu bi bejna xwe ya kinik, bi dev û rû ve diçûyî erdê, te erd maçî dikir. Piştî ku ez çend caran li erdê bûm çît û min erd maç kir, hîn nuh min ev rastî fêm kir. Bi vî hawî, bi guhdarîkirinê, dawiya dawî ez têgihîştim ku, ji bo fêrbûna xweşikiya keçikekê riya herî baş ew e ku dema keçik ji himamê derdikeve divê meriv wê bibîne. Min jî bi vî hawî guh da gotinên mezinan, hurmet nîşanî wan da û hemû şertê pêwîst bû anî cî û hema raste rast çûm ber himama here nêzî mala me, ber "Paşa Hemami" (Himama Paşê), li ber deriyê wê ketim nobetê.

"Ev xweşik e, ev ne xweşik e", bi vî hawî min li xwe kir êvar. Lê ji bo ku biryara xwe ya dawî bidim, roja din jî ez dîsa li ber deriyê himamê bûm. Û min fahm kir ku keça herî xweşik, keça Tûmasê cîranê me bû ye... Her çiqas min berê jî keça Tûmas gelek caran dîtibû jî, lê ev cara pêşî bû ku piştî himamê min ew didît.

Li alî me, gava lawik ji keçikê pirr hez bike dibêje "ez bengî me." Ez jî bengiyê keça Tûmas bûm. Him jî bengîtiyake çawa!... Min dest pê kir êvaran zû diketim nav nivînan û orxan (lihêf) dikşand ser serê xwe. Gava min wiha dikir ji min wednê ez'ê kanibim keça Tûmas hîn baştir xeyal bikim. Çimkî gava dilê te di keçikekê hebe, divê tu li li gor urf û edatan ji alîkî ve hêdî hêdî zeîf bibî, bihelî. Lê belê meriv ev zeîfbûn çuqasî zû li hev ragirta, bala mezinan jî hewqasî zû dihat kişandin. Min jî dîqet kir ku her roj hîn hindiktir bixum û xwe birçî bihêlim.

Ya rast, dilê min diçûyê, lê ez mecbûr bûm ku rîayetî urf û toreyçn civatê bikim, dernekevim derî adetên heyî. Min jî wer dikir.

Ez zeîf bûm. Zeîf bûm, lê çi heyf ku bala kesî nedikişand ku ez zeîf dibim û roj bi roj dihelim. Ku min wiha dom bikira, ez'ê bibûm ta û di kuniya derziyê re derbas bibûma, yanî ez'ê bibûma ta û derzî û ez'ê derketama rêwîtiya aliyê din. Ewê heyfa min û evîna min buya, ya herî xerab jî ewê keça Tûmas jî bi vî halê min ez neecibandima. Min biryara xwe da. Divê min mesele biteqanda... Mesele biteqanda ? Başe ji kê re ? Û çawa ?

Min mesele teqand. Rojekê di wexteke musaîd de min dît ku waye keça Tûmas ji kaniyê bi tenê avê dibe malê; min xwe gîhandê:

– Keçê ka ava te ez rakim...

Keça Tûmas soro moro bû, got:

– Naaa.

– Keçê ka ez rakim.

Min xwest ku ji destê wê dadim satila tije av. Lê wê ji min atîktir hereket kir, destê xwe di satilê de kir û av avêt ji min de, ez şil û pil kirim û reviya mal. Min jî, ji bo ku kincên min zuha bibin, min çû xwe da ber rojê. Gava min xwe dabû ber rojê û li bende bûm ku kincên min zuha bibin, ez ji xwe re viya fikirîm:

– Madem ez şil kirim, wê gavê dixwaze bi min re bizewice. Ez wiha fikirîm, ji ber ku li alî me, çaxa keçik dismalê bavêje ber zilam ya jî tasek av bi ser de ke, ev yek bi hawakî eşkere dibe îşareta daxwza zewacê. Ji xwe hereketeke wiha dibû îspata wê yekê ku keç û xort dildarên hev in. Piştî kincên min zuha bûn, bêyî ku wextê zêde biborînim, bi lez çûm ba diya xwe:

– Dayê ez'ê ji te re tiştekî bibêjim.

Diya min fena ku ez nebihîstibim karê xwe dom kir. Şuştina kincên xwe domand. Min daxwaza xwe ya ku ez dixwazim pê re bipeyivim dubare kir û got ku ez'ê tiştekî pirr girîng jê re bibêjim, divê ew li min guhdarî bike.

Diya min hinekî bi guhnedan û hinekî jî bi hêrs got:

– Ma nuha wexta wê ye ? Tam gava destê min di hevîr de ye, ya jî dema kincan dişom muheqeq tu'yê tiştekî axaftinê bibînî. Tu çuqasî dişibî bavê xwe.

Çaxa diya minn wiha got, min ev axaftina wê ya bi tinaz qet li dilê xwe girt, lê tew di ser de hinekî kêfa min jî hat. Çimkî ev cara pêşî bû ku diya min ez bi bavê min re muqayese dikirim. Ev heta dereceyekê ji bo min tiştekî baş bû, xuya dikir ku êdî min dikanîbû bi bavê xwe re kab biavêta. Wê gavê, ev tiştê min ji diya xwe re got ji alî wextê çuqasî ne di cî de buya jî lê ji bo min tam roja peyivandinê bû. Bêyî ku fersendê birevînim, hema min raste rast dest pê kir:

– Dayê ez'ê bizewicim!

Diya min şuştina kincên xwe domand, bêyî ku bersîvê bide min, ya jî tiştê min got muhîm bibîne. Divê ez viya jî bibêjim ku diya min di wê bîstikê de derpiyê min ê qilêrî dişuşt. Ya rast min ev sersarî ji diya xwe qet nedipa. Ez şaş mam, lê îcar dora qahrê ya min bû, min dengê xwe hinekî din jî bilind kir û min bi hêrs eynî cumle dîsa dubare kir:

– Min ji te re got ez'ê bizewicim...

Diya min serê xwe ji derpiyê min ê di têyştê(teşt, legana mezin) de bilind kir, li ruyê min nêrî, çavên xwe bera çavên min da, bi awirekî ku ha teqiya, ha wê biteqe, bîstekê wer bala xwe da min û dûre got "niç niç" û serê xwe bi alî rast û çepê ve li ba kir; tiştê dixwest bigota fena ku daqultîne, daqultand û negot, serê xwe xist ber xwe, îcar bi hêrs derpiyê min ji têyştê derxist, danî ser kevirê mezin ê li kêlek xwe û

ji bo ku paqijtir bibe, rahîşt şwênik û dest bi şwênikirinê kir.

Dora "niçe niçê" îcar ya min bû. Bi perda dengê xwe ya herî bilind, tu bigrî hema ez qîriyam:

– Ji bavê min re bibêje! Lawê te bûye qasî kerekî...û dixwaze bizewice...Û...

Min got "ûûû" û min nikanîbû dawî bianiya. Ya rast min baş nizanîbû ku ez'ê çi bibêjim, Bi tertilandin ez pengizîm derve. Ez ji ber deriyê mala Tûmas derbas bûm, hevalên min'a li serê kuçê bi gullan(xaran) dilîstin, ez çûm tevî wan bûm. Wê êvarê wek hertim, piştî me şîva xwe xwar, ez zû ketim navciyê xwe. Du sebeb hebûn ku ez zû ketim navciyan. Ya yekê hûn dizanin, ji bo ku bikanibim keça Tûmas hîn baştir xeyal bikim. Ya duduyan jî ji bo ku diya xwe û bavê xwe bi tenê bihêlim, ji wan re îmkanê peyda bikim ku kanibin di der heqê min de bipeyivin, mesela zewaca min derz bikin. Û ji xwe wer jî bû.

Ji oda kêlekê dengê wan dihat min, bi Kurdî dipeyivîn.Esas kêm zêde min Kurdî hinekî fêm dikir. Lê ew îşev, qey ji bo ku ez fêm nekim, di dêlî Kurdî(qest Kurmancî ye. Z.X), bi Zazakî dipeyivîn, ku hema hema min yek gotin jî jê fêm nedikir. Diya min û bavê min wê şevê hemû şêwr û mişêwrên xwe bi Zazakî kirin.

Roja din nizanim ji ber çi, ez zû şiyar bûm. Lê ji ber ku min cesaret nedikir ji nav nivînên xwe derkevim, wek ku ez di xew de bim, ez li bende bûm ku bavê min biçe kar. Min çer dengê kuxuka bavê xwe û dengê girtina deriyê me yê der bi hev re bihîst, ez ji nav nivînan pengizîm. Li ser xurniyê murûzê diya min gelekî tirş bû, lê tiştek jî negot. Li hember vê bêdengiya diya xwe, min zêde sebir nekir û jê pirsî:

– Çer bû, te ji bavê min re got ?

Diya min qet nefikirî, xwe giran nekir, tavilê bersîv da:

– Min got.

– Ê çi got ?

– Got bira berê zikê xwe têr bike, dûre xwe li zewacê rakşîne.

Diya min piştî axaftina xwe qedend hêzî ser xwe kir, fena ku bi lez û bez ewê here bigihîje derkê, zû zûka sifre da hev. Li hember vê bersîva ku min qet nedipa, bi tertilîn û bi hêrs min got:

– Êêêê ?

Îcar diya min xwe ranegirt û bi min de teqiya:

– Hîn tu zarokê do'yî, tu xwe li zewacê radikşînî...Tu li ku, zewac li ku ! Ma bi ya te xwedîjinbûyin hewqas rehet e ? Tu'yê zikê keçikê çawa têr bikî ?

Diya min wek tivingeke otomatîk derbasî êrîşî bûbû. Wer xuya dikir ku ewê hîn pirr bipeyiviya. Ez rabûm ser piya û bi hawakî çewto mewto pê de qîriyam:

– Zik, zik, zik...! Ma li vê dunyayê tiştekî din tuneye ?

– Heye... Helbet heye... Lê her tişt jî divê di wexta xwe de be. Carê berî her tiştî divê tu mekteba xwe biqedînî. Eskeriya xwe bikî. Ji xwe re çend quruş pere bide ser hev, bira destê te ço bigre, piştî wê tu çi jahrê

bela dikî bela ke...

Ya rast, ev cara pêşî bû ku diya min bi min de hewqas hêrs dibû, hewqas bi xişim li min radibû û li hember min hewqasî bê însaf bû. Te digot qey ew diya min a bi piranî mulayîm û li hember heqê her kesî hurmetkar çûye û yeka biyanî hatiye di dewsa wê de vî hukmî li ser serê min dike. Ku tu carî min diya xwe wiha nedîtibû. Min dengê xwe dernexist. Wê bi xişim axaftina xwe domand:

– Ya din jî, ewê kî yê qîza bide te, kî yê te bixwaze ?

– Min keçik dîtiye.

Diya min qey bersîveke wiha nedipa, dest bi girî kir. Gava min di ruyê diya xwe de lehiya hêsiran dît, ez şaş mam, di wê bîstikê de min xwe wek kûçikê ku hestî di gewriyê de mabe û nikanibe daqultîne, hîs kir. Lê min'ê êdî hew ji ber daxwara, ya rast hewqas jî zêde bû, diya min raste rast henekê xwe bi min dikir. Ji bûka xwe ya pêşerojê re digot çilmê û di ser de jî zewqa min rexne dikir... Bi vê şêla xwe jî dixwest ku ez biryara xwe biguherînim. Şûşan qet jî ne yeka wek diya min digot bû. Ma min li ber himamê belasebeb hewqasî pabû ? Ma belasebeb ez hewqasî kûr û hûr çûbûm ? Ev yek pirr pirr ewê êrîşa xwesîyekê buya, ku dixwest bûkê li ber çavan reş bike. Ji ber wê yekê jî, li hember hisên diya min reaksiyona min pirr bi hîdet û bi mêranî bû:

– Ew bi çilm be jî ez dixwazim !

Belê, heger bi çilm buya jî min biryar dabû ku ez'ê bi keça Tûmas re bizewiciyama. Lê çi heyf ku ev mirazê min qurçimî. Nebû. Bavê min got na. Li mala me biryarên bavê min wek emrên Xwedê bûn. Nedihatin guhertin. Û nehat guhertin jî. Bi vî hawî evîna min a pêşî bû qurbana urf û adetên me.

Keça Tûmas, Şûşana min a çilmikî bi yekî din re zewicandin. Min mekteba xwe nîvçe hîşt, li ba bavê xwe sinetê wî fêr bûm. Min ji keran re kurtan durû, durû, bûm hosteyê kurtanê keran. Piştî çar salan jî, ji min ra gotin:

– De vaye destê te kar digre, tu dikanî bizewicî. Û keça Hecerê ji min re anîn. Nuha her cara ku li kuçê ez rastî keça Tûmas têm, ez serê xwe dikim ber xwe û dimeşim.

Jina min ducan e... Heger keçikekê bîne gelo ez navê wê bikim Şûşan? ■

Ji kitêba Gavur Mahallesi( Taxa Fila)

# NÛJENTÎ Û NÛDEM



*Cemîl Gündogan*

Kurd, pêşîn di warê siyasetê de ji tradîsyona kevn qetiyan û ew rawirtin (aşmak, transcend). Encam baş bû: Piştî terikandina şopa polîtîkayên kevneşopîn, riya kurdan vebû. Xasima piştî 1975'an di qada siyasetê de guherînên mezin çêbûn û bi saya van guhêrînan, kurd, îro bi her awayê peyvê ve netew in.

Lê mixabin, tiştê ku di siyaseta kurdan de bîst sal berê çêbû, hê jî di hin warên din de neqewimiye, an jî kêmtir qewimiye. Di warê edebiyat, kultur û hunerê de rewş weha ye. Wek mînak, gava tu bêjî edebiyata kurdî, hê jî berhevkirin, pesindan û şirovekirina çarînên Ehmedê Xanî û hwd. tên bîra hin entellektuelên kurdan.

Çima?

Helbet sedem cur bi cur in. Lê, bi ya min, di nav wan de du heb layiqê qalkirinê ne. A yekemîn, di derheqê afirandina edebiyateke nûjen de tunebûna guftûgoyan e. Edebiyata kurdî wê çawa çêbibe, li ser vê babetê guftûgoyên pêdivî têr nehatine çêkirin. Ya duwemîn jî, ku ji ya yekemîn derdikeve holê, baş nehêjandina di avakirina edebiyateke nûjen de rola veqetîn û rawirtina kevneşêwe û kevnenaverokê ye. Rast e, mirov heta ku edebiyata xwe ya kevn hazm neke, nikare edebiyateke nûjen jî biafirîne. Lê mirov heta ku ji şêwe û naverokên kevn veneqetîne û wan ranewirîne, dîsa nikare edebiyateke nûjen ava bike.

Ji ber ku dijmin edebiyata me ya kevn tarûmar kiriye, berhevkirina bermayiyên vê edebiyatê, çi devkî û çi nivîskî, wek peywir xwe pêş xist. Ev karê han jî, bû sedemeke neditîna girîngî û divêtiya rawirîna edebiyata kevn.

Lê sedem çi bin bila bibin, encam vekiriye: Edebiyatvanên Kurd, tiştê ku siyasetvanên Kurd bîst sal berê çêkirine, ew nikarin bibin serî; dereng mane.

Bi rastî, di nav xwe de ev, ne tiştekî eceb e. Ji ber ku di welatên wek welatê me paşvemayî de siyaset pêş de diherike. Bi gotineke din, polîtîka rê vedike, warên din

piştî wê diçin. Xasima, di destpêka pêvajoya têkoşîna netewî de rewş weha ye. Lê piştre rewş hêdî hêdî diguhere; cihê celebên warê jiyanê (ekonomî, îdeolojî, kultur û hwd.) li gor giraniya xwe cihên xwe yên rastî distînin.

Li gor şemaya jorîn, paşdehatina nûjenkirina edebiyata kurdî tişteki anormal nîn e. Tiştê anormal, derengmayîn bi xwe ye. Bi rastî jî divê edebiyatvanên me zû da ev mesele safî kiribûna. Lê mixabin ew dereng man. Nikarin bi guftûgo û bi berhemên xwe re hîmekî edebiyateke nûjen biafirînin.

Eşkere ye ku karekî weha xasima bi alîkarî û hewldana rojname û kovarên edebî diçe serî. Lê belê em di rojname û kovarên me yên edebî de hewldaneke vê cureyê hew dibînin. Kovar û rojnameyên me yên edebî, ji aliyê şêwe û naverokê ve ji edebiyata me ya kevn neqetîne; kar û barê xwe hê jî bi pîvanên kevn dimeşînin.

Li gorî dîtina min, di vê niktê de cihê Nûdemê piçekî cuda ye. Ji ber ku Nûdem, ji destpekê ve berê xwe daye afirandina edebiyateke nûjen. Di vê armanca xwe de hewldaneke balkêş û berdewam radixe ber çavan.

Min Nûdem cara pêşî çend sal berê li girtîgehê dît. Xwediyê kovarê birêz Ceweri, hejmareke kovarê ji min re şandibû. Gava min lê nihêrî, wek her kesî, berî her tiştî şêweya bergê bala min kişandibû. Berg, bi rêkûpêk bû. Piştre min xwend û dît ku, kovar ji aliyê naverokê ve jî dixwaze tiştekî nûjen biafirîne. Hewldaneke wusa tê de xwe diyar dikir. Û ji wê rojê û pê ve min bi awayekî baldar li kovarê nihêrî.

Rast e, hemû gotar û materyalên Nûdemê, ji aliyê perspektîfa afirandina edebiyateke nûjen de ewqas zelal û xurt nîn in. Di hin gotaran de mirov dikare bi hêsanî tûşî mantalîteya kevn bibe. Li aliyê din Nûdem, xwe ji hin aliyan ve teng dîzayn kiriye. Lê, li gel van kêmasiyan perspektîfa kovarê eşkere ye. Nûdem, li ser riya afirandina edebiyateke nûjen gaveke bi rûmet e. Û pênc sal e ew vê meşa xwe bêrawestan didomîne.

Ger mirov temendirêjahiya kovarên kurdan bîne ber çavan, dibîne ku pênc sal ne demeke kin e. Lê Nûdem, piştî vê demê hilneweşiya, beravajî ew bû dayîka kovareke din û Nûdem Werger jî ket destê xwendevanan.

Bi ya min derketina Nûdem Werger, di perspektîfa afirandina edebiyateke nûjen ya Nûdemê de delîleke nû ye. Ji ber ku wergerandin di avakirina edebiyateke nûjen û xurttirkirina zimên de tiştekî pir girîng e. Niha Nûdem dest avetiye vî warî jî. Ez di vê meşa nûjentiye de ji Nûdemê re serefrazî û temendirêjiyê dixwazim.

*24.11.96/Stockholm*

# Demsala neqişandî

*Abbas Alkan*



Weke her roj, dîsa roj di Rojhilatê re hilatibû. Xweşikbûna rojê li çiyayê pêşberê gundê me xeteke rengîn kişandibû. Li jora xetê xezer û zelaliya rojê, li jêra xetê jî şîn û geşiya buharê weke bûkeke xemilandî dixwiyan. Ji ber ku gundê me di newalê û di navbera du çiyan de bû, roj zû nedigiha ser. Gund li berpala çiyayê Rojhilatê bû. Wexta ku roj dihilat, pêşî li çiyayê Rojavayî dixist. Lê her ku roj bilind dibû, xeta li çiyayê pêşber jî berjêr dadiket û zelaliya wê tîna xwe bi ser siyê ve hildiweşand û roj hêdî hêdî bi ser gund ve dadiket. Rojê li ava li ser pelên dar, devî û gîhayên biharê dixist. Ava li ser tehtik û azê, li ber şewqa rojê dibiriqîn û çavên mirov tê de venedibûn.

Pîra diya min Xamê sibehê zû radibû û çêlekên xwe, bizinên xwe didotin û şîrê xwe dikeland, kar û barên malê yên dîtir dikirin û hîna jî tava rojê nedihat ser gund. Ji ber ku şîrê çêlek û bizinên diya min hindik bû, wê ji du rojan carekê dew dikila. Carina ez û Gulîstanê ji xewa şêrîn ya sibehê bi dengê diya xwe şiyar dibûn ku wexta diya min dew dikila,

di ber de stirana dewkilê jî digot:

Kil, kil kil meşkê
Kilî rûnê vê meşkê
Destê kebaniyê bişkê
Piçek nedaye Gulê...

Piştî ku diya min dewê xwe dikila, meşka xwe ya reş ji darê dadixist, navkil ji meşkê derdixist û bi destê rastê bi lewlebê pêşî û bi yê çepê jî bi lewlebê paşî digirtin û dewê çîl-sipî vala dikir beroşê; rûnê nîvişk ê mîna kefê sipî bi ser dêw diket...

Diya min, piştî xelaskirina karê malê dihate ba ciyê min û Gulîstanê û bi zarekî şêrîn; bi qurban, bi heyran û bi bergerîn em şiyar dikirin, da em herin ber heywên. Pêşî taştiya me hazir dikir û her yekê me loqek rûnê nîvişk li ser nên pahn dikir û du tas dewê hênik dianî datanî ber me. Carina min û Gulîstanê li ser taştê li hevûdu dixist. Bi dû taştê, diya min çend nan, du çeng mewîj, bîst-sih lib gwîz dixistin tûrikê Gulîstanê yê xetxetîyê rengîn.

Ez û Gulîstanê ji malê derdiketin hewşê, min dêrî vedikir û wê jî herdu çêlek, hersê bizin û her çar mih ji mexel radikirin û me ew dibirin. Em li bintara gund difetilîn, hêdî-hêdî ber bi çolê ve diçûn. Carina min radihişt tûrikê nên, carina jî Gulîstanê. Bi destpêka kaş re, me bihna xwe li ser panavê berdida.

Wexta mirov li serê kaş dinerî, nava gund weke nava kefa destên xwe her der didît. Serjêra kêş, weke xalîçeyeke rengîn dihate ber çavên mirov. Bayê hênik li porê Gulîstanê dixist û por bi ser serê wê ve vedigerrand.

Çola berfireh ji ser serê bahnavê mîna behreke şîn dihate ber çavên mirov. Li berjêrî, Amûdê dixuya û gumêna dengê Riya Hevrêşim weke nalîna şêrekî birîndar ji kûr ve dihat. Li kêleka milê çepê, çiya û Newala Palan xwe dabûne hevûdu û ber bi Cizîrê ve dikişiyan. Li kêleka milê rastê jî, Keleha Mêrdînê ji dûr ve weke sê hêkên çîl-sipî dixuya. Aliyê berjor jî heta ku çavên mirov didîtin çiya û şînikayîya biharê bûn, di navê de hinek gundên Omeriyan jî dihatin dîtin.

Carina me heywanên xwe li dora Textê Dara Mazî, carina li dora Textê Benkê, carina jî li dora qûçikan diçêrandin. Carina jê, em heta êvarê li ser nigan diman û li dû heywanan bûn. Carina hinek heywan mexel dihatin, ên mayî jî li dora wan diçêriyan. Ez û Gulîstanê rûdiniştin û me bi heftoka dilîst. Hin rojan me li hevûdu dixist û heta êvarê em bi hev re nedipeyîvîn û ji hevûdu xeyidî diman...

Li çolê, ji alîkî ve gumîna dengê Riya Hevrêşim û nalîna wê ya di kûr de, ji alîkî ve şînîtî û geşiya biharê; bihna kulîlkan, sosin û bilbizêqa, xwişîna dar û deviyan, dengê şalûl û bilbilan, dengê qebe-qeba kewan, zinge-zinga zengilê keriyên pêz ku li derûdor bûn, xewa mirov dianîn. Ji bo ku em zanibin nîvro bûye yan na jî, me li ezmên dinerî; ger roj hatibûya nîvê ezmên û siya me bûbûya du pê, wê çaxê me dizanibû ku

nîvro ye û wextê firavînê ye.

Min destmala xwe ya belek ji hustuyê xwe vedikir û li cihekî rats radixist. Gulîstanê jî turikê xwe yê bi gulikî gulbend ji milên xwe datanî ser destmalê û nan, mewîj û gwîzan vala dikirin ser. Me heta nan dixwar û heywanan bi ser hev ve dicivandin, ew roj jî li me dibû êvar.

Her ku dem bi pêş ve diçû, pevçûna min û Gulîstanê jî kêm dibû û roj bi roj hezkirina me ji hevûdu re pirtir dibû...

Rojekê, wexta ez û Gulîstanê li ber heywanan bûn, dîsa bavê min û diya min bi tenê li malê mabûn. Bavê min weke hertim li quncika hudur rûniştî bû û pala xwe dabû dîwêr, li pişt wî jî li dîwêr wêneyê Şêx Seîdê Kal û yê Qazî Mihemed li kêleka hevûdu daliqandî bûn. Rihê bavê min ê çîlsipî bi ser singa wî ve hatibû xwarê, simêlê wî ji dûxana çixarê zer bibûn. Qutiya xwe ya mezin a tijî tûtin, vala kiribû dawa şerwalê xwe û kirşên girs ji navê dineqandin, di ber de jî cigareke qalind dipêça. Ji ber ku guhên wî hinekî giran bûn, carina deng baş nedibihîst û baş fêm nedikir.

Diya min ji cihê xwe rabû, pêştemala xwe ya sor ku gulên zer tê de bûn li pişta xwe pêça, çû li kêleka bavê min rûnişt û got:

– Hecî! Min ê duh ji te re gotiba, lê ez vala nedibûm ku bêjim. Tu zanî, ku bi ya min be, tu yê van heywanan bifiroşî. Lewra tiştek ji wan dernayê û ev zarok li van çolan heta êvarê li dû wan dihelikin. Êdî Gulîstan jî xortî kamil bûye!

Ji nerîna bavê min dihate fêmkirin ku deng baş neçûbûyê, destê xwe da ber guhê xwe û got:

– Dengê te baş nehat min, lê.

Min got:

– Ev zarok li van çolan heta êvarê li dû van heywanan dihelikin. Êdî Gulîstan jî xortî kamil e! Her roj ev çol û çiya tijî leşker dibin, hezar belayên dinyayê jî hene. Mala min şewitî, hingî roj li rûkê Hesenê min xistiye, ruyê wî weke nava hinarê sor–gevez bûye. Ya baş ew e, van heywanan bifiroşe û zarokên me ji vî ezyetî xelas bike. Ger tu bêjî ku wê zarokên Derwêş û Reşo qirikziwa bimînin, cehnima wan kirî. Ew ji roja ku gihane jinên xwe, ma rojekê jî deriyê me vekirine? Yan li rewşa me pirsîne? Ew ji tirsa jinên xwe, newêrin bên devê deriyê me. Qîza min ne cêriya jinên wan e ku heta êvarê ji bo wan û zarokên wan şivantî bike. Heywanan tevda bifiroş, bila tenê Çêleka Zer bimîne besî me ye...

Bavê min, piştî wan gotinan destê xwe ji ber guhê xwe daxist, çixara xwe pêxist, hilmek–dudu kişandin. Ruyê wî ji dûxanê nema dixuya û got:

– Welehîn, Xanê, bê heywan nabe, lê dîsa jî tu dizanî. Hema em bila qirikziwa nemînin...

Belê, ya rastî her tişt di destên diya min de bûn. Wê çi bigota, bavê min ji gotina wê dernediket. Çawa ku birê min Reşo û Derwêş di binê tesîra jinên xwe de bûn, bavê min jî weke wan di binê tesîra diya min de bû.

Êvarê ez û Gulîstanê ji çolê hatibûn malê. Bavê min weke hertim bêdeng li ser doşeka xwe rûniştî bû, qutiya wî ya cixarê li ber bû û çeqmaqê wî li kêleka qutiyê bû. Doşeka ku bavê min li ser rûdinişt, pirî ku agirê cigara wî bi ser ve diweşiya tevek qulqulkî bibû. Lê hertim wî cigare ji cigarê vêdixist.

Bi hatima me ya malê re êvarê diya min ew mesele ji me re got. Pêşî min dengê xwe dernexist û hinek sekinîm, piştre min got:

– We qenc kir. Em ê ji wan xelas bibin. Lingên me li van çolan bi keviran re diçin...

Gulîstanê jî serê xwe ji ber xwe rakir û bi tiliyên xwe biskên porê xwe yê zer–zêrîn ji ser çavê xwe da alî; ruyê wê yê gewherê bocik, pozê wê yê biçûk, çavên wê yên şîn ji binê por derketin û bi dengekî nizim got:

– Hûn zanin, yadê.

Piştî wan gotinan, Gulîstanê li min nerî û vebişirî...

Çendekê şûnde bavê min heywan firotin. Gulîstanê jî weke keçikên hevalên xwe hêdî hêdî dest bi çêkirina nexşan kir. Wê, dîwarên hindur tev bi nexşên xwe xemilandin û her karûbarên malê dikir, carcaran bi keçikên hevalên xwe re diçû kaniyê û av dianî. Diya min a pîr jî êdî ji karê malê xelas dibû.

Keçikên cîranan li mala me kom dibûn, wan û Gulîstanê bi hevûdu re nexş çêdikirin. Gulîstanê bi tilîkên xwe yên zerikî destmalek dineqişand û her çar aliyan bi gulikên rengîn dixemilandin, li her çar koziyên wê her yekê guleke sor çêdikir, di nîvê destmalê de sê xet li kêleka hevûdu bi rengê kesk û sor û zer çêdikir...

Di wan rojan de diya min li nava gund digeriya û haziriya palûtekê dikir da ku dahnê xwe bihêra. Wê êvarê qîz û xortên gund tevde li mala me civiyabûn. Diya min heşt cot destar ji nava gund berhev kiribûn. Çar destar li vî alî û çar jî li wî aliyê hundir li rex hev bi rêzê danîbûn. Li ber hinek destaran cot–cot qîz û li ber hinekan jî qîz û xort li pêşberî hevûdu rûniştibûn û dahn dihêran, diavêtin ber hev û bi awayekî gengeşî digotin:

Bihêr, bihêr dayîkê
Serê min û vê xwîşkê
Daweta kê û kê ye?
A Reşo û Fatê ye

Reşo dibim ber avê
Lê direşînim xwinavê
Ew esmer e min navê

Bihêr, bihêr dayîkê
Serê min û vê xwîşkê
Daweta kê û kê ye?
A Hesen û Rewşê ye

Hesen dibim ber avê
Lê direşînim xwinavê
Ew çavreş e min navê

Bihêr, bihêr dayîkê
Serê min û vê xwîşkê

Daweta kê û kê ye?
A Memo û Zînê ye

Memo dibim ber avê
Lê direşînim xwinavê
Ew kinik e min navê.

Wê rojê mala me bûbû weke mala dawetê. Dahnê diya min xelas bibû, qîz û xortên ku hatibûn palûtê belav bûn. Hina destar li cihên xwe bûn. Li her deverên hundir dahnê hêrayî bû û Gulîstanê ew berhev dikir. Diya min dixwest ku ez alîkariya Gulê bikim, lê wê nedihişt ku ez tiştekî bikim.

Ji dema ku Gulê dest avêtibû karê malê, diya min êdî ji kar xelas bibû, lê sebra wê nedihat û carna dest diavêt kar, Gulê jî dixeyidî û nedihişt.

Ez carina bi hevalên xwe re diçûm êzingan û carina jî bi bavê xwe re diçûm merdana rez.

Carekê min porê xwe şeh dikir, min mirêka xwe ya biçûk ji bêrîka xwe derxist û pêşeniya xwe li ber rast dikir. Bavê min gava dît ku ez porê xwe şeh dikim, wî da ez şerm nekim li min nenerî, lê ji kêfan re jî kelegirîn ket qirika wî û hêsir bi ser riha wî ya wek pembo de hatin xwarê û ji xwe de got: "Elhemdûlah ji te re, ya Rebî! Min wa êdî dît ku Hesenê min mezin bûye û porê xwe şeh dike. Hema ez niha bimrim jî, ne xema min e, lewra ez çavgirtî narim gorrê. Piştî ku min dît wa Hesenê min mezin bûye, besî min e."

Ez û Gulîstanê êdî mezin bibûn, lê hîna jî me li ser tiştekî nehêja li hevûdu dixist. Wexta ku pîra diya min didît ku em li hevûdu dixin, destên xwe li dora xwe dipaland û maşika sobê, yan sivnikê, yan jî şimike digirt û diavêt me. Lê diya min rast nediavêt me, bi çend metroyan dûrî me diavêt. Ji ber ku wê dil nedikir ku rast biavêtina me. Me jî dest ji hevûdu berdida û direviyan.

Wexta min û Gulîstanê li hevûdu dixist, wê bi min karibû. Lê wexta ku min bi porê wê digirt, ew ji desthilanîn diket û min zora wê dibir û ji ber êşa porê xwe digiriya. Lê piştî çend saetan ez li ber digeriyam ku wê haş bikim û min destên xwe diavêtin ser hustuyê wê, min porê wê yê zer–zêrîn ji ser hinarên ruyê wê dida alî û bi bergerîn poşmaniya xwe jê re nîşan dida. Piştre Gulîstanê weke her car qayîl dibû û me dîsa ji hev hezdikir, em dibûn dostên jidil...

Li herêma me carina livbaziyên pêşmergan çêdibûn û her kesî dibihîst, heta li şevbihêrkan, li berojkan, li gasînan û li ser tenûran behsa wan dihate kirin. Di wan rojan de jî xortên gund haziriya Newrozê dikirin, êvarekê piştî ku me şîv xwar Gulîstanê ji min pirsî:

– Keko, çima pêşmerge derketine çolê?

Min kir ku li gor zanîna xwe bersiv bidimê, lê hema bavê min berî min dest bi gotinê kir û bi kurtayî behsa perçekirina Kurdistanê kir û dû re jî çîroka Newrozê ji me re got.

Birastî bavê min timî çîrok ji me re digotin, lê wek çîroka Kawayê Hesinker û ya

Dehaqê xwînxwar bi heyecan tu çîrok nedigotin. Ez û Gulîstanê pir bi çîroka Newrozê kêşfxweş dibûn. Her çiqasî min û Gulîstanê pêşmerge nedîtibûn jî, dîsa me di dilê xwe de pir ji wan hezdikir û me ji hev re digot: "Xwezî rojekê pêşmerge bihatina mala me jî da me ew bidîtina, ka mirovine çawan in."

Dem dibihurî. Xortên hevalên min xwe di destpêka havînê de hazir dikirin ku herin Stenbolê da bixebitin. Min jî xwe hazir kir ku ez jî bi wan re herim. Rojekê êvarê em tev li malê rûniştî bûn û hêj nû ji ser şîvê vekişiyabûn, min ji diya xwe, bavê xwe û xwişka xwe re got:

– Wê hevalên min tevde herin Stenbolê, da bixebitin. Wan bajar dîtine, lê ez hîna ji gund derneketime. Îsal ez jî dixwazim bi wan re herim...

Mirov ji wan fêm dikir ku ew gotina min ne bi dilê wan e. Ji ber ku wan nedixwestin ku ez herim û nedixwestin ku dilê min jî bihêlin. Lê mîna ku hinkî bi dilê bavê min bû, erê diya min û xwişka min nedixwestin. Lê bê dilê xwe destûra min dan. Ji diya min û bavê min bêtir Gulîstanê nedixwest ku ez herim, lê wê nikaribû ez bisekinandima jî.

Gulîstanê di wan rojan de ji min nediqetiya, carina heskirina min û wê ji merhela xwişk û biratiyê jî zêdetir dibû. Ez û ew hem hevalên hevûdu bûn, hem jî xwişk û bira. Wê carina destê xwe diavêt ser stûyê min û ez maçî dikirim, devê xwe ji ruyê min derdixist û li min dinerî, hêstirên çavên wê weke çilkên baranê bi ser ruyê wê yê gewherî ve dihatin xwarê û destên wê ji min nedibûn. Kincên ku min ê li xwe bikirina, tevde paqij û şuştibûn. Destmala ku ji bo min neqişandibû, êvarê da min û got:

– Keko, tu ê xwêdana xwe bi vê destmalê paqij bikî û her ku te xwêdana xwe paqij kir jî, min bîne bîra xwe...

– Xema neke xwakê. Bawer bike, ez vê destmalê nalewitînim, ez ê li hevûdu bipêçim û têxim bêrîka xwe. Carcara ez ê derbixim lê binerim û te bînim bîra xwe. Çaxê ez bigîhêm wir, ez ê çend wêne bo te bişînim. De wexta ez vegerim jî, ez ê ji te re çend cot şimik û çend kirasên xweşik jî bi xwe re bînim.

Ez berî ku ji malê derkevim diya min, bavê min û xwîşka min li dora min bûn. Wê rojê qermîçokên ruyê bavê min pirtir bibûn. Wexta ku min xatir jê xwest, wî ez maçî kirim û ruyê min ji hêstirên çavên wî şil bûn. Diya min jî weke wî, kela giriyê wê fûriya û çavên wê ji hêsiran ziwa nedibûn. Rêşîkên şara wê bi ser ruyê wê ve daketibûn, çavên wê kûr çûbûn xwarê û gepên ruyê wê kort bûbûn... Piştî ku min xatir ji dê û bavê xwe xwest, ez bi ser Gulîstanê ve zîvirîm ku xatir jê jî bixwazim. Min lê nerî û wê jî li min... Me herduyan nikaribû ji ber kela girînê tiştek bigota, wê serê xwe danî ser milê min û em bi hevûdu re girîn... Erê, Gulîstanê digiriya lê ew roj li ber çavên min ji hemû rojan xweşiktir bibû; çavên wê şînder bibûn, bisk û keziyên wê zertir, hinarkên ruyê wê gewhertir bibûn û

hêstirên çavên wê hêdî hêdî dihatin xwarê. Dê û bavê me, li me dinerîn û digiriyan. Wexta min xatir ji Gulîstanê xwest, min ruyê wê maçî kir, wê jî yê min... Wê nedixwest ku ji min biqetiya, berî ku ez destê wê berdim, wê destê min eciqand... Û bê dilê xwe destê min berda û girîna wê zêdetir bû. Çaxê ez ji wan cuda bûm, diya min satilek av li dû min rijand...

Piştî ku ez ji malê çûm, heta demekê agir li mala me pêneketibû; xwarina germ li êgir nebibû, hizn û girî ji malê qut nebibû. Pîra diya min nanekî tenûrê li dîwêr daleqandibû û gotibû: "Ev nan yê Xwedê ye, xwarina Eshabe û melayîketan e. Min Hesenê xwe sipartiye wan. Heta ku Hesenê min bi selametî nê malê, ez vî nanî ji dîwêr danaxînim..."

Bi derketina min ya ji malê re, her tişt hatibûn guhertin. Bavê min ê kal ez nedidîtim û kêfa wî ne li cih bû. Rohniya çavên diya min roj bi roj kêmtir dibû, gepên wê çûbûn xwarê û her tim behsa min dikir. Rojê pênc wext gava ku limêj dikir, dua ji min re dikirin. Gulîstanê jî nema çavên xwe kil dikirin. Xort û qîzên gund nema weke berê dihatin mala me govend û dîlan dikirin û şahî nema çêdibûn.

Li bajarê Stenbolê çend rojên min li kuçan derbas dibûn. Min wêneyek û nameyek li ser navê Gulîstanê şandin malê. Ez hîna di rojên pêşî de ji kuçeyên wî bajarê mezin adiz bibûm. Çend rojan xebitîm, çend rojan betal mam, min çend mehan kar dît û çend mehan jî bê kar mam. Lê hesreta welêt bibû mîna kulekê û ketibû ser dilê min. Min bêriya diya xwe, bavê xwe û xwişka xwe dikir û ew dihatin ber çavên min. Gava ez dixebitîm ew dihatin bîra min û ez radizam ew dihatin xewna min. Carina min destmala xwe ya neqişandî ji bêrîka xwe derdixist û Gulîstan dianî bîra xwe. Sebra min bi destmala neqişandî dihat û ez pê hêsan dibûm.

Şevna jê, xewa min nedihat û ez ji nava livînan radibûm û hildikişiyam ser avahiya bilind, min berê xwe dida ezmanan, stêrk li ezmên weke pirîskên êgir nediçirisîn û Leyl û Mecnûn nedixuyan. Bayekî hênik li serê min dixist. Ew ba, dişibiya bayê welêt û şivantiya min û Gulîstanê dianî bîra min.

Li wî bajarê biyanî pênc an şeş mehên min qediyabûn. Hesreta welêt û bêrîkirina malê bibû weke çend sersotên êgir û ketibûn nava dil û hinavên min. Wê şevê êdî vegera welêt di serê min de bi cih bibû. Jixwe diya min berî çend rojan telefon kiribû. Bi rastî min ji ber dengê girîna wê, tiştek jê fêm nekiribû û wê xwestibû ku ez vegerim malê.

Wê rojê sibehê zû ez ji xewê rabûm û kêfa min li cih bû. Ji kêfan, ez dikirim ku bifiriyama. Bi hazirkirina taştê re heval jî ji xewê rabûn. Em tev li ser taştê civiyan. Min biryara xwe ya vegerê li ser taştê gote wan ku sibehê ez ê herim gund. Wan jî bi hev re biryar dan ku wê rojê nexebitin da hinek tişt bikirrin an jî hinek lazimiyên malên xwe bi min re bişînin.

Ez çûm sûkê. Min ji bavê xwe re gopalek

û qelûnek kirrî, ji diya xwe re çend metro çarî kirrîn û tiştên Gulîstanê hiştin dawiyê. Min çend kiras, çend cot şimik û gelek tiştên ku wê pê kêfxweş bibûna tev kirrîn.

Wexta ez vegeriyam kargehê, nobetdarê wir li ber dêrî pêrgî min hat û got:

– Mirovek ji sibehê ve ye ku telefon dike û li we dipirse. Min çiqas nerî jî, ne tu û ne jî hevalên te, hûn ne li van deran bûn. Wî tiştek jî ji min re negot.

Em hêj li ber dêrî bûn, zingînî ji telefonê hilat û nobedaran rahiştê da ber guhê xwe û piştre direjî min kir, got:

– Li Brahimê hevalê we dipirse.

Min telefon da ber guhê xwe. Deng ji kûr ve dihat. Ji mirovê miqabil werê ku ez Brahîm im. Hîna min jê nepirsîbû ku ew kî ye, wî dest pê kir û got:

– Brahîm, lawo li min guhdarî bike. Sibehê tevde, karê xwe bikin û werin gund. Bela haya Hesen jê çênebe, Gulîstanê şehîd bûye.

Telefon ji destên min ket erdê û kela girînê ket qirika min, hêstir ji çavên min hatin xwarê. Min hêstirên çavên xwe bi destmala xwe ya neqişandî paqij kirin.

Ez û hevalên xwe, bi hevûdu re hatin gund û pêşî em çûne ser gora Gulîstanê. Me dît ku xelkê sosin û beybûn li ser gora wê çandine. Min jî destmala wê ya neqişandî bi berê kêlika wê ve daleqand. Demeke dirêj çû, hîna jî destmala wê liba dibû...

*Girtîgeha Taybetî, Blok D, BURSA*

# Di warê kovarvaniya kurdî de merhaleyek

*Zana Farqînî*

Du aliyên vê navlêkirinê hene: Yek jê teşe û naverok û ya din jî temen û jî ye. Bi rastî jî Nûdem di warê teşe û naverokê de, di ser xwe re ye. Ta niha kovarên kurdî yên ku min ew dîtine û xwendine, raman û nêrîna min a der barê vê kovarê de neguhartine.

Digel vê yekê, Nûdemê karibûye xwe nû bike û kiras biguhêre.

Kovar ji aliyê temen û jî ve jî xwediyê serketinekê ye. Bêyî ku navber bide weşana xwe derketiye û pêncsaliya xwe temam kiriye. Kesên ku bi karê weşanvaniyê ve eleqedar in, baş dizanin ku ev rewş ji bo kurdan tê çi wateyê.

Bi hêviya ku em li ser axa welat a rizgarkirî gelek pêncsaliyên Nûdemê pîroz bikin...

# Kovara Nûdemê bû pênc salî



*Cemşîd Bender*

Kovara Nûdemê ku li Swêdê derdikeve û li ser edebiyatê, kulturê, hunerê, dîrokê û hwd. radiweste, bi hejmara xwe ya 20'an dibe pênc salî. Ev kovara spehî ku di bin birêvebiriya Firat Cewerî de li Swêdê derdikeve, ne bi tenê dilê kurdên Swêdê, lê belê wê dilê kurdên seranserî dinyayê geş kiriye û valahiyeke mezin dagirtiye.

Li gora min ku Nûdem deng û temsîlkarê ekola edebiyata kurdî ya Swêdê ye, bi înad weşandina bi kurdî berdewam kiriye û bi vê yekê bûye dengê edebiyata kurdî.

Zimanê me bi sedsalan bê xwedî maye û bi riya qedexekirin û nebikaranînê li paş maye. Ji ber vê bêxwedîbûnê, zimanê me bi pêş neketiye, devok û zaravayên me zêde bûne, zimanê kurdî bi alfabeyên cihê hatine nivîsandin. Dîroka me çiqasî kevin be, kultura me çiqasî dewlemend be jî, ji ber zilma neyaran zimanê me bûye zimanekî qeydkirî. Di vê rewşa ne baş de, ev pênc salên Nûdemê ne ew têkoşîneke mezin ji bo azadkirin û rizgarkirina zimanê me dide.

Di vê pêvajoyê de kovara Nûdemê bi riya weşanên xwe, ji edebiyata kurdî û edebiyata dinyayê bi dehan pirtûkên hêja û giranbuha pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî kiriye. Ev xebata han, xebateke pir giring û hêja ye.

Ez di pênc saliya Nûdemê de, Nûdemê û berpirsiyarê wê dostê hêja, nivîskar û wergêr Firat Cewerî ji dil pîroz dikim û hêvîdar im wê weşana Nûdemê her û her berdewam be!

# Zarokên Zerdeşt

## *Arjen Arî*

çend mirin di çeperan de
Zîlan de, geliyê Soran de
ma qey refên qulingan bûn
nîşangeha nêçîrvanan di eniya wan de
ji hev belav nedibûn
te bidîta
di himbêza axê de sor sor
dibeşişîn.

tê bidîta
ne roj ba
di kefa dest de ne weha deşt
tê bidîta
di raserî mirinê de egîdî
û zarokên Zerdeşt.

xwe nedan dest.
bi Yezdan sond xwarî, ahddayên Zerdeşt
her heşt, her heşt
di himbêza axê de sor sor
dibeşişîn.

xwînê bibîn, bêhn bik
şînê bibîn, bi jîn bik,
mirinê bibîne mirinê
di nabêra radestiyê û manê de
mêr be, bi cî bik.

*94 Amed*

www.nefewe.com

# Hê?...

Wan ne av divên ne jî xwarin
xwe ristine li pêşberî zilmê,
di kolanên Amedê de xelekên jînê
ew : bira ne
ew : jin in
ew : xwuşk û dê...

rojiya mirinê ye,
jîn tê de, can tê de
devê`m negire destê`m berde
bi min re bimeşe, here bi ser de
dagirker e, zilimkar e, xwelîser e
ji ser venegere
zîndan be zîndan, mirin be mirin
canek e here were...

agir bi te bikeve looo
dê dişewitin, dê
dê lo, dê

hê?...

*92 Nisêbînê, 94 Amed*

www.netewe.com

# Esperanto estas nova lingvo

*Lars Forsman/Süleyman Demir*

*En la lando Tracio iam loĝis lerta kantisto nomata Orfeo. Lia patro, kiu estis la dio Apolono mem, donis al li liron kaj instruis al li kiel oni ludas ĝin. Do ne estis strange, ke la muziko de la juna viro estis tre bela. Orfeo fakte tiel plaçe ludis, ke kiam li tuşis la kordojn, la bestoj kaj birdoj kuniĝis en rondon çirkaû li por aûskulti lian ludadon.*

Bi kurdî:

Demekê, klambêjekî jîr bi navê Orfeus li welatê Trakyayê dijiya. Bavê wî, ku xwedayê Apollon bi xwe bû, lurayek diyarî wî kir û ew fêrî lêxistina wê kir. Loma jî qet ne ecêb bû ku muzika wî zilamê ciwan, gellekî xweş bû. Bi rastî jî Orfeus wilo xweş lê dixist, gava ku dihingivî têlan, heywan û çûk, ji bo ku lê guhdarî bikin, dihatin li dora wî dibûn xelekek.

———ooo———

Berî bi deh salan, gava ez diçûm dibistanê û ez bi bingehîn fêrî swêdî dibûm, ez cara yekem pê hisiyam ku zimanekî bi navê esperanto heye. Her wilo ez pê hisiyam ku esperanto ne zimanê tu miletan e, lê zimanekî ku bi dû re hatiye çêkirin e. Dersên esperanto li dibistana me dihatin dan û bi dû re jî ket şema dersan. Ez çend dersan çûm û min li wî zimanî jî guhdarî kir. Xweş û hesan bû. Ez fêrî çend peyvan jî bûm.

min li wî zimanî jî guhdarî kir. Xweş û hesan bû. Ez fêrî çend peyvan jî bûm. Lê ji ber kar û barên dinyê, mixabin heta roja îro ez negiham li ser ava bikim û baştir bikim. Lê dîsa jî ez bi kêfxweşî dixwazim di derheqa wî zimanî de binivîsim û wek agahdarî rabigihînim xwendevanên Nûdemê. Ji ber ku bi baweriya min, her tiştên di derheqa zimanan, kulturê, hunermendiyê û edebiyatê de, mijarên fêrbûna me û rika vejandina edebiyata me ne.

Lê divê ez bibêjim ku çi gava gotin çûye ser esperanto, mamostê min ê hêja Lars Forsman hatiye bîra min. Lars Forsman, li ba min him wek mirov û him jî wek mamoste hêja bû. Mamostê min ê zimanê swêdî û esperanto herduyan bû. Gava min biryara ku ez ê li ser esperanto binivîsim da, min qet nexwest ez bêyî alîkariya wî karekî wilo bikim. Gava min pêwendî pê re danîn û alîkariya di vê derheqê de jê xwest, xwe bi kêfxweşî da ber tiştê ku diket aliyê wî. Roja piştî ku ez pê re axivîm, agahdariyên ku hewcedariya min pê pê hebû, ji min re şandin. Piştî ku min nivîs li gor xwe amade kir, ez dîsa pê re axivîm; min li raya wî pirsî û li pêşniyarên wî guhdar kir. Min ê bêyî alîkariya wî, nikarîba ev nivîs amade bikira. Loma jî her çiqasî min bi pronava yekem (ez, min) amade kiribe jî, ez spasî wî dikim û li ser navê xwe û wî diweşînim.

Sala 1887-an, doktorê çavan ê Polonyayî Ludwig Zamenhof, cara yekem esperanto bi hêviya ji bo mirovatiyê tevî, wek zimanê dinyê tevî eşkere kir. Hêvî dikir ku gava mirov hevdû fam bikin, wê nakokî jî kêmtir bibin; wê qet nebe, ên lokal, ên ku divê neyên jiyan, rabin. Ji ber ku li bajarê ku ew bi xwe lê dijiya, gellek milletên cuda hebûn û ji ber ku ji zimanê hevdû fam nedikirin, pev diçûn. Vê yekê Zamenhof bêzar dikir. Lê ji bo ku pev neçûna, divabû hevdû fam bikin. Lê wê kî fêrî zimanê kê bûbûya! Li gor Zamenhof, zimanekî nû hewce bû. Gava di dinyê diramiya, didît ku yekî nû ji dinyê re jî hewce ye. Loma rabû salên xwe dan karekî wilo giran û esperanto ava kir û eşkere kir. Tiştê ku eşkere dikir, rêzimaniya esperanto bû. Wî çaxî hîna nû bingeh avêtibûn. Lê dîsa jî bingehekî baş fireh bû. Hîna berî ku nivîsandî eşkere bike, Zamenhof di salên xortaniya xwe de, di ber xwendina xwe re, esperanto di warê wergerandina berhemên navdarên wek Shakespeare, Goethe û Moliere de diceriband. Wî bi xwe jî hin nivîsên nesr û helbest bi esperanto dinivîsîn û li gor hêviya ku jê dikir, encameke baş jê girtibû.

Esperanto, li ser xezîna peyvên zimanên Îndo-ewrûpî yên li Ewrûpayê, Emerîkayê û deverin Asyayê hatiye avakirin. Bi piranî peyvên navnetewî ên ku berê nas in hatine hilbijartin. Ên ku zimanê wan ji grupa slavî ye, xwe bi vê yekê baş di esperanto de dibînin. Bi gellek deng û hêlên xwe yên din, dişibe Îtalî û Îspanî. Lê bi rêzimaniya xwe, zimanekî nû ye. L. Za-

menhof çêkiriye.

L. Zamenhof bingeh danîn, lê bi dû re, esperanto hat dewlemendkirin û baştir hat avakirin. Îro hejmara peyvên ku esperanto wek ziman radigirin, di ser sed hezaran re ye û li çar aliyên dinyê bi mîlyonan mirov pê diaxivin. Radio û kovar pê diweşin; kongre, konferans û civînên taybetî pê dibin; li bi sedan bajar û welatan dibistan, akademî û navendên esperanto hene. A herî balkêş ku îro êdî edebiyata dinyê pê heye. Heger mirov çend navan di vê derheqê de bide: *Hamleta* Shakespeare, *Paskalya* Strindberg, *Don Quijote* a Cervantes û *Sê Kuştina* Tolstoy. *Qur`an* û *Incîl* jî bi esperanto hene.

Ji nav ên ku bi esperanto diaxivin, xelatgirên nobel Reinhard Selten, Joseph Thomson, Wilhelm Ostwald, Alfred Fried hene. Professor Reinhard Selten endamê Yekîtiya Esperanto a Nevneteweyî (Universala Esperanto Asocio) ye. Hin tezên xwe yên li ser ekonomiyê bi esperanto nivîsîne. Li gor agahdariya ku Lars Forsman da min, L. Tolstoy û A. Einstein esperantîst bûn. Teoriya Einstein a matematîkê bi esperanto heye.

Esperanto, zimanekî ku mirov bi hesanî fêr dibe ye. Ji ber ku rêzimaniya wî wilo hatiye avakirin e. Peyv û prensîbên bingehîn, mirov rast bi nav de dibin. Alfabeya esperanto ji **28 tîpan** pêk tê. Pênc ji wan **dengdêr** in û ên din jî **dengdar** in. Wek ku tê nivîsandin tê xwendin û tê gotin ku mirovên ji hemû milet û zimanan dikarin dengên esperanto derxin.

Ew tiştê ku di rêzimaniyê de jê re bi ingîlîzî *accesnt*, bi swêdî *betoning*, bi tirkî *vurgu* tê gotin û li gor hin kurdan bi kurdî jî **kirp** e, di esperanto de, her demê li ser dengdêra ku ji dawiyê ve a duwemîn e dibe.

Numûne:

V**o**jo, kant**a**do, histor**i**o, d**o**mo, h**u**ndo, hund**i**no.

Rêzimaniya ku ji bo esperanto hatiye danîn, ji bo tevaya zimên û hemû peyvan wek hev e. Halê awarte di esperanto de tune ye. Wek numûne, nav hemû bi tîpa **-o** xelas dibin. Gava hewce be, tîpa **-j** tê dawiya hemû navan û tên pirkirin. Rengdêr hemû bi tîpa **-a** xelas dibin.

Di esperanto de nav û rengdêrên wesfîn hemû ne nêr û mê ne. Lê di navên heywan û însanan de navên nêr û ên mê, ji hev kifş in. Ên mê hemû wek hev û nêr jî hemû wek hev tên avakirin.

Numûne:

Hund**o**, kûçik e. Hund**ino**, dêlik e.

Lejon**o**, şêr e. Lejon**ino**, a mê ye.

Vir**o**, zilam e. Vir**ino**, pîrek e.

Lêkerên esperanto bi tu awayan nakevin formên awarte. Prensîbên heyî, her demê ji bo hemû lêkeran in. Wek numûne, forma wextê niha-present, ji bo hemû lêkeran, **-as** e. est**as**, skrib**as**, vid**as.**

Lêkerên esperanto bi şeş awayên bingehîn tên tewandin:

**-Infinitiv** (raweya rader): tîpa **-i** tê dawiya lêkerê: est**i**, skrib**i**, vid**i**



www.netewe.com

**-Present** (dema niho): tîpên **-as** tên dawiya lêkerê: est**as**, skrib**as**, vid**as**

**-Preteritum** (boriya çîrokî): tîpên **-is** tên dawiya lêkerê: est**is**, skrib**is**, vid**is**

**-Futurum** (dema pêş): tîpên **-os** tên dawiya lêkerê: est**os**, skrib**os**, vid**os**

**-Konditionalis** (rewaya gerînî): tîpên -**us** tên dawiya lêkerê: est**us**, skrib**us**, vid**us**

- **Imperatif** (boriya berdest): tîpa **-u** tê dawiya lêkerê: est**u**, skrib**u**, vid**u**

Li gor van şeş formên bingehîn, kombînasyonên wextên din jî di esperanto de çêdibin û mecala ku ziman bikaribe bersiva hewcedariyan bide, baştir derdikeve.

Çi prefix-pêşpirtik û sufix-paşpirtikên ku di esperanto de hene bi formên xwe yên kifş tên ber û pişt hemû peyvan. Ji yekê zêdetir pêşpirtik û paşpirtik bi hev re dikarin di hevokekê de bên bikaranîn.

Hemû hevokên pirsyar, bi pronavên pirsyar tên avakirin. Pronava pirsyar, her demê tê serê hevokê.

Numûne:

*Li estas knabo.* Ew xortek e.

***Çu** li estas knabo?* Ma ew xortek e.?

*La knabo estas juna.* Xort, ciwan e.

***Çu** la knabo estas juna?* Ma xort ciwan e?

Îcarê gellek pronavên pirsyar ên wek **çu** hene. **Kio, kiu, kia** û hwd.

Negatîvkirina peyvê ya jî hevokê, her gavê bi awayê kifş dibe. Bi daçeka neyinî **-ne** dibe û her gavê berî peyva ku tê redkirin tê. Lê heger lêkera alîkar hebe, berî wê jî tê.

Numûne:

*Ne, mi ne volas.* Na, ez naxwazim. *Volas* (xwestin) tê redkirin.

*Mi ne estas juna.* Ez ne ciwan im. *Juna* (ciwan) tê redkirin. Lê lêkera alîkar *estas* jî heye. Loma jî divê daçeka **-ne**, berî wê bê.

Taybetî û hesaniyeke esperanto a din heye. Pêşpirtika **-mal-** maneke dij dide rengdêran. Ev yek, ji bo hemû rengdêran wilo ye.

Numûne:

Bona- baş e, **mal**bona-ne baş e

Bela-spehî ye, **mal**bela-ne spehî ye, kereh e

Granda-mezin e, **mal**granda- dibe biçûk

Li gor materialên ku di destê min de hene, deh pêşpirtik û sîh û yek paşpirtikên ku esperanto wilo hesan dikin hene.

Ji ber ku ziman li gor rêzimaniyeke wilo hatiye avakirin, tê gotin ku gava mirov fêrî peyvekê tenê dibe, mirov pê re belaş fêrî deh peyvan dibe. Loma jî gava mirov dest bi fêrbûna esperanto dike, di nav hefteyekê de mirov kare bi ê li hemberî xwe re diyalogeke hesan bike. Û her wilo piştî mehekê, mirov dikare xweş biaxive û binivîse.

Gava ez bi xwe diçûm dibistanê, min yekî macar li ba Lars Forsman dît. Li gor ku digot, berî serdana xwe ya swêdê bi du salekî çûbû japonyayê. Lê mêrik ne bi japonî zanîbû û ne jî bi Ingîlîzî. Rêya wî

hefteyeke sax digirt. Radibe ji bo ku li japonyayê bikaribe bi hinekan re biaxive, xwe di trênê de fêrî esperanto dike. Heta gava ez giham japonyayê, min xwe fêrî biqasî ku ez bikaribim hemû karên xwe bimeşînim, fêrî esperanto kir, digot.

Ez bi xwe bawer im ku ev yek rast e û dibe. Ji ber ku hew li gor van çend prensîbên ku min li jor rave kirin, heger mirov xwe fêrî çend peyvan û çend pêş-an paşpirtikan (prefîks û sufîksan) û pronavan jî bike, mirov êdî dikare biaxive. Loma jî esperanto xwedî pêşerojeke xurt e.

Esperantist di vî warî de xwedî hêvî û îdealên bilind in. Aniha di qada navneteweyî de, bi xurtî dixebitin û dixwazin ku esperanto bibe zimanê Computer, Yekîtiya Ewrûpa û Neteweyên Yekbûyî ê hevbeş. Ji %30 butça NY diçe ji karê wergerandin û kaxetên di vê derheqê de re. Ji bo biryarên ku tên girtin û tiştên ku tên gotin baş bên famkirin, carê werdigerînin çend zimanên xurt. Lê dîsa jî li gor îstatîstîkên sala 1979-an, li navenda NY a li Cenevre tenê, ji bo vî karî, rojê sê (3) ton kaxet dihatin xerckirin. Ev yek tê mana ku salê bi sedhezaran dar ji bo kaxetên NY tên birrîn. Dinya delal rûttir dibe û ekolojî xerabtir dibe.

Rewş ji bo kar û barên YE qet ne baştir e. Çi tiştê ku devjengî li ser dibin, divê wergerînin 9 zimanan (aniha pirtir in, ji ber ku welatên endam pirtir in) û ji bo karekî wilo 72 tercuman, ya jî tercumankirinên cuda divên. Lê îcarê heger wergerînin 20 zimanan (ji aniha û nêzîk dikare bibe 20), wî çaxî divê 380 tercuman bixebitin. Îro ji bo ku YE ne xwediya zimanekî hevbeş e, xerciyên di vî warî de salê digihijin 750 mîlyar Kronên Swêdî, bi texmînî dor 166,5 mîlyar DM ye. Hejmareke mezin e, lê rast e. Gerr, serdan, lêkolîn, ders, konferans, kirê û kaxet di nav de ne. Aniha 86 parlement ji YE, piştgirên ku esperanto bibe zimanê hevbeş in.

Bêguman ev xercî hemû ji pişta gellên ewrûpayî û dinyê tên rakirin û ji qirika wan tê qutkirin. Esperantîst, gava evqase xizanî, nexweşî û birçîbûn li ewrûpa û dinyê hebin, xerckirina wilqase peran ji bo karên wilo, bêexlaqî ye, dibêjin û êrîşên xwe yên di vî warî de her xurtir dikin.

Tiştê ku esperantist dixwazin li dinyê bikin, ne ku dikin zimanên din rakin. Dixwazin bikin, ku esperanto bibe zimanê mirovatiyê ê hevbeş, ê ku hevdû pê fam bikin.

Tiştê ku divê di encama vê nivîsê de bê gotin, ev e: zimanek ji tunebûnê tê avakirin, li çar aliyên dinyê xurt dibe, geş dibe û xelk pê diaxivin û dixwînin. Loma jî wê esperanto bijî.

Xwezî Kurdî jî di nav kurdan bi xwe de xwediyê şans û mecaleke wilo bûya. Xwezî kurdan jî bi kurdî bixwendina û biaxivîna.

Heger entresa we ji esperanto re hebe, em dikarin alîkariya adresan û rêyên xwefêrkirinê bi we bikin.

Not:

*1-Di alfabeya esperanto de, tîpa ç û ş, ji bedêla niçika jêr ve, wek ê-ya kurdî bi şewqe ne.*

*2-Sernavê nivîsê, tê mana, esperanto zimanekî nû ye.*

*3- Min kurdiya perçê esperanto ji ber swêdiya wê wergerandiye.*

Lars Forsman, li Dibistana Gel a Bilind a Karlskoga mamostê zimanên ingîlîzî, almanî, swêdî û esperanto ye. Lars Forsman ji bo kar û barên li ser esperanto, li gellek welatan geriyaye û beşdarî kongre û konferansan bûye.

Radioya Swêdê, alîkariya ku îsal serê çileyê pêşîn pênc programan ji bo Utbildningsradio (radioya perwerdekirine) çêbike, jê xwestiye. Li seranserê Swêdê lê tê guhdarkirin.

# Nûdem ronahiyek e!



*Hafiz Qazî*


Di salroja pêncan a kovara Nûdemê de, pîrozbahiyên xwe bi dil û can ji we re dişînim û pênûsên nivîskarên wefadar bo peyva kurdî a resen maçî dikim.

Domandina Nûdemê di van pênc salan de bi rengekî spehî û awayekî xemildar dilê xemxwarên edebiyat, mêjû, zanyarî û çanda kurdî geş kiriye, roleke bi rûmet û bihadar di warê pêşxistin û geşkirina ziman û edebiyata kurdî de leyistiye.

Kovara Nûdem delal e, cihê şanazî û serbilindahiya hemû edebdost û ronakbîrên kurdan e. Hêvîdar im dê Nûdem di cîhana rewşenbîriya kurdî de herrim ronahiyek be.

# Vegere were

*Tosinê Reşîd*



Bona guhên te ji beytên evînê
Guharên şirik min sêwirandin,
Ser gerdena çîl morî, mircan ji
Hisreta lêva min hêwirandin
Lê xemgîn bûyî.
Herdu çavên te
Du pilte ewrê reş, tijî birûsk
Te perde-çîtê bijangên tarî
Daxistine ser.
Lê ji bin perda,
Çawa ji hêşûya konê reş, mezin
Baraneke germ û şor dilop kir.
Niha pir dûrî.

Şiverîya min, te
Gîha şîn bûye.
Û wê şiverê,
Niha tek bi dil, lê ne bi çava
Karî texmînkî.
Gilî-gotinê pey te rêzkirî
Mînanî namê
Ku navnîşana xwe yî ne rast e
Şûnda vedigerin.
Û wek çomaxên gilê-gilêyî
Defa guhên min dikutin ser hev.
Ji dengê defê
Hêsabûn û xew-karên xezala
Ji min kûvî dibin.
Niha pir dûrî
Û ez dixwezim,
Gelek dixwezim,
Ku ji min dûr jî tu bextewar bî,
Lê nizam çira
Min tirê niha bêyî evîna min
Tu bêsitarî.
Vegere, were!

Vegere mîna berbanga sibê,
Kulîlkdayînê.
Mîna berfhela baharê li çîya.
Û tarîya xemê min ronayîke,
Li ber çavên min
Bibe kulîlka dara hinarê,
Li ber guhên min
Bixulxule wek ava belekîya.
Dîsa bi hêvîyê ve ez bûme circirk
Û benda teme.
Hisreta xwe ya biçûka sava
Dixwezim di nav
Pêçeka dengê te de sitarkim.
Dixwazim wekî nizanim bi çi,
Ew tu baş zanî
Xew, hêsabûnê dîsa kedîkim.

* * *

Ro ser lêvên çîya
Mînanî dilê zara dikute.
Û nizam çira
Ji nav bêdengîya evê berbangê
Mukurhatina evîna te min
Tesele dibe.
Binevşên biçûk,
Belgên xwe sipî, zer reng kirine,
Mîna bijangê keçê şermoke
Daxistine jêr
Û nav kevira xwe veşartine,
Ça nav porê te,
Kevir jî mîna zilfê te reşin
Çûkên mêşe, yên nû ji xew rabûyî
Bi stranên xwe hîmnên berbangê
Ser her gavekê pêşîya min digrin
Û di guhên min de hêdîka dibên,
Wekî ez niha di bîra te de me
Û ji bîranîna
Ser lêvê nazik
Beşer bişkivtîye.
Û ez berbangê heta êvarê,
Şev heta sibê
Bi wê beşera te bextewar im.

* * *

Berfa belekîya
ewa niha tek li bilindcîya maye,
bi çîlaya xwe
hinekî nolî bedena te ye,
ji yasamana,
ku niha bajar tijî kirine
bêhna wan zilfên teye tarî tê
ewên nolanî tîrêjên heyvê
peya dibin xar
û dor gerdena mermer çît digrin,
nav porê te jî,
belgên kulîlka qey reşandîne.
Her lêveke te
mîna mangeke çardehşevî ye
lê kiraskirî
bi ewan belgê gulên sor, gevez,
yên bi teqla dil re
çiqasî diçe gevezaya wan
hê zêde dibe.
Ji vê baharê

ku niha dora bajêr gişk girtîye,
zîlên şînkaya zirav, zinaneng
lê-lêne kevirê ser xwe jî qulkin,
bişkojên dara ji kela hundur
û ji ramûsanê roja evîndar,
ber-pêsîrên xwe pey hev vedikin.
Ji vê baharê dinya dîn bûye
bahar jî hinkî mînanî te ye.
Û niha gava tu ji min dûrî
ez pacên teye, ku hê nas nakim
bi dil dikutim:
eger hişîyarî bême bîra te,
bême xewna te eger razayî.
Û niha gava tu ne bal minî
ez nolî dîna
ketime nava bajarê xalî
û dirêjaya hisreta xwe ya bê serobinî
dikim bipîvim
û di bîra xwe de
(carna jî bilind)
ji kenê lêva ta hêstrên çava
hezar yek carî
te nijar dikim,
te ezber dikim.

* * *

Tu hêdî-hêdî, çawa zarotî
ji min derdikevî,
tu hêdî -hêdî, çawa zarotî
ji min dûr dikevî
û ez bêyî te wêran dimînim,
dibime wergê payîza dereng-
bê ken, bê stran û bê kale-kal.
Li zozana sare payîza dereng.
Ba parzûnekî li wera mayî
ji xwe re kirîye al
di nav zomê de kotel digere
û gurên birçî
ser tenêbûna mine sêfîl de
dîrokên melûl bi gurkî dizûkin.
Barana zivêr bi ava xwe sar
melûltiyê dişo,
ku berfa qerqaş bê wê kefenke...
Tu hêdî-hêdî, çawa zarotî
ji min derdikevî,
tu hêdî-hêdî, çawa zarotî
ji min dûr dikevî
û çawan daxwaz, armanca mezin,
ça xewna şeva paqij û pîroz
tev min dimînî.

# Goethe wek pedagogê zimên

*Gunnar Hård*

*Wergera ji swêdî: Mustafa Cizîrî*

Di pirtûka Goethe ya ku li ser gera wî ya Îtalyayê ye, kurtebûyerek derbas dibe. Li wê derê nivîskar li Castel Gandolfo keçeke Îtalyanî ya ciwan fêrî xwendina tekstên îngilîzî dike.


Payîza sala 1787'an bû. Di eynî salê de havînê, Goethe, ji gera xwe ya Sicilyayê ji başurê Îtalyayê vegeriya Romayê.

Wêneya meşhûr ya Goethe ku Tisehben resimandiye; Goethe bi fotêrekî qawêrfireh di nava ebayeke romanî de pêça ye. Di nava xatiratê arkeolojîk, di bin asmanê Campagnasê ê vekirî de, ew jî ji ber vê gerê mane.

Çend roj, ji rojên meha oktoberê ên gelekî xweş Goethe li Castel Gandolfo bû mêvanê îngilîzekî dewlemend û entîkfiroş bi navê Mr. Jenkins.

Mazûbanê Goethe di qesreke xuyayî ku bi stûn û gelek odeyên wê hebûn de rûdinişt. Berê di wê qesrê de generalekî Jesuit rûdinişt. Di nava mêvanan de jinikek xweşik ya başûrî û keça xwe jî hebûn. Goethe hê di 39 saliya xwe de, dema ku ew li Corsonê rûdinişt nas kiribû. Niha ji nû ve hat bîra wî ku hevnaskirina wan kengî bû. Lê piştî çend rojekî, tiştekî hîn xweştir, zeriyeke nû derket pêşberî wî. Ew xwişka yeke îtalî bû ku yek ji meslekdaşê jenkînsê li Mîlano bû.

Ew herdu keçên îtalî qet nedişibiyan hev. Goethe di nivîsa xwe de



dibêje; ciwana romanî çavreş û porreş bû û keça mîlanî jî zer û çavşîn bû. Wekî din jî ew serbest bû û meraqa wê ji dinyayê re hebû. Hevala wê a romanî ciddî û giran bû. Tam berevajiyê hevdu bûn. Hêj wext zêde neketibû navberê, gerokê ku ji wî aliyê çiyayê Alpê bû, hemû bala xwe berda ser jinika ku dawiyê hatibû. Goethe eleqe û întereseyeke hindik nîşanî keçika ciwan a romanî da ku ji ber wê yekê diya keçikê ruwê xwe pêre tal û tirş kir.

Întreseya keçika mîlanî ji dinyayê re pir bû. Wê gilî û gazinên xwe bi Goethe dikirin ku ew li hemberî civatê kêm întresê nîşanî terbiye û perwerdekirina keçên ciwan dike. Wê digot, me fêrî nivîsandinê nakin. Ji ber ew ditirsin ku em ê pênûsa xwe ji bo nameyên eşqê bi kar bînin. Heger xwendina pirtûkên dînî ne mecburî ba, wan ê qet destûra xwendinê nedana me.

Wê dîsa gazinên xwe berdewam dikir ku çima keçên ciwan fêrî zimanên biyanî nakin. Ew amade ye ku her tiştî bike û bide heger karibe fêrî îngilîzî bibe. Ew ji kesên îngilîzîzan didexisî. Li maseya li ber wê, tije rojnamên îngilîzî bûn. Wê nizanîbû ku çi di wan rojnameyan de hatibû nivîsandin.

Ji bo ku pedagogiya Goethe pê xurt û gurr bibe, hewcedarî bi gotinên zêde neman. Goethe got; Bi rastî heyf e ku ev keç negihaye ku îngilîzî fêr bibe. Bi giştî fêrbûna îngilîzî tiştekî hêsan e. Wê jê re ne zehmet be ku ew di kurtedemkê de îngilîzî fêhm bike.

Ji bo ku Goethe îdîaya xwe bide nîşandan, ew li nava rojnameyên îngilîzî geriya da ku bikaribe teksteke maqûl ji nava rojnameyan peyda bike. Hema pêre pêre wî notîsek li gora dilê xwe peyda kir. Notîs di derbarê jineke ciwan ku ji xeniqandinê tê xelas kirin û teslîmî xwediyê wê dibe, bû. Rewşa ku jinik çawa ketiye nava avê ne zelal e. Gelo kîjan ji wan herdu kesên ku ew ji avê xelas kiribû? Yê ku wê jê re gotibû "Erê" ya na ew ê ku wê bersiva wî ne erênî dabûyê.

Goethe bi vî awayî xwest dest bi xwendina tesktê bike. Pêşî wî ji şagirta xwe daxwaz kir ku ew bi dîqat teksta îngilîzî bixwîne. Dûre wî hemû substantîv wergerandin û pê da tekrarkirin. Di pey wê re ew derbasî gotinên mayî bû. Wî pêşî gotin wergerandin û dû re da derskirin û pirskirin. Dawiya dawî şêgirt spontant karîbû hemû tekstê bixwîne. Heger tekst bi îtalî ba, ew digihîşt armanca xwe.

Ceribandina ku Goethe li ser fêmkirina teksta îngilîzî da kirin, bi hemû awayî biserketî bû. Mamoste û şagirt herdu di mêzênekê de ne. Şagirt bi daxwaza ku fêr bibe û hewcedariya ku were motîvekirin tune. Keçika ciwan bi eşq û heweseke mezin dixwaze fêrî îngilîzî bibe.

Amadekirina wê ji aliyê psîkolojîk de rehet bû: Îngilîzî rehet e. Tu dikarî di

demeke kurt de fêrî îngilîzî bibî. Ev bes bû. Rewşa xuyayî hilbijartina tekstê derxist holê. Materyal û rojname li ber destan bûn. Keçikê dixwest wan bixwîne. Daxwaza wê nexwendina Shakespeare an jî Mîlton bû. Goethe ne bi dû notîsek sivik û sansansiyonel de bû, da ku bala keçikê bikşîne ser. Wî tekstek bijart ku her tişt tê de bi xumam û ne zelal e. Teksteke wilo bû ku fantaziya mamoste û şagirt dixiste tevgerê: Tirsa mirinê, xelasbûn, evîn, tiştên bersivandî û nebersivandî.

Goethe werger biçûk nedidît. Lê di vir de cûdabûna Goethe ji hemû pisporên perwerdekarên zimên hebû ku digotin: Têkiliya wergerê bi fêrbûna zimên re tuneye. Pîvana Goethe ne ew bû ku ew gotin bi gotin bide îmtîhankirin.

Ew sefha ku a nivîsandinê ye û em pedagogên zimên nikarin binçav bikin, an jî di ser guhên xwe re bavêjin, bila niha bisekinin. Ji ber ku şagirt hê jî nikarin binivîsînin.

Û dawiya dawî: Destpêka wê ne bi bêjeyê, lê bi tekstê bû. Ew yeka han jî ne li dijî tiştên ku linguwîstan fêrî me kirine.

Goethe ne ji bo ku tecruba xwe li ser pedagojiya zimên ku bi xwe peyda kiriye, bide kirin. Wî eynî êvarê ji çend pîrejinên ku bi hev re avaçûyina rojê pîroz dikirin, bihîst ku keçika mîlanî ya ciwan bi dergîstî bûye û wê di nêzîk de bizewice.

Serbûriyên ku di vê gerê de pêkhatine piştî sîh salî derketin holê. Wê demê bîranînek hate bîra Weimarê kal jî ku çawa jiyana wî jî ketibû xeterê û eynî tişt bi serê wî de jî hatibû. Dema ew li derve digeriya û wêne çêdikirin, bûyera ku di serê Goethe re derbas dibû dît. Ew xweşika ku ji Mîlano bû, bû kurtebûyerek di jiyana berhevkarê mezin de.

Tecrubeya pedagogiya Goethe a zimên di fêrkirina zimên de tu şoreş nekirin. Di lîteratura ilm de behsa wê nayê kirin.

Nêzîkbûna ferhengên îtalî û îngilîzî mecal dida ku ev rengwerger karibe pêk were. Lê heger zimanê şêgirt yê zikmakî tiştekî din ba, mînak: Silavî, fînî û ugrî ba, wê demê dê zehmetî bêtir ba.

Gera Goethe ya îtalyayê hemû bi hevre bi swêdî bi wergerandina Bertel Kilmans ku tekûz û bi rêk û pêk kiriye heye. Di vê tekstê de hinek tişt hatine kurtkirin. Ew beşa ku di derbarê hevdîtina keça Mîlanî de ye, li Castel Gandolfoyê hatiye kinkirin.

**Çavkanî:**


Johan Wolfgang von Goethes italyanska resa Red. med ledning av Göran Schild, till Svenska av Bertel Kihlman. Biblioteksförlaget; Seelig (vindrusböckerna) Stockholm, 1961.

Johann Wolfgang Goethe italiensische Reise I-II insel tashen Taschenbuch 175, Baden -Baden 1989.

Carl Otto Conrady, Goethe Leben und werk 1 Athenäum, Rengsburg 1982.

# Nûdem tiştekî nû û nedîtî ye



*Yusuf Yeşilöz*

Nûdem di çapemeniya kurdî ya kulturî de gaveke cidî bû. Digel min li Swîsreyê jiyana kurdan ya kulturî taqîb dikir û digel ku ez xwediyê weşanxaneyeke bi îdentîta kurdî bûm jî, ez piştî hejmara çaran ji weşana Nûdemê haydar bûm.

Bi naverok û estetîka xwe, di edebiyata kurdî de Nûdem tiştekî nû û nedîtî bû. Ez dixwazim mikur werim: di demeke ku mirov bi mûman li xwendevanên kurd digeriya, min ji xwe pirsîbû, gelo wê Nûdem çend hejmar derkeve û wê çiqasî bikaribe li ber xwe bide. Lê belê, Nûdem bi peryodîk 20 hejmar derxistin û hem jî bi kurdî derket; ev serkeftineke mezin e û ji bo edebiyata kurdî fêdeyeke mezin e.

Nûdem, tiştekî ku em kurd biyaniyê wê ne, yanî di berdewamiyê de jî bi înad bû. Ez wê pîroz dikim. Nûdem, heta niha ji şiîrê heta romanê, ji resim heta wergerandina berhemên nivîskarên dinyayê yên navdar, ji bilî pirtûkên weşanên Nûdemê, Nûdemê bi xwe nêzîkî 3000 rûpel pêşkêşî ziman û edebiyata kurdî kiriye. Dîsa tiştekî din ku em biyaniyê wê ne, wê siyaset û edebiyat bi zanebûn ji hev veqetand.


Ez hêvîdar im digel vê kalîteya xwe wê karbidestên Nûdemê hebekî zêdetir guh bidin danasîn û belavkirina wê û bi vê riyê bigihîje xwendevanên kurd ku li seranserî dinyayê belav bûne. Dil dixwaze ku Nûdem rojek ji rojan li Kurdistanê derkeve.

Divê em ji bîr nekin; li welatên ku em lê dijîn, belkî deh personalên kovareke bi vê kalîteyê hene.

Bi hêviya berdewamiyê...

# Xemê û Xemgîn

*Şefik Kaya*



Herdu jî êdî navsere bûn. Geşahiya reng û rûyên wan nemabû, pişt li wan xuz bûbû. Riha Xemgîn spî bûbû, ji emrê xwe zêdetir xuya dikir. Çavên wî di kûr de çûbûn, di bin bijangan de, her yek mîna xareka şûşeyî di cîhê xwe de dizivirîn. Diranên wî yên pêş, ew çend sal bûn, ku ketibûn. Ji ber devlikeniya wî, diranên ketî nedihatin veşartin. Hebên mayîn jî, bi zingara xwe ve di aziya şikefta devê wî de diman. Xemgîn, li gundekî şên hatibû dinê, zarokî û xortaniya xwe jî li wir derbas kiribû. Jiyana ku ew tê de, ew kiribû mirovekî pirr zarxweş û helîm. Wî ji zarokiya xwe hetanî wî emrî nehîştibû dilê tu kesî jê bimîne. Dema ku didît heval û dostên wî ketine tengasiyekê, destê dostaniyê dirêjî wan dikir, bi alîkarî û bi dilovanî ber bi wan ve diçû. Ew bi xwe mirovekî gelek xîretkêş û xwedîsebir bû. Kul û xemên di dilê wî de nedihatin ser ziman, tu carî bi xwe bahs nedikir. Ne jî di mad û mirûzê wî de dihatin xuyakirin. Kul û xemên xwe avîtibû kûraya dilê xwe û derxûnek danîbû ser. Lê hesreta wî jî mîna ya kesên hevrewş ku kurdûnde neçe, di nav mala xwe de zarokek bibîne. Ev yek di dilê wî de bûbû kul û

xem. Xemgîn, Xemê biribû ser gelek ziyaretan, avîtibû malên şêx û melan, nivişt jê re dabûn çêkirin û gelek qurban lê dabûn. Lê Xwedê dîsan jî bedena Xemê terr nekiribû... Lew axîn û oxîna wan bû! Mîna yên din tu mal û milk ji Xwedê nedixwest, hebûna zarokek di nav mala wan de bes bû, lê ev daxwazî nehatibû cîh.

Bavê Xemgîn di piçûkiya wî de çûbû ser dilovaniya xwe. Wî jî li dinyayê meremên xwe neanîbûn cîh. Her çiqas Xemgîn kurê wî bû, lê bi exlaq û tebîetê xwe jê dûr bû.

Bavê wî mirovekî xeberlirû, çors, ne ji bo xwe, lê ji bo kesên din xem dixwarin. Lê Xemgîn ne wisan bû, aliyekî dilê wî xem, aliyê din jî hevaltî, dilovanî û dostanî bû. Wî êdî hêviya xwe ji zarokan birîbû, bawerî pê re nemabû û dilovaniya xwe ji bo yên din dida nîşandan. Hêviya ku Xwedê dê wê rojê jê re bike qismet qels bûbû. Rojekê ji Xemê re got: "Bi eniya bavê min, ew Xwedayê ku heta vî emrî zarok nedabe me, ew ji niha û pê ve jî qetûqet nade".

Gava dikete nav xeyalan, kelehek ava dikir, yek jî xera dikir, nikarîbû tu rê û dirb ji hev derxista.

Ew di derdê ka çi bike, ku rojekê di baxçê wî de jî gulek şîn bibe, de bû.

Kavilek xaniyê wan, çend mirîşk, varik û mehîneka wan hebû. Herdu carina bi nanoziko karê nav mala axê dikirin. Havînan jî diçûn palehiya axê. Qûtê xwe yê salane û alifê mehîna xwe datanîn, ev ji bo wan bes bû.

Wext havîn bû. Dasên Xemê û Xemgîn di dest wan de, zadê mala axê didirûtin. Tavê ji jor ve hemî germiya xwe dabû nav pişta wan. Herdu di ber hev de, bê piştrastkirin, ji sibê hetanî danê êvarê dasûk dişixulandin. Her çiqas dixwestin jî, lê dîsan ji piştrastkirinê bi tirs bûn. Tirsa wan ji wê bû, ku hinek wan bibînin, herin ji axê re bibêjin, zanîbûn, ku axa bibihîze, dê ji wan bienire.

Piştî ku berê xwe birin serî, pişta xwe rast kirin. xwêdan ji eniya herduyan jî diherikî, dihate xwarê. Lê terîşikên li eniyên wan girêdayê, nedihişt ew xwêdan bi ser çavên wan de birije. Navmilên wan jî, ji xwîdanê şil bûbûn, cilên wan bûbûn mîna ku yek bîne ji dilê xwe re çend caran di nav lîça avê de dake.

Xemê pişta xwe rast kir, pişkovên sînga xwe vekir û berê xwe da bayê ji aliyê bakur ve. Ba xweş dihat. Xwîdana wê hebekî sar bû, bîna wê derket. Fitilî li malxoyê xwe kire gazî, got:

-Xemgîno, de bes e! Te ruh li xwe nehişt, hebekî pişta xwe rast bike.

Xemgîn berê xwe biribû serî, ketibû pey şopê liqat dikir, dianî, diavîte ser melûyan. Paşê ew jî hat, herduyan bi hev re berê xwe dane bi aliyê holika cenanan ve û ber bi wan çûn.

Cenan, li bin siya holikê rûniştî bûn, ji dûr ve li Xemê û Xemgîn dinihêrîn. Ew wê rojê dereng mabûn. Paşê ji dûr ve xuya kirin, bi halekî şerpeze, hêdî hêdî ber bi cinanan ve çûn. Xemgîn hê ji dûr ve li wan silav kir, got:

– Xwedê qewetê bide we!

Yekî navsere got:

– Wey..., hûn bi xêr û selamet hatin! De kerem bikin, xwe bidin ber siyê, rûnin! Me têra xwe û we bacan û xeyar çinîne, kerem bikin, em bi hev re bixwin.

Di binê holikê de, cîhek nîşanî wan dan ku rûnên. cenan li ser palehiya wan, wî jî li ser cinaniyê pirsin ji hevdu kirin; gotinek ji vir, yek ji wir anîn û civata xwe xweş kirin. Di wê navekê de, jin jî çûn ser kaniyê, dev û rûyên xwe şûştin, cêr û sewîlên xwe ji ava sar dagirtin, anîn, danîn ber siya holikê. Xemê nanê xwe ji hebanê deranî, bir di ava sar da kir da nerm bibe û baştir bête daqurtandin. Jina cenan jî bacan û pîvazên şîn gir hûr kir, çend xeyar jî di nîvî de kire qet, anî, danî ber nan. cenan ji wan re negot "bifermin!", ha dîtin, ku dest pê kirine.

Ew hê di ser xwarinê de, kurikekî deh dozdeh salî xwe bi keftelet avîte bin siya holikê. Li ber lingan, li erdê xwe dirêj kir û tasek ava sar xwest. Xemê berî jina cenan tas ji cêrê li ber siyê dagirt û dirêjî kurik kir. Lêwik tas ji destê Xemê girt û bêbismîlah bi ser xwe de kir. Wî xwest taseke din jî vexwe, lê cenan bi awiran eşaret kir, ku ji tasekê zêdetir venexwe.

Piştî xwarinê, cenan xwe nêzîkî kurik kir, jê prisî:

– Kurê min, te dît?

Lêwik hêdî hêdî xwe livand, got:

– Erê, min dît.

Bavê wî dîsan jê pirsî:

– Di nav pezê kê de bû?

Kurik got:

– Xwe xistibû ber siya xerzê mala metika min.

Temir xwest hinek pirsên din jî jê bipirse, got:

– Kurê bavê min, tu birîn tê de hene?

Kurik li bavê xwe vegeriya, got:

– Na, lê ji tîna zimanê wê bihostekê ji devê wê kişiyabû, dikir ku bimire. Min ew da pêşiya xwe û bir ser delavan. Li wir têr av vexwar, paşê bi bez çû, giha pez.

Temir dixwest pirsên xwe bidomîne, lê Xemgîn dilop kir, gotina xwe avîte nav xeberdana wan û pirsî:

– Ma kurik ji kur ve tê, birakê Temir?

Temirê cenan, berê xwe da Xemgîn û got:

– Lo heyran, ez çi bibêjim, meseleka kûr û dûr e. Miyeka me sitewr bû. Ev çend sal in, ku ber nedigirt. Ya rastî, min digot, bila di nava pez de be, ku em payizê ji zarokan re bikin qelî. Êdî haya me jê nema, em li ser wî dilî razan. Carekê şivan hat cem mala me, got:"Ma hûn dizanin, ku miya we ya sitewr avis e?" Me bawer nekir, ez û diya zarokan rabûn, çûn nav pez, me lê nihêrî, ya rastî me ji çavên xwe bawer nekir, ji ber ku me êdî destên xwe ji avisbûna wê şûştibû. Birayê Xemgîn, piştî vê miyê, divê tu carî mirov hêviya xwe nebire! Weke me û vê heywana bê zar û ziman. Bêhêvîbûn ne tiştekî baş e.

Xemê jî mîna Xemgîn, li Temir guhdarî dikir. Bi wan gotinên cenan re, derdê wan dîsan ji nû ve ket bîra wan. Ew gotinên

Temir çend caran di dilê wan de çûn– hatin, got:"divê mirov tu carî bêhêvî nebe!". Ew miya ku ji avisbûna wê hêvî hatibû birîn, careke din ji nû ve avis bûbû! Xemê li Xemgîn nihêrî, dît ku Xemgîn jî li wê dinihêre. Piştre serên xwe berjêr kirin û deng ji wan hate birîn. Xemê, ji nişka ve mîna yeka ku ji xew şiyar be, serê xwe rakir û li kurikê cem xwe nihêrî. Lawik ji serî heta lingan, di ber çav de derbas kir, di dilê xwe de got: "xweziya kurekî min jî weke te hebûya, bila ez bi çavekî tenê bûma!". Careke din jî kizînî ji dilê wê hat.

Di pey van xeberdanan re zêde şor çênebû. Xemê û Xemgîn xatir ji wan xwestin û çûne palehiya xwe.

Xemgîn li pêş Xemê jî li pey wî, hêdî hêdî kişiyan, çûn. Di rê de, Xemê xwe nêzî Xemgîn kir, got:

– Xemgîno, te bihîst Temir çi got?

Xemgîn, serê xwe hejand, hêdî got:

– Belê, belê...

Paşê dest bi xeberdanê kir:

– Herê, herê... Min guhên xwe baş da wî. Bi rastî, ev çend sal bin, ku miya wan nezabe, çima tu... Tu hê li ser xwe yî...

Xemê şerm kir, serê xwe berjêr kir. Di dilê xwe de baweriya xwe bi gotinên Temir anî û ew gotin yeko yeko rast qebûl kirin. Bi dengekî nizim bangî Xemgîn kir, got:

– Ev tişt ketin bîra min jî. Ez dibêjim, em jî hêviya xwe nebirin...

Lê Xemgîn peyva wê birrî:

– Çi dibe bila bibe, hêvîqutkirin nebaş e, lê piştî vî emrî?

Xemê jî li bal sekinî, Xemgîn herdu destên xwe da ber kêlekên xwe, giraniya xwe da ser lingê rastê û got:

– Na... Hêviya xwe winda meke! Li ser hêvîqutkirinê, ez ê ji te re meselekê bêjim: Gava ez zarok bûm, jinên cînaran li ber berrojkê mala pîra min Gozê diciviyan. Pîra min ji wan re bahsa jinekê dikir, digot: "Jineke bi navê Gulê hebû. Hê bûka destbihine, Romiyan bi ser malan ve girt, mêrê Gulê, nûzava û qefleyek xortên din ji nava gund dane hev, bi werîsan destên wan bi hev ve girêdan, dane pêşiya xwe û ew birin. Ew şandin riya çûn û nehatinê. Gulê hê bûk bû, lê li benda mêrê xwe ma. Mêr li xwe heram kirin. Salek, dido, sisê... His û deng ji mêrik nehat. Lê Gulê qinayata dilê xwe xera nekir. Hêviya wê hebû, ku ê nûzava rojekê vegere, were; lê nehat. Piştî ku lawik eskeriya Romiyan diqedîne, wî ji bo xebata riya hesin dişînin Zengildaxê. Ew çend salan jî li wir dixebite. Paşê me bihîst, ku ji bo tirênê komir pê dane kişandin. Rojeke ne xweş bûye. Ba û ecacık radibe, toz û duxan dikeve çavên wî, heta bi çavên xwe ve dilepike, tirên tê, lê dixe... Dûrî van ciyan! Xeber pirr dereng hat, lê nexwestin xebera nexêrê zû ji Gulê re bibêjin. Piştî çend salan ji wê re jî gotin. Gulê ji wan bawer nekir, ji ber ku nedixwest bawer bike. Ew sî salan roj bi roj, kêlîk bi kêlîk li benda lawik ma û hêviya xwe ji hatina wî qut nekir. Lê mêrik nehat. Gulê jî êdî bi nevegera wî bawerî tîne, ku êdî mirî ye; hew tê, çû di nav mezelan de, jê re gorrek

da çêkirin. Her êvarên îniya diçû ser, xêr û xêratin lê dida.

Porê wê êdî spî bûbû, bejna rihanî çûbû, bejin lê bûbû wek dara biyê ku serê xwe bi ser çem û cihikan ve xwar dike.

Giregirên gund civiyan, çûn bal Gulê, jê hêvê kirin da wê razî bikin, ku cîhana xwe bi rengekî din bigorîne, serê xwe bi yekî din re deyne ser balgîv... Gulê, rihspiyên gund neşikand, bi yekî din re zewicî. Piştî neh meh û neh rojan bedena wê terr bû, Xwedê deriyê rehmê lê vekir û zarokek da wê."

Rihmetiya pîra min daîm ev qiset ji xelkê re digot. Em baş li xwe bipirsin! Belkî hema Xwedê li me jî hate rehmê, zarokek da me.

Xemê kûr fikirî, hinekî ma, got:

– Tu rastiyê dibêjî Xemgîn. Ma em li cem wî Xwedayê bê dest û pê, bê cîh û war, bê heval û hogir, yê rehimdar, mîna wê kuleka Temir jî nabin, qedrê me bi qasî yê wê kulekê jî li bal wî tune?

Ew êdî gihabûn ber berê xwe. Xemgîn di nav xwe de wek beroşa agir li bin, dikeliya bi hêrs destê xwe avîte hêsan, lepek rûn ji nav paçikekî derxist, danî ser, bi hêrs li devê dasûkê da, li Xemê fitilî û got:

– Gelo ez dixwazim kurdûnde herim? Ma ez dixwazim, mîrateyên min bi xerîban bimîne? Lê ez çi bikim! Ma zarokçêkirin di dest min de ye? Lê ev payiza ku were, em dê dîsan herin bal malên şêxan, cem sêrbazan, ser ziyaretan. Em ê dîsan xwe bavîjin wan, herin ser hekîman belkî deriyekî xêrê li me jî vebe.

Mirûzên kirî dîsan vebûn, bişirîn madên wan xweştir bû. Bi hêviya vebûna deriyekî xêrê, yekî nû, li benda payizê man.

Bi kêf û xweşî dest li qevdên dasûkan şidandin û dest bi berekî nû kirin.

Berêvarkî, herdu bi hev re, li mehîna xwe siwar bûn, berê xwe dan bi aliyê malan ve û ajotin.

Wê êvarê, bi dilekî xweş û bi hêviyên nû serî xistine xewê. Bi şev rabûn cîhê serên xwe guhertin, bi aliyekî din ve dan. Serê sibê zû rabûn, cîhê sivdera xwe jî guhertin. Deriyekî nû li aliyê rojhelat vekirin da ronahiya rojê bide nav malê.

Yên ku serê wê sibê ew wisan dîtin li wan ecêbmayî man, meraq kirin, gelo ji bo çi wiha kirine?.

Ew havîn jî mina gelek havînên din derbas bû, payiz hat. Êdî karûbarên payizê dest pê kiribû. Xemgîn û Xemê ji axê destûr xwestin da herin, li çareyekê, li dermanekî bigerin. Derdê xwe jî serî ve careke din ji axê re gotin. Axe qayil kirin û ew payiz ji suxra wî azad bûn. Qûtê xwe, alifê mehînê danîn. Mal terk kirin, karê wan bû çûna ser ziyaretan, serlêdana mela û şêxan. Li cem şêxan, nivişt dane çêkirin. Ji bo perû û bertîlan sozên din dan.

Tu tiştekî bi qîmet di nav mala wan de nemabû, tev dabûne mela û şêxan, li ser ziyaretan, li xizanan belav kiribûn.

Gelek caran xwe li benda nivişt û hemayilan hiştibû. Belê hêviya wan weka gûza xerabûyî pûç derketibû. Tiştê ku bibin, bi-

dine şêx û melan jî nemabû, şêx û mela li ber çavên wan reş bûbûn. Tu tesîra ayetan, rûmeta nivîştan û maçîkirina ebayê şêx li cem wan nemabû.

Rojekê, Xemgîn û Xemê dîsan li mehîna xwe siwar bûn, ji ser ziyaretekê dihatin. Bala xwe danê ku derwêşek jî weke wan ketiye rê, ber bi wan tê. Yekî pordirêj, erbana wî li milê wî, ketibû rê û dirban gundo, gundo digeriya, zerg li xwe dixistin û qesîde diavîte ser şêx û seyidan. Porê wî yê dirêj ji erbana wî re bûbû hêlîn.Tozê li porê wî yê ji xwîdanê şilbûyî danîbû, ji dûr ve weka werîsekî gemarî dixuya. Berê xwe dabû gundên mirîdan, ku li ser şêxên wê herêmê qesîdeyan bibêje û ji xwe re tiştekî bicivîne. Di ser û sinçê derwêş de xuya bû, ku ew ji şêx û melan hes nake. Porê wî yê wek qetikê golikan, guhê wî yê bi guhar, kiras û derpiyê wî yên spî tev di derheqa şêxan de nîşanên bêbaweriyê bûn; lê xuyabû nanê wî jî bi wî awayî derdiket.

Derwêş bala xwe dayê, ku jinek û mêrekî navsere bi hev re, li mehînekê siwar bûne, hêdî hêdî diajon, ber bi wî tên. Wî dîna xwe dayê, ku ji qelsî û pîrayî mehîn bi zor bi rê ve diçe. Derwêş li pawika wan ma hetanî ew hatin cem wî. Derwêş bi mirûzekî kirî ji wan pirsî:

– Ma çi bi we bûye, hûn herdu li pişt hev li vê qorê siwar bûne? De jê peya bin! Xwedê bela we bide! Hûn jî weke min bi rê ve herin.

Xemgîn jî mîna derwêş bi mirûzekî tirş bersiva wî da:

– Çima em siwar nebin, ev ê jî, ji hinekan re bimîne, birako. Em lê siwar nebin kî lê siwar bibe?

Gotinên Xemgîn ji derwêş re bûn meraq, bûne kul, giran bûn û weka hoqeyek risas xwe berdane ser dilê wî. Derwêş careke din jê pirsî:

– Ma qê tu mîratxwirên we nîn in, ku ev mehîn ji wan re bimîne, hûn ê bi xwe re bibine gorra tarî?

Mîna mirovên ji berê ve şîretkirî, herduyan bi hev re bersiva derwêş dan:

– Na, na, birakê derwêş, na... Tu zêdayiyên me çênabin, em kurdûnde ne!

Mirûzên wan weke gulên bêavmayî dîsan çilmisîn.

Derwêş, miroveki geriyayî bû; gelek mîr, beg, malmezin, giregir, şêx, axa û mela dîtibûn. Xwediyê serpêhatiyan bû. Derwêş, ji wan derwêşên ku zivistanên xwe li Amedê, biharên xwe li Mehabadê, havînan li Tetwanê, li Zaxo û payizan jî li Qamîşlokê derbas dikirin, bû. Ji ber vê yekê, gelek hekîm û tixtor nas dikir. Dilê wî bi halê wan şewitî, hestên dilovaniyê wek xûziya serê sibê bi ser dilê wî ve bariya, xwest bi wan re alîkarî bike, got:

– Hekîmên şareza li vir, li nav Rişkotan nadebirin. Hemî eşîr xwedî hekîmên baş in, lê ne hûn. We hema bi guşê cibên şêxan girtiye ka hûn dê heta kur li pey wî qerpalî biçin? Şêx we nabin Laleşê!

Xemgîn bi van gotinên derwêş aciz bû, got:

– Em ne tenê bi guşê cibên şêxan digirin,

gava diqewime, em wek libên tizbiyê neyar li ber hev rêz dikin! Ma te nebihîstiye? Yên li dora Girnator mîna libên tûyan eskerê Romê li erdê raxistin, kî bûn? Yên ji tabûr û alayan yek nefer tenê hiştin, ji mezinên wan re kirin diyarî, kî bûn? Tu çima dev diavêjî şêxan? Îslamî ye, lawo!

Paşê derwêş bi nermî got:

– Bi rastî hûn kurdûnde bin, ez ê navê hekîmekî ji we re bibêjim, we bişînim Çiyayê Gurdilan. Li wir, di quntara çiyê de gundek heye, dibêjinê: Behişta Xeyalan. Mala hekîm li perê başûrê gund e. Xanî bi keviran hatiye lêkirin. Gava hûn çûn di nav gund de nesekinin, rast biajon ber deriyê wê mala ku ez salixên wê didim. Xaniyekî dutebeq e. Kaniyeka avsar di ber deriyê wan de ye. Dema hûn çûn li ber derî peya bin, hevsarê mehîna xwe biavîjin sekeyê ber derî û rast hilkişin, herin tebeqa jorîn li odeyê rûnin. Ku kalê li wir hazir be, herin wî ziyaret bikin, lê hûn jê re bahsa tu tiştî mekin, heta ew bi xwe ji we bipirse.

Lê ku ne li mal be, li pawika wî bisekinin heta ku tê malê. Ji xeynî wî hûn li ser meselê bi tu mirovî re xeber nedin. Ku hûn berî wî bi hinekî din re biaxivin, dienire. Ez bawer im, ku ew kal dê bikare riyeka xêrê nîşanî we bide, ji derdê we re dermanekî peyda bike.

Piştî van şîretan, derwêş xatir ji wan xwest, kete rê û çû. Ew bi lez ji ber çavên Xemê û Xemgîn winda bû. Herdu jî di cîhên xwe de çik sekinî man, zoq bûn û ji dûr ve li derwêş nihêrtin. Lê nihêrtin heta ku ew di nava toz û dûmana ji ber lingên wî radibû de wenda bû. Xemê ji Xemgîn pirsî:

– Derwêş çi got? Bi kur ve çû? Xemgîn, dibe ku gotinên wî rast bin? Ma ev ne Xocê Xizir bû?

Haya Xemgîn jê tunebû, ew bi gotinên derwêş re ketibû nav derya xeyalan, difikirî. Wî bi dev bersiva jinê neda, tenê lêva jorîn bi ser ya jêrîn de şidand, weka yekî ku bibêje:"Ma ez çi dizanim!". Ew gotinên derwêş bûn kula ser kulan. Gelo herin wî cîhê ku derwêş got yan neçin. Dilê wan xuşûşî bû. Paşê herduyan jî xwe yekdilî kir, ketin rê û dirban, ber bi Çiyayê Gurdilan ve çûn.

Bi pirs, gundo gundo çûn. Weke ku pêşiyan gotiye:"Mirov bi pirsê diçe Xursê!". Ew jî bawer bûn, ku ew dê bi pirsê herine Gurdilan.

Westandin û eziyet li ber çavên wan nedihat. Hêvî û pêşeroja wan di çûyina bal kalê hekîm de bû. Lê dîtina gund ne hesan bû, serê wan êşand.

Piştî Xemgîn ji dîtina gund kete şikê, taqeta wî nema, xwest bi paş ve vegere, dev ji çûna bal kalê berde, lê Xemê gelek dixwest, ku here. Wê ji bo bedeneka terr hemî eziyet û zahmetî dabûn ber cav. Wê li ber dilê Xemgîn da heta ku ew dîsan ji bo çûnê qayil kir. Jê re got:

– Heyran, Xemgîn hey em hatine, em herin wî kalî jî bibînin.

Dem hat, gihîştin gund. Mîna şîretên derwêş kirin, mehîna xwe rast ajotin ber

deriyê wê mala ku ji wan re hatibû salixdan. Hevsarê mehîna xwe bi sekeyê ber derî ve girêdan, dane pey hev, hilkişiyan, çûne tebeqa jorîn.

Xelkên odeyê, ji ber wan ve rabûn piya, xêrhatin di wan dan û ew li ser kulavekî dane rûniştandin. Ji wan re xwarin anîn. Belê tu tiştek ji mêvanan nehat pirs kirin. Xeberek ji vir, yek ji wir anîn, şor kirin. Lê çavên Xemê û yên Xemgîn daîm li benda hatina kalê bûn.

Ber bi êvarê, kalê li derî da, kete odeyê. Ew jî mîna yên din ji ber kalê ve rabûn piya, heta ku kalê çû li quncikê xwe rûnişt. Xemgîn bi dizî ji Xemê pirsî, got:

– Yê ku derwêş salixên wî dabû ev e!

Hêdî hêdî cîhê xwe xweş kir, zoq bû li kalê nihêrî.

Hekîmê kal ji ber pez dihat. Temenê wî tev li serê çiyan, li zozanên bi gul û rihan derbas bûbû. Hemî cureyên çîçekan, giyayên bi şîfa nas dikir. Baş dizanîbû kijan şiklên giyayê ji pez re, kîjan ji mirovan re baş e, kîjan bi adan e, kîjan jî li pez nayê. Hemî giya û kulîlikên ji bo dermanan nas dikir, ew didane hev, dianî malê û li ber tavê hişk dikir, hildida. Yên mîna Xemê û Xemgîn tim di bîra wî de bûn. Kalê hekîm biharan li deştê, havînan jî li zozanan digeriya, seyd dikir, pez diçêrand.

Ew kalê pispor li quncekî odeyê, li ser kulavekî bi nexş rûniştibû û bi dilovanî li mêvanên xwe dinihêrî. Balgîvekî ji qeselê li ber pala wî bû, her qasê carekê ji ber pişta wî dişemitî. Bi destê rastê tizbiya xwe dikişand, bi destê çepê jî balgîvê ber pişta xwe rast dikir. Tizbiya wî jî di dest de, libo libo dikişand û bi her libekê re jî bi dizî tiştek digot, lê nedihate fêmkirin ka ew çi dibibêje. Çareke din xêrhatinê di mêvanên xwe da, li hal û rewşa wan pirsî. Lê pirsa ku ew pê hatibûn hişte êvarê, piştî şevbihêrkê.

Êvarê, piştî belavbûna şevbihêrkê, kalê hê ji nû ve cîhê xwe xweş kir, hinekî din jî nêzîkî mêvanan bû û pirsî:

– Mêvanên ezîz, hûn di ser çavan re hatine, hê zû ye, lê kerem bikin û sebebê hatina xwe bibêjin!

Bi van gotinan re, weka lîça devçîmkirî devê Xemgîn hete girtin, nema karîbû tiştekî bibibêje. Mirov digot qê cenan lê daye û dev lê şemirî ye. Lê derdê wî ji çavên wî dihat xuya kirin.Tûk di qirikê de ziwa bûbû, ziman di dev de bûbû mîna şonikekî nav avê, nediçû– nedihat.

Xemgîn ji kalê şerm kir. Wî bi awiran bala Xemê kişand, ku ew ji pêl wî ve dest bi gotinê bike. Xemê wek serbazeka çeleng, ku dabe pêşiya şerrvanên azadiyê, hat hewara mêrê xwe û ew ji wê tengasiyê xelas kir, got:

– Apo, ez xulama te me, bêedebî tê, derdekî me heye.

Kalê got:

– Bibibêje, qîza min.

Xemê got:

– Apo, em bêweled in, niha em bimirin tu mîratxwirên me nîn in. Ji dema ku ez bûme bermaliya Xemgîn heta îro, bedena min terrr nebûye, Xwedê tu... Lew em ji

www.netewe.com

derdê xwe re li dermanekî digerin. Me salêxên hekîmiya te hilanî, em hatine cem te. Dinya li me teng bûye, em nizanin çi bikin. Hêvî û mefera me tu tenê mayî. Apo, em...

Pîremêr, bi dil û can li Xemê guhdarî kir, serê xwe hejand, mîna yekî bibêje: "Heyfa we", gunhê xwe bi wan anî. Di pey gotinên Xemê re, kalê rabû ji odeyê derket derva. Xemgîn ji paş ve bala xwe da şal û şapikên wî yên kej, bejna kalê mîna ya xortekî hijdeh salî, wek spîndarekê rast bû, ew şal û şapikên kej pirr li bejna wî dihatin. Firehiya navmilên wî û beraya sînga wî, ew dişibande şêrên Şingalê. Dilê Xemgîn bijiya çekên kalê, xweziya xwe pê anî.

Piştî demekê, kalê bi hebanekê ve kete odeyê, hebanê anî danî ser kulavê ku li ser rûniştî bûn. Kalê hêdê hêdî hem devê heban vedikir û hem jî bi wan re xeber dida. Destê xwe avîtê çend qevdik giyayê hişkkirî ji hebanê deranî, dirêjî Xemê kir, got:

– Keça min, divê hûn van qevdikên giyayê di nav şîrê bizina kej de, baş bikelînin, heta ku tev dihelize. Jê bidin mehîna xwe jî. Ji mehê carekê vexwin. Piştî ku dermanê we xelas bû li ber rehma Xwedê bisekinin. Piştî ku we derman bi mehînê jî da vexwarin qet nesekinin. Wê berdin çolê, nav hespan. Lê ji bîra we neçe, gava mehîna we pirça xwe nû kir, xêr e.

Xemê û Xemgîn wê şevê jî li wir man. Roja din bi şeveqê re rabûn ji kêfa bê limêj, bê taştê ketin rê... Dermanê wan di xurcezînê de, hêdî hêdê hevsarê mehîna xwe kişandin û ji gund dûr ketin.

Herdu bi dilekî xweş, lê bi meraq gihane malê. Yên ku ew didîtin, pêre– pêre ew guhartina di reng û rûyên wan de çêbûbû, fêm dikirin. Xemgîn êdî bi çavên zava, Xemê jî bi çavên bûkan li xwe dinihêrt...

Hêvî û mefer ji rojên pêş dikirin. Deriyekî nû yê jiyanê li wan vebûbû. Dinya wan ya teng li wan fireh bûbû. Dergevanê dilê wan kul û keder ji kûraya dilê wan qewirandibûn, derge ji kêf û şahiyê re li ser taqê piştê hiştibû. Ronahiya roja kêfê dabû dilê wan, xem hêdî hêdê diçûn, wenda dibûn, xweşî û şahiyê cçhê kul û derdan digirt. Dem, dema jiyaneka nû bû û ew roj, ya yekemîn bû, ji wê mehê.


Wek derbasbûna pirr meh û salan, ew meh jî hat, zû– zû derbas bû. Meheke din dest pê kir. Ew rojên bi hêvî û bi umîd hatin. Her rojeke nû hêviyeke nû bi xwe re dianî. Destpêka wê mehê ji bo wan bûbû destpêka jiyaneke nû. Belê her tişt bi dermanê kalê ve girêdayî bû. Lê ku ew destpêk bûbûya destpêka xemên mestir?

Dema Xemê terrbûna bedena xwe difikirî, wek dengê girîna zarokên dergûşê ji kûr ve dihate guhên wê û ji kêfa hêsir dibarand. Xemê êdî di xewnên xwe de zarokên papûçikê didît, dipêça, dida ber dilê xwe û şîr dida.

Dewama wê di hejmara 21'ê de

# Leheng û têkoşerê sedsala 20'an
# Nelson Mandela

*Mihemed Dehsiwar*



### Xayintî

Piştî ku Mandela di sala 1955-an de ji bin kontrola polîs filitî, biryar da ku derkeve û li nav welêt bigere. Ji mêj ve dixwest ku here Transkeyê, welatê bav û kalan, diya xwe, malbata xwe û hevalên xwe yên kevn bibîne. Berî derbasî Transkeyê bibe, li çend cîhên din geriya û rewşa welêt û ya gel ji nêz ve dît. Bi vî awayî rewşa ANC-ê û rewşa birêxistinbûna wê baştir nas kir. Piştî vegerê li ser gera xwe raporekê da meclîsa rêxistinê, dîtinên xwe pêşkêş kir û tedbîrên pêwîst diyar kir. Polîs çend mehan piştî gera wî, carek din ew mahkumî li mal seknandinê kir. Êdî ji Johannesburgê derketina wî heta pênc salan qedexe bû.

Di serê sala 1956-an polîs wî û 156 kesên siyasî li ser "xayintiyê" xistin hepsê. Mahkemeya wan nêzî salekê berdewam kir lê ji ber bê delîliyê bi kefaleta peran hatin berdan. Lê mahkeme bi vî awayî xelas nebû, wê di pêş de hîn dirêjtir dom bikirna.

Piştî ji hepsê derket, dîsa dest bi karê ewûqatiyê kir. Lê jina wî Evelyn bi rêxistina *"Şahidên Yehova"* re ketibû pêwendiyê û dîtin û

baweriyên wan pirr ji hev dûr ketibûn. Bê şik sebebekî vê jî kar û xebata Mandela ya siyasî û heps û zîndan bûn; lê birayên jinikê jî li ser wê tesîr kiribûn. Mandela dizanibû wê jihevqetandina wan li ser zarokên wan pirr tesîr bike, lê tu îmkanên ku jina xwe qanî bike ku bi hev re bimînin jî nedît. Di dawiyê de jina wî zarokan girt û tevî eşyayên malê, çû mala birayê xwe.

Mandela piştî nêzî salekê, keçeke bi navê Nomzamo Winnifred Madikizela (piştre Winnie Mandela) dinase û her du pirr ji hev hez dikin. Winnie di malê de ji nav 11 zarokan a heftemîn bû û di buroya sosyalê de kar dikir. Herdu di 14-yê hezîrana 1958-an de zewicîn.

Tekoşîn her berdewam bû; jinên tekoşer qanûnên nû protesto dikirin û nediçûn karên xwe. Ev protesoya wan, rasterast dibû sebebê ketina hepsê. Qor bo qor jin, diçûn ber deriyê girtîxaneyan ku polîs wan têxin zîndanan. Ji hêla din ve mahkemeya serokên ANC-ê hê jî berdewam dikir. Her wiha di destpêka sala 1959-an de hinek kesên (serokê wan mamosteyekî bi navê Robert Sobukwe bû û dostekî Mandela yî kevn bû. Robert jî mîna Mandela û hevalên wî zêdeyî 25 salan di girtîxaneya Robben Islandê de raket.) ku rêxistinê pasîf didîtin û ew bi hevalbendiya komunîst û sipiyan mehkum dikirin, ji ANC-ê qetiyan û rêxistineke bi navê Pan Africanist Congress-PAC damezrandin. Çi Robert û çi serokên din ê vê rêxistinê, dost û hevalên Mandela yî kevn bûn û ew gelek ber bi veqetandina wan ket.

Di 29-ê adara 1961-an de mahkemeya ku zêdeyî çar salan berdewam kiribû, bi dawî hat. Piştî hewqas sal hakimê polîs ji ber netêrbûna delîlan, Mandela û hevalên wî ji daweya "**xayintiyê**" serbest berda.

Mandela piştî vê biryarê qet naçe mal; êdî nedixwest ku polîs wî ji hinek sedemên din bigrin, têxin bin çavan û li ser azadiya wî tesîrê bikin. Ji ber vê jî xwe veşart û îllegal karê xwe domand. Rojekê li Kapstadê, roja din li Port Elizabethê bû. Xebata wî bûbû sernivîsên rojnameyan û her roj xebera ku li dereke din hatiye dîtin dinivîsandin. Her wiha ew ji civînên rêxistinê jî bi paş nediket û beşdarî her civînê dibû. Ji hêla din ve jî polîs li her derê lê digeriya lê ew bi dest nedixist. Ji ber vê kar û xebata wî ya bi dizî navê wî "**Qerenfîla Reş**" danîbûn.

Mandela ji berê ve di fikrê tekoşîna şerê çekdarî de bû. Di civîna komîteya navendî ya ANC-ê de bi dijberiya endamên komunîst, bêyî ku dîtinên wî têkevin rojeva nîqaşê, hatibûn redkirin. Lê piştî ku dest bi xebata bi dizî kiribû, van dîtinên xwe ji der û dora xwe re vekiribû û bersîvên pozîtîv girtibû. Li Durbanê di civîna komîteyê de careke din fersend danê ku dîtinên xwe pêşkêş bike. Lê berî civînê bi kesên ku bi şid li dijî van dîtinan bû re xeber dabû û wan bi riyeke wiha dabû bawerkirin.

Di vê civînê de diyar kir ku dewleta nîjadperest ji bilî şîddetê tu riyê nedida wan. Mandele eşkere kir ku gel ji niha ve xwe bi çek kiribû û pêwîst bû ku ANC vî gelî bê serok nehêle. Her wiha şîddet jî alternatîvek ji metodên tekoşînê bû, li gelek cîhan hatibû bikaranîn û gelek caran jî bi ser ketibû. Pêwîst bû ku bihatina ceribandin. Ji bilî vê şîddeta ku niha dikir bê serokatî dest pê bikirna, dê welêt bixistina kaoseke mezin û wê ANC jî bê xwedî însiyatîf bimana. Pêwîst bû ku ANC berpisiyariya xwe ya siyasî bigirtina û ji bo tekoşîneke wiha, rojek berî rojekê biryarekî bigirtina. Mandela vê carê dîtinên xwe bi rihetî diyar kiribû û gihîştibû armanca xwe.

Roja din komîteya navendî wezîfe dide Mandela ku ew vî karî bigre ser milên xwe û dest bi organîzekirina rêxistineke wiha bike. Li gorî biryarê komîteyê, wê ANC-ê siyaseta xwe yî bi prensîbên bê-şîddetê berdewam bikira. Rêxistina nû ku wê bi navê "Umkontho We Sizwe" (Rima Neteweyî)bê nasîn, ji ANC-ê cuda, lê di bin serokiya siyaseta wê de karên çekdarî bimeşandina. Tekoşîna ANC-ê ya bê-şîddet ku zêdeyî 50 salan domandibû, dikete rewşeke nû; rewşeke bi xeter ku dawiya wê ji niha ve ne eşkere bû.

Mandela tevî Joe Slovo û Walter Sisulu komîteya serkirdatiya vê rêxistinê di nav xwe de parê vekirin û Mandela bû serokê rêxistinê. Karê Mandela yê pêşîn ew bû ku li ser şerên çekdarî yên cîhanê lêkolîn bike. Che Guevara, Mao Zedung û Fîdel Castro di nava lêkolînên wî yên sereke de dihatin. Her wiha Menaehem Begîn (The Revolt) û serhildanên Îsraîlê, şerê Cezayirê û yên din balkêş bûn jê re. Her wiha Marks, Engels û Lenîn jî xwend û ji wan kêmasiyên ku di nîqaşa bi komunîstan re dikişand, filitî.

Mandela çend mehan li welêt geriya û kadroyên ku jê re lazim bûn hilbijart. Her wiha di civînan de, li ser şikil û taktîkên şer jî fikrên xwe got û dîtinên wan jî guhdarî kir. Bi giştî li ser çar şiklên şer rediwestiyan: sabotaj, şerê gerîlla, çalakiyên terorîst û şoreşa gel. Lê hem ji ber ku ANC-ê bi şîddetê bê dil razî bûbû û hem ji hêla coxrafya welêt û rewşa wan î taybetî, niha ji sabotajan pê ve, rê nedida şiklekî din. Di dawî de biryarbû sabotaj.

Serokê ANC-ê Albert Luthulî di sala 1961-an de xelata aştiyê ya Nobelê wergirt. Roja ku Lutulî bi destûra dewletê ji bo ku xelata wergire çûbû Osloyê, li çend cîhên welêt (Johannesburg, Port Elîzabeth û Durban) çend teqandinên mezin çêdibin. Umkhonto wê rojê dest bi xebata xwe kiribû û hukumet şewişî bûbû û ketibû xemgîniyan. Piştî van teqandinan bi belavokên xwe ve jî hukumetê û raya giştî pê hisandibûn ku êdî rewşa welêt guhiriye. Di belavoka xwe de daxwaz ji hukumetê dikirin ku dev ji siyaseta xwe yî nîjadperest berde, mafên mirovantiyê qebûl bike û nebe sebebê şerekî giran. Her wiha ev ji gelê bindest û yên cîhanê

re mesajeke serhildanê bû.

PAFMECSA (Pan African Freedom Movement for East, Central and Southern Africa Unity), Rêxistina Yekbûyî ya Afrîkayê di sibata 1962-an de ji bo welatên Afrikayê yên serbixwe û yên ku ji bo rizgariya xwe tekoşîn didin civînekê amade dikir û ANC-ê jî dawetî vê komcivînê kiribû. Civîn li paytexta Etiyopya, Addis Ababayê çêdibû û li ser navê ANC-ê jî ji welêt Mandela, ji dervayî welêt jî Oliver Tambo beşdarî civînê dibûn. Ew ji Mandela re mîna xewn û xeyalekê dihat; wî ji zû ve dixwest derkevê û rewşa welatên rizgarkirî bibîne, tekoşîn û berxwedana wan bêtir fêr bibe. Her wiha di demeke wiha de civîneke wisa, ji bo alîkariya aborî û şerê çekdarî jî fersendeke pirr baş bû.

Mandela bi alîkariya hevalên xwe ji welêt derket û di ser Tanzanyayê de çû Sudanê û ji wir jî derbasî Addis Ababayê bû. Konferans bi axaftina mazûrvanê civînê melîk Haîle Selasiye dest pê kir û piştî wî jî dora axftinê dan Mandela. Mandela di axaftina xwe de pêşî li ser rewşa welatê xwe bi kurtayî agahdarî da beşdarên civînê û pişt re jî ji nûnerên konferansê alîkariya aborî, çekan û dostaniyê daxwaz kir. Axaftina wî ji teref beşdarên civînê pirr hat hezkirin û herkesî şipya destê xwe jê re lihev xist.

Mandela û Tambo piştî civînê, yek bi yek welatên rizgarkirî (Zambiya, Misir, Tunis, Fas, Ghana, Ghîne, Cezayîr û yên din) ziyaret kirin. Armanca ziyaretê eşkere bû û tenê ji bo alîkariyê bû; alîkariya aborî û siyasî. Piştî ku ji pirraniya van welatan sozên alîkariya perwerdekirina leşkerî jî girtin, çûn Londonê. Mandela li wir dibe mêvanê partiya Labourê û bi serokên wê re rûdinê. Pişt re vedigere Addîs Ababayê ku xwe di hêla leşkerî de perwerde bike. Li vir hê tam nakeve formê leşkeriyê, ji welat bangî wî dikin ku vegere welêt. Bi vî awayî jî planên wî yên ku xwe şeş mehan perwerde bike, dikevin avê. Li welêt şerê azadiyê geş bûbû û rêxistinê dixwest ku serokleşker, di serê leşkerê xwe de cîhê xwe bigre. Mandela tevî diyariya serokleşkerê Etiyopî, keleşkofekê û nêzî dused fîşekan vedigere welêt.

Mandela piştî vegera welêt di derheqa gera xwe de agahdarî da Walter û hevalên xwe yên din. Mandela li ser tiştekî giran sekinî û bala hevalên xwe kişand. Siyasetvanên afrîkî ji siyaseta ANC-ê ku bi Partiya Komunîst re hevkariyê dikir, fêm ne dikirin. Tevî ku Mandela ji hevalbendî û hevkariya PK-ê xweş bû jî, pêwîst bû di vî awayî de taktîkê xwe biguhertina. Ji bo wê jî girîng bû ku ANC-ê giranî bidana siyaseteke xweser û weke taktîk xwe ji PK-ê dûr nîşandana. Mandela pişt re van dîtinên xwe ji serokê ANC-ê Luthulî re jî pêşkêş kir. Lê Luthulî ne dixwest ku ANC ji bo dilê siyasetvanên biyanî xweş bike, siyaseta xwe biguhrîne. Hevkariya heta niha ku bi PK-ê û mixalefeta spî re hatibû kirin, tu zerarê nedabû tekoşîna wan. Lê Mandela ew da bawerkirin ku ev

ne guhartina siyasetê bû, tenê taktîkên tedbîrî bû.

Piştî civîna bi Luthulî re çû Durbanê û beşdarî civînekê bû. Li wir bû mêvanê Îsmaîl û Fatîme Meer -Fatîme di sala 1990-an de li ser Mandela pirtûkeke bi navê "N. Mandela, En Hoppets Symbol" (Semboleke hêviyê) nivîsandiye- û wê şevê li wir ma. Roja din di 5-ê tebaxê de, hevalê wî Cecil ew ji wir girt û berê xwe dan Johannesburgê.

Mandela ji gerên bi otomobîlan û di tebîetê de gelek hez dikir. Ger ev çaxê sibehê bûna, kêfa wî hîn bêtir dihat. Wê demê karibû planên xwe çêtir bifikire û xwe bêtir konsantre bikira. Sebebekî din jî ku ji van geran hez dikir ew bû ku jina wî û zarokên wî diketin bîra wî û bi vî awayî hinek sebra xwe dianî. Wê berêvarê jî ketibû xeyalan ku here jina xwe yî ciwan ziyaret bike û ji zarokên xwe hez bike. Ji zû ve wan nedîtibû û gelekî bêriya wan kiribû.

Ji Durbanê derketin û nêzîkayî li Pretermarîtzburgê kirin; hê ji nav bajêr derketibûn ku çavên Mandela bi erebeyeke ku rêwingiyên wê sipî bû ket. Erebe di ber wan de derbas bû, ji wan hinek buhurî û li kêleka rê sekinî. Di neynikê de otomobîleke din jî li pey wan bû. Çend saniye şûnde erebeya pêş ew dan sekinandin. Mandela û hevalê xwe fêm kiribûn ku ew kî ne; azadiya wî ya 17 mehan hatibû nêzî xelasekê.

Li ser pirsa navê wî, bersîva Mandela "Davîd Motsamayî" bû; navê ku 17 mehan bikar anîbû ev bû. Lê polîsan xwe şaş nekirin; wan zanibûn ku ew Mandela û hevalê xwe Cecîl Willîams bûn. Bêyî ku li ser wan û li nav erebeya wan bigerin, ew girtin û bi xwe re birin qereqola Pretermarîtzburgê. Di hucreyên ji hev cuda de Mandela ketibû kul û xeman. Ji ber pirsên di serê wî de wê şevê heta berê şeveqê xew nekete çavên wî. Polîs çawa pê hisiyabû ku li van deran e û çawa ew zeft kiribûn? Kî wî dabû dest? Li kur şaşîtî kiribûn? Çawa wisa bi rehetî hatibû girtin? Gelo ji ber bêtedbîrî û bêtedarikî hatibû girtin an jî hinekan ew şikayet kiribûn? Ev pirs û gelekên din di serê wî de derbas dibûn, lê tu bersîvên wî jî tune bûn. Berê şeveqê, bi kuxika Walter pê hisiya ku ew jî girtine. Bersîvên pirsên xwe ku ew nexistibû xewê, kêm zêde girtibû êdî.

Di mahkemeyê de digel çend ewûqatên din, Mandela bi xwe jî ewûqatiya xwe kir û xwe parast. Lê bi vî awayî, dadgehê xistibû rewşeke xerab û hukumetê jî kiribû sucdar:

"*Qanûnan min tawanbar kiriye, belê ev ne ji ber ku min çi kiriye, lê ji ber ku ez çi difikirim, çi diparêzêm û ji ber bawerî û wîjdanê min ez tawanbar kirime. ... Ev qanûn xerab in in ku min mecbûrî van kiryaran kiriye û ez ji van biryarên ku min girtiye, ne poşman im. ... Ez baş dizanim ku rewşa zîndanên wî welatî çawa ne û amade me ku dadgeha we çi cezayî bide min, bikşînim. ... Bira ev dadgeh baş biza-*

*nibe ku piştî ez cezayê xwe tewa bikim, ez ê dîsa li gora wîjdanê xwe bimeşim. ... Min li hember gelê xwe û welatê xwe wezîfeya xwe kiriye û ez pê bawer im ku wê gelên cîhanê min ne tawanbar, lê di dewsa min de yên sûcdar ku pêwîst bû niha di vê dadgehê de bihatina mahkemekirin, hukumetê tawanbar bikin."* ( r.317-320)

Mandela di axaftina xwe de dersên dîroka Afrîkayê dide hakim û sawciyên dewletê, li ser neheqî, zilm û zordariyên hukumetê û polîsan rawestiya; rewşa gelê xwe, jiyan û birçîbûna gel tîne zimên. Ew ferqa reşik û spiyan bi her awayî eşkere dike û ji hakim dipirse: "*Tu xwe têxe dewsa min û bi fikire; tu bûna yî, te yê çi bikira?*"

Di dawiya gulanê de Mandela û hevalên wî şandin Robben Îslandê, girava ku bi zîndanên xwe nav û deng dabû. Dadgehê pênc salan ceza dabû wî û çend hevalên wî. Ev ceza ne ji bo damezrandina rêxistina Umkhontoyê û sabotajan, lê ji bo teşwîqkirina serhildana gel dabûn wan. Wê piştre, ev ceza bibûna heta dawiya jiyana wan.

Li Robben Îslandê mihafizan hîn di destpêkê de dixwestin ew bi her awayî teslîm bigrin û têxin bin tesîra xwe. Lê tekoşîna wan ji derva ketibû zîndanan; ew girtiyên siyasî bûn û tu kesî nikaribû wan teslîm bigire. Lê şertên girtîxaneyê pirr giran bûn û jiyana wir gelek zor bû. Xwendin û nivîsandin, pêwendiyên bi girtiyên din re û bi hev re axaftin, qedexe bû; her wiha ji sibê heta êvarê jî dihatin şixulandin.

Deh meh piştre hatin û ew birin Pretoryayê. Mandela hate wê baweriyê ku tiştê jê ditirsiya, hatibû serê wan. Ew ji berê ve bi pênc salan razî bû; lê heke dadgehê ew li ser sabotajan mahkum bikirna, cezayê wê bidardakirin an jî "muebbet" bû.

Du roj şûnde ew birin buroya dadgehê; Walter û tevahiya serokên Umkhontoyê li wir hatibûn civandin. Wê roja din ji ber xebata sabotajan, ew derxistina pêşberî hakim. Piştre pê hisiyan ku polîs dokumanên wan bi dest xistibûn û wê ew li gora van dokumanan derxistina dadgehê. "Xayîntî", "bi riya çekdarî şoreş li dar xistin" û "komunîstî" hersê sûcên girîng ku wê sawciyan pêşkêşî mahkemeyê bikirna. Lê rojnameyên nîjadperset berî ku bên guhdarîkirin ew mahkûm kiribûn. **"Qerenfîla Reş"** û hevalên xwe, ji niha ve li ber çardara xeniqandinê dihesibandin.

Mandela di îfadeyên xwe de bersîva sawcî û hakiman wiha dida:

"*Ez qebûl dikim ku min bi hinek hevalên xwe re Umkhontoyê damezrandiye û ez yek ji serokê vê rêxistinê me. ... Hinek tiştên li vê salonê hatin gotin rastin, lê pirraniya wan xelet in. Ez înkar nakim ku min sabotajan plan kiriye, lê min van ne ji bo macera yan jî ji ber ku ez ji şîddetê hez dikim, kiriye. Planên me bi seriyekî rihet û di cîh de, ji ber rewşa siyasî ya welêt ku li ser gelê min barbarî û zordariyeke bêhempa dime-*



www.nefel.com

*şe, ketiye rojevê.*

*Di nav ANC-ê de me demokrasiyeke li dijî nîjadperestiyê meşandiye û me rê nedaye ku nîjad ji hev dûr bikevin. Lê rastî ev e ku tekoşîna me ya 50 salan ku bê-şîddet bû, em ji bilî qanûnên zorê û kêmkirina mafên mirovantiyê ji bo afrîkaniyan, ne gihandine deverekê. ...*

*Dîtin û baweriyên ANC-ê ji destpêkê ta niha, welatperweriya afrîkî ye, ev bi maneya wê nîjadperestiya ku bixwaze gelê spî ji Afrîkayê derxe, nîne. ... Ev dîtin di "Deklarasyona Azadiyê" de jî vekirî hatiye diyarkirin. Her wiha bername û deklarasyona me jî dewleteke sosyalîst daxwaz û plan nekiriye û guhartinên şoreşgerî di sîstema aborî de nexistiye pêşiya xwe. ...*

*ANC-ê di destpêkê de ji PK-ê cuda, tenê kesên afrîkî girtiye endametiya xwe. Armanc ji vê ew e ku gelê afrîkî bigihijîne ser hev û mafên wan î siyasî bi dest bixe. Armanca PK-ê ew e ku sîstema kapîtalîst daxîne û di dewsa wê de sîstema karkeran ava bike. PK cad dike ku cudabûna sinifan ji holê rake, lê ANC dixwaze wan li hev bîne û ew bi hev bide fêmkirin. Belê di nav me de gelek caran têkilî û hevkarî çêbûne, lê hevkariya me tenê ji bo armancekê bû; ew jî hilweşandina hukumetê û bi dawî anîna tadehiyên hêzên spî bû."* (349-352)

Mahkeme piştî nêzî salekê, di 12-ê hezîrana sala 1964-an de bi dawî hat. Hakim hatibû însafê (!?) û cezayê bidardaxistinê nedabû, lê "muebbet" dabû wan. Bê şik ev biryar ne ji însafa hakim hatibû û ne jî gunê wî bi wan hatibû. Li çaraliyê cîhanê nameyên rîca û protestoyan hatibûn jê re; LO-ya navneteweyî dadgehê protesto kiribû, li hundir gel bi meş û protestoyên xwe welêt xistibûn kaosê. Brejnev ji hêlekê ve, Kongreya Amerîkayê ji hêla din ve ew protesto kiribûn; parlamenterên îngîlîzî li Londonê, li dijî dadgehê bi meşekê protesto kiribûn û welatên Ewrûpayê ji nerihetiya xwe eşkere kiribûn.

Mandela û hevalên xwe hê berî biryardana dadgehê qerar dabûn ku ger biryarê dadgehê çi bibe bira bibe, wê wan dijberiya vî qerarî nekirana û mahkemê nebirina dadgeha herî bilind. Ewûqat û hevalên wan li vê biryara wan şaş mabûn û şoke bûbûn û dixwestin ku ew herin dadgeha herî bilind. Lê ew xwedî biryar bûn û qerarê xwe bi paş ve nekişandin. Li gorî wan carekê ev ji hêla moral ve ne di cîh de bû û ya din jî ne dixwestin ku bi hukumetê û gelê xwe bidin fêmkirin ku ew ji kiryarên xwe poşman in. Ew bi kiryarên xwe serbilind bûn û wîjdanê wan jî rihet bû. Ger biryarê dadgehê bidardaxistin bûna jî, mirina wan ji armanca wan a azadiya gel, ne girîngtir bû. Her wiha ew hatibûn ser wê baweriyê ku ger tiştekî wiha bi qewimiya, wê ev ji gel û welatê xwe re bibûna ronahî û wê doza wan hîn bi pêştir bixistina.

## Dîsa Robben Îsland

Şeveke nîvê şevê, Mandela û hevalên wî ji xew tên hişyarkirin. Rêwingitiya wan bi

dizî û di bin çavnêriya birrek polîs û parêzgeran de meşiya. Piştî ajotina seetekê bi otomobîlan ew birin balafirgeheke dervayî bajêr, li balafirê siwar kirin û birin Robben Îslandê, girtîxaneya ku heta niha kes bi selametî jê rizgar ne bûbû.

Mandela û hevalên xwe wê nêzî 20 salan di vê girtîxaneyê de ku çaraliyên wê av bû û jiyana wê gelek sirt bû, derbas bikin. Şertên jiyanê û pêwendiyên girtiyan hem bi hev re û hem jî bi leşker û parêzgerên wê re pirr zor bûn. Ji şeveqê ta êvarê kar û xebat dikirin; karê dirûna cilên kevn ku dawî dîsa ji teref parêzgeran ve dihatin qetandin û li wan vedigeriya, karê şikênandina kevirên mermer û yên din. Karê wan î rojane ev bû, nêzî 20 salan ji sibê heta êvarê vî karî kirin.

Xwarinên wan weke ava firaqan bû; bê goşt, bê fêkî, bê navoşk û tiştên din. Wekî din jî xwarina wan ji ya hindî û rengînan hindiktir bû û nan jî ne didan reşikan. Siyaseta hukumetê di vir de jî jihevqetandina gelan bû û firqiyet xisitina nav wan bû. Axaftina girtiyan a bi hev re qedexe bû û tew ya siyasiyan bi yên din re, cezayê mezin bi xwe re dianî. Rojname, pirtûk û kovar qedexe bûn; bi kî re bihatina zeft kirin, ew dixistin hucreyên reş û tarî, bê xwarin û vexwarin. Ziyaret tenê ji malbatên wan dihatin qebûlkirin; ew jî bi tenê ji şeş mehan carekê û bi tenê yek kes.

Karmendên girtîxaneyê, girtiyan xistibûn çar kategoriyan; A, B, C an jî D. Di nav van kategoriyan de ya herî bilind A bû û îmkanên wê baştir bûn. D jî ya herî nizim bû û girtiyên virê ku bi pirranî kesên qatil û girtiyên siyasî bûn, di şertên herî xirab de dijiyan. Kesên ku di vê kategoriyê de bûna, ji her mafên mirovantî bê maf bûn; ziyaret, name, xwendin û kirîna tiştên hûr jî li ser van tesîreke mezin dikir. Ji bo meriv derbasî beşeke bilindtir bibûna, pêwîst bû ku meriv pirr mulahîm bibûna û dengê xwe ji tiştekî wan re nederxistina. Di gel vê jî pêwîst bû ku mirov çend salên dirêj di kategoriya xwe de rawestiyana û bi şertê ku îdareya girtîxaneyê jî biryar bidana, hê mirov derbasî yeke bilindtir dibû.

Mandela û tevahiya girtiyên siyasî di kategoriya D-yê de bûn. Ji ber ku siyasî bûn, kontrola ser wan pirr hişk bû ku nedihiştin serê xwe bixwirînin. Mihafizan ew bi karên beredayî û bêmane ji sibehê heta êvarê didan mijûlkirin da ku biwestin û ji hal bikevin. Li ser kar jî axaftina bi hev re mîna dema koletiyê, qedexe bû û cîhê karê wan jî mîna avahiyên girtîxaneyê, ji girtiyên din cuda bû. Hucreyên wan jî ji hev cuda bûn û pirr teng bûn. Herî cîhê xirab jî hucreyên îzoleyê bûn û çaxê girtiyekî li gorî îdareyê sûcekî bikira, ew li gora mezinbûna sûcê wî çend şev û rojan, bê nan û av dixistin wirê.

Tevî van tade û zoriyên girtîxaneyê, digel van biryar û îdareya hişk jî, Mandela û hevalên xwe tu carî ji îdareya girtîxaneyê re serî nedanîn. Ew ji tekoşîna derva

hatibûn qutkirin lê girtîxane jî cîhekê tekoşînê bû û weke girtiyên siyasî pêwîst bû ku tekoşîna xwe di şexsiyeta hukumetê de, li hember îdareya girtîxaneyê bidomînin. Mandela û girtiyên siyasî nêzî bîst salên ku li Robben Îslandê girtî man, wextê xwe vala derbas nekirin. Tevî wan şertên zor jî ji xwe re îmkanan çêkirin, xebat û nîqaşa siyasî di vir de domandin. Wan li ser curbecur babetan lêkolîn kir û gelekan ji wan jî dîsa di vir de xwendin û ketin curbecur îmtîhanên xwendegehên bilind. Mandela bi xwe jî xwendina xwe yî huquqê li vir berdewam kir û bi nameyan beşdarî xwendin û îmtîhanên unîversîteyê bû. Her wiha di nav xwe de jî xwendegehekê vekirin û li ser babetên cuda semîner dan girtiyan.

Mandela ji malbateke begzade dihat; bavê wî mezinê herêma xwe û pismam û şêwirdarê mîrê Transkeyê bû. Ew bi xwe jî ji bo berdewamiya vî karî hatibû mezinkirin û çûbû xwendegehê. Lê jiyan û şertên welêt, berê wî bi riyeke din ve guhartibûn; bûbû ewûqat û pişt re jî serokekî ANC-ê, tevgêra rizgariya welêt. Dijmin ji destpêkê heta dawî xwestibû wî bikşîne hêla xwe û di hukumeta Transkeyê de cîhekî bidê da ku ji pêşiya xwe derxe. Li girtîxaneyê jî ev siyaseta wan berdewam kiribû, di sala 1976-an de wezîrê girtîxaneyan çend caran ew ziyaret kiribû û jê xwestibû ku vegere Transkeyê. Lê Mandela di her axaftinên xwe de dersên baş dabû wî û ew destevala bi paş ve şiyandibû. Ew girtiyekî siyasî bû, serokekî rexistinê bû û dixwest ku wisan jî muamele bibîne. Cîhê wî ne li cem wê hukumeta Transkeyê ku qanûn û biryarên hukumeta nîjadperest bicîh dianî, lê li cem gelê xwe yî belengaz û bindest bû.

## "Mandela serbest berdin!"

Mandela di sala 1979-an de xelata Nehrû ya ji bo mafên mirovan werdigre. Piştî vê bi pêşevaniya Olîver Tambo, li welêt û çaraliyên cîhanê kampanyayeke bi navê "Mandela serbest berdin!" dest pê dike. Li curbecur welatan komîteyên "Free Mandela" têne avakirin. Di sala 1981-an de ji teref şagirtên Unîversîteya Londonê, weke berendamê rûmetserokê Unîversîteyê hat pêşkêşkirin.

Di adara sala 1982-an de ji ber protesto û xebatên çar alî, hukumet Mandela ji Robben Îslandê dibin girtîxaneya Pollsmoorê. Pollsmoor ji Kapstadê bi çend kîlometreyan dûr bû; rûniştevanên wê spî bûn û cîhekî xweş bû. Girtîxane di nav tebîeteke xweş de hatiye avakirin û Kapstad dikeve aliyekê wê, çiyayên Constantia jî alîyê din. Dora wê bi rezên bê serî û bê dawî hatibû xemilandin. Mandela û hevalên xwe Walter, Raymond û Andrew di odeya herî mezin û di qatê herî bilind de hatibûn bicîhkirin. Di odeya wan de texteyên razanê yên nû û delal, du tûwalet, du serşok û tiştên modern hebûn. Li gora Robben Îslandê, ev der weke otêleke luks bû. Her wiha îdareya girtîxaneyê jî ji wan

re gelek baş muamele dikir; rojname û kovar xwendin serbest bû û ziyaretên wan dirêjtir bûn.

Di vê girtîxaneyê de jî li ser navê hukumetê gelek kes car bi car hatin cem Mandela û xwestin pê re têkevin pêwendiyê. Rewşa hukumetê roj bi roj xirabtir dibû û ji dervayî welêt jî ambargoya aborî û ya çekan ketibû rojeva cîhanê. Her wiha pirsgirêkên hundurî her roj zêdetir dibûn. Protesto û xebata tevgêra rizgariyê, hukumetê gav bi gav bêhêz dikir. Hukumeta Botha ji çaraliyê dinyayê ve dihat protesto kirin û dora wî roj bi roj teng dibû.

P W Botha, Serokkomarê Afrîkaya Başûr, di 31-ê çileya sala 1985-an de di parlamentoyê de diyar kir ku ger Mandela şîddetê red bike, wê derhal serbest bê berdan. Lê Mandela vê pêşneyarê bi şid red kir. Bersîva wî di civîneke mezin de ji teref qîza wî Zîndzî ve weha hat xwendin:

"*Ez rûmeteke mezin didim azadiya xwe, lê ez ji ya xwe bêtir azadiya gelê xwe difikirim. Piştî ku ez ketime zîndanan gelek kesên din hatine qetilkirin, gelekan ji bo evîna rizgariyê kul û kederên mezin kişandine. Girtîxane ji girtiyên siyasî tije ne. Li hember bêkesên wan, jinebî û êtîmên şehîdan, dêûbavên wan erk û wezîfeyeke min heye. Ne ez tenê êşiya me û bi tenê ma me di van salên girtîxaneyê de. Ez ji we kêmtir ji jiyanê hez nakim, lê ez nikarim mafên xwe yên mirovantiyê bifroşim û ez bi vî awayî ne amade me ku mafên gel ên mirovantiyê ji bo azadiya xwe bifroşim.*

*Ew çi azadi ye tê pêşkêşkirin ku hê rêxistina gel qedexe ye! Ew çi azadî ye tê pêşkêşkirin ku ji ber bê pasaportiyê çaxê derkevim dervayî bajêr, dîsan bêm girtin! Ev azadî ye ku çaxê ez bixwazim bi malbata xwe re bijîm lê hîn jî jina min li nefiyê ye. Ew çawa azadî ye ku ez ê dîsan ji bo ku li bajêr rûnêm, pêwîst e destûrê ji hukumetê bigrim? Ew çi azadî ye ku min serbest berdidin lê rûmeta hevwelatiyên min nagirin?*

*Bi tenê kesên azad dikarin bazariyê bikin. Girtî nikarin lihevhatinan bi dawî bînin. ... Ez heta ku gelê min negihîje azadiya xwe, hem nikarim û hem jî naxwazim tu şertan qebûl bikim. Azadiya min û ya gelê min bi hev re girêdayî ye.*" (498)

Mandela di vê salê de ji kezebên xwe nexweş dikeve û li nexweşxaneyeke Kapstadê tê razandin. Piştî emeliyatê, wezîrê edaletê ew ziyaret dike û herdu bi hev re hinek sohbet dikin. Mandela ji vê ziyareta wî fêm dike ku hukumet dixwaze pê re pêwendiyan deyne. Hukumetê weke prensîb ANC-ê bi şeklekî giştî hemberê xwe ne digirt; lê ji dewsa wê ve dixwest bi Mandela re bikeve têkiliyan. Ji xwe piştre Mandela nabin cîhê wî yî kevn û ew ji hevalên wî cuda dikin. Mandela ji vê jî êdî baş dizanibû ku di vê de hîkmetek heye.

Serîlêdanên hukumetê roj bi roj zêde dibûn. Hukumet komîsyonekê dide avakirin ku bi Mandela re li ser rewşa welêt a siyasî guftugoyan bike. Mandela pêşî ra-



www.nudewe.com

manên xwe diyar dike û pişt re bi zimanekî xweş wiha bersîva wan dide: "*Ez ne serokê rêxistinê me; serokê herî bilind Olîver Tambo ye û niha li Lusakayê dimîne. Pêwîst e ku hûn herin wirê û pê re xeber bidin; hûn dikarin fikrên min ên şexsî jî ji re pêşkêş bikin, lê ev bi tenê dîtinên min in û hevalên min ên hepsê jî girê nadin. Lê piştî ku we pê re xeber da, hûn dikarin pêşneyarên min î ku dema guftugoyan di nav ANC-ê û hukumetê de hatiye, pêşkêş bikin.*" (r. 503)

Ev komîsyon di karê xwe de bi ser nakeve. Ji hêlekê ve Olîver Tambo û ANC-ê, bangî gelê Afrîkayê kiribû ku dest bi xebat û çalakiyên ku hukumet êdî nikarebe welêt îdare bike, ji hêla din ve jî hukumet zordarî û pîkoliyên xwe çar qat zêdetir kiribû. Lê Mandela dîsa jî bi dizî, bi endamên hukumetê re pêwendiyên xwe berdewam dikir. Di derheqa van pêwendiyan de, hevalên wî yên girtîxaneyê dudil bûn; li gorî wan pêwîst bû ku hukumet û ne ANC-ê gavê pêşîn biavêtina. Lê wan Mandela ew qanê kirin û dilê wan rehet kir; ya herî giring gav avêtin bû û bidawîanîna sîstema nîjadperest bû, ne kî pêşî gav bavêje bû. Her wiha Olîver jî jê bi nameyekê di derheqa pêwendiyan de pirsan dikir û dixwest ku Mandela ew rewşa pêwendiyan jê re ronahî bike. Mandela jî bi nameyekê jê re armanca xwe diyar kir: Pêwîst bû û dem hatibû ku ANC û hukumet dest bi pêwendiyên xwe bikin û li ser maseyekê rûnin.

Di salên 1987 û 88-an de, ambargo rewşa welêt pirr xerab kiribû û welêt roj bi roj ber bi kaoseke giran ve diçû. Şîrketên biyanî xwe ji welêt vedikişandin û aboriya welêt jê tesîreke mezin digirt. Kongreya Amerîkayê pê danîbû ser apartheîdê û welatên Ewrûpayê jî hukumetê bi ambargoyê û bi protestoyên siyasî, hukumetê xistibûn quncikekî tarî. Serokkomar Botha li hember van serdestiyan îdare nekir û di tebaxa sala 1989-an de, dev ji wezîfeya xwe berda. Roja din F W de Klerk kete dewsa wî.

Pêwendiyên di dema Botha de, di dema de Klerk de jî hatin domkirin. Du meh piştî ku hatibû ser hukum, de Klerk pirraniya girtiyên ANC-ê dabû berdan. Walter û hevalên xwe êdî dikaribûn li ser navê ANC-ê axaftin bikirna û beşdarî civînên siyasî bibûna. Di pratîkê de qedexebûna rêxistinê jî rabû bû. Piştî vê, de Klerk sîstema apartheîdê gav bi gav hilweşand. Qanûnên ku di dema apartheîdê de hatibûn danîn, bi giştî rakir; dezgehên nîjadperest qedexe kir û rewşeke ku mirov karibê tê de pêwendiyan xort bike saz kir. De Klerk bi van kiryarên xwe da nîşandan ku êdî paşveçûn nabe û ji bo vê jî ji ANC-ê daxwaza piştgiriyê dikir. Mandela car bi car pê re rûnişt û herdu li ser çareserkirina rewşa siyasî ketin nîqaşan. De Klerk di 2-ê sibatê, sala 1990-an de di parlamentoyê de sîstema apartheîdê resmî hilweşand û di serî de ANC-ê û rêxistinên siyasî serbest kir. Di dawiya axaftina

www.netewe.com

xwe de "*dem hatiye ku em dest bi guftugoyan bikin"* got.

## Azadî

Mandela piştî 27 salên dirêj ku ji mala xwe, ji gelê xwe û ji hevalên xwe dûr, di zîndanên reş û tarî de derbas kiribû, di 11-ê sibata 1990-an de gihîşt azadiya xwe. Serbest berdana wî, li welêt û li dervayî welêt bûbû nûçeya yekemîn. Bajarê Kapstadê ji gelê bajêr û tevahiya welêt tije bûbû. Grand Parade, stadyuma bajêr û dervayî wê ji mirovan cinciqî bû, cîh di bajêr de nema bû. Çaxê ew derbasî ser mîkrofonê bû, destê xwe bi silava ANC-ê bilind kir û "***Amandla***!" (azadî!) qîr kir; gel bi carekê re "***Ngawethu***!" (azadî ya me ye!" bersîv da. "***Afrîka***!" qîrand Mandela; "***Mayîbuye***!" (Mayîbuye Afrîka=Afrîka ya me ye) bersîv da gel. Piştî ku gel dengê xwe birî, Mandela dest bi axaftina xwe kir:

"*Birano, hevalino, hevwelatiyên Afrîkaya Başûr, ez li ser navê aştiyê, demokrasiyê û azadiya hevbeş û giştî, silavên xwe yên germ pêşkêşî we dikim. Ez niha li cem we me; ne weke mezinekî lê weke xîzmetkarê we, yê gel im. Tekoşîn û fîdakariya we ya bê westan û bêxofiya we kiriye ku îro ez li virê me. Lewra jî ez van salên jiyana xwe yên pêşerojê, dixim oxira we û nav destên wê!*" (r. 539)

Li Sowetoyê 120.000 kes di stadyuma First National Bank de, li Mandela guhdarî kirin. Mandela di nava herdu heftiyên pêşîn de beşdarî gelek civînan bû, bersîvên medyaya welêt û cîhanê da û pişt re jî li Lusakayê beşdarî civîna navendî ya ANC-ê bû. Di civînê de Mandela weke cîgirê serok hat hilbijartin. Piştî vê civînê, li çaraliyê welatên Afrîkayê geriya, çû Misirê, ji wir hat Swêdê (ez bi xwe jî di wê civîna ku ji bo xatirê wî li Globenê hatibû amadekirin, amade bûm). Ji Stockholmê derbasî Londonê bû, çû Amerîkayê, Kanadayê û dîsa vegeriya Londonê û dawî jî xwe gihand malê.

Têkiliyên ANC-ê û hukumetê berdewam dikirin lê hinek hêz di nav hukumetê de bi provakasyonan dixwestin vê xebata wan bidin rawestandin û nehêlin welêt bigihîje azadî û aştiyê. Dijminên aştî û azadiyê gelê reşik bi zanebûn berdidan hev û şertên dijmintiyê hazir dikirin. Eşîra Zulu ji teref van hêzan ve li hember ANC-ê dihat bikaranîn û polîs jî bi don diçû ser êgir. Mandela û ANC-ê pê danîn ser De Klerk da ku prosessa demokratîkkirina welêt dest pê bike û gel bi her awayî bigihîje azadiya xwe. Her wiha di pêşiya wan de pirsgirikên aborî û civakî jî hebûn û ji bo ku rewşa welêt a siyasî bibe demokratîk, pêwîst bû ku rojek berî rojekê hilbijartin çê be, da ku kar û xebatên birêveçûna dewletê bi paş ve nemînin.

Olîver Tambo, serokê ANC-ê ku zêdeyî 30 salan li derva bû, di dawiya sala 1990-an de vegeriya welêt. Piştî vegera wî, konferansa ANC-ê li Johannesburgê bi

beşdariya 1500 nûnerên delege çêbû. Ev konferans giraniya xwe dabû ser lihevhatina bi hukumetê re; lê wekî din jî hesabên salên buhurî û siyaseta ANC-ê hatibûn rojevê. Gelek beşdaran Mandela bi "dîplomasiya şexsî" rexne kirin. Mandela van rexneyan bi dil û can guhdar kir û gelekan ji wan jî qebûl kir, lê pêwîstiya berdewamiya pêwendiyên bi hukumetê re jî dubare kir. Şeş meh piştre, kongreya ANC-ê ya piştî 30 salan ku yekem car li welêt çêdibû, Mandela bi tevahiya dengên 2244 nûneran, weke serokê ANC-ê hilbijart.

27 salên ji jiyana wî, di zîndanên dewleta barbar de derbas bûbûn. Ew ji mala xwe û malbata xwe dûr mabû. Rewşa jiyan wî ne tenê li ser wî, li her wiha li ser malbata wî jî tesîreke mezin kiribû. Di van salên ji hev dûr de, Mandela û jina xwe jî ji ber sedemên jiyanê ji hev dûr ketibûn. Navê Winnie bi alîkariya polîs jî ketibû hinek skandalan. Tevî ku tu îsbatên dadgehê tunebûn jî, ceza da Winnie û piştre jî wê bi kefaletî serbest berda. Mandela û Winnie ji ber vê yekê di nîsana 1992-an de hev berdan. Dilê wî gelek êşiya lê li gora xwe tu çareyeke din nedît.

Mandela di sala 1993-an de digel de Klerk xelata aştî ya Nobelê wergirt. Çend sal berî wî jî Desmond Tutu û berî wî jî Albert Luthulî bûbûn xwediyên vê xelatê.

Hilbijartinên ji bo parlamentoya neteweyî di dawiya nîsana 1994-an de çêbûn. Mandela, serokê ANC-ê î 75 salî, cara yekem çû ser sandoqan û raya xwe bikaranî. ANC-ê di van hilbijartinan de, ji tevahiya rayên welêt ji sedî 62 û ji 400 cîhên meclîsê jî 252 kursî girt. Di axaftina xwe ya piştî hilbijartinan de Mandela spasî de Klerk, endamên ANC-ê û tevahiya hevwelatiyên xwe kir û her wiha li Correta Kîng, jina Martîn Lutherr Kîng Jr. ku di podyumê de rûniştibû nihêrt û çend gotinên Kîng anî zimên.

Mandela di 10-ê gulanê de li Pretoryayê, di avahiya Union Buildings de sonda serokkomariya Afrîkaya Başûr xwend. Avahiya ku heta niha di destê spiyan de bû û ketina reşikan jî qedexe bû, tevî serokkomarekî reşik, hukumeteke li dijî nîjadperestiyê û ewlehiya demokrasiyê, niha bi pirraniya reşikên Afrîkayî hatibû dagirtin.

Mandela ji bo beşdar, nûnerên meclîsê û medyayê wiha di got:

"*Îro em tev bi hatina xwe ya virê, şewq û hêviyê didin ji nû ve derketina azadiyê. Em spasî wan mêvanên ku ji derva ve hatine virê dikin ku hûn beşdarî vê serkeftina me ya hevbeş a ji bo rastî, aştî û qiymeta mirovantiyê bûn.*

*Em di dawiyê de gihîştin armanca xwe ya azadiyê û sond dixwin û soz didin ku em ê tevahiya gelê xwe ji xizanî, belengazî, eziyetan û newekheviya cînsî û tevahiya neheqiyan rizgar bikin.*

*Wê ev welatê xweş û şêrîn qet û qet, careke din pêwîstî bi zordestiyê nebîne... Wê tav tu carî di ser vê serkeftina mezin a mi-*

*rovantî û ronak de, neçe xwarê.*

*Bijî azadî! Xwedê Afrîkayê bibexşîne!'*

(r. 591)

Belê Mandela riya xwe ya dirêj ku gihîşt azadiyê, tewa kir. Evîna wî yî mezin, rizgariya welêt û azadiya gel, di dîrokê de rûpelekî nû û bi rûmet vekir. Her wiha ew bi xwe jî kete dîrokê û têde bû xwedî cîhekî taybetî û herî bi rûmet. Lê hîn riya wî bi dawî nehatiye û ew hîn jî dimeşe. Leheng û tekoşerê sedsala me, xwedî temenekî gelek dirêj be. ■

**Çavkanî**


1. N. Mandela; Den långa vägen till frihet (Riya dirêj a azadiyê; çapa 2. 1995)

2. Fatima Meer; N. Mandela, en hoppets symbol (Semboleke hêviyê; 1990)

3. Mary Bensson; Nelson Mandela (1986)

4. N. Mandela; Den svåra vägen till friheten (Riya dijwar a azadiyê;1965)

5. Colîn û Margaret Legum; Det bittra valet (Riya dijwar; 1968)

6. Christer L. Petterson; Vägskäl för Sydafrika (Rêveqetin ji bo Afrîkayê1990)

7. Winnie Mandela; En bit av min själ följde med honom (Perçeyek ji ruhê min pê re çû; 1990)


# Her bijî NÛDEM!...




*A. Balî*

Di aliyê kultur, huner û edebiyata kurdî de, NÛDEM wek kulîlkeke rengîn e. Di aliyê lêkolîn û lêgerînê de gelek berhemên hêja bi riya NÛDEMÊ tên weşandin û naskirin. Herweha weşanên Nûdemê jî pirr hêja ne. Ew jî pirtûkxaneya kurdî dixemilînin û dewlemend dikin. Ji bo vê yekê ez Nûdemê, berpirsiyar û serkarên wê pîroz dikim û di aliyê weşandinê de jiyaneke dirêj ji Nûdemê re dixwazim. Her bijî NÛDEM!...

# Ez û Şalûl

*Abbas M. Abbas*



Bêkarî dermanê zivistanê ye, mirov êdî cilika bê xelatiyê bi ser rûwê xwe de dike û bi taybetî mirovên wek min ku bi dilê xwe ji welatê xwe koçber bûne û li welatê biyanî ber deriyan xwestek dijîn.

Îro du salên min in li vî welatê biyanî ku tên qedandin û zivistana duyemin jî, ber bi dawî diçe, hêjî wek her roj, ez ji nav livina xwe bi giranî û bêyî dilê xwe têm der!..

Çi roj e ji heftiyê ye, ez nizanim, bi dengê çûn û hatina tirimbêlan li ser kuça ber mala min, şiyar bûm, bi giranî çavên xwe bel kirin, pêre pêre ronahiya geş da wan û bi lez dan hev. Qelfên berfê bi wê bel bûnê re, di pencerê ve li ber çavên min ketin, bi bablîsokê re dihatin xwar û diçûn banî... Min berê xwe guhert bi rexê din de, ku pişta min kete aliyê pencerê de. Lihêfa xwe li xwe da hev û kişande ser pozê xwe, bo bi hilma xwe germ biminê û hêdî hêdî bi vê jiyana han de min hishisand.

– Mal xerab!.. Ku a niha tu li welatê xwe baye... Tê herê ba pismamên xwe, yan jî nasên xwe... Lê, li vî welatî, tê herê ba kê!....

Piştî vê mijûlbûnê, bêhtir min lihêfa xwe li xwe da hev û pozê xwe di nav de germ hişt û çav dan hev. Lê, ku mirov bêhtir ji şazdeh saetan di xew de mabe, wê ji nuv re çi xewê bikî..!?

Êş kete serê min. Ev êşa hanî ku bela xwe daye min, ji roj koçberiya min ve, loma jî ez di nav livîna xwe de rûniştim û bi çavên rizî û gemarî, min di pencerê ve li derve nehirt. Di qoziya navbera depê pencerê û hêt de bablîsokê baskên teyrekî hîldida. Teyr hewl dida ku baskên xwe li xwe bide hev, di melisî û cihê xwe xweş dikir, lê bahozê, disa keysa wî xira dikir!...

Wilo tewandî, min xwe ji nav lihefê kişand, bo min nebinî û ji min netirsê. Li tihêla din ve ya pencerê rabûm şipiya û lê nêhirt.

– Hey tengezar!...

Min ev gotin got û ez li xeleka di lingê wî de mam behitî .

– Salûlekî kedî kiriye... Bawer dikim ji mirovan natirse!...

Bi dizî, min pencera li ber vekîr û ji odê hatim der. Min dest bi amadekirina taştê yan jî firavîna xwe kir, ji ber ku taştiya min ev du salan nîrokiyê. Çarîk ne qediya dengê pire-pira Şalûl di odê de kete guhên min. Di odê de di çû û di hat. Bi lez min xwe avête odê û pencere girt û asê kir. Bêhneke baş di ser serê min re firîya, min û wî li ber hevdû da, dawî westiya yan ez hew wek neyar dîtim, lewre jî, li ser darê textê min danî û di cihê xwe de ma. Ne liviya, heya ku min destê xwe danî ser û ew girt.

– Weyê.. .jar, ji serma di lerizê...

Min ew kire nav her du mistên xwe de û bi devê xwe hilma germ berda nav pirtikên wî. Heya ku hin ji lerizandina wî sivik bû, ji nuv re min çavên xwe li xeleka di lingê wî de gerand û xwendina li ser xwend ...

– Girtîgeha Amedê. 1432!...

Ava germ bi laşê min de hat xwar û qeremê min sist û lerizîm, min lê nêhirt, hêstir ji çavên min rijiyan û kêlikeke baş ez ji xwe re giriyam.

– Bigirî!.. Girî bihna mirov fereh dikî!..

Min çavên xwe ji hêstiran ziwa kirin û hin xwarin danî ser kefa mista xwe da bixwê. Lê nedixwar, min av anî û niklê wî dinav avê dakir. Lê nedivexwar, min kir û nekir, ez ne gihiştim tu encamî!...

– Bi Xwedê... Şalûlê min nexweş e... Ji îşkencê û ji rêya dûr westiya ye, lewra jî ne saxlem e. Mala Xwedê ava ku li vî welatî hekîmên teyrikan jî hene!..

Min Şalûlê xwe, leza..lezekî bir ba hekim, lê nêhirt û dawî derman in da min û got:

– Şalûlê te saxlem e... Tu tiştî lê nabînim, lê hema, hin ji vî dermanî pê bide...

Berî ku ez berê xwe bidim bi mal de, min rêya xwe bi nav darbestekî xist, li bin dareke mezin û bilind rûniştim. Min sakoyê xwe li xwe da hev û ji xwe re qîr kire sitrana, Xalo... lo Xalo...

Şalûl çavên xwe bel kirin û da xwe ku bifire. Lê ji tirsa ku li min nevegerê, min neberda. Keftelefta wî di nav destên min de zêde bû. Sê car caran nikilê xwe li des-

tên min xist, dawî min ew berda. Bi yek firrê bilind bû û li ser ferehbûna darbestê re firiya. Bêhneke baş li jor ma û dawî hat li ser çuqlikî ji ê dara li ser serê min re danî. Wî jî dest bi tewirandina xwe kir!..

Ne Feqihê Teyran bi tena xwe di zimanê teyrikan de digihişt. Lê belê, ez û bi hezarên weke min ku koçber bûne a niha hînî zimanên biyanî bûne, lewra jî, ez dikarim bibêjim bê ma Salûlê min çi di bejê. Ma wê çi bibijê ji xeynî ...( Ez mirime li xerîbiyê lo xalo ) weke min!... ■

# 20:emîn hejmara Nûdemê pîroz be!

## *Weşanên Sarayê*

Ev deh salên dawî, çalakiya weşandina kovar, pirtûk û rojnameyên kurdî li derveyî welêt, ber bi armanca xwe ya bilind ve hildikişe. Îro me mişe gul û nêrgiz, rihan û beybûnên ji gulîstana çanda kurdî hene, ku em nîvê jiyana xwe bi çavbirçîtî li wan digeriyan. Her rojên ku diçin jî, gul û rihanên teze û cûrbicûr di vê gulîstana geş û mezin de dibişkivin.

Ev pêşdeçûna dîrokî, weke şîmaqeke birûskî û tûj, li nav dev û çavên dagîrker û stemkarên tirk ve ket, ku evn nêzîkî sed salan e çanda me qedexe kiriye û em ji vê jiyana rind û ciwan bêpar hiştiye.

Vêca di vî bareyî de, di vê dema destpêkî de, me pir dijwarî û sextiyên destpêkê jî hene. Lê belê em wisan bawer in, ku ev ne astengên welê girîng û şopdirêj in.

Di vê cîhana nû de, cih, dozdarî û peyama NÛDEMê bêguman weke her weşanên kurdî yên îroyîn, xwedî girîngiyeke pir mezin e.

Me pir kêmasî û sextî hene. Kar û barê me giran e, riya me hê dûr e. Lê çi tarîtî û reşayî li pêş me nîn e. Ji lewra me vê carê biryareke zexm û xurt heye, ku em dibêjin em ê bibin xwediyê ax û warê xwe û bi wê jiyana xweşpergal û azad, çanda xwe geştir û dewlemendtir bikin. Ew sextî û kêmasiyên me yên heyî, bêguman ji ber vê yekê bûye, ku em kurd mixabin ta roja îro jî, nebûne xwediyê welatê xwe û her wisan jî em nebûne xwediyê çi sazî û avahiyeke neteweyî ya bêhndirêj. Ta welatê me bi taybetî ji bin destê tirkan dernekeve û azad nebe, em bi şêweyê rastî nabin xwedî çi sazî û dezgeheke biçûk jî.

Li pêş vê rastiyê, em pîrozbahiya derketin, berdewambûn û dagirtina 20:emîn hejmara NÛDEMê ji dil dikin, bicihkirina erk û delametên wê de, jê re serkeftinê dixwazin.

# Şelale

## *Müslüm Yücel*

Em bi destpelînkê dimeşin
Lingên me tavilê ji mêjiyên me diqetin
Em pêl li hestiyên dostên xwe dikin
Qesir bi me mezin dibin
Stiriyek dilê me xwîn dike
Reh me didin dest
Em kulmek ax dixwazin
Kulmek ax ji xweliya miriyên xwe
Yek dibêje xwe bi çem bigire, yê din dibêje bi avê
Av reh dide
Û çem diherike
Dengekî bêbinî
Ji zixuran hezar Şelale dihêle
Û di binê dilopê de xizneyeke mezin
Me dide dest
Av bi cihê ku stiriyan xwîn kiriye dikeve.

Ev şiîra Müslüm Yücel ji pirtûka wî ya nû, "Îpekyolu" hatiye girtin û ji tirkî hatiye wergerandin. Tiştê em dizanin Müslüm Yücel heta niha du pirtûkên şiîran derxsitine. Ji bilî "Îpekyolu" wî di tebaxa 1994'an de pirtûkek bi navê "Kalbimiz kuyusunda kardeştir yaralarımız" jî pirtûkek derxistiye. Ji bilî şaîrtiyê, Müslüm Yücel rojnamevanekî bijarte ye û di gelek kovar û rojnameyên bi tirkî de dinivîsîne. Bi hêviya nivîsandina wî ya bi kurdî...


www.netewe.com

# Roniya bi pîvana ronahiyê



*Sabah Kara*

Pir eşkere ye ku îro piraniya rêxistin û sazmanên kurdan hê xwe ji "gundîtiyê" xelas nekirine û ber bi aliyê "bajarvanî û medeniyetê" de gav neavêtine.

Piraniya partiyên me, partiyên gundiyan û gundîtiyê ne. Piraniya "navend", "enstîtu", "komele" û saîr rêxistinên me, yên gundiyan û gundîtiyê ne.

Ji her tiştî re mazereta me jî hazir e: "Dijmin em di vî halî de hiştine!"

(Baş e! Dijmin îşê xwe dike! Ma ka tu çi dikî?)

Di vê pêvajoya malxerab de hin xebatên îstîsnaî, hêviya min xurt dikin; ku bêguman yek ji van xebatên îstisnaî û hêja jî, kovara "Nûdem" û "Weşanên Nûdemê" ne.

Kovara Nûdem û weşanên wê, roniyê didin "şikeftiyên me..." Roniyek ku pîvana wê, "ronahî" bi xwe ye.

Hûn li vê destpêkê binêrin ku di rûpela ewil a Nûdemê de cih digire:

"Nûdem kovareke serbixwe û Kurdistanî ye; ferqiyetê naxe navbera nêrîn û îdeolojiyên kurdan; ji dijminatiya kes û rêkxsitinan dûr e; rûpelên wê ji hemû nivîskarên kurd re vekirî ne."

Bi baweriya min, erê Nûdem kovareke serbixwe ye, lê bi tenê "Kurdistanî" nîne; unîversal e jî. Rûpelên wê ne tenê ji nivîskarên kurd re, lê her wisa ji nivîskarên gerdûnî re jî vekirî bûne.

Her bijî xuşka Nûbihar, Nûdem!

Her bijîn berpirsiyar û nivîskarên Nûdemê!

# Lêrmantov

*Husên Hebeş*



Ûristan di salên 30'î de, di sedsala 19'an de di bin zordestiya Nikolay I. de ketibû bin perda şevreşiyeke siyasî û civakî. Bûyerên vemirandina serhildana Dekabrîstan (1825) hîn çavên xelkê ditirsandin. Baştirîn şoreşger û xanedanên welêt hatibûn dardekirin, an jî heta Sibîryayê hatibûn dûrxistin. Di vê dema reş de ji mêjoy Ûristanê behreya M. Lêrmontov rewşen dida û di wêjeya ûrisî de rehên hunerî hêdî hêdî kûr berdidan.

M. Y. Lêrmontov di sisiyê cotmeha sala 1814'an de li Moskovayê ji dayika xwe dibe. Ji malbateke navxanedan e û ne ewqasî dewlemend e.

Bavê wî Yorî Petrovîç Lêrmontov kapîtanekî leşgerî bû, ewqas ciwan û lihevhatî bû ku gelek keç û jin lê bi mereq bû. Û wî jî di vî warî de kêmasî nedikirin. Dayika zarokê piçûk Mariya Mîxayîlovna (1795-1817) ji malbateke dewlemend bû û nuxuriya keça Elîzabeta Arsênêva bû.

Dê û bavê M. Lêrmontov di pêwendiyên navxweyî de li hev sar bûn. Di nav van mercên jiyana dijwar de lawikê piçûk mezin dibû û rojgar jî

ne dilovan bû, li ser mirina diya xwe di sêsaliya xwe de sêwî dimîne. Dayika pîr neviyê xwe dibe cem xwe û li gundê Tarxanê, li wîlayeta Pênzê wî perwerde dike.

Ji aliyê dê û bavê de, malbatên M. Lêrmontov bi huner ve hatibûn girêdan. Nemaze dayika pîr, ya ku di perwerdekirina helbestvanê duwaroj de roleke mezin lîst. Wê mamosteyên zimanê almanî û îngilîzê jê re girtin û M. Lêrmontov jî di demeke kurt de bi serbestî bi van zimanan dixwîne û dinivisîne. Jiyana li gund, li ser êş û janênên gundî û cotkaran çavên zarok vekirin. M. Lêrmontov di zaroktiya xwe de nexweş dikeve, li ser vê yekê dayika pîr wî sê caran dibe bijwênên Qafqasê piştî ku mezin jî dibe, êdî Qafqas jê re dibe ciyê kar mirinê.

Sala 1827'an M. Lêrmontov tev dayika pîr vedigere Moskovayê û di sala 1828'an de li Dibistana Xanedanan dikeve kursa çaran. Ev dibistana girêdayîyê Zanîngeha Moskovayê bû. Di wê salê de xwendevan dest bi nivisandina hunerî dike. Di sala 1830'î de li universitê dikeve pişka Axlaqê-Siyasî. Piştî du salan zanîngehê berdide.

Jiyana universitê, asoyên siyasî, civaka hunerî li pêş M. Lêrmontov fireh dike. Lewra di wê demê de baştirîn xwendevanên Ûristanê li wir dixwînin. Serqisê: V. Belînskî, A. Gêrstên, N. Ogarêv ûhd... û yên ku dûre wek rexnevan, pûblîsîst û niviskar têne naskirin.

Xwendevanên pêşverû li gor dema xwe di jîngeya siyasiya universitê roleke mezin dilîstin. Herweha M. Lêrmontov jî ji vî karî ne bêpar bû. Di sala 1832'an de ew neçar dibe û ji xwendina universitê dûrdikeve, lewra ew carekê li hemberî ramanên profesorekî kevneperest radiweste. Piştî vê bûyerê diçe bajarê Petersbûrgê, li wir dikeve dibistana leşgeriyê û heta dawiya jiyana xwe jî di leşgeriyê de her weke efser dimîne.

Di edebiyata rûsî de, A. Pûşkîn û M. Lêrmontov nûnerên qonaxa zêrîn in. Di nîvê sedsala 19'an de bi hunerên xwe weke herdu telpên çiyayê Elbrûs berz û bilind in. Bi mirina van herduyan, di wêjeya rûsî de qonaxa zêrîn dest pê dike. Jiyana M. Lêrmontov gelekî kurt dajo: Bîst û şeş sal, neh meh û duwanzdeh roj in. Di sêzdeh salên niviskariya xwe de zêdeyî çarsed helbest, nêzîkî sî helbestên dirêj (poêma), şeş drama û sê roman nivisîne. Helbesta wî ya herî pêşîn «Payiz» (1828), û ya herî dawîn jî «Pêximber» e (1841).

Di destpêka jiyana hunerî de M. Lêrmontov li ser rêça A. Pûşkîn, G. Byron û H. Heynê diçe. Ew bi taybetî bi gîyana G. Byron ya romansî û şoreşgerî pir nêzîkî xwe dibîne. Ev helbestvanê ciwan bi berhemên xwe yên nestîle li dijî zordestiyê şer dike, herweha bi pêşevaniya wan doza serbestiyê nîşan dike. Lê mixabin tevgera civakî û siyasiya wê demê pir qels e û loma helbestên M. Lêrmontov bi bedbînî û zatî têne pêşankirin.

Di salên 30'yî de helbestvan bi çalakî helbest, poêm û diraman dinivisîne. Lê navê M. Lêrmontov piştî mirina niviskarê mezin A. Pûşkîn bi şêweyekî berfireh li Ûristanê



*Lêrmantov tenê 26 salan jiya, lê bû şaîrekî dinyayî*

belav dibe: M. Lêrmontov li ser bûyera mirina A. Pûşkîn helbesteke bi navê «Mirina Biwêj» dinivisîne û bi nehênî li seranserê Ûristanê belav dike. «Mirina Biwêj» yek ji nirxtirîn helbestên M. Lêrmontov e û bi taybetî jî di warê siyasî de. Ji ber ku xwediyê helbestê yekemîn kes bû ku kujdarên A. Pûşkîn bi awakî vekirî diyar dike. Li ser vê helbestê M. Lêrmontov ji hêla Keyser ve pir tê êşandin, ji ber vê helbesta xwe dikeve bendîxanê û tê dûrxistin.

Li gel ku me xwe pir êşand ku em vê helbesta bi navê «Mirina Biwêj» wergerînin kurdî, lê bidaxawe werger ne bi dilê me bû û me nikanîbû. Loma me ji diwarojê re hişt.

M. Lêrmontov di dawiya salên 30'yî de wek helbestvanekî mezin tê naskirin. Di sala 1941'î de yekemîn pirtûka wî ya helbestan tê çapkirin.

M. Lêrmontov ne tenê helbestvan e, ew hunermend e jî. Gelek tabloyên hêja afirandine û bi xwe kemanjenekî hêja ye.

Di warê paxşanê de bêguman romana wî ya bi navê «Qehremanê Dema Me» di edebiyata rûs û dunyayê de giranbuhayiyeke xwe ya taybetî heye.

# Lêrmantov

## WELAT

Hez dikim ji welatê xwe,
Hezkirineke bêsînor!
Nesteqên min wan altnakin,
Ne rûmeta avdayî bi xwînrêtinê,
Ne şanaziya mişt ji hevbaweriyan,
Ne pendên kevnareyên nirxîn,
Nalivînin ji min mereqên pîrozîn.

Ez hez dikim, seva çi, ez jî nizanim?
Ez hez dikim ji çolên wî sar pengirî,
Ji daristanên wî yên bi tîn pêl didin,
Lêmiştên rûbarên wî nola derya ne,
Di rêyên çolbir de hezdikim li paytonê siwar bim
Û bi nêrîneke hêmin tariya şevê hingav bikim,
Pêrgînkirin li hindavan,
Bi mereqa êvargehê
Li ber agirên gundên hejar,
Hez dikim ji dûyê pirêza şewutî,
Li çolan payton tê de şevder dîmîne
Û li ser hesû di nav zevinga zer de
Çiftik dara Bryoza sipî.
Bi kêf dibim bi dîtina
Embarên tijî ji gênim,
Ji kadînên mişt ji kayê
Cem rêncberan,
Ji pencerên bi ebejor,
Û li cejnên di êvara xunavî de,
Hazirim bênêrim heya nîvê şevê
Li helperkê, bibihîsim teperepan lingan,
Fîtefîtên gundiyên serxwoş.

*1841*

*Wergera ji rûsî:* Husên Hebeş



www.netewe.com

# Afrîka ber bi sedsala 21'emîn *

*Frank Mackayanim-Appla*

*Wergera ji îngilîzî: Şahînê B. Soreklî*

Ez ji we re slavên germ yên navenda PEN li Gana û yên gelê ganî li gel xwe tînim.

Sê salên din û sedsala 21'emîn dest pê dike, lê Afrîka hîn di nav tevliheviyeke bêhempa de ye, li bervaciya baweriya bi hêvî ku ew ê di pêşeroja xwe ya dîrokî de bi gavên sabit ber bi pêşveçûneke aborî û teknolocî biçe. Cîhê daxê ye ku pêşeroja aborî ji bo Afrîka tarî xuya dike û eger şehweta bidestxistina hêzê ya serokên nuha li ser karbidestiyê bi rêya qudreteke veşartî 360 radeyan neyê badan, Afrîka dê pêrgîne nifirên ebedî bêt.

Ji destpêka salên 60'an û vir de istiqrariyeta siyasî li dora bîst welatên afrîkayî hat hejandin. Li Nîcêryayê, Çadê, Zaîrê, Hebeşistanê, Ugandayê, Rwandayê, Brundî, Somalê, Lîbêryayê - hema bi nav bike - şer cîh girt. Hele şerê li ser sînoran, ew tew bûye bûyereke heftane û mehane, bûye beşekî ji şêwejiyana me.

Bernameya Botros Botros Xalî, Sekretêrê Giştî yê Koma Neteweyên Yekgirtî, li gel hemî bend û beşên xwe bi aştiya navneteweyî û asayişa di cîhana dû şerê sar re peywendîgir dikin, seranser ji bo pirraniya serdarên Afrîka bêxwebêj man. Faktora ku roleke mezin di destpêkirina kirîzan de dileyize xizantî ye ku bûye nexweşiyeke dayimî di nav civatên Afrîkayê de. Va yeka bûye sermiyanê serokan, tiştê ku ew li dij

hemwelatiyên xwe bi kar tînin. Van serokan bi milyonan dolar ji bo kirîna çekan xerc dikin û gelên xwe yên nexwende dixin nav şer û pirsgirêkan da ku rêya mayîna bi salan li ser desthelatdariyê ji bo xwe vekin.

Faktoreke din eşîrtî ye. Siyasetmedarên navdar yên ku aliyên qenc di eşîrtiyê de li dij kolonyalîzmê û ji bo serxwebûnê bi kar hanîn ê di gorên xwe de biqîrin eger bizanibin nifşê nû ji siyasetmedaran çawa aliyên çak yên eşîrtiyê hil û herimandin. Van serokên nû eşîrtî ji bo wê yekê xistin kar da ku bêaramiyê di nav gellek neteweyên Afrîka de peyda bikin. Di derheqê vê yekê de recîmên leşgerîşêwe (milîtarîst: wergêr) yên herî tawanbar in. Bi saya bikaranîna aliyên eşîrtiyê yên neçak Afrîka ji hev hat belavkirin û bû beşekî bêyî ehmiyet di cîhanê de.

Li Afrîka guhertinên siyasî cîh digirin lê ne guhertinên di siyasetê de. Pêwîst e bête zanîn ku cudabûneke mezin heye di navbera bêleşgerîkirina siyasetê û demokratîzekirina siyasetê de. Tiştê ku nuha cîh digire ew e ku serdarên medenî şûna yên leşgerî digirin bêyî guherandina şexsiyatan û çanda siyasî. Rola hêzên leşgerî yên Afrîkayê ku yeke bi şêweyeke adetî li dij xelkê ye û stemkar e bi çi şêweyan nehat guhertin. Bi encama cîhgirtina şer û lihevdanê mirin û wêrankirin li Afrîka belav bûn, çeta bêtir bûn, talanê xwe berfireh kir û bi sedhezaran kesên medenî neçar man warên xwe li cîh bihêlin û bibin sedema hewcedariyeke zûkat bi alîkariya merovahî.

Ji mêj ve kat hatiye ku serokên Afrîkayê êdî dawiyê bidin gotina ku kolonyalîzm sedema hemî gelşên Afrîka ye. Sedema herî mezin rêberiya şaş û qels ya serdaran e. Ewan kesên fasid û bêberpirsiyartî ne. Ma ne şermeke mezin e ku bi milyonan pereyên alîkariya derve, li şûna ku ji bo pêşvebirina Afrîkayê bêyên bikarhanîn, wenda dibin û bi rêyên nixamtî xwe digihînin bankên swîsrî da ku bi wan çek bêyên kirîn ji bo hîştina serokan li ser karbidestiyê.

Di derheqê rewşa tevlihev ya li vî beşê cîhanê de rewşenbîrên Afrîkayê jî ne bêtawan in. Bi encama ew daxwaza germ û berjewendiya ezotî ku li nik hukûmetê karekî bi dest xin, ew bi zanebûn dibin hevalên recîmên stemkar.

Şerên li Rwandayê, Brundî, Somalê û yê li Lîbêryayê berdewam, bi şêweyeke ciddî li benda çareserkinên afrîkayî ne. Demeke dûr û dirêj e ku serokên afrîkayî ji bo çareserkina hemî gelşên xwe ber bi derve dinihêrin. Di demekê de ku her welat û herêm bizavê dike xwe bispêre taqetên xwe, mirov tênagihê ku çawa serokên me dûrdîtinên gewrerêberên me wenda kirin, mezinmirovên wek Kiwamê Nikroma, Cemal Ebdul Nasir, Coma Kenyata, Culyus Neyrîrî û yên din, ewên di 1963'an de Rêxistina Yeketiya Afrîkayî (RYA) damezirandinî.

Di dema berdewambûna şerên li Afrîkayê de, van şerên ku bi xwe re têkbirina mirovan û tiştan tînin, RYA rola pilingekî kaxezîn dileyizêye - wek lêner li aliyekî danîştiye , bêyî ku bikaribe di çareserkirina kirîzên li herêmê de tiştekî bike. Li ber çavan e



www.netewe.com

ku RYA di warê armancên xwe de, ku yekîtiyê ber bi pêş bibe, bizavên baştirkirina jiyana xelkê bi hev gihîne, piştgiriya serxwebûna welatan bike û kolonîzmê bi dawî wîne, bi ser neket.

Baştirîn rê ji bo bicîhkirina aştiyê li vê herêma di nav şer de ew e ku fermandariyeke bilind bête damezirandin, wekî ku ji aliyê Kiwamê Nikroma de berî sîh salan hatibû pêşniyarkirin. Ev fermandariya bilind pêwîst e xwediya hêzeke leşgerî be ku leşgerên tê de beşdar ji welatên endam bin, hêzeke ku li şûnên stratêcî bête bicîhkirin da ku xwe bigihîne deverên şer lê dest pê dike û şer rawestîne. Ji bo nuha, RYA pêwîst e bêyî derengî mêkanîzmeke çareserkirina kirîzan peyda bike da ku van kirîzan ber teqîn û berfirehbûnê çareser bike. Civata navneteweyî pêwîst e êdî ji tecrûbeyên borîn dersan bigire û nehêle rewş li devereke afrîkayî bigihê radeya herî aloz berî kirina tiştekî. Pirraniya afrîkiyan bizavên civata navneteweyî di derheqê bicîhkirina aştiyê li herêmê de teqdîr dikin, lê van bizavan bi serê xwe têrê nakin. Welatên cîhanê pêwîst e firotina çekan û alîkariya leşgerî ji bo recîmên stemkar yên li Afrîka rawestînin. Nikare bête înkarkirin ku civata navneteweyî jî ta radeyekê di derbareyê rewşa îro li Afrîkayê berdewam de gunehbar e. Divêt li vir dubare bibe ku welatên alîkariyê didin Afrîkayê pêwîst e misoger bikin ku ew alîkariya ji bo dawîdana belangaziyê bête bikarhanîn.

Nivîskar li hember merovahiyê xwedan berpirsiyartî ne ku ji bo aştiya cîhanî xebatê bikin, kirina vî karî çiqa bi tehlûke be jî, û li ku dibe bila bibe, li Ewropa, Afrîka, Asya, Emerîkaya Latînî, yan Australya. Nivîskar divêt di nav eniyekê de ji bo aştiya li her derê têbikoşin. Wek endamên PEN'a navneteweyî divêt em bizanibin ku bi saya hêza pênûsên xwe em dikarin tiştên di cîhana me de cîh digirin bidin guhertin û tevdêrên serokên stemkar ku berjewendiya xwe ya şexsî didin ser her tiştî bidin pûçkirin.

Li wan welatên afrîkayî yên ku wek welatên demokrat têyên binavkirin, ku li gor destûrên wan azadiya çapemeniyê û axiftinê hatiye misogerkirin, di rastiyê de van mafan ne hatine dayîn, ne jî rêz ji bo wan heye. Heta ku dezgehên fermî (muessese-yên: wergêr) li van welatan neyên guhertin ev maf jî nikarin bêyên bidestxistin. Tecrûbeya afrîkayî diyar dike ku bêyî bicîhkirina tevahiya şert û mercên xwe bi civateke demokrat re peywendîgir dikin, tiştên wek azadî û û serxwebûna organên dadmendiyê û dadgehan, rêzgirtina ji bendên qanûnî û asayişî re, azadiya çapemeniyê û tilînexistina nav karên wê; bêyî wan destûrê welatekî nerxê kaxeza li ser hatî nivîsandin jî nake, heta ku li wir desthelatdarî pirralî be jî.

Divêt em têbigihên ku xewna hemî kesên li dû cîhaneke bêçek dikare, ne bi rêya retorîk û kilîşeyan, lê bi encama berhemên nivîskaran bête bicîhkirin (realîzekirin: wergêr). Ez wisa bawer im ku nivîskar dikarin riya bûyerên sedsala 21'emîn bidin

guhertin. Me navêt ku em hêviya merovahiyê pûç bikin. Di riya xebata ji bo aştiyê de dewletine dê her bizavê bikin ku me car li dû carê bitirsînin yan bêhêvî bikin, lê di rewşên wisa de ye ku nivîskar pêwîst e xwe îspat bikin. Eger hêza pênûsên nivîskaran sebaret aştiya cîhanî bi sernekeve, tevahiya vê cîhanê dê têkeve rewşeke bêtir tevlihev û lihevşaşmayî. Ev xebat ji bo nivîskaran erk e û tevahiya cîhanê TEMAŞEYÎ WAN DIKE.

* Gotar di Civîna 29'emîn ya Nivîskarên Cîhanê de (Bled, Slovanya: 5/96) hatiye xwendin û di kovara PEN INTERNATIONAL de (hejmar 2, 1996) hatiye weşandin.

## Agahdariyek ji weşanên Welat

Çînî dibêjin: «dereweke nivisandî ji rastiyeke nenivisandî rastir dibe.»
Ji bo ku em jî rê nedin çewtiyeke weha me pêwîst dît ku em danezaneke weha binivisînin. Li ser pirtûka Mehmed Uzun *Rojek ji rojên Evdalê Zeynikê* nivîseke Adil Duran di Nûdema hejmara 19 de derket. Di dawiya nivîsa xwe de Adil Duran: "Li vir bi gotina Mehemed Uzun dixwazim dawî bikim." dibêje û dinivisîne «Îro li dunyayê tiştê herî dijwar kurdbûyîn e û em jî wê dixwazin.» Weke berpirsiyariya xwe divê em jî bibêjin ku Adil Duran, bi gotina wî, çewt dawî kiriye. Ji ber ku ev gotin ne gotina Mehmed Uzun e û me ji wî jî ne girtiye.

Çîroka vê gotinê dirêj e, lê em bi kurtî weha bibêjin. Her pirtûkek ku di nava weşanên me de belav bûye, me gotineke hêja peyda kiriye û li bergê wê î paşîn xistiye. Ji Xwedê û pêxemberan, ji niviskar û ehmeqan jî me gotinên hêja peyda kirine û me bi kar hanîne. Ev gotina jî gotineke wusa ye. Lê me şop û xwediyê vê gotinê wenda kir. Me wenda kir ku ji kê û kuderê peyda bû û em hîn jî baş pê nizanin. Em du îxtimala didin peydabûna vê gotinê:

1- Dibe ku li derekê di nivisa mezinekî kurd de weke formulasyon ev hevok hebûye û me wusa girtiye, an jî weke mijar niviseke weha hebûye û me bi xwe formulasyona hevokeke weha jê derxstiye.
2- Yan jî di sohbet û munaqaşên me de formulasyoneke weha peyda bûye.

Di derketina pirtûka Mehmed Uzun de em gelekî li ser sekinîn û me lê kola. Lê em bi ser ne ketin û hîn jî wusa ye. Ji bo ku ev gotina ha rengekî anonîmîtetê negire me li binê hevokê di dewsa xwediyê wê de sê nuxtik danîn.

*Weşanên Welat*



www.nefewe.com

# Pêncsaliya kovara Nûdemê pîroz be!

*Kemal Görgü*



Gel bi hunermend, edebiyat û efsaneyên xwe ve tên naskirin. Ji bo vê jî pêwîst e ku ew her dem bên parastin. Ew kesên ku wan bide parastin û jiyana wan dom bikin ew jî hunermendên wî gelî ne. Karê hunermendan ew e ku efsaneyên gelê xwe bikin efsaneyên mîtolojîk û wan biparêzin.

Lê xwediyên efsaneyên mîtolojîk ê berê jî wekî hunermendên îro bûn. Wan li ser dîwar û kevirên mezin wêne û rîtualên xwe bi qasî îmkanên ku wê demê hebûn nivîsîn û jiyana xwe heta roja îro anîn. Wek tê zanîn efsaneyên gotinên kultur û fikrên berê ji civata gel tên.

Lê bi rastî ew kesên ku hunermendên kulturên civata xwe ne, ew kesên ku bi rastî li ser tiştên edebî û hunermendiyê, hewes û eşqa wan heye, yên xwedî qabiliyet, yên ku çavên xwe û dilên xwe bo edebiyat û kulturên cîhanê û welatên xwe vedikin û deng û hîsên wan yên nazik dibihîzin. Ew berî her tiştî bi hunermendiyeke xurt bidestxistinên xwe bo gelê xwe dikin û gel jî bersiva wan dide. Bi wî halî kultur ji aliyê hunermendên wî gelî de tê qebûlkirin. Gel jî wan nêzî jiyana xwe dibîne û dike malê xwe û jê re sadiq dimîne.


Lê dîroka edebiyata Kurdistanê dîsa nîşan dide ku hunermendên Kurdistanê her tim karê xwe li gora îmkanên xwe kirine û ew efsaneyên me yên nemir wek Mem û Zîn, Memê Alan, Siyabend û Xecê, Leyl û Mecnûn, Dimdim, Serê Sîsebanê, Moriya Yaqût, Zembîlfiroş, Evdalê Zeynikê, Şahmeran û hwd. Di hemêza Firat û Dîcle de, wê navê wan bi herfên zêrîn di dîroka kultura me de werin nivîsîn.

Daxwaz ew e ku rojekê Mem û Zîn, Evdalê Zeynikê û hemû efsaneyên Kurdistanê yên din û nivîsên nivîskarên Kurdistanê yên wê demê li sehneyên cîhanê wekî klasîkên William Shakespeare, Molier, Çexov, Lorka, Beckett, Strindberg û Îbsen bêne sehnekirin. Ew jî mutlaqa bi hevrebûn û hevkariyê mumkun e.

Ez pênc saliya kovara Nûdemê bi dilekî germ pîroz dikim û hemû kesên ku heta îro dilê me bi nivîsên kulturî, hunerî û edebî şa kirine spas dikim û ji karê we hemû hevalan re serkeftin û pêşveçûnê dixwazim. Serkeftina hunermendên gelên bindest, mizgîna pêşketin û serkeftina welatbûyînê ye.

# Mîlîtarîzekirina sosyalîzmê

*Şerefxan Cizîrî*



Ev nêzîkî 200 salî ye ku teorî û praktîka sosyalîzmê tê şirovekirin. Tevgerên sosyalîstî, akademisyenî, polîtîkvanî, rêxistinên karkerî û navnetewî, kesên hunermend û teorisyen pirr caran dîtin li ser sosyalîzmê pêşkêş kirine. Li ser çilobûn û çawabûna civateke sosyalîst pirr tişt hatine nivîsandin û ji sala 1917'an de û vir de jî, hinek raman hatine ceribandin. Li ser civat, mirov, kultur, huner, polîtîka û hişmendiya sosyalîstî heta roja îro teorî û dîtinên cûrbecûr pêkhatine. Ji aliyekî de ev rastî dewlemendiyek e. Lê belê heger dewlemendî bi serê xwe bibe armanc, wê çaxê dewlemendî dibe tevlihevî. Sosyalîzmeke dewlemend hergav baş e, lê sosyalîzmeke tevlihev alîkariya tu mirovan nikare bike. Jiyana civatî pirr dijwar e û ji ber wilo jî zelaliya îdeolojî dixwaze. Pirr tevgerên niyet xerabe dikarin vê dewlemendiyê ji bo armancên xwe yên pîs bikarbînin. Weke mînak mirov dikare gotina "sosyalîzma netewî" nişan bide. Faşîzm û nazîzma Germanî, dixwastin gotina sosyalîzmê bilewitînin û wê ji armanca wê dûrbixînin. Li welatê "sosyalîst" jî pirr caran sosyalîzm ji



www.netewe.com

bo armancên qirrêj dihate bikaranîn. Ji bo mînak mirov dikare bibêje ku li van welatan navê dagirkeriyê bibû sosyalîzm û navê dîktatoriyê jî bûbû pêşverûtî.

Weke teorî û praktîk divê îdeolojiya sosyalîzmê sivîl û aştîxwazî be. Sosyalîzm, li ba klasîkên xwe yên navdar weke utopyake sivîl û aştîxwaz tê pesinandin. Tevgerên sosyalîst tu caran nikarin bibin şerxwaz. Ji ber ku felsefa sosyalîzmê felsefa aştîxwaziyê ye. Li cem tu nivîskarê, teorîsyenê, îdeologê û polîtîkvanê sosyalîzmê, felsefa şer nayê parastin. Di tekstên sosyalîstî de xweparastin heye, demokrasî û têkoşîn heye, ramanên mirovî hene, humanîzm û kultur heye, ji bo van armanca jî xebata polîtîk heye ûhw.

Lê weke felsefe tucarî parastîna şer û mîlîtarîzmê, di tekstên sosyalîstî de peyde nabe. Sosyalîzm antî- milîtarîst e û ev yeka jî pirr eşkere ye. Lê heger li hinek cihan behsa şer û xebata milîterî bitaybetî bê kirin jî, ev yeka bi giştî ji bo rakirina şer ji meydanê ye. Sosyalîst û Marksîstan hergav daxwaz kirine ku şer û zordarî jî nava mirovantiyê rabe... Sosyalîstan heta îro ji mecburî şer kirine. Dîtinên Fredrich Engels di vî warî de pirr zelal in. Heger karbidest û sermayedarên civatê bi rastî netîca demokratîk bipejirînin, wê çaxê tu encam tuneye ku sosyalîst zorê bikarbînin. Bi kurtî sosyalîst hevalbendên xebatên demokratîk û sivîl in. Pêwîst e di vir de tu şik tune be...

Ma gelo teorî, îdeolojî û praktîka sosyalîzmê çawa pêşket?

Rastiya dîrokî çiye?

Ji pirr aliyan de mana gotina sosyalîzmê hatiye guhertin. Sosyalîzm ji pirr aliyan de ji armancên xwe hatiye dûrxistin. Sosyalîzma ku di wexta xwe de aştîxwaz bû, pirr caran di praktîkê de bû şerxwaz. Sosyalîzma ku dibingehê xwe de sivîl bû hate milîtarîzekirin. Sosyalîzma ku li ser hîmê ilm û zanyariyê avadibû, di dîroka rastî de bû dogmatîk û sekterîst. Sosyalîzma ku ya zehmetkêşa bû û enternasyonalîst bû, di pêşketina dîroka rastî de, bû ya burjuvaziya biçuk û neteweperest. Sosyalîzma ku di armanca xwe de ji bo desthilata xelkê û demokrasiyê têkoşîn dide, di rastiyê de burokrasî û dîktatorî pêşxist. Bi kurtî tiştê ku di qirnê 19' an de bi serê sosyalîzmê hat, bi serê kutubxana ku çekê kîmyevî bifiroşe nehatiye! Tu tevgerên ramanî û polîtîk weke sosyalîzmê, ji armancên xwe evqasî ne hatine durxistin. Ji ber vê yekê jî, sosyalîzm divê bi hemû awayî li eslê xwe vegere û bikaribe bersiva dema me ya modern bide...

Baş e çima wilo bi serê sosyalîzmê hat?

Li ser vê yekê dikarin pirr dîtinên curbecur hebin. Ev tiştekî normale. Divê mirovê sosyalîst, hemû dîtin û rexneyê ku li ser vê mijarê hene fêr bibe û netîcên rastî û ilmî ji van derxîne. Em hewcedarê rexne û ramanên nû ne. Lê di vê mijarê de, divê mirov karibe bi durustî, pitpita taxê û ramanê rastî jî hev baş cihê bike. Ewê ku problemên sosyalîzmê ji xwe re kirine weke pitpita taxê, ew bi xwe problemeke sosyal û pisîkolojîk pêktênin. Weke baş tê zanîn, bi taybetî li Kurdistanê, xaînên sosyalîzmê pirr

caran, ji nav vê kategoriya sosyal derketine. Ewê ku di şeveke tarî de bûbûn sosyalîst, di şeveke tarî de jî, dev ji sosyalîzmê berdan. Wexta ku ew bûn sosyalîst, nizanîbûn çima bûne sosyalîst û wextê ku vana dev ji sosyalîzme jî berdan, dîsa nizanibûn çima dev ji sosyalîzmê berdane! Ez bawer dikim ku ewê riya van kesan, hergav li ser nezantiyê û tarîtiyê berdewan be!

Bi dîtina min yek ji problemên sosyalîzmê ew e; ji destpêka şoresa oktober û heta îro, ji pir aliyan de mîlîtarîzekirina raman, rêxistin, dîtin û jiyana sosyalîstî berdewam kir û hîna jî berdewam e. Ez li vir mîlîtarîzekirinê wuha fahm dikim: Tenê danûstandinên polîtîk ji jor ber bi jêr de dimeşin, kanalên danûstandinan, ji jêr ber bi jor de hatine xitimandin. Karê polîtîk ji pirr aliyan de mutlaq hatiye navendekirin û mantiqê leşkerî jî, bi hemû awayî ketiye şûna xebata demokratîk û sivîl. Kultura leşkerî û çareserkirinên bi zorê, bûne armancên serbixwe. Piraniya îmkanên ekonomî kanalîzeyî xebata leşkerî dibin. Serok dikevin şûna xelkê, kesên bi rutbe dikevin şûna kategoriyên sosyal û polîtîk, qurretî, fexfexe û xwe nişandan dikeve şûna hişmendiya polîtîk, desthilat dikeve şûna aqil, kvantîta kar dikeve şûna kalîta kar, pragmatîzm û opportunîzm dikeve şûna prensîba, karê bi ecele dikeve şûna kar ê bi plan û program, alet dikevin şûna armancên polîtîk û jiyan ji pirr aliyan de anormalîzê dibe. Ji xwe armancên mîlîtarîzekirinê jî, anormalîzekirina jiyana civatê ye...

Li ser mîlîtarîzekirina sosyalîzmê bi taybetî xebatên baş û kûr ne hatine kirin. Li ser vê mijarê zêde tişt nehatine nivîsandin. Xebateke balkêş li ser vê mijarê ya akademîsyen Amanda Peralta ye. Ew bi xwe ji Emerîka Latîn e û eslê wê Arjantinî ye. Di nav tevgera gerîllayên Arjantîn de ka rkiriye, paşê ketiye zindanê û di pirr asaqên nebihîstî re derbas bûye. Di salên 70 de ew weke penaber hatiye Swêdê û di nav Partiya Çep de kar dike. Amanda textorê dîrokê ye û teza xwe li ser şer, şoreş û polîtîka di ramanên Marksîstî de nivîsandiye.

Li gora dîtinên Amanda Peralta sosyalîzm hatiye mîlîtarîzekirin. Encamê vê yekê dikarin pirr bin. Yek ji van encaman, teoriya şer û polîtîka ye ku ji teorîsyenên burjuwazî hatiye girtin. Sosyalîstan teoriyên burzuwazî li ser şer, bê rexnekirin weke teoriynê xwe pejirandin. Di warê felsefê, dîirok, ekonomî, kultur û pirr tiştên din de, sosyalîstan rexne li teorî û dîtinên burjuwazî girtine û alternatifê xwe nîşan dane. Lê di warê şer de, bi giştî bê rexnekirin tenê teoriyên burjuwazî û bi taybetî jî teorî û dîtina Carl von Claseuwitz ji xwe re kirine bingeh.

Ba şe, Carl von Clausewitz kî ye?

Clasuewitz him teorîsyenekî şer yê navdar e û him jî di wexta xwe de di artêşa Prusya de general bû. Pirtûka Clasuewitz ku li ser şer hatiye nivîsandin di warê xwe de bûye klasîkek naskirî. Di pirtûka xwe ya li ser şer de, Clasuewitz li dijî teorî û dîtinên çewt derdikeve. Ew kesên ku digotin



www.netewe.com

şer dikare bibe ilmekî paqij, an jî şer tenê dikare bibe huner, ji aliyê Clasuewitz de dihatin rexnekirin. Şer ne ilm bû ne jî huner bû. Şer babetekî tekoşinê bû ku pê nakokî dihatin çareserkirin. Di şer de xwînrijandin hebû û berjewendiyên cihê cihê bi hev re şer dikirin. Şer ji aliyekî de weke polîtîka û bazirganiyê bû. Li gora Clasuewitz, mirovan dikaribû bigota ku şer, bi babetekî din berdewambûna polîtîka ye.

Armanca şer ew e ku nakokiyên civatî bi riya zorê çareser bike. Lê mirov dikare bêje ku kuştina normal, şeniqandin û karê polisiye jî zor tê de heye. Di vê hevgiradanê de jî armanc bi zorê çareserkirina nakokiyan e. Ev yeka pirr eşkere ye. Ji ber vê yekê jî divê mirov karibe şer û bûyerên bi zorê, ji hev baş cihê bike.

Li gora Clausewitz divabû ku şer weha bihata tarîfkirin; tevgereke desthilatî ku dixwaze daxwaziya xwe bi dijminê xwe, bi zorê bide qebûlkirin. Şer berdewamkirina polîtîkayê bû û armanc wê jî, jinavêrakirina desthilata dijmin bû. Lê mirov baş dizane ku di dîrokê de şer hebûn û şer hebû. Ji bo zelalkirina bûyeran divabû mirov şerê heq û şerê neheq ji hev cihê bikira. Weke ku baş tê zanîn, heq û neheqî gotinên polîtîk û îdeolojîk in. Di warê şer de divabû ev gotin, ji pirr aliyan de xweşik bêne zelalkirin.

Li gora faşîstan jî şer tiştekî di bû. Faşîsta bawer dikirin ku şer, karakterê netewî xurt dike û hîsên netewî jî şiyar dike. Ji ber vê yekê jî şer, li gora tevgera faşîstî pêwistiyek bû. Di felsefa faşîstî de şerkirin bingehekî girîng bû. Civat û danûstandinên sosyal li gora prensîbê mîlîterî dihate avakirin. Ji ber vê yekê jî serokê faşîst, felsefa mîlîtaristî di hemû warê civatê de dipesinandin û pêşdixistin. Di vê felsefê de ferqa jiyana civatê û jiyana artêşê ji hev tune bû. Huner, edebiyat, ilim, rêxistin, raman û pirr tiştên din li gora prensîb û normên mîlîterî form digirtin...

Di warê şer û zorê de divê gotinên weke şerê sosyal, şerê netewî, şerê şoreşgerî, şerê çînayetî ûhw, baş bêne analîzkirin. Em hemû baş dizanin ku gotinên weke şoreş, polîtîka û şer bi giştî, ji bo hemû mirovan nayêne eynî manê. Di nav van her sê gotin û tevgeran de danûstandinên pirr têkilhev hene. Ev tiştekî eşkere ye. Lê mirov dikare bipirse; ma gelo ev danûstandin ji aliyê îdeolojîk, felsefî, exlaqî û kulturî têne çi manê? Ma gelo dewlet hergav weke dewleteke mîlîter e an jî mirov dikare bipirse; ma gelo dewletên sivîl dikarin hebin? Ma gelo polîtîka tenê ya dewletan e? Li derveyî tixûbên dewletê, polîtîka çawa kare bê meşandin? Ma gelo di jiyanê de dikare tiştin hebin ku li derveyî polîtîkayê bin an jî ma gelo polîtîka dikare hemû tişt be? Ûhw. Zelalkirin û bersiva van pirsan ji bo mirov û tevgerên sosyalîstî pirr girîng in. An na ewê sosyalîzm û felsefa çepîtiyê bikeve bin nîrê îdeolojiya burjuwazî...

Clausewitz li ser tarîfa şer weha digot: Desthilat ku bi teknîk û keşfên ilmî rehatiye xemilandin. Desthilat li vê derê desthila-

tê fizikî bû, yanî zor bû. Di vir de ez dixwazim bêjim ku em di vî warî de, behsa desthilata exlaqî nakin. Desthilata exlaqî mijareke din e. Di warê desthilata fizîkî de, tiştekî din î bingehî hebû; tu bi xwe zorê li dijminê xwe dikî ku daxwaziyên te bi cih bine û ev yeka jî di rastiyê de, dihate mana ku dijminê te jî desthilanîn bikeve. Jidesthilanîn ketina dijmin ji bo te, biserketina şer bû. Aletên şer, zor û desthilanîn bû. Armanca şer jî bê desthilanîn kirina dijminê te bû. Danûstandina di navbera aletên şer û armancên şer de jî, praktîk bû, kirin bû û tevgera polîtîk bû.

Teoriya Clasuewitz ya li ser şer, bi piranî li ser gotinên weke polîtîka û şer, stratejî û taktîk, êrişkirin û parastin, şerê bi tixûb û şerê bêtixûb, ûhw ava dibû. Di hemû dîtinên Clawusewitz de diyalektîkek Hegelîst heye. Li gora Clausewitz teoriya şer, divabû li ser fêrbûna dîrokê bi kûr û dûr avabibûya. Teoriyek baş dikarîbû alîkariya mirovan bikira ku mirov danûustandinên di navbera fenomenên cihê cihê de keşif bike û zanebûna xwe ya li ser şer tekûz bike. Weke hemû tevgerên civatî, şer jî hewcedarê teoriyeke bi rêk û pêk bû.

Baş e, Marks û Engels çawa nêzikayî li dîtinên Clausewitz dikirin?

Mirov dikare dîtinên Marks û Engels li ser vê mijarê di sê demên dîrokî de kom bike. Dema yekemîn di navbera salên 1848 - 1849'an de derbas dibe. Di van salan de dîtinên Marks û Engels li ser şer û şoreşê pirr pozîtîf in. Li gora wan şer û şoreş girêdayî hevdû ne, hevdû pêşdixin, tesîrê li hev dikin, hevdû xwedî dikin û xwîn didin hev. Di vê dîtinê de tesîra diyalektîka Hegelîst pirr eşkere ye. Marks û Engels li şer û şoreşê weke zewacek bê problem meyze dikin. Lê di rastiya xwe de ev zewac, zewacek bi problem bû...

Dema duemîn jî di navbera salên 1850 - 1859'an de derbas dibe. Di dema yekemîn de pirr tevgerên şoreşgerî li Ewrûpa belav bûn û têk çûn. Tevgera karkeran li paş ket. Ketina tevgera şoreşgerî li Ewrûpa xeyalên nifşek mirov wenda kir. Lê yek ji wan kesên ku xayal û ramanên xwe wenda nekir Fredrich Engels bû. Engels di vê demê de pirr pirtûk û lêkolîn li ser şer xwendin, ders ji wan derxistin û tecrubên xwe yên kevn di çav re derbas kirin. Bi taybetî jî xwest ku teorî û ramanên Clausewits baş fêr bibe.

Dema sêemîn di navbera salên 1859 - 1871'ê de derbas dibe. Di vê demê de şer û şoreş ji hevdu têne veqetandin. Di salên 1848 -1871'ê de li pirr welatên Ewrûpa şer bûbûn. Ev şer bi tu awayî tesîreke posîtîf li tevgera şoreşgerî nekiribû. Ji pirr aliyan de tesîr negatîf bû.

Piştî salên 1871'ê heta 1895'an li ba Marks û Engels dîtinên nû pêde dibin. Li gora van dîtinên nû, şer, ji pirr aliyan de li dijî pêşketina şoreşê radiweste. Ji bo Marks û Engels hêdî hêdî problemên aştiyê dikete warê navendê. Lê Marks û Engels tucara nebûn pasifîst...

Di dîtinên Lenin de şer û şoreş, ji teorî û

www.nefel.com

dîtinên wî yên bi giştî nikarin bêne veqetandin. Dîtinên Lenin li ser parti yê jî weha ne. Lenin, sîstemeke bi taybetî ji xwe re çêkiriye. Ev sîstema ramanî û teorî li gora mercên Rûsya yê rastiya dîrokî şikil girtibûn. Di sala 1905'an de, di nameyeke xwe de Lenin weha dibêje; "Kongra partiyê divê hêsanî be, weke ku di bin şer de ye, kurt be, weke ku di bin şer de ye, bi tixûb be. Ev kongreyeke ku ji bo şer organîzekirinê ye."

Paşrê Lenin dîtinên xwe, di vî warî de hîn bêtir sîstematîze kirin. Li dora sala 1915'an Lenin teoriya Clawusewitz li ser şer û dîtinên Marksîstî bi hevdu ve baş girêdan. Şer, ji bo Lenin dibû berdewama polîtîkayê. Bi dîtinên Lenin re tiştekî pirr girîng careke dî ji nû da dikete rojevê. Ev jî pirsa şerê heq û şerê neheq bû.

Di dema navîn de Dera Katolîk dîtinê xwe li şerê heq û neheq diyar kiribû. Li gora dîtinên Dêrê, şerê heq ew bûn ku ji aliyê serokatiyeke meşrû ve hatine beyankirin. Serokê ku ne meşrû bûn nikaribûn şerê heq beyan bikin. Di wê xalê de dîtina Dêrê pirr formalîst bû. Heta mirov dikare bêje ku ev dîtin ji pirr aliyan de, dîtinek huqûqî bû. Li ba dîtinên Dêrê formê beyankirina şer, di ser naveroka şer re hatiye girtin.

Lenin ew dîtinên Dêrê serobino kirin. Li şûna gotina meşrûtiyetê Lenin prensîbê exlaqî derdixistin pêş. Şer, girêdayî armanc û encamên xwe, dikarîbû heq an jî neheq ba. Pîvanên polîtîk-îdeolojîk divabû di vê hevgirêdanê de roleke mezin bilîzin. Weke mînak mirov dikare şerê welatê bindest li himber welatê serdest, weke şerê heq nîşan bide. Şerê ji bo biratiyê, demokrasiyê, wekheviyê, hevkariyê ûhw, şerê heq bûn. Şerê li dijî van qîmetan jî şerê neheq bûn...

Di şer de, hergav tehlûka mîlîtarîzekirina tevgera polîtîk hebû. Ev yeka doh jî rast û îro jî. Jiber vê yekê Lenin li hemberî mîlîtarîzmê derdiket. Li gora Lenin mîlîtarîzm çerrixandin bû, ji armancên polîtîk dûrketin bû. Lê divabû mirovan di vir de bikarîba organizasyonên mîlîter û mîlîtarîzmê, ji hevdû baş veqetînin. Her organîzasyona mîlîter ne mîlîtarîst bû. Mirovên Marksîst diva ji hemû aliyan de, baş bikaribe hassasiyeta di navbera bikaranîna aletên mîlîter û çerrixandina mîlîtarîst ji hevdu cihê bike. Mîlîtarîzm tucara nikaribû biba karê Marksîstan.

Di ramanên Marksîstî de Mao Tse Tung jî, prensîbên şerê xelkê û tevgera gerîllayetî li gundan pêşxist. Prensîbê Mao bi kurtî ev bû; xwe biparazê û dijmin jî ji navê rake. Clausewitz dixwest ku dijminê xwe kedî bike, lê Mao Tse Tung digot dijmin divê ji meydanê bê rakirin. Piştî Mao pirr kesên din weke Che Guewara, Regis Debray ûhw, stratejî û taktîka Mao pêşxistin. Li Çînê tevgera Mao bi taybetî li hember dagirkeriya Japon rawestiya. Tevgera Mao ji xwe re dijminekî li derve û biyanî kire hedef. Lê li Emerîka Latîn dijmin di hundir de bû. Ji ber vê yekê jî bi taybetî li Emerîka Latîn teoriya fokus pêşket. Bi kûrtî ewê gerîllayên ku ji bo cografya gundan hatibûn

perwerdekirin, bi teoriya fokus ewê bibana gerîllayên bajaran. Weke tê zanîn ev dîtin heta niha li tu deveran biserneketiye...

Bi kurtî mirov dikare weha bibêje; Tevgera Marksîstî û sosyalîstî divê xwe ji hemû cure mîlîtarîzm paqij bike. Hemû kes baş dizane ku sosyalîzm tevgereke antî-mîlîtarîst e. Lê dîsa jî em hemû baş dizanin ku sosyalîzm ne tevgereke pasîfîst e. Di vî warî de divê mirovên sosyalîst li hember tendansên mîlîtarîst pirr şiyar bin. Problemên ku hata niha di vî warî de pêkhatine, bingehê xwe ji teorî û dîtinên Clausewitz digre. Divê sosyalîst teorî û dîtinên xwe, ji nava felsefê û armanca civateke sosyalîstî derxînin. Rê û armanc divê hevdû temam bikin. Ma mirov tucara dikare sosyalîzmê bi tanq û topan ava bike?

Wek mînak mirov dikare teorî û dîtinên Hegel li ber çavan bigire. Marks û Engels, dîtin û teoriyên Hegel ji pirr aliyan de serobina kirin. Hegel li ser lingên wî dane rûniştandin. Ji bo vê yekê jî teorî û dîtinên Marksîstî di hêla felsefî, dîrokî, polîtîk, ekonomî ûhw de, berhemên hêja dan. Marksîzm, di warê ramanî de şoreş kir. Lê di warê mîlîterî de teorî û dîtinên Marksîzmê ne serbixwe bûn. Marksîzmê teorî û dîtinên xwe yên li ser şer, ji burjuwazî deyn kiriye. Weke tê zanîn, şer bixwe, di dîrokê de tucarî bê alî nebûye. Di şerkirinê de îdeolojî û naverokek heye ku bi dîtinên Marksistî re tucara li hev nake. Madem ku em li dijî çewisandina mirovan bi destê mirovane, emê çawa bikarin bibin hevalbendê, kuştina mirovan bi destê mirovan? Şer bi xwe re babatên organîzasiyonên nû pêk tîne û danûstandinên nû diafirîne. Di şer de, dîtinên hiyerarşik û otorîter pirr xurt dibin. Mirov bi xwe tucara nikarin normên şer biguherin, lê belê şer pirr caran dikare mirovan biguhere. Wan ji eyyarê mirovantiyê derxîne. Şer, mirovan bi hêsanî dikare bike weke xwe! Wexta ku mirov bibin weke şer, wê çaxê şer dibe armanc... ■

# Helbestvanê tepeser û hejaran; Letîf Helmet

*Xelîl Duhokî*



Nivîsîn li ser helbestên Letîf Helmetî, çêj û tameka taybet dide mirovî, çinku ew bi zimanekî sivik û rewan dinivîse û her zû xwendevanî radikêşe cîhana berhemên xwe. Ew bê perde, bê tem û mij, bê asteng û girê dinivîse. Ew mîna stêreka geş xwe li esmanî xuya dike. Ew ne bi tenê, ji bo grûpeka berteng, hişyar û zana dinivîse, belku ji bo tevaya karker, cotkar û bisporan jî helbestan divehîne. Ew peyvên xwe, mîna gul û rihanan bi ser cemawerî de direşîne û xelk jî, wan himbêz dikin.

Ew jî weke Hemzatufê dibêje:" Ez ji Xudê, hêvî û tika dikim ku, min ji zimanê min bê behir neke, çinku ez dixwazim bi rengekê helbest, pirtûk û tevaya berhemên xwe, binivîsim ku, ji bo diya min, xwîşka min û gişt xelkê aşkera û hêsan bin. Min nevê ez dilê wan nexweş bikim, belku min divê bextiyarî û kêfxweşiyê ji wan re bibim. Çinku heke zimanê min xera bû, hîngê ew çend jiyana min têk dide û dilê min diêşîne."(1) Belê; helbest ji pênûsa wî, mîna ava kaniya dizên, rêka xwe dişeqînin û xwe digehînin nav mejî û ruha xwendevanî. Çi di mejyê wî de heye di-

bêje û çi di torkê wî de heye, vala dike meydanê. Ew ji çi hêz, rijêm û deselatê natirse û bi wê çendê, helwêsta mirovekê dilsoz û xemxor nîşan dide û bi wê rê xizmeta gelê kurd dike û wî ber bi bajarvaniyê dibe.

Helbest ji cem Letîf Helmetî, wek av û nanî ye. Dema nenivîse, hîngê dimire. Lewra jî berhem û pirtûkên wî pirr in, lê bi hêz in, diserketîne û cihên xwe di pirtûkxana kurdî de kirîne. Ez bawer dikim ku, pirraniya pirtûxanên mala jî, bi pirtûkên wî dixemlandîne. Her edebdostek jî hebe, bêguman nav û dengê wî bihîstiye, çinku bi rewiştên xwe yên paqij, helwêstên xwe yên mirovane û welatparêziya xwe, şiyaye biçe nav dilê her kurdekî. Kemal Mîrawdelî vê rastiyê, pêtir aşkera dike û dibêje:" Letîf mirovekî paqij e, paqijiyeka bê sinor. Xwedan ruheka paqij e. Ji vê paqijiya wî, rastî, dilsozî û sozên sofiyaneyên wî dizên. Lewre nabe yek Letîfî binase û xweş nevê. Ew kesekê xweştiviye."(2)


Mirov dikare bêje ku, çendîn sala, li pirraniya bajarên Kurdistanê û li Bexdayê jî, eger fêstîvaleka şiirî hatiba gêran, bêguman diviyabû Letîf Helmetî, helbestên xwe tê de xandibana. Çinku wî cihê xwe di dilê xwendevanî de kiribû. Ferhad Shakely li ser behre û hunermendiya wî dibêje:" Di nav helbestvanên îro yên Kurdistanê de, bawer nakim kesek bi qasî Letîf Helmetî, xwedan behreya şiirî be. Di destpêka salên 1970 ê de, ew weke taviyeka barana buharê barî û bi dirêjiya çendîn sala, bûbû diyardeka edebî di ferhenga kurdî de, rexnegir û rojnamevanên kurd jî, bi xwe û helbestên xwe ve mijûl kiribûn." (3)

" Di sala 1970 ê de, bizaveka nû ya edebî, bi mebest û armanca peydakirina riyên nû, wek guherîna zimanê şiirî, bûçûnên şiirî û teknîkên nû, ji dayik bû. Mebest ji wan riyên nû ew bû ku, bikarin derbirrînê ji kovan, azar, xem û xewnên mirovê kurd bikin." (4) belê; Letîf Helmet, yek ji pêşengên vê bizavê bû û helbesta nû ya kurdî jî, gehande pileyên bilindtir. Ji bo çespandina vê rastiyê jî, Refîq Sabir dibêje:" Dema basî nûkirina helbesta kurdî, di salên 1970 ê de bête kirin, bi hizra min, divê berî her kesî, navê Letîf Helmetî bêt. Yekemîn komela helbestên wî ku, di naverasta sala 1970 ê de belavbû, nîşana derketina dengekê nû yê helbestê bû û her wesa diyardeka nû bû di edebê kurdî de. Çinku bi zimanekî nû yê şiirî hate meyanê û bûçûnên nû digel xwe anîbûn."(5)

Ji bo ku ew helbestvanekî navdar û jîr ê kurd e. Xwedan taqet û şiyanên şiiriyên bilind e, lewre li cem xelkê xoştivî û bi rûmet e. Li ser vê çendê jî, Hemeseîd Hesen dibêje:" Bi dirêjiya salên heftê, netirstirîn, xoştivîtirîn û serkeftîtirîn helbestvanê kurd bû. Helbest keçek e zû xwe davêje himbêza wî, bi tenê awirekê lê bide, çi cihê bixwaze digel diçe. Gelek bi jîrî digel peyvê dilîze. Eger kurdan Şaril Budlêrek hebe, ew Letîf Helmet e."(6)

Bi rastî jî, ew çûye nav dil û derûna xelkê. Ev çende bi hêsanî nabe. Divê rewişt, jiyana wî ya rojane û helwêstên wî yên mirovane, ew gehandibe vê encamê. Nexwe çewan edîbek dikare hin xoştivî be. Li ser vê çendê, Ebdulrehman Zengene dibêje:" Di her peyveka

wî de, rastgoyî, dilsozî, derûnpakî, kurdperwerî û welatparêzî serhildidin û bê perde û perjan, hest û bîrên xwe derdibire. Lewre bê pesindan, Letîf Helmet, pêşengê karwanê helbesta nû ya salên 1970 ê ye ku, piştî wî yên Riwangeyî jî, ew şop girtin û ew rêbaz meşandin."(7)



*Letîf Helmet*

Bi dirêjiya van 26 salên borî, gelek lêkolîn û gotarên edebî, bi zimanên kurdî û biyanî, li ser helbestên wî hatine nivîsîn, lê mixabin ku, li vê xerîbiyê dest nakeyin. Yusif Heyderî di lêkolîneka xwe de, bi zimanê erebî dinivîse:" Letîf Helmet, diyardeka şiîrî ye û kaniyek e hişk nabe. Ew ji cîhaneka efrandinê pêkhatiye, cîhanek taybet û kûr. Ji bo ku mirov biçe nav vê cîhana rind û xweşik, pêdivî lêkolîneka berfireh û pirralî ye."(8)

Letîf Helmet, helbestvanek e bi doza gelê kurd û welatê xwe ve girêdayî ye. Nemaze texa hejar û bindest. Lewre jî, hêvênê pirraniya berhemên wî ku, çîrok û helbestan, ji bo zarok û mezinan dinivîse, li ser axîn, derd, xem, kovan, xewn û paşeroşa xelkê kurd û mirovatiyê pêk hatiye. Her çend carna li ser xemên xwe yên taybet û ruha xwe ya westiyayî jî divehîne, lê dîsan wan di nav xemên tevaya mirovan de, dihelîne. Ew nikare ji bin vê sîberê derkeve, çinku ew pirr bi mana peyvê mirov e... Ji bo serferazî û bextiyariya mirovan dijîtin. Nemaze mirovê kurd yê bindest, tepeser û ezyetdayî. Yê ku bi sedan sala ye, welatê wî wêran dibe û xwîna wî ya paqij dirijîte ser axa wî ya paqij. Belê; Letîf Helmet ji bo van dinivîse.

Hezaran sale, dijmin welatê wî wêran dike û ter û hişkî pêk ve dişewitîne. Ne bes vê, belku navên gund û bajaran diguherînin û şûnwarên welatê wî jî diherrifînin. Ew mirov e û rêza wî ji bo mirovatiyê heye, dixwaze gelê wî, mîna gişan jiyana xwe bi tenahî biborîne. Lê dijmin hemî riya li ber digirin û jiyanê lê dikine dozex. Lewre ew daxwaza mirovên bi bawer û netirs dike ku, beramber vê sitemê rawestin. Bi aştî û biratiyê, mafê netewê wî nadin, belku bi xebat, qurbanî û xweragirtinê ew têne wergirtin. Ew di vê helbesta xwe de, tif li vê aştiya derewîn dike.

Kanê Xalîlo? Li ber dergehê mezin
Bê tirs ji Mesîhî re bêje:
Incîla xwe bişewitîne.
Peyvên xwe di bin derya windabûnê de, kilît bike
Ey Pêxemberê aşitiyê
Leşkerê kêvjalên hov divê
Nexşê bajarê min biguherîne.
Navên kolanan û dengê bajarê min biguherîne.
Nav û nîşanên bajarê min bidize.
Min xoştivî xiste nav lepên xwe
Kete ber rimên wan!
Mirovatî kire lawkek ji bo wan
Kotira bi niklê xwe birî, ew jî kuşt wan.(9)

Ew berdewam hewar û gazî dike. Lê kes bersiva wî nade! Êdî ji diruşmên xapînokên mirovatiyê bêzar dibe. Bawerî bi biratiya saxte û aşitiya derewîn namîne. Çinku çi hêzên xêrxazên dinê di hewara gelê wî naên! Ew di binê bîrê de ye û kesê hay jê nîne. Belê; ma çewan ev hemî karesat û boblatên vî netewê hejar û bê xwedî, nagehin herçar aliyên dinê?! Ma dibe, mirov di dînekê pîroz de, bira û hevbîr be û paşî bi navê Xudê û wî ayînî, mirovê kurd bikujin û fetwayên qirrkirin û kafiriyê ji bo derxînin û encam bidin! Ma çira mirovatî çarekê ji vî gelî re nabîne? Erê; dema hemî dergeh bêne girtin û çi alîkarî jî nebe, hîngê mirovê kurd neçar dibe ku, bi çavekî din temaşay van diruşmên derewîn bike û li tolê bigere. Dema hêviyên wî didizin û jiyana gelê wî serûbin bikin û girrnijînê li ser lêvên zaroka bikujin. Êdî ew li riyên din digere û divê xwe biparêze. Lewre ew di vê helbesta xwe de, bi vî rengî digel dinê dipeyive.

Kê ev stirane ji bo min vegêra!?
Kê hetava xweziyên min, havête gewriya şêra!?
Pankart hemî derew in.
Civata Gelên Yekgirtî û serbestiya mirovî derew in.
Yasa... Wekhevî... Biratî...
Roşenbîrî... xwepêşandan... aştî...
Hemî piropaganda ne û derew in.
Dê vêca ey barûta tole û rastiyê
Di bahoza paytextê ronahiyeka nû de.

Tevan bipirtikîne,
Di wê xoştiviya têt û naêt de.[10]

Ew dixwaze xelkê kurd hişyar bike û ji wê sitem û ezyetê qurtal bike. Rê nîşanî wan dide û pîlan û nexşên dijminî aşkera dike. Digel hindê jî, helwêsta kesekî şoreşger werdigire û naxaze bibe lêbokê dîwanên axa û began û berevaniyê ji berjewendiyên wan yên genî bike. Lewre dema ew digel xelkê dipeyive, hîngê forma qisekirina Mesîhî bikar tîne û dibêje: " Ez ji we re dibêjim..." Lê pirr caran ew xwe mîna Mesîhekê kurd dibîne, xaça xwe bilind dike û dixaze gelê kurd yê bindest û perîşan, ji dest û pencên Hecacên çerxê bîstê rizgar bike. Lê ew metodên Mesîhî yên mirovane û şîretên wî pêşkêş nake. Belku bi metodên vî serdemê kujtin û vebirandinê, serdemê nemana aştî û biratiyê dixebite û xelkê kurd pal dide şoreş û serhildanê.

Min navê mîna parseka bikim û
Stirana ji bo axa bêjim.
Da min nekuje, da bihêle di koçka wî de bipeyivim.
Ez ji we re dibêjim: Pirr rengî, mikyac e.
Ez ji we re dibêjim: Biazirin...
Ji dij nexşe û bacê.
Yaxî bibin ji meydan û geracê.
Mirov mîna amîreta dikeve herracê.
Yaxî bibin ji satûra sor bûyî bi xwîna Helacî.
Yaxî bibin ... Yaxî bibin
Ji Xudayê vî bajarî, ji Hecacî. [11]

Ew di gelek helbestên xwe de, hewarên xwe digehîne Xudê û Pêxemberê wî. Xemên gelê kurd dike gelwaze û bi stûyê xwe yê zirav ve dike û ber bi dîwana Xudê diçe. Belê; ew ji bo rizgarkirina kurdan, hemî riya dişeqîne. Lê herdem dest vala û bê hêvî, vedigere welatê xwe yê wêran kirî! Ew pirr bi gewriya xwe hewar dike û serenca cîhanê radikêşe rewşa kembaxa gelê kurd. Ew li kesekî bi hêz û xwedan şiyanên mezin digere ku, derkeve û vê sitemê nehêle. Ew li benda Mihemedekî ye ku vî gelî bigehîne kenarê tenahî û xweşiyê. Ew li benda hêza Ebabîlekî ye ku, bêt û leşkerê dijminan bide ber kevirên Sicîl. Zîndan û girtîgehan biherrifîne û milê kurdan ji ber satûra dijminan xelas bike. Ew hewara xwe digehîne Pêxemberî û jê re xuya dike ku, çend car Kurdistan wêran kirîne, mizgeft û heta Qurana pîroza wî jî şewitandîne... Ew wê rewşê û azarên gelê kurd, bi eşkerayî di vê hel-



www.netewe.com

besta xwe de, destnîşan dike. Werin em bi hev re bixwînîn.

Min xoştivî nivîsî li ser keştiya xwe.
Nav û nîşan hêlan li ser gora xwe.
Ez im. Ez im
Di ferhenga hemî zimanan de, win im.
Taziyê ji bo yekem rojê dikim.
Ez digerim, li tevaya şkefta digerim.
Ger Mihemedî bibînim, dê jê re bêjim:
Çira Zulfeqar te xistiye destê dijminên Emar?
Dê jê pirsim: Çira dubare Ebabîl
Leşkerê Ebrehey nadene ber kevirên Sicîl?
Dê jê pirsim: Tu çi ji zîndna dizanî?
Bastîl. Bastîl.
Hezareha Nuqreselman.
Dê jê pirsim: Derbareyî sedan tawan.
Dê jê pirsim: Tu dizanî. Tu dizanî.
Çend car şewitandin Kurdistan!
Şewitandin, çend mizgeft û çend hezar Quran! (12)

Ew bi hemî bawerî û bûçûnên xwe ve, girêdayî texa bindest û hejare. Ew ne bes guh dide pirtûk û teoriyan, belku di piratîkê de jî, digel tepeser û rûtên welatê xwe ye. Ew baş agehdarî kawdanên hejara ye, çinku di jorên hotêlên here erzan de, bi tenê jiyaye û derdê feqîriyî û dûriyê kêşaye û dîtiye. Ew bihayê nanî dizane û dehan caran li kolanên xerîbiyê birçî û bê xwedî maye. Lê bi rastî helbestvanekî cergasin e û tirsê rê li ber xweragirtin û xebata wî negirtiye. Ji lewre jî pirr xweştiviye.

Ew mirovekî rastgo ye û xelkê naxapîne, anku ne her bi peyvê, belku bi karî jî, vê çendê nîşan dide. Werin em vê helbesta wî bixwînin, da ku bizanin ku heta çi pileyê digel xelkê xwe yê hejar daye û beşdarî xem, derd û xoşiyên wan dibe.

Hejarîno...
Ger we hest kir, dengê min yê we nîne.
Rengê min, yê we nîne.
Ger we hest kir, xema min ya we nîne.
Devê min yê we nîne.

Helbestên min bidirrînin.
Mîna peykerekî kirêt, min biherrifînin.
Ger we hest kir, mîna we ne birçî me.
Ger we hest kir, li dervey zinca we dijî me.
Ger we hest kir, burjuwazî me.
Navê min, mîna jenga parey birrenin
Ger we hest kir, mîna we zehmetkêş nînim.
Mîna hewe kaniya xem, jan û êşa nînim.
Ger we hest kir
Min di dilê xwe de bikujin
Bi hevokeka mezin binivîsin
Şairekê tirsinok û derewîn mir... (13)

Welat di nav xwîna wî de ye. Ew di eşqa wî de helyaye. Mezinan gotiye:" Şam şekir e, lê welat şirîntir e." Ji xwe eger welat ewqas xweşik, rind û dilveker nebe, kesê nikare qurbaniy ji bo bide. Mirovê bê welat, berze ye û çi bihayê xwe nîne. Heta niha bi sedan hezara, ji xort û kalên me, ji keç û dayikên me, di riya welatê dagîrkirî de, şehîd bûne û bi xwîna xwe ya paqij, dara azadiyê avdane. Helbestvan bi giyan û bîrên xwe ve, girêdayî doza welatê xwe ye. Xebat ji bo kiriye û çendîn cara jî, li ser hindê, toşî ezyet, giriftarî û derdeseriya bûye. Ew ji bo welat û gelê kurd bûye helbestvan û dinivîse, rûpelên dîwanên wî jî, bi xem, kovan û derdên welatî dixemlandîne.

Dema hatin, hizir kirin
Welatê min, pîrekeka rût e û dikarin bikirrin!
Digel xwe bibine avdestxanê.
Digel xwe bibin qehpexanê.
Hizir kirin, welatê min bi peran e.
Pîrekeka rût û ciwan e.
Şêt û şeyda ye ji bo gustîl û memikdanê.
Dê xapînin, dema du toqe û çend şeh danê.
Lê nizanin, welatê min, Ke'be ye
Bi hezaran nobedar yê li rex û çanê. (14)

Mirov helwêst e, lê dema di riya serferazî û serbilindiyê de be. Divê helwêsta mirovî, beramber doza adil û jiyana rojane, paqij û rasteqîne be. Ji xwe kesê bê helwêst, di nav civatê

de, bê biha ye. Bi taybet di nav rêzên gelê me de, helwêst mîna nan û avê pêwîst e. Çinku welatê me dagîrkiriye û em jî bindestîn. Ji bo bi cêanîna armancên pîroz, divê xebat bête kirin û xweragirtin jî pê re be. Nemaze di nav texa hişyar, bispor û zana de, çinku ew tex ji hemî çînên din, pêtir di rewşê digehe û dikare giriftariya şirove bike, pîlan û nexşên giring ji bo rizgarkirinê darêje. Helbet dema gelî, pêwîstî bi helwêstên şoreşgêrane hebe, hîngê kesên çeleng û tirsinok jî, xuya dibin. Di nav şoreşê de û di qonaxa rizgariya gelan de, bi sedan nivîskar û ronakbîr şehîd bûne û doza gelê xwe ber bi pêş de birine. Helbet di nav rêzên tevaya serhildan û şoreşên kurdî de jî, bi dehan kesên zana, nivîskar û jîr, xwe gorî axa pîroz kirine. Lê li aliyê din jî, bi sedan kesên tirsinok û xweperês jî hene ku, çi helwêstên şoreşgerane wernagirin û belku roleka pîs û nebaş dibînin. Hîngê bêguman dîroka gelan, rûpelên reş ji bo tirsinok û yarêngavê dinivîse û yên geş û zêrîn jî, ji bo welatparêz û şoreşgeran dixemlîne. Letîf Helmet, helbestvanekî xwedan helwêstên şoreşgêrane û bilind e û welatparêzekî jêhatî ye. Berhemên wî, vê rastiyê destnîşan dikin. Werin em vê helbesta wî bixwînin.

Şairokên tirsinok
Ey zelamên bê nav û lêbok
Hûnin. Hûnin
We helbest kirine nala hespê sultanî.
We da bi av, bi nanî.
We da bi maç, bi navranî.
Ey zelamên pîç...
Kê gote we, helbestê pêşkêş bikine
Şah û xelîfên xesandî?
Erê Şa pîroze yan pêlava hejarî ya dirrandî?
Ew dehola hûn lê dixin, wê kun bibe.
Wê rojek bê, koçk û kela hemî Şaha, kavil bibe.
Evca hîngê, kî dê ji bo helbestên we bikir bibe.
Ey zelamên bêrûmet û genî.
Ey şairên mîna solê, her li binî. (15)

Dijminan welat dagîrkirine û paşê parçe kirine. Bi vê çendê sinor di navbera dever û gundên Kurdistanê de çêkirîne. Rûbarek, çiyayek û carna baxçeyek, bûye du beş û her yek di bin kontrola dewletekê de maye. Bi vê pîlan û hovîtiyê, xelkê me ji hev dûr bûne. Dayik ji keçê, bab ji kurî û pismam ji dotmamê. Belê; nimonên vê rastiyê gelek in. Pirr caran li

gundekê kurdan yê sinorkirî, li wî alî keç bang dike û li vî alî dayik diqîrîne, pirsa kawdanên jiyana xwe dikin. Eve derdeke mezin e û dilê xelkê me dihelîne. Em di nav welatê xwe de, mêvanin û ji bo dîtina hev, divê paseportên me hebin! Dijmin riyên dîtinê jî, li me digirin. Letîf Helmet, di vê helbesta xwe ya bi navê (Amoza giyan)de, gelek zîrekane, çûye nav derûna pismam û dotmameke kurd ku, ji hev dûrin û nikarin bi dîtina hev şa bibin. Xuyaye ku pismam pêşmerge ye û dotmam jî li bajarî ye. Dijmin rê nadin û ew jî nikarin bi hêsanî hev bibînin. Stiraneka xweş peyv û xweş awaz bi vî navî, di folklora kurdî de heye û di nav xelkê de, pirr belav e. Lê wî zîrekane kariye sodê jê wergire. Ew biha û giringiyê dide folklora kurdî û di nav wê deryayê de, digere û dirr û mirariya jê dertîne. Ew dibêje:" Helbesta folkloriya kurdî, cîhaneka pirr e ji nûkirinê. Bi baweriya min, her helbestvanekî kurd, eger bi sedan tekstên helbestên folklorî, lawik û heyranan nexwîne, ew nikare bibe şaîrekî resen û nikare rêbaza xwe ya taybet peyda bike." (16)

Ev helbesteka pirr kûr û ji aliyê form û naverokê ve, serketî û lihevhatiye. Musîka wê jî, dilê xwendevanî xweş dike. Werin da em bi hev re bixwînîn.

Tu dûrî û rê jî dûr e dotmamê.
Hezareha çetên birçî,
Di navbera me de, sinor e dotmamê.
Eger destê min negehe te
Eger mêtina maça min negehe te
Eger çûka helbesta min, negehe te
Li min bibore...
Rê dûr e dotmamê...
Eger devê xwe dirêjî yê te bikim, dê qetînin.
Eger tiliya xwe dirêjî porê te bikim,
Dê şewitînin.
Eger nama şairekê dûre bajar
Bigehe nav sinorên bajarî
Ne bes namê, belku posteçî jî dihincinînin...

Ez têhniyê te me, ya biyaban yê avê ye, dotmamê.
Ez şeydayê te me, ya bajar yê hetavê ye, dotmamê.
Ez di xew de tê me cem te
Bêy ku te hişyar bikim
Herdu lamên te diramosim

Asoya devê te, tijî helbest û stiran dikim.
Digel elindê peyva nameka bê nav
Li memkên te direşînim, mîna gulav.(17)

Dijminî hemî dergehên bajarvaniyê li ber gelê kurd girtine. Ne rê didin xelkê me zimanê xwe biparêze û ne jî fêr bibin. Belku dixazin gelê me di nav xwe de bihelînin û dîroka me jî binax bikin. Belê; dijmin ji ziman û zanînê ditirsin û hezaran nobedar û kirêgirteya li pey peyva kurdî rêz dikin. Li Tirkiyeyê sizayî jî didine wî kesê bi peyva kurdî biaxêve! Ew dizanin hêza peyvê çende û rola wê çend giring e. Lewre li hinedek deverên Kurdistanê zimanê kurdî qedexe ye, lê li cihên ku serbest bûye, ew bi xwîna hezaran şehîda geşbûye û pişta dijminan çemandiye. Eger bikarin û rê bibînin, wê li tevaya welatî qedexekin. Werin da ku van peyvên wî yên agirîn bixwînîn.

Dema şairek temaşay kaxezekê dike
Tevaya dijminî wî cihî dûrpêç dike.
Li bin gişt kevir û dara
Xwe diveşêrin weke mara
Dibe ji hindê bitirsin.
Şairê hejar tevaya peyva,
Li wan bike dijmin.
Dibe ji hindê bitirsin. (18)

Gelê kurd ji neçarî dest daye tivengê û şerê rizgariyê dike. Çinku hemû rê lê girtine û ji bo ku xwe ji vebirandinê biparêze, ew toşî şerî bûye. Her wesa ji her alî dijminan dûrpêç kiriye û bêhna wî çik kiriye. Welat wêran kirinê, mirov bi saxî veşartine, zik li jinên aviz peqandîne, gundiyên hejar di şkefta ve şewitandîne û gel bi giştî dane ber hêrişa çekên kîmyawî û qirrkirinê. Belê; dema ev hemî tadaye û ezyete hebe û mirovatî û wîcdan jî nemîne, hîngê ev gelê tepeser, hewara xwe bigehîne kê? Ew ji berevaniyê zêdetir, çi riya nabîne û ji lewre bi xebateka gerim û bê rawestan, mana xwe diparêze. Ew xuya dike ku aşit û biratî bi çekî peyda dibe. Ji Îsa pêxember re dibêje: Ev e ne demê diruşmên te ye. Here ji dîrokê derkeve. Yê me bikuje, divê tola xwe vekîn. Yê didanekê me bişkêne, em dê serê wî herrişînin!

Ji hezretî Îsa re bêjin:
Ger birîna zarokê vî bajarî bibînî.

Çewa dipêçe û dibore, bê kerb û kînî.
Hêşta cihê bizmarê zordaran
Di lepî de diyare.
Lew hewar e.
Ji hezretî Îsa re bêjin:
Ger bizanî zordarên vî çerxî
Çewa zarokan dikujin, mîna mêş, kulî û berxî.
Dê Incîlê şewitînî,
Hewarkî û êye vî rexî.
Yê zilehekê li te xîne
Dê deye ber şêlka gulla û tolê derxî... (19)

Karesat û boblatên mezin hatine serê gelê kurd û heta niha jî, bi sedan xelkê me bi destên dijminan têne kuştin. Welat dişewite û her çi karên hov hene, beramber me têne kirin. Gelê ji bo rizgar kirina nîştimanê xwe xebatê bike, bêguman wê şehîdan jî bide. Her çend hizrên cuda û şerenîxa texeyî, di nav tevaya gelên dinê de hebûne û niha jî hene, lê mixabin ku, di nav gelê kurd de, ev nakokî û giriftarî, mezin bûne û şerê birakujiyê birînên kûr di dilê xelkê me de çê kirine. Her çend serokên kurda û hêzên siyasî jî, dizanin ku ev şere, xizmetê nake û ziyanên mezin digehîne doza pîroza kurdî, lê hezar heyf û mixabin ku, dest jê bernadin û bi riyên biratî û aşitiyê, giriftariyên xwe çareser nakin. Belê; vî şerî dilê xelkê me heland û omêdên paşerojê jî binax kirin. Ev şere bû sedemê peydabûna xem, azar û birînên kûr. Di vî demî de ku, dijmin bi pîlan û nexşên xwe yên kirêt û çepel, rê li serketina gelê kurd digirin, li vî al, hêzên kurdî bi xwe jî, dibine kosp û asteng di riya serferazî û serbilindiya xelkê me de. Eger mirov bi hezaran rûpelan reş bike û binivîse, hêşta nikare rewşa kembaxa vî şerê birakujiyê salox bide. Ev e şerê wêrankirin û şewitandina Kurdistanê ye. Şerê paşveman û binketina gelê kurde. Şerek e ku serketin tê de nîne. Şerek e ku doza kurdî çendîn sala paş ve dibe û li tariyê dihelîne. Şerek e ku divê her welatparêzekî kurd li dij be û li riyên çareserkirinê bigere. Belê; bi dehan nivîskar, ronakbîr, zana, bispor û dostên gelê kurd jî li dij dinivîsin û hêştan ne rawestaye. Letîf Helmet, bi ruheka kurdekê paqij, xemxor û welatparêzekî hişyar, vê helbesta dilşewat divehîne. Rewşa gelê kurd û encamên vî şerî destnîşan dike. Ez helbesta wî ya bi navê (Nameyeka vekirî di pêşwaziya sala 1996 ) an de, şirove nakim, çinku peyv bi xwe hewar dikin û laneta li vî şerê xwekuştinê dikin.

Ev e rojeka nû li ser kopê Gilezerdî

Hêlînekê ava dike ji xwe re.
Bi xêr hatî ey sala nû
Me çi nîne pêşkêş bikin ji te re.
Ji bilî rondik û xewnan.
Ev e derbeder li benda te ne dîsan.
Tu wan dinasî?
" Derbeder ji dûr ve diyar in
Rût in... Birçî ne... Xembar in."

Bi xêr hatî ey sala nû
Çi di torkê te de ye, te çi anî?
Gulegnim û aştî, gulenêrgiz û biranî.
Yan jî kelex, xwîn û malwêranî?
Ey sala nû
Tu mîna sala bûrî neke
Sala bûrî dilreq bû.
Tewalên ser cadan koçber kirin û her rev bû.
Kotira girrnijîn û aşitiyê, nêçîra çifta bû.
Kurdistan.
Kire Mergistan.
Em hemî ji bo pêşwaziya te hatin û me hêviye.
Her çend em destvala ne, lê dilê me pirr xweştiviye.
Me gul divên, neku gulle.
Me nan divê, neku rondik.
Me kar divê, neku sitem û hutik.
Me girrnijîn divê, neku peyvên rengîn.
Me aştî divê, neku şerê birakujiyê û xwîn.
Tirsinok in yên beşdarî şerê birakujiyê dibin...
Qareman in yên aşitiya navxwe dirust dikin...! (20)

Ew pirr bi rewşa aloz û dilşewata gelê kurd diêşe. Nemaze dema dibîne parçekirî û ji hevketî. Dijmin cudayiya dixine nav rêzên kurda û pîlanên çepel dadinên. Dibîne ku rijêmên dagîrkerên Kurdistanê, bi tevayî xwe dikine yekdest ji bo nehêlna gelê kurd. Bi dirêjiya çendîn sala Îraq û Îran şerekî wêrankirinê digel hev dikin û herdu welat diêne şewitandin û bi milyonan xelkê wan jî diêne kuştin, girifrariyên wan dîrokî ne û dijminatiya

wan ya berî sedan salaye jî, lê bibînin... Ay Xudêwo! Dema rewşa kurda baş dibe û xwe nêzîkî rizgar kirinê dikin, tevaya dijminên hev yên duhî, dibine dostên sitratîcî û li dijî netewê kurd şerî dikin û pîlanên qirrkirinê dadirêjin. Eve di navbera herçar rijêmên hov de, ku hemû dijminên hev in û li dij kurda dibine dost û bira! Eve hemî ji aliyekê, lê li aliyê din karesata here mezin dest pê dikin! Xelkê me nabine yek û her ji hev cuda ne! Giriftariyên xwe yên berwext nakine di xizmeta doza pîroza kurdî de. Mixabin ku heta niha jî nikarîne bi yekdil û yekdest li dijî dijminên xwe xebatê pêş de bibin! Her hêzek bi tenê be, hîngê dijmin dikare bi hêsanî ji nav bibe û bixapîne jî. Lê eger hemî xwe bikin yek, hîngê şkestina wan zehmet e û serkeftin nêzîk dibe. Letîf Helmet, pirr bi vê giriftariyê ve mijûle û rewş dilê wî dixwe. Lewre ew ji dil li dij hevqetandina gelê kurd e û daxaza yekgirtinê dike. Belê; yekgirtin serketin e. Yekgirtin azadî û rizgariyê tîne. Ew di helbesteke xwe de, bi vî rengê jêr, yekgirtinê destnîşan dike.

Tevaya peyvan civiyan
Bûne dirêjtirîn helbest û stiran.
Tevaya şemalkan civiyan
Bûne hetaveka geş û rûn.
Tevaya ava yekgirtin
Bûne mezintirîn lihî û avrabûn.
Bûne darek... Tevaya darên daristanê.
Bi hêztirîn bivir şkand li meydanê! (21)

Jin di gelek helbestên wî de, cihekî giring distîne. Ew di çendîn helbestên xwe de, wesan dide xuya kirin ku, çi keçik xwe nahavêne himbêza wî. Dibe ji lawazî, feqîrî û hejariya wî be. Ew xwe bêşiyan û bêhêz beramber jinê û ciwaniya wê dibîne. Eger we nebe, pa çira keçik wî nakine kilê çavên xwe û nakin ristikên rengîn, bejin û stûyên xwe pê naxemlînin!. Çira li govendan destên wî naşidînin û li sererêkan jî, awirên evîniyê lê reşînin!? Ew riyeka din ji bo himbêzkirinê dibîne û carna xwe dike mêvanê xewnên wan û carna jî, keçikên şeng û xweşik, radikêşe cîhana xewnên hingivîniyên xwe. Ew nikarin xwe ji xewnên wî rizgar bikin.

Ger di xewê de şairek hat
Viya te himbêz bike.
Viya bi zûrê te maçî bike.
Ger di xew de şairek hat

Viya te birevîne, bibe ji xwe re.
Ew ez im...
Bes di xew de dikarim rûnim bi te re. (22)

Ew xwedan hesteke nazik û derûneke paqij e. Ew bi wê bejna xwe ya kinik û porê xwe yê qijavij, lê bi cergê şêra û bi dilekî mezin û pirr evîndarî û dilovanî, herdu destên xwe ji bo keçekê vedike. Ew bi dirêjiya şevan û rojên bêkariyê, li benda keçên rind û xweşik dimîne, lê kes di tan û hewarê naêtin! Belê; ew di vê cîhana berfireh de, xwe bi tenê dibîne. Hinde caran bi xerîbiya xwe digehe pileya namobûnê.

Ax dema carna di jora xwe ya wek qefesa de
Ez xwe divenisînim û digivêşme serêk
Ez hez dikim
Dilê xwe mîna parçeka goştê gehî.
Bavême ber pisîka birçiya pişt dergehî.
Bila êdî stirana nelûrîne bo keçekê.
Ku di dilî de nabe cihê şairekî ...! (23)

Lê jin, ne her bokeşûşeyeke û ji bo ciwanî û rindiyê peyda bûye. Belku; ew jî mirov e. Xwîşka hêja ye, dosta xebatê ye û dayika dilovan e. Lewre jin, dayika Letîf Helmetî, pirr aliyên jiyana wî dagîr dike, nemaze dema li pêş çavên wî dişewite û nikare rizgar bike. Ew birîn kûr e û naête jibîr kirin. Ew evîndarê diya xwe ye û ji lewre jî pirr rêz û bihayî dide jinê bi giştî. Ji aliyê din ve, dayik jî hemî hêza xwe dide zarokan û xwe dişewitîne da ku ronahiyê bide wan. Çinku Letîfî baweriyeka mezin bi musilmanetiyê heye û ayîn jî, roleke giring dide dayê, nemaze dema Mihemed pêxember bi xwe, pesnê dayikê dide û dibêje: " Dayik sê pile û derecan li pêş babêye." Ji lewre ew di çendîn helbestên xwe de, basî xweşikî, nazikî, dilfirehî, dilovanî û hêjayiya dayika xwe dike. Ew axîn û nalînên kûr ji bo diya xwe radihêle. Werin em vê helbesta wî ya dilşewat bi navê (Mezintirîn Birîn) bixwînin.

Dema diya min mir.
Ne stêr ji esmanî rijyan,
Ne masiya koç kir!
Dema diya min mir.
Ne rondikek ji çavê esmanî der bû!
Ne tewalek di xemê wer bû!

Dema diya min mir.
Erd her wek xwe bû
Lê di nav dilê min de
Dergehê kûrtirîn birînê vebû.
Ay yadê, dûriya te pirr giran e.
Dûriya te, ne qirrqiçîna têhnê ye
Ne zîzbûn û dilmayîna dezgirtiyê ye
Ay dayê
Dibême şekroka, şekrok
Dibême birînê, birîn
Dibême gulê jî, gul
Lêbelê dayê
Êdî heta hetayê.
Bêjime kê dayê...? (24)

Ew di gelek helbestên xwe de, naverokê dubare dike û formê jî lawaz û sist dike. Hinde caran mîna suhbeteke sade dinivîse û çi tam û çêja helbestê namîne, wek :

Berî çend saleka
Ez û çend hevalên xwe
Li ber dergehê tecnîda bajarî
Çaverêy hindê bûyn
Ku me bo serbaziyê bibin. (25)

Letîf Helmet, bêguman helbestvanekî bi nav û deng e û xwedan behre (mewhîbe), taqet û şiyanên edebiyên bilind e. Berhemên wî ji aliyê form û naverokê ve serketîne. Teknîka nû bikar tîne û jîrane bi peyvê dilîze, bê ku mebesta xwe berze bike. Di nav xelkê de jî pirr xoştivî û hêja ye. Bi zimanekê şiiriyê resen, sivik û rewan dinivîse. Helbestên wî ji wênên şiîrî mişt in û hevokên wî jî ciwan darêjtîn e, musîka wan mirovî dihejînin. Ew zû mebestên xwe digehîne xwendevanî û dilê wî xweş dike û tesîrê li ser dihêle. Şairê ereb Ebdulwehab El Beyatî, di helbesteka xwe de, dinivîse:

Mîhracay gote Xalibî
Te çi di gustîla xwe de veşartiye:
Dilopeka jehrê

Laneta evînê
Yan jî zeriyeka xweşik
Bi xemgînî lê vegêra:
Helbestên xwe û xemên hejaran [26]

Belê; di gustîla Helmetî de jî, bi tenê helbest, xem û kovanên hejaran hene, ne ku jehir û pîlanên genî û saxte. Ew ji bo texa bindest û tepeseran dinivîse û xwe li ber tevaya lihî û nexweşiyan jî radigire, ta ku doza wan ber bi pêş de bibe û keştiya xwe bigehîne kenarê tenahî û serferaziyê.

( Letîf Helmet, di sala 1947 an de, li bajarê Kifrî, ser bi parêzgeha Kerkûkê, ji dayik bûye. Di sala 1963 an de, dest bi nivîsîna helbestan kiriye û di rojname û kovarên kurdî de belav kirine.)[27] Helbestên wî hatine wergerandinî çendîn zimanên biyanî. Ev helbestên ku min di vê lêkolînê de, bi kar anîne, ji dîwanên wî, tîpên erebî û ji kurmanciya jêrî (soranî) wergerandine kurmanciya jorî. Mebesta min ew e ku, berhem û cîhana hunermendiya wî, bigehînime tevaya kurdên parçên Kurdistana dagîrkirî. Hêvîdar im pirtûkxana kurmancî bi vî lêkolînê dewlemend bibe.

Heta niha wî ev pirtûkên jêrî çap kirine:
1. Xiwa û şare biçkolekeman. Helbest 1970.
2. Amadebûn bo le dayikbûnêkîtir. Helbest 1973.
3. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Helbest 1977.
4. Gerdelûlî spî. Helbest 1978.
5. Ciwantirîn dê. Helbest ji bo zarokan.
6. Ew namaney ke daykim nayanxwênîtewe. Helbest 1979.
7. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê. Helbest 1979.
8. Wişey ciwan gule gul. Helbest.
9. Deng xoştirîn mel. Helbest ji bo zarokan.
10. Felestîn hemîşe nîştimanî Xesan Kenefani ye. Helbest.
11. Sirudî hejaran. Helbest 1983.
12. Hêlaneyêkîtir. Helbest û çîrok ji bo zarokan, 1989.
13. Em rûbare wişk nakat. Helbest 1991.

*Helac: Sofiyekî bi nav û deng bû li Bexdayê. Di dema Ebasiyan de, ji ber bîr û bawerên xwe, pirr bi kirêtî û namerdî kuştin. Dest û pên wî birrîn û bi darê ve helawîstin, paşî sotin û xweliya wî havêtine nav çemê Dîcley, ji bo ku wî çi gor nebin û rojekê nebe cihê seredan û tewafa mirîdên wî.

*Hecac: Hakim û hovekê serdema Emewiya bû li Kofe, Îraqê. Sitemeka mezin li ser musilmanên ne li gor baweriyên wî û bêgunehan dikir.

* Di soreta Elfîl ya Qurana pîroz de heye ku, Xudê tewalên Ebabîl hinartine ser leşkerê Ebrehey û şkand.

* Emar kurê Yasirî: Hevalekî Pêxemberî bû. Dijminên musilmanan li ber çavên wî dayik û babê wî kuştin.

*Ebabîl: Teyr bûn û her yekê sê ber li kafiran direşandin û hemî paş de birin.

* Sicîl: Ber bûn yan jî heriya hişkkirî bû.

* Ebrehe: Melikê Yemenê bû.

* Nuqreselman: Zîndaneka bi nav û deng bû li biyabana jêrî Îraqê.

## ÇAVKANÎ:


1. Bedel Revo Mizûrî. Sînahiyên çiyayî, Bexda 1989, rûp 7.
2. Kemal Mîrawdelî. Rojnama Hetaw, hejmar 4 û 5 , Lenden 1996, rûp 4.
3. Ferhad Şakelî. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
4. Xelîl Duhokî. Kovara Nûdem, hejmar 18, rûp 66.
5. Refîq Sabir. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
6. Hemeseîd Hesen. Goraniye balnekirawekan, Swêd 1994, rûp 135.
7. Ebdulrehman Zengene. Di nameka xwe de, ku ji bo min hinartiye.
8. Yusif Heyderî. Rûpelên rengîn ji edebê kurdî, Bexda 1991, rûp 118.
9. Amadebûn bo le dayikbûnêkîtir. Dîwana helbestan, Silêmanî 1973, rûp 7.
10. Her ew çavkanî, rûp 14.
11. Her ew çavkanî, rûp 18.
12. Her ew çavkanî, rûp 26- 27.
13. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Dîwana helbestan, Silêmanî 1977, rûp 30.
14. Her ew çavkanî, rûp 81.
15. Her ew çavkanî, rûp 99.
16. Kovara Xermane, hejmar 9 û 10, Swêd 1993, rûp 17 - 18.
17. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Dîwana helbestan, Silêmanî 1977, rûp134-140, 145.
18. Em rûbare wişk nakat. Dîwana helbestan, Bexda 1991, rûp 9.
19. Her ew çavkanî, rûp 30 - 31.
20. Kovara Dengê Melbendî, hejmar 1, Emerîka 1996, rûp 29 - 30.
21. Sirudî hejaran. Dîwana helbestan, Bexda 1983, rûp 35.
22. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Dîwana helbestan, Silêmanî 1977, rûp 6.
23. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê. Dîwana helbestan, Bexda 1979, rûp 9.
24. Pirçî ew kiçe reşmalî germiyan û kwêstanim e. Dîwana helbestan, Silêmanî 1977, rûp 22 - 23.
25. Ew honraweyey ke tewaw debê û tewaw nabê. Dîwana helbestan, Bexda 1979, rûp 87.
26. Kovara El Hewadis ya erebî, hejmar 2051, sal 1996, rûp 54.
27. Kemal Mîrawdelî. Rojnama Hetaw, hejmar 4 û 5 , London 1996, rûp 4.

# Edebiyat: Xemila zimani

*Rojan Hazim*

Wekî her tişti, ziman jî xwudan xemil e. Hem jî xemileke tîr û tijî. Ma çi heye bê xemil... Wekî pêşîya gotî, her di serî da; "biçûk xemila malan in". Yêkê jî em lê zêde bikin; zerîyên bejin zirav çawa dibin xemila ber dilên xortên çeleng; anjî xort û ciwanên çeleng û jêhatî, çawa dibin xemila ber dilên zerîyên sipehî, bejin zirav û narîn... Vêca xemil, li her tiştî û kesan têt û herweha bi naverok û manaya xwe ve jî, bêjeyeke fireh, têr û tijî ye. Gelek tişta rave dike. Di serî da xweza bi xwe xemil e. Belêm tiştên ku xwezayê dixemilînin jî hene. Bigiyan û bêgiyanên cihanê digel reng û rûyên xwe yên cuda, xemileke şirîn û balkêş didine xwezayê... Demên salê her wisa: Bihar, havîn, payîz anjî zivistanek, her yêk bi serê xwe ma ne xemilên xwezayê ne... Ji xwe xemilên xwezayê yên harmonîk, bi serê xwe abîde ne... Gewrîyeke deryayê, çawa reşahîyê dike du beş û xemileke neditî peyda dike di navbeyna reşahîyê û avê da. Herwisa sulaveke boş, wekî ji bilindahîya çiya anjî beteneke têr dar û şînkatî vedirese û bi hêla sîpekê dirije xwarê û li jêr gereke bi pêl û kef pêktîne ku, mirov heyranî wê tabloyê dibe û ji bînerîya wê têr nabe. Dîsa wekî Ava Zê û Gelîyê Şine, di nîveka dilê welati da digihine yêk û herwekî evîndarên sedsalan xwe diavêjin ser û stuyê yêk, bi serê xwe xemileke neditî pêktînin. Ew xemila li wî gelîyê asê û kur pêkhatî, destaneke evînîyê ye ku bibe şahesereke edebî. An piştî tevîbarenekê, wekî buka baranê anjî

heftreng, kivanekî rengîn çêdike li esmani, ku adeta hesuya reşahîyê û banê esmani pêkve girêdide, çawa tabloyeke nexşîn derdiêxe meydanê û dibe xemila demekî kurt, ku li ser stran û lawje hatine gotin. Bi kurtî xemil, ne ji ber dilê mirovan, ne jî ji sing û berê xwezayê kêm nabe. Cihan û jiyan bê xemil nabe. Û helbet manaya xemilê relatîv e û li goreyî her kesê û her tiştî mana û girîngîyeke cuda dide.

## Xemila ber çava

Tiştekî bi giştî mirov dikare bêje ku xemil; reng û rûyekî geş dide jiyanê, monotonîya jiyanê belav dike, tameke şirîn û estetîkê dide jiyanê, kirêtîyên jiyanê vedirevîne, delalî û nazdarîyekê dibişkivîne. Heke li ser alîyê mirovi yê berçav bête hizirîn; bejin û baleke narîn, şêleke balkêş û sipehî, bisk û kezî, rih û simbêl, pora dirêj anjî kurt, guhên bi guhark anjî kepîyê bi xezêm, rû û bedena gulavkirî û gelek sipehîtîyên dî çawa mirovi dixemilînin. Wekî gerdeneke sipî anjî reş û esmer, bi ristikên zîv û zêrîn anjî bi mirarî û berên dî yên biqîmet; anjî tilîyên bi gustîlkên xelek û biqaş û pêyên bi xirxalan ve hatine xemilandin... Mirov, wekî jîndeyê herî bedew û biaqil, bi cilik û aksesuarên rengareng xwe dixemilîne, jiyanê ji alîyê estetîkê ve delal û balkêş dike. Di xemilandina vi rûyê mirovi da heyîtî anjî neyîtî ne hind girîng e. Her mirovek; heyî anjî neyî, gelek tiştan li xwe tîne. Jineke hejare belengaz, berikekî biçûkî delal yê ku li ber çemekê anjî pesarekê dîtî, bi wan destên xwe yên wekî pencê şêrê, direne, hilu dike, şiklekî xweşik didetê, kun dike û dike qulpika ber êlekê xwe. Eve hem hewcetîyeke bo wê, belêm herweha jî aksesuareke li ber bedena wê ya zirav û tenik. Şivan, gava dest bi karê xwe dike, her di serî da bazara kepeneyekî nexşîn dike. Jin anjî mêrekî heyî jî, cilik û aksesuarên cuda û rengîn li xwe dike û xwe pê dixemilîne. Rûbalgeh û perdeyên dantelkirî û bi motîfên "şahmeran" û gelek delalîyên dî ve hatine nexşandin; berik, mêzer û mehfurên bi desenên rengareng hatine raçandin, çawa odeyên gundîya; û digel dekorên klasîk û modern, tabloyên bijare çawa odeyên bajêrîyan dixemilînin... Eve hemû xemil û tarzê mirovan in. Helbet divê bête gotin ku; manaya xemilê di çarçoveya herî fireh ya sipehîtî, delalî û bedewîyê da bi kar têt. Mirov nikare manaya xemilê, tinê bi manaya aksesuarê ve teng bigire. Li vê derê jî mexsed manaya fireh e û dê bi sipehîtî û delalîya zimani ve bête girêdan.

## Xemila bingehîn

Mirov herweha cihana xwe ya navînî, hiş û bîra xwe, dil û mejîyê xwe jî dixemilîne. Xemila navînî, ya bingehîn e û eve xemila xwezayî ye. Ji xwe xemila derveyî li ser xemila navînî reng digre. Delalîya cihana navînî xwe di cihana derveyî da jî nîşan dide. Mirovê dil û mejîyê xwe bi başî, qencî û bi giştî giyanhezîyê ve xemilandî, vê delalî û

www.netewe.com

paqijîya xwe, di danûstandina xwe ya derve da bi nermî, dilnizmî, qencî û kubarîyeke bi xwe bawer dide xuya kirin. Mirovê ji xemila mejî, dil û navînî î dûr û xilas, î dilreş e. Dilê bixemil, dilekî nazik û nazdar e û bi rû û rûmet e. Bi giştî î giyan hez e. Ma evînî bi serê xwe ne xemila dilê mirov e... Mirov, cihana xwe ya navînî, bi zanînê û hûbûnê têr û tijî dike. Eve bi xwandinê dibe, bi geryanê dibe, bi guhdarkirinê dibe, bi dîtinê dibe û gelek awayên dî...

Di xemilandina cihana navînî da heke mirov bêje ku xwarineka bingehîn edebiyat e, di cih da ye. Helbet edebiyat mijareke fireh e. Gelek bask hene di edebiyatê da. Ji helbestê bigrin heta çîrok, serpêhatî, roman, helbest û destanê, di çarçoveyeke mezin da tête rave kirin. Kesê anjî kesa bi van baskên edebiyatê mijul dibe û xwe pê têr dike; xewn û xiyala xwe, his û xwezîya xwe, bawerî, dîtin û rave kirina xwe ya li ser xweza, mirov, civat û gelek tiştên dî tîne ziman û demê vê afiranderîyê dike, zanîna xwe digel zimanê edebî hevîr dike û vî berê xwe, bi gelek awayên nivîsînê dixemilîne û dide derve.

## Edebiyat xemil e

Mirov dikare bêje ku her baskê edebiyatê, hiş û bîreke saxlem û taze û digel vê jî, his û evînîyeke paqij û bijun dide mirovi û humanîzmeke xurt peyda dike di dilê mirovi da. Eve xemila herî tîr û tijî ye, ku edebiyat derzîyî xwuna mirovi dike. Eve herweha xurtîya edebiyatê ye jî. Lewma edebiyat li ser her axê şîn dibe. Axeke kêm av jî be, edebiyat reyên xwe di nav axê da bi firehî û kurahî belav dike û rêyên jiyanê û xwarinekê peyda dike. Cihê xwandin lê nebe li ser ziman e û jiber e. Xwandin hebe li ser kaxezê ye. Bi çu awayi xwe namirîne, rê nade ku av ji ser çik be û hergav coyên jiyanê çêdike û xwe dide jiyandin. Ev berxwedanîya edebiyatê, bi serê xwe destanek e.

Berxwedanîya edebiyatê helbet ji ziman têt. Ziman û edebiyat adeta wekî nunik û goşt in. Pêk ve risyayî ne. Xwunê didine yêk. Di nav wan da sirkulasyona jiyanê heye. Pêk ve dijîn. Yêk bêyî yêkê nabe. Li vê derê elementê bingehîn helbet ziman e. Belêm zimanekî bê edebiyat î mirî ye. Edebiyat giyanê dide zimani. Îro di cihanê da gelek ziman hene ku êdî di nav rûpelên dîrokê da mane. Li ser bereferşa mane. Ev rewşa dîrokî, girîngîya edebiyatê dide kivş kirin. Herweha gelek ziman jî hene ku jar û lawaz mane. Îro li gelek alîyên cihanê, ziman hene ku tinê li nav êl anjî eşîrekê têne axivtin. Ev paşdamayîne helbet ne guneha wan zimanan e, belêm îro êdî realîteyek e. Ji ber ku ji alîyê edebiyatê ve nehatine têr kirin û ji vî kanalê bi bereket xwun newergirtine. Li alîyê dî; zimanê ku digel edebiyata devkî, edebiyata xwe ya nivîskî jî neafirîne û pêşve nebe û herweha ji wî kanalê bi bereket xwunê newergire, neşêt li ser pêya bimîne û jiyana xwe bidomîne.

Ji bo vê yêkê li nimûneyên derve geryan ne hewce ye. Nimûneya mezin zimanê me

bi xwe ye. Zimanê me bi edebiyata xwe li ber xwe da. Bi çîroka, serpêhatîya, bi destan û strana, bi lorîyên şîn û şahîya xwe têr kir, bi hêz kir û reyên xwe di nav axeke bi bereket da belav kirin. Em zirbîna xwe bidine ser duhîya zimanê xwe û paşê jî berê xwe bidin îro. Çend sedsal hatine wergêrandin li ser jiyanê. Cografyaya ku gelê me têda dijî, ji kurahîya sedsalan heta îro bûye meydana cengê.

Şerên heq û neheq li ser vê axa bi bereket hatine kirin. Li xwarêya Mezopotamyayê îro gelek xelkên qedîm nemane, hem zimanê wan, hem kultur û edebiyata wan hatiye birandin û helandin. Belêm gelê me bi zimanê xwe berxwedaneke efsanewî nîşan daye, xêr û xweşîya xwe, şîn û şahîya xwe, ken û girîya xwe, timamî jiyana xwe car kirîye lorî û stran, car kirîye helbest û destan û car jî kirîye çîrok, serpêhatî û roman. Bi hemû baskên edebiyatê ve, berxwe daye û di vê rikeberîyê da serketîye. Co û cobarên edebiyatê kirine çem, ew çem furhandine, pêlên mezin rakirine û deryayeke edebiyatê afirandiye. Nifşê îro heke bi serbilindî behsê zengînîya edebiyata xwe bike î heq e. Kêm xelk hene di cihanê da ku hinde şer û bela bi seri da bên, bi zanahî bête birandin û helandin, belêm dîsa çik li ser pêya bimîne. Ev li ser pêya mana gelê me helbet ne bi tinê bi şerê edebiyatê bûye. Gelek elementên dî yên girîng jî bûyne stun ku ev gele li ser pêya bimîne. Belêm dîsa ve heke mirov bi çavekî objektiv li rewş û serpêhatîya gelê xwe binêre, hingê girîngîya her cure baskên edebiyatê dibîne. Gelê me çi bi seri da hatibe kirîye stran, kilam, lorî, helbest, destan, çîrok, serpêhatî û roman. Di nav van baskên edebiyatê da taybetî destan adeta bûye bang û gazîya hebûna gel. Çîrok û serpêhatîyan, şano û kilamên koçik û dîwana, şevên dirêje zivistana xweş û geş kirine. Strana, ken û şahî daye xelkê. Dîsa kêm xelk hene li cihanê ku xezîna edebiyata wan bi tinê bi awayê jiberî û devkî dom bike û ji nav sedsala biparzine û di vê prosesê da hem xwe nû bike, hem jî zengîntir bike û bigihe heta îro. Heta ku zimanê nivîskî peyda bûyî, gelê me bi vê jîrîya xwe ya jiber kirin û gotina devkî hem xwe îfade kirîye, hem jî zimanê xwe parastîye û digel vê berxwedanê edebiyatek jî afirandîye. Ev edebiyate, her ji duhî bigrin heta îro jî bûye hawar, bang û gazîya gel û welatê me.

Eşîr bi şer çûne; li ser vê an stran û kilamek, anjî lorî û serpêhatîyek hatîye gotin û eve ketîye ser devê xelkê û belav bûye. Eşq û evînîyek bûye; helbest û destanek li ser hatîye gotin ku nehatîye ji bîr kirin û pêlên deryayî rakirine. Dahwetek, anjî xêr û şahîyek bûye; stranên folklorîk hatine afirandin, ku ev heyecane furhaye ser sedsalan û gihiştîye îro. Berxwedaneke dijî dagîrkeran bûye; bûye destan, serpêhatî û roman. Nazdarê, anjî nazdara ber dilê yêkê mirîye; lorîyên şînê hatine gotin. Egîdîyek bûye li ser bûyerekê; bûye stran ku bi sedan sala ajotiye û gelek nimûneyên dî.

Lewma edebiyat, çeperekî xurt yê berxwedana hebûn û jiyana xelkekê û zimanê

wî ye. Heta mirov dikare bêje ku çeperekî herî xurt û girîng. Û ev xurtîya edebiyatê ye ku, hem giyan daye zimani, hem jî bûye xemila zimani.

## Danûstandina zimani û edebiyatê

Wekî me goti, ziman û edebiyat pêkve girêdayî ne. Yêk bêyî yêkê nabe. Belêm ev danûstandine li ser zemînekî biber dom dike. Alîyek aktîv yê dî pasîv nîn e. Herdu alî jî aktîv in. Bo edebiyatê di serî da helbet divê ziman hebe. Belêm edebiyat nebe ziman lawaz dimîne ku nimûnên vê çendê gelek in. Digel ku gelek elementên dî yên jiyanê, zimani ji alîyê bêje û terman ve zengîn dikin, belêm elementê herî xurt yê ku zimani zengîn dike edebiyat e. Gava cure cure baskên edebiyatê bi kar tên, eve hem bi awayê teswîrê, hem jî bi awayê nexşandinê zimani zengîn dikin. Li vê derê edebiyat li ser dezgehê zimani, berik anjî mehfurek e. Bi van baskên cuda yên edebiyatê, desen û motîfên rengareng têne raçandin li ser dezgehê zimani. Ziman bi vê hunera hunîn û raçandina edebî tête xemilandin. Di vê afiranderîya xemilê da, ziman hem ji alîyê bêjeyan, hem jî ji alîyê gotin û îdyoman ve berfireh û zengîn dibe û dibe kaneke furhayî. Ev kana hatîye têr û tijî kirin dîsa dibe xezîna bêjeya, ku edebiyat jê wergire û bi kar bîne. Ev bizava di navbeyna ziman û edebiyatê da wekî sirkulasyona xwuna di leşê mirovi da ye. Di navbeyna zimani û edebiyatê da jî ev sirkulasyone heye û bi vê yêkê ziman û edebiyat yêk û du têr dikin, bi xwuna taze jîyanê didine yêk.

## Rola nivîskarîyê

Gava ziman û edebiyat xwunê didine yêk, yêk û du têr dikin, di vê danûstandinê da kirdeyek heye ku ew jî nivîskar e. Nivîskar bi zanahî, têr û tijîtîya xwe ya xwandayî û têrbînî, roleke mezin dileyize di navbeyna zimani û edebiyatê da. Bi kar înana hemû potansiyela xwe ya zanahîyê, pireke mezin û saxlem ava dike û digel vê avakirinê trafîkeke xurt jî peyda dike di vê prosesê da, ku edebiyat û ziman yêk û du timam bikin, bêje û gotina bidine yêk û xezîna xwe ya gotina zengîntir bikin. Di vê derê da roleke dî ye girîng ya nivîskari derdikeve meydanê; ew jî bi zanahî û têrbînîya xwe ve, afirandina bêje û gotinên nû ye. Nivîskar demê iskeletê nivîsa xwe dadine û dest pê dike ku bi xwun, goşt û organên dî, giyanê bide nivîsa xwe, bi bêje û termên nû nivîsa xwe dinexşîne, bi kar înana desen û motifên nû nivîsa xwe dixemilîne û li ser tevnekî hinde sipehî, raçandina xwe dike şahesereke bilind. Eve bi serê xwe hostahîyeke di karê nivîsandinê da. Kesên ku çîrok, novel, roman, helbest anjî destana dinivîsin, axleb metodê teswîrê bi kar tînin ku eve zimanekî derece bilind derdêxe meydanê û bi hevkarîya bêjesazîyê nivîskar adeta zimani direqisîne û leyiz û govendê digel dike. Helbet eve ne digel leyizîneke sivik û vala ye ku ziman bête lawaz kirin û kaliteya zimani



www.netewe.com

bête şikandin. Ji xwe nivîskarê ku teksta xwe li ser tevnekî saxlem dadine, wê hostahîya xwe ya bi zanahî û têrbînî dide kivş kirin û ev kaliteye di herikîna nivîsa wi da tête dîtin.

Nivîskarekî bi zanahî û têrbînîya xwe î bawer û tijî, dizane ku dê çawa zimani bi kar bîne û di nav tekstê da çawa govendê digel bike, ku naveroka nivîsê têrkertir bibe. Ziman, tinê bi xebata komên zana û pisporan ve nayête nû û zengîn kirin. Nivîskarê têr û tijî jî, bi vê kaliteya xwe ya zanahî û têrbînîyê, xizmeta zengînîya zimani dike û zimani bi afirandina bêje û termên nû ve zengîntir dike.

Belêm wekî me gotî, eve bi serê xwe hostahîyek e. Ji ber ku, nivîskarê hosta bi zimani na leyize, digel dileyize. Nivîskarê hosta, ferqa "pê leyistin" û "digel leyistin"ê baş dizane û nivîsa xwe bi vê zanînê ava dike. Nivîskarê ji her alî ve bi xwe bawer, zana û têrbîn, di xebata nivîskarîyê da, di danîna pirekê li navbeyna zimani û edebiyatê da, dizane ka dê çawa terazîyê durust bike. Nivîskarê hosta, vê hilsengandina zimani û edebiyatê li ser zemînekî saxlem pêktîne. Dîkilokê terazîyê şaş nake û narevîne. Eve girîng e. Hostahîya di vi wari da, rê nade zimanekî sist û çêkirî!

Li vê derê helbet elementekî dî jî dikeve nav vê prosesê ku ew jî xwandevan e. Xwandevanên hişyar, berê nivîskari, digel bûyer û naverokê herweha ji alîyê zimani ve jî disengînin. Zimanê bi hostahî nehatîye kar înan ji xwe naverokê jî lawaz û qels dike, ku eve jî bala xwandevani dişikêne û ew zimanê şikestî û çêkirî cih nagire. Di vê derê da ewlehîya zimani dîsa ziman bi xwe ye. Çawa ku li her tiştî awayên nexwezayî cih nagirin, sivik û sar dimînin, ziman jî wisa ye. Zimanê ku sivik û sar bi kar hatî jî, cih nagire û balê nakêşe. Ji ber hindê jî, ev encame divê hewesa nivîskari neşikêne, ku di tekstên xwe da zimani nû bike, ji alîyê bêje û terman ve zengîntir bike.

Belê: Edebiyat xemila zimani ye. Edebiyat, hem ristika herî biqîmet e di gerdena zimani da, hem bazink e di zendika zimani da, hem xezêm e di kepîyê zimani da, hem guhark e di guhê zimani da, hem gustîlk e di tilîya zimani da, hem jî xirxal e di pêyê zimani da. Edebiyat herweha geşî, ronahî û xwuna taze ya zimani ye. Ji her rûyê prîzmaya edebiyatê tîrên ronahîyê diteyisin. Hêza ronahîya edebiyatê ji erdekî çol, rêhlekî mezin peyda dike. Edebiyat, hem cereyaneke diyalektîk e, ku tesîra xwenûkirinê li ser kes û civatê dike, hem jî amuretekî xurt yê komunikasyona di navbeyna ziman, mirov û civatê da ye.

Zimanekî zengîn edebiyatê, edebiyateke tîr, tijî û têrker jî zimani xurt dike û herdu pêkve kaliteya xwandinê bilind dikin û oksîjeneke tîr û boş didine cihana ronakbîrîyê ku eve herweha dibe rûmet û serbilindîya neteweyî jî. ■

# Koç, mirin û zayin

*Mehmed Uzun*



Kurteçîroka me li ser serpêhatiya zarokekî biçûk e, zarokekî ku ji mirinê dertê. Belê, zarokekî ku ji mirinê dizê, ku zarokê mirinê ye. Serpêhatiya vî zarokê mirinê ku ne hewce ye em navekî lê kin, şevekê, di şeveke şil û tarî de, dest pê dike.

Li ku? Li welatekî bi tenê û jibîrbûyî. Li welatekî çiyan. Herwekî ku di çîrokên efsanewî de tê gotin; hebû tune bû, li pey heft çiyan welatek hebû... Çîroka serpêhatiya zarokê biçûk jî li welatekî li pey heft çiyan, welatekî xwediyê çiyayên bilind, serî li esmanan, dest pê dike.

Û kengî? Em ê bibêjin, bi demeke dirêj, gelekî dirêj, berî nivisîna van rêzan. Em dest bi serpêhatiyê bikin û herin şeveke tarî ya wan salên bihurî yên destpêkê. Hingî umrê zarok, em ê bibêjin, bi qasî du sal-du sal û nîv e û em li welatê çiyayên bilind, li gundekî quntarên çiyan in: Dinya şevereş e. Şeveke şilî û tarî daketiye ser welatê çiyayên bilind. Baran hêdî hêdî dibare, baran porê daristanên welatê bêrê û bêbihur şeh dike, rehmetê dixe zikê axa hezar salan. Axa zuha baranê dadiqultîne. Bîhneke teze ji axê difûre.

Ax dinale.

Xwediyên vê axê yên hezar salan gundê xwe, axa xwe terk dikin. Ew, îşev, bi dilekî sotî koç dikin û derin. Bi hêdîka, bêdeng. Bi keser. Êdî tu çara wan

nemaye, divê ew ji gund derkevin û herin; ber bi zikê çiyayên xwe, newal û geliyên xwe. Ew divê xwe bispêrin wan deran, warên rawir û teyran. Wan heta îro sebir kirin, li ber xwe dan, lê ji îro pê ve êdî li ber wan tu rê nemaye. Dijminên wan, yanî ordiya welatê fireh ku ew jê re dibêjin "biyanî" ku bi zimanekî din dipeyivin, bi zimanekî din fermana wan rakirine, bi zimanekî din li wan hatine xezebê, dor li wan teng kirine. Ew êdî ne dikarin li ber xwe bidin, ne jî li gund bimînin. Ew bêgav mane, bêçare ketine. Bi tenê du rê li ber wan mane; riya mirinê û riya çiya û geliyên nas.

Yanî riya revê, riya koçê.

Ew derin. Pîr û zarokên wan li ser hesp û mehînan, xeşî, têr, xirar û telisên ard, genim, ce, garis û zad û zexîreyên din; kîsik û xurçikên şekir, xwê, birinç, sawar û dîzik, kûzik û meşkên rûn, hingîv û dimsê li ser pişta bergîr, hêstir û keran, bi strana dengê baran û bayê sivik, ew derin. Ew bûne çar qor; qorê pêşîn egît û şervanên wan in ku hem rê vedikin, hem jî di xeterereke nediyar de dê wan biparêzin. Qorê dudiyan kal û pir û jin û zarok in. Yanî ew in, yanî rabirdûya wan, pêşeroja wan. Qorê sisiyan senhetkar, şivan, gavan û nobedarên wan in ku hin pez û dewarên ku ew dikarin bi xwe re bibin, dane ber xwe û li pey herdu qoran derin. Qorê dawîn dîsan xort û çekdar in. Lê serekê wan ê eşîrê, dengbêj û sazbendê wan ên gund, kalemêrê wan ê ruhanî, necar, hesinker, koşkar, remildar, du serpaleyên gund û çend aqilmend û zaneyên wan jî tevî qorê dawîn in.

Kerwana wan bi rê ketiye, ew derin; şikestî, birîndar, bêkes, bêpişt û bêhêvî. Bi tenê ew dixwazin bijîn, ne zêdeyî vê, bi tenê bijîn. Li ser axa xwe, mîna berê. Lê niha ji bo jîyin û jiyanê rev divê, terkkirina axê divê. Ji welatê xwe, axa xwe, gundê xwe, gor û goristanên xwe rev divê. Ji kesî deng dernakeve, ji tiştên pêwist pê ve kes tiştekî zêde nabêje, tiştekî zêde nake. Mîna ku dest û piyê wan qeydkirî, zimanê wan qufilkirî ye. Di dewsa wan de ba û baran dipeyivin, baran bi hêdîka dibare, ba xwe li ba dike, hesp, mehîn, ker, bergîr û hêstir deng derdixin, pez û dewar xwe dilivînin. Û hin zarok, zarokên ku haya wan ne ji xezeb û şewatê, ne jî ji koç û revê heye, digirîn. Zarokên ku nizanin war û welat, dewr û dewran, mirin û mayin çi ye, zaroktî dikin.

Seg û tajî, belê seg, tajî û cewrikên wan jî hene. Meriv divê seg û tajiyan, hevalên wan ên herî nêz, herî wefakar, herî kevn ji bîr neke.

Zivistan bi ba û baranê xebera hatina xwe dişîne; çile li rê ye. Berî çilê ew divê xwe bi stariyekê bigihînin. Stariyek ku bikaribe wan di sar û seqema çilê de bihewîne. Stariyek ku nêzîkî teyr û lawiran, lê dûrî biyaniyan be ku biyanî nikaribin xwe bigihînê. Du sal in, bi temamî du sal in ku ew li ber xwe didin, geh derin hawara cîran û xismên xwe, geh li ser rê, çûyin û hatinên biyaniyan kemînan datînin, dimirin û dikujin. Lê niha êdî bi tenê rev divê. Ji ber

www.netewe.com

ku ordî yanî biyanî li rê ne û berî ku berf bikeve, ew ê xwe bigihînin gund.

Di destpêka payizekê de biyanî, ordiya welatê fireh, bi esker, çek, top û cebirxanên xwe, hatin. Çima ew hatin? Wan ê çi bikira? Kesî bi van yekan nizanibû, lê ew hatin; bi zor û şidet, bi ferman û qîrîn. Çima zor û şîdet, çima bi van yekan? Kesî pê nizanîbû, lê tifing teqiyan, ji lûleyên top û mitralyozan agir bi dar û daristanan, dahl û gundan ket. Mirinê kemîna xwe veda. Bêdengiya ku bi sed salan hukimdara Welatê Çiyan bû, bi carekê, winda bû û dewsa xwe berda qîrînê: Qirîna wan û biyaniyan ku ji zimanê hev fahm nedikirin; qîrîna xort û çelengan ku bi berikên xedar ên mirinê diketin erdê; qîrîna jin û pîran ku ji ber keft û leftên şer hew wext didîtin ku reşa xwe girêbidin û li şîna xwe rûnin; qîrîna şervanan ku mîna pilingên wan çiyan di nav gelî, newal û çiyan de geh gêr dibûn, geh hildikişiyan, geh dilezandin da ku rê li hatina biyaniyan bigirin; qîrîna teyr û tilûran ku ji dar, daristan û dahlên ku dişewitîn, bi dûr diketin. Qîrînê û encamên qîrînê welatê çiyayên bilind vegirtibû.

Lê belê, tevî her tiştî, rûniştevanên axa qedîm bi hêvî bûn; ew li ser axa xwe, di cîh û warê bav û kalan de bûn. Bavê wan, kalên wan, bapîrên wan li van deran hatibûn dinê, li van deran ji dinê xatir xwestibûn. Ji heft, ji heftê û heft bavan û vir ve, ew xwediyê van diyaran bûn. Tava germ, heyva ronî, stêrkên çirûsî, barana nerm, berfa spî, çiyayên serî di esmanan de, axa rehmetdar, kahnî û lehiyên biharan, teyrên eylo, hemû alem şahidên vê yekê bûn. Vî esmanî, van çiyan, van çem û geliyan şahîdiya jiyana wan kiribû. Dengê wan ê toq hê jî di newal û geliyan de olan dida. Bayê sibê yê bakûr hê jî dengê stran û destanên wan bi her aliyê welatê çiyayên bilind digîhand. Di bin kîjan kevirî de çi rawir heye, di kîjan hêlîn, gom, kun û qulê de çi hêk heye, li ser kîjan tahtê çiyan çi teyr heye, li ber kîjan çemî çi şitil hêşin tê, di kîjan avê de çi masî heye... wan bi van hemûyan dizanîbûn. Heta wan bi înikên masiyên co û kahniyan jî dizanîbûn. Belê, welat welatê wan bû. Biyanî dê biwestiyana û biçûna. Wan weha bawer dikir.

Wan weha hêvî dikir.

Payiza ku biyanî hatibûn, qulipî ser zivistanê, zivistan qulipî ser biharê, bihar ser havînê û havîn jî ser payizeke nû. Lê biyanî neçûn. Ji bervajiyê, ew hîn zêdetir, hîn kûrtir, hîn nêzîktir hatin. Êdî dengê wan ê xerîb, zimanê wan ê biyanî bi ber guhê wan diket. Bayê seqem dengê stranên biyaniyan bi wan digîhand. Di nav du salan de biyaniyên ku bi hewalê şer û pevçûnan dizanîbûn, bi dewlet û ordî, bi çek û pûsad bûn, ew şikandin û nefes li jiyana wan a kevnare ya çiyan çikandin. Xwediyên axa Welatê Çiyan xurt bûn, li ber xwe didan, dibezandin, dilezandin, lê nezan û bêgav bûn, bêtevdîr û bêîmkan bûn. Ew mal bi mal, binemal bi binemal, bav bi bav, eşîr bi eşîr, dever bi dever dijiyan. Mîna berê, mîna berî hezaran salan. Ne yekitiyeke wan, ne za-

nîna wan a şer û pevçûnên li dijî ordiyan, ne çek û cebirxanên wan hebû, ne jî haya wan ji dinê. Kemînên wan, kozik, çeper û sîperên wan, hêvî û mirazên wan, yek bi yek, hatin hilweşandin, yek bi yek têk çûn. Biyanî ne mîna eşîrên cîranên wan bûn, şerê biyaniyan jî ne mîna şerê wan ê navxweyî bû. Çembera li dora wan, roj bi roj, tengtir bû.

Û niha, di vê şeva baranê de, biyanî bi qasî gaveke rê ji wan dûr in. Yanî biyanî evçend nêzîkê wan in! Liberxwedana du salan şikest xwar û dewsa bîhna barûtê, bîhna xwinê hawirdor vegirt. Dar, daristan, dahl, gelî û newal bûn gor û goristan. Li her derî nas û xism, meriv û dost, heval û hogir ketin. Rengê xwinê tevî rengê spî yê ava çeman bû. Dar û daristan, war û gund şewitîn. Sêdar bilind bûn, kesên ku hatin girtin, bi fermanên ku wan jê fahm nedikirin, xeniqîn.

Biyanî hatibûn û jiyana wan a ku bi hezaran salan hertim mîna xwe mabû, bi darê zorê, têk didan û ew ji war û axa wan bi dûr dixistin.

Şev, şeveke weha ya koç û revê ye: Gundî, xwediyên vê axê, ji gund bi dûr dikevin. Qorê yekemîn ji gund gelekî bi dûr ketiye, bi qasî bîhnekê maye ku ew xwe bigihîne pişta çiyayê ku ber bi esmanên tarî bilind dibe. Qorên dudiyan û sisiyan di navbera qorê yekemîn û gund de bi aramî, bêdeng, derin. Qorê çaran ji gund derdikeve. Mîna ku hemû qorên din kirine, kesên qorê çaran jî niha, berî ku bi dûr kevin, vedigerin û li gund dinihêrin. Di bin tariya şevê de, mîna sî, mîna xeyal, mal û xaniyên wan, hewş û hevşoyên wan, bîra wan a meydên, darên wan ên spîndar, gûz û hêjîran, bîr û bîranên wan, deng û pejnên wan ên rojên çûyî, umrê wan, ruhê wan li wir, li pey wan, li gund dimîne. Wan çavê xwe li malên bi kevirên reş avakirî yên gund vekirin. Bîhna mîz û rêxa pez û dewaran li axurên gund bi difnên wan ket. Wan ji erdên gund zeviyên xwe yên serîzerbûyi rakirin, hesp û mehîn li ser vê axê xar dan, li pişta van çiyan derketin seyda ask, xezal û rawiran, çûn nêçîra teyr û çivîkan, li pişta gund, li quntarên çiyan xefik û kemînên gur û roviyan, baz û eloyan danîn, bi masiyên çemên gund zarokên xwe têr kirin. Di şevên vî gundî de, piştî ku zarok ketin xewan û kundan dest bi xwendinê kirin, dilê xwe dan ber pêlên kêf û henekan, kel û coşa bedenan aş kirin, di rojên germ ên havînên gund de ew rabûn dîlanan, dawet li dar xistin, dengê stranên dengbejên wan gihîşte stêrikan. Lê ew niha derin, van tiştên xwe, deng û pejnên xwe, xatire û bîranîn xwe, hebûnên xwe hemûyan terk dikin û derin.

Ji malên wan hê bîhna dû û dûmana argûn û tifikên wan digihe wan. Hê jî pisîng, seg, mirîşk û dîkên wan di navbera xaniyên wan ên neçar de, bi tiralî, digerin. Hinên wan, bi hêdîka, digirîn, hin jî, şermok û bêdeng, keserên kûr dikişînin û careke dawîn li gund dinihêrin.

Veger? Vegera vê çûyina şeva tarî heye?

Ew ê kengê vegerin mal û warê xwe, reh û umrê xwe?

Gava biyanî çûn. Belê, hingî ew ê vegerin ser ax û zeviyên xwe. Ew ê dîsan gund şên bikin, agirê tifikan dîsan geş bikin. Şev ê dîsan bi nalînên wan bedenên wan ên bêdeng û tirsoke binale. Beroş ê li ser agir bikelin, dûman ê bi serê çiyan, bi esmanan bigihe.

Biyanî dê herin. Ew ê li van derên kevir û kepir ku ji dinê û çerxa dine dûr e, çi bikin? Ew ê herin, îro nebû, sibê. Sibê nebû, du sibê. Sê sibê. Rojekê zûtir yan derengtir ew ê herin bajarên xwe yên mezin, malên xwe yên germ ên apartimanan. Ew ê herin nik hezkirên xwe yên nazenîn. Ma yar û evîndarên biyaniyan nîn in? Ma wan yar, evîn, hez û hezkirin navê? Ew ê herin. Rêving weha bawer dikin.

Ew weha hêvî dikin.

Koça gund dere. Ew di ber erd û zeviyên xwe re derbas dibin. Bîhna axa şil ji erdê radibe. Hê heta vê payizê jî ew li ser erdên xwe bûn. Wan zevî rakirin, bender danîn, zêrzeminên malên xwe bi zexîreyên xwe yên zivistanê tijî kirin. Lê ew niha terka erd û zevî, zad, zexîre û xwarinên xwe yên zivistanê jî dikin.

Baran dibare; hem hawirdor şil dike, hem dinya dişo û paqij dike. Eger meriv dengê gelekî dûr ê hin rawir û kûzekûza wawîkan nehesibîne, bi tenê dengê baranê hevaltiya dengê lingên wan û heywanên wan dike. Tarî ye, tariya şevê ye. Esmanên wan ên ku hertim bi comerdî ronahî direşandin, îşev di nav taritiyê de ne. Ji bo koç û revê, ew li benda şeveke weha bûn. Şeva revê diviya tarî bûya; kes bi wan nehesiya, kesî ew nedîtina. Lê eger kesî ew bidîtina jî, wan bikaribûya xwe li ber çavê wan winda bikira. Çiya, çiyayên wan bûn, bi qasî hirç, gur û roviyên van çiyan, wan jî çiya dinasîn û bi hewalê wan dizanibûn. Lê baran, rehmeta baranê ne di hesêb de bû. Şeva tarî bi baranê hat. Çare nîn bû, wext li wan teng bû. Ew ê bi rê biketina.

Baran li ser seran, li ser çavan bû. Baran jî barana wan bû.

Baran; paqijî, şuştina her celeb gemariyê. Rehmet, bereket. Nermahiya tebiyetê. Baran; di dilopan de ronahî, keskesorên ronî, tovê jiyanê. Madera jiyanan. Baran ê co û cobarên wan ên zuhabûyî tijî av bike, pişta zinar û çiyayên wan mist bide, rehmetê têxe zikê ax, newal û geliyên wan. Baran ê hevaltiya wan bike, wan ji kesp û kospan, dahf û kemînan biparêze. Baran bîhneke teze ya taybetî dide ax û der û dorê. Bîhna ax, dar û ber, pûş, giya, zibil, pişkul û heywanan ji hawirdor difûre.

Di bin baranê de ew gund li pey xwe dihêlin, hevşo û mexel, çêre, erd û zevî tê de ku tov diçandin û jê simbil radikirin li pey xwe dihêlin, cîhên bênder û seyrangehê li pey xwe dihêlin, bexçe û rezên ku jê tirî dixwarin li pey xwe dihêlin û derin. Riya wan dirêj e. Pêşî ew ê ji du bihurên dirêj û fetloke yên navbera çiyan derbas bibin. Paşê ew ê hilkişin çiyakî bilind û bi dû re jî ew ê xwe berdin jêr, nav newalekî bêbinî.

www.netewe.com

Ew ê dakevin û dakevin da ku ew xwe bi cîhê ku wan daye ber xwe bigihînin.

Baran dibare, ba dilive, şev diherike û ew ji war û welatê xwe vediqetin û derin. Rê ne xuya ne, teng in, nîn in, tijî kevir in, kelem, dirî, sitrî ne, xîç in, qîş in. Rê dijwar e, rê dirêj e; xuloxwar e, bi çîv e. Zinar li pey zinar, gir li pey gir, pal li pey pal, pozik li pey pozik, kuç li pey kuç, kaş li pey kaş, çal li pey çal, dar û devî li pey dar û devî, av û co li pey av û co tên. Hin rovî, wawîk û gur kûzekuzê dikin, hin teyr, hertim, li der û dor, vîçevîçê dikin. Bûm û kund dixwînin. Bûm û kund dibin hevalên koçerên şeva tarî.

Bi xêra Xwedayê alemîn ku bergîr û qantirên wan hene. Rênas û gernasên herî jîr ên wan bergîr û hêstir in. Bergîr û hêstir rê vedikin, rê li ber wan rast dikin û wan ji pekîna gelî û newalan xelas dikin. Hin ji wan, kal û pîr diwestin, nefes li wan diçike, jin û pîrejin, bêdeng, digirîn û strana koç û veqetînê ya bi keser, bêdeng, dinehwirînin. Şervan, egît û xort, tevî seg û tajiyan, di navbera qoran de derin û tên, geh ber bi pêş, geh ber bi paş. Xort û mêr alîkariya siwaran dikin geh wan peya dikin, geh siwar dikin. Di nav bîhnên têkel ên şevê de kerwan, giran giran, dimeşe.

Mij û dûmaneke tenik jî, perde bi perde, dadikeve. Çavên westiyayî û bêxew pêşiya xwe nabînin. Kerwan dirêj e; pez hene, dewar hene. Kal û pîr hene, zarok hene, jin hene. Û ew divê, berî ku tîrêjên tavê yên rojeke nû hilbên, xwe bigihînin stariya xwe. Çend kavir û mî ji kepirekî geliyan gêr dibin. Caniyeke yekta ya kumêt û hespekî seglavî hew dikarin herin, sim û gûzekên wan di nav xwînê de ne. Çend zarok dikuxin û dilerizin, ji wan re sar e. Kulav û cil û bergên rîs têrî ba û baranê nake. Çi divê? Li kêleka serpala zinarekî bilind, li ser tahtekî nîvzuha, ew disekinin. Êdî ji vir û pê ve riya wan berejêr e. Lê şiverê dirêj, pir teng û aliyekî wê newalekî kûr e. Gaveke şaş mirin e. Siwar peya dibin, dê şîr didin zarokên xwe yên berşîr. Kal û xort ji titûneke sor ya teze ku bîhneke xweş jê difûre, cixare dipêçin. Hin şervan li ser kulavên xwe ên qalind pal didin û bîhna xwe vedidin. Şivan û gavan destmalên xwe yên nan, penêr, toraq û sewzê vedikin. Û serekeşîr, aqilmend, rênas û dewrannasên wan li hev rûdinin û bi hev dişêwirin; çi divê? Veger nabe, hîç nabe. Lezandin nabe, rê dest nade. Terkkirina hin tişt, pez û dewaran jî nabe. Zivistaneke dirêj li ber wan e, pêşerojeke nediyar, nenas li ber wan e. Biyanî li pey wan in. Hingî? Hingî ew divê bibin du beş. Beşekî divê zûtirîn wext xwe bi cîh bigihîne. Beşekî jî bide dû wan.

Qor, ji nû ve, tên pê. Kal û pîr, zar û zêç, nexweş û nesax, li ser hesp û mehînan, tevî çend şerwan û egîdan, bi rê dikevin. Ew tiştên pir pêwist, pir pêdivî jî bi xwe re dibin. Qorê dudiyan jî dide pey wan. Ew derin, ber bi geliyên kûr berjêr dibin.

Şev diherike, wext diherike û bi dû rêwitiyeke direj a hemû şevê, bi dû gir, zinar û çiyayên bilind, newalên kûr û geliyên teng

re, qorê pêşîn, di berbangê de, çaxa dinya û tebiyet hişyar dibe, xwe bi cîh digihîne. Piştî demekê, çaxa tîrêjên tavê xwe bi pişt û palên çiya û daran digihînin, qorê dudiyan jî tê. Baran sekiniye. Dinya ronî ye, tîrêj şewq didin. Ji ber bextê çê, ba hew xwe li ba dike. Ew westiyayî ne, tî ne, birçî ne. Hinarikên wan sor, lêvên wan terikîne. Zikê wan vala, gewriya wan zuha, devê wan tahl e. Dest û piyên wan hew dikarin bi tişteki bigirin. Cil û berg, libas, postal û pêlavên wan ên çermîn qetiyane, teqiyane, qul bûne. Cil û bergên rengîn ên jinan û kum û kolos, şal û şapikên mêran ên tarî şil in, ji delingên şapikan dilopên şevaçûyî ber bi jêr dibin.

Lê rawest navê, ew divê zûtirîn wext bi cîh bin. Ew nikarin tevdîrê ji dest berdin. Piştî bîhnvedaneke kin, ew barên xwe vedikin, zarokên xwe hembêz dikin, pez mexel dikin, çend ji wan dewar û hespan dibin ser avê û çêrê û paşê jî, ew, bi bejn û bala xwe ya dirêj, bi rû û rûçikê xwe yê qemerî, li der û dora xwe dinihêrin. Ew di bin newaleke gelekî kûr û gelekî dirêj de ne. Herdu aliyên wan bi zinar û çiyayên pir bilind rapêçayî ne. Pişt û berpalên çiyan dar û dahl in. Gelek ji dar û daristanan rût in, pelên daran weşiyane, daran kirasê xwe yê bihar û havînê ji xwe kirine. Lê li hin deverên sermilkên çiyayên bilind û kêlekên newal hişinahiyeke tarî rengekî taybetî dide hawirdor: Darên çamê ku hertim xwe li ber xusûsiyetên demsalan radigirin, hawirdor dineqişînin: Zînde, serîbilind, bi baleke şox û şepal û bi rengekî helekesk.

Esman dûrî rêvingan e. Ew divê serê xwe rakin da ku bikaribin, di navbera çiyan re, esmana zelal a vî danê sibê bibînin. Esman çikî sayî ye, bi tenê du ewrên biçûk, bi rengekî gewr, lê ne.

Di ber wan re, di navenda newal de, çemekî diherike. Newalê bihurek di zikê zincîra çiyan de vekiriye. Çêm jî, raser, di zikê newal de. Çem hemû newal seranser dibire. Çem diherike, ne mîna lehiyekê, lê bi alikariya barana şeva bihurî, boş diherike. Digel vê yekê, av zelal e, ewçend zelal e ku rêving dikarin tê re masiyên biçûk ên tê de û xîç û kevirên biçûk ên binê avê bibînin. Herdu qiraxên çêm kevirên mezin, pal û bilindahî ne. Ji çêm hin qelîşek derdikevin û tîşikên biçûk li vir û wir tînin pê.

Li milê ku wan barên xwe danîne, li ber lingê zinaran şikeft û ziving hene. Zinar tijî şikeft in. Ew ê li vir, di nav van şikeftan de bi cîh bin. Heta ku biyanî herin û ew vegerin gundê xwe, êdî, mal, war û welatê wan ê, ji îro pê ve, ev der be.

Ji devê newalê yê rohelat, ro, mîna teyfikeke sor, hiltê. Tîrêjên wê li ser pişta zinaran, li ser ava zelal a çêm û darên çamê leylan didin. Ronahiyek û şewqeke nedîtî ku bi tenê di çîrok û efsanan de heye, îro, xêrhatinî li wan dike. Hawirdor şil, ronî, zelal û aram e.

Ew gihîştine cîhê xwe, gihîştine bihuşta veşartî ya zikê welatê çiyayên bilind. Kî dê, ji wan pê ve, bikaribe xwe bi van deran bigihîne? Kî dê bikaribe wan li vir, di nav

van kevir, gir, zinar, çiya, dar û şikeftan de bibîne? Lê ew dikarin xwe bigihînin her derî. Ew bi rê û xaçerê, newal û gelî, hal û hewalê welatê xwe dizanin. Her kengî ku ew bixwazin, ew dikarin, mîna rawirên di-rende yên vî welatî, di nav zinar û çiyan de bipengizin û herin û werin.

Serekeşîr û aqilmendê wan, bi rûkenî û serfirazî, li hev dinihêrin. Wan bîr bi vî cîhî biribûn. Ew bi ser ketine, bê qeza û bela, bêyî ku tiliya yekî birîn bibe, wan gund anîne vê bihuşta veşartî. Ew divê bi cîh bin, zûtirîn wext, mîna ku ew li gund, li jûrên xwe yên teng û tarî, rûniştine, divê ew li nav şikeftan rûnin û dest bi jiyana xwe ya rojane bikin. Mîna berê, mîna ku ew ji hezaran salan û vir ve dikin. Xort û mêr barên xwe hildigirin û dibin ber devê şikefta herî mezin. Serekkeşîr, aqilmend, çend kalemêr, dengbêj, necar û hin kesên din jî dikevin nava şikeftan û digerin. Şikeft, ziving, kov, qul û qelîşek zehf in. Ew li kû û çawan bi cîh bin? Di rêza şikeftan de, li destpêkê, şikefteke zehf fireh, dirêj û kûr heye. Şikefta herî nêzîk a avê jî ew e. Devê şikeftê fireh û ronî ye. Şikeft ne bi tenê têra ehlê gundeki, têra ehlê deh gundan jî dike. Piştî ku ew der û dor dibînin û bi hev dişêwirin, ew biryara xwe didin; ev şikefta stûr ê bibe warê wan ê mayinê. Dewsa ku ew şêniyên xwe di nav şikeft, kepir û zinaran de belav û peregende bikin, welê çêtir e ku ew li ser hev, li nik hev bin. Zivistan û çile li rê ye. Rawirên kovî yên dirende, hurç, piling, gur, keftar, beraz hene. Saw û tehlîka biyaniyan heye. Belê, weha hîn baş e, ew ê şikefta mezin, li gora xwe, sererast bikin û tê de bi cîh bin. Şikeftên kêlekê jî ji bo pez û dewaran serrast bikin. Û ew ê li vir bijîn.

Biryara wan weha ye. Ev biryara wan a hanê dibe şaşiya wan a yekemîn.

Şikeft kûr, tarî û dirêj e; sar e, bi saw e. Çend gavan ji deriyê şikeftê bi dûr, cîhekî ar û argûnê heye, tê de xwelî û çend êzingên reş ên nîvşewitî hene. Bê guman, masîvan, seydvan û nêçîrvan hatine û li şikeftê mane. Ji şikeftê bîhneke genî, bîhna axê, bîhna ka û pûşê, kufik, xwîdan û mîzê tê. Ne xem e. Ew ê bîhnê biqulipînin ser hilm û bîhna însanan a germ.

Ew dest pê dikin; erdê şikeftê rast dikin, çiqilên daran, dep, pûş, rêsî û giya û di ser wan re jî kulavên xwe radixînin; ji bo mal û malbatan, bi alîkariya qorên kevirên reş, kutek û spartekan navbir lêdikin; li ber devê şikeftê argûnek, bixêriyek û mitbaxekê lêdikin; hin aliyên diwarên şikeftê siwax dikin; li ber devê şikeftê şipaneyeke dirêj çêdikin û ew çûl, mehfûr û doşegên xwe radixin.

Û ew agirekî gur vêdixin. Agirekî ku dê hîç venemire, geh bi êzingan gur be û ronahî bireşîne ser şikeftê, geh di bin xweliya ber destê sibê de, nobedarî li xewa kûr bike û li hêviya geşbûnê be. Û ew, koçer û derketiyên welatê xwe, di şikefteke kûr a binê geliyên welêt de, li kêleka agirê gur, hîn bêtir nêzikî hev dibin, hîn bêtir dengê axîn û nalînên wan, xewn û xeyalên wan digîhe hev, hîn betir jiyana wan a neçar di-

be yek ku hew kesekî dikare wan ji hev veqetîne.

Û hîn bêtir qedera wan dibe yek.

Ava wan heye, nanê wan heye, pez û dewarên wan hene, masiyên wan hene, ask û xezalên wan hene, kew û teyrên wan hene, dar û berên wan hene. Ew ê li vir bijîn, li ber perê vî çemê ku di zikê newalan de fetlokan dide xwe û dirêj dibe û bi rengên zelal ên vekirî hertim leylan dide. Ev der, ev çiyayên ku her û her di zikê hev de, li piştа hev, ber bi esmên bilind dibin, ev newal û geliyên bêbinî ku bi dengê çûkeke biçûk jî olan didin, ev darên dirêj ên spîndar û bî ku, bi rengê xweliyê, mîna tayên spî yên porekî geş, rengekî kevnare li rengan zêde dikin, ev teyr û tilûrên ku hertim vîçevîçê dikin, ev tebiyeta hov, bixof û rengîn, belê ev der ê bibe welatê wan.

Roj û şevên wan, rabûn û rûniştina wan weha dest pê dike. Carina kulmeke tîrêjên tava berbangan, li ber devê şikeftê, li ser rûyê wan şewq dide, carina bayê sibê yê sar wan ditevizîne, carina dilopên barana boş a piştî nîvro ji por û simbêlên boq ên mêrên wan ber bi jêr dibin, carina hingûra sor a êvaran wan dike kelegirî, carina stêr di nîvê şevan de dibin heval û guhdarên stranên wan, carina jî taveke negerm rengê rûyê wan ê qemer diqulipîne ser rengekî tarî yê qehweyî.

Roj diherikin, şev diherikin, hefte derin, meh derin. Pêşî baran tê, bêwest, bêrawest. Bi rojan, bi heftan. Bi dû baranê re, çile dadikeve. Sar e, pûk e. Paşê jî berf tê. Pêşî hêdî, hindik, mîna kepekê. Paşê jî her kuliyeke wê mîna gûzekê. Mezin, qehîm, giran ku kete axê hew jê radibe. Rengê spî hawirdor vedigire. Berf kulavekî gewr û spî radixe ser bedena hawirdor û tebiyetê dike mîna bûkeke bedew a çikî spî. Berf; di zikê welatê çiyayên bilind de cîhana kevnare ya dastanan, çirûskên ronî yên li ser av û lehiyan, stêrkên çirûsî yên dar û dehlan, taca dewranên tenê, bêgav û tirsok, stariya ruhê dudilî û neçar û kirasê spî yê xewên wan, xewnên wan.

Berf; hevriya qehîm, dosta qedîm, yara zelal a salan, a sed salan, a hezar salan.

Û ew di şikeft û zivingên xwe de ne, li nik hev, navbir bi navbir, çavik bi çavik. Çavên wan tên girtin, ew dikevin xewan. Çavên wan vedibin, ew ji xewnan hişyar dibin. Ew di tariya şikeftê de dihezin, di tariya şevê de vediciniqin. Ew kêm dixwin, kêm vedixwin, kêm xwe dişon, kêm dipeyivin, kêm derdikevin derve, ji zarok, kal û pîran pê ve, kêm li hev dinihêrin. Ew li cîhanê di nav cîhaneke nenas û jibîrbûyî de dijîn. Haya kê ji wan heye? Çi bi serê ehl, gund û eşîrên doralî hatiye? Çi bi gundê wan bûye? Kî niha wan bi bîr tîne, navê wan hildide? Kesekî ku wan meraq bike, li ser wan û qedera wan bifikire û li wan bipirse heye? Biyanî niha li kû ne, çi dikin? Biyani ji wan çi dixwazin? Dinya, qeda li te keve dinya! Nalet li te be, li mal û milkên te be!

Biyanî... berê jî wan dibihîst ku welatê wan perçeyekî welatekî firehtir bû, welatê

wan di bin destê biyaniyan de bû, biyaniyan li welatê wan hukim dikir. Lê ew dûrî biyaniyan, biyanî jî dûrî wan bûn, -ji stêrkên esmanên wan jî dûrtir. Wan ne biyaniyek dîtibûn, ne jî cendirmeyek û eskerek. Di nav çiyayên xwe de, li gundê xwe, ew di halê xwe de dijiyan. Lê berî niha bi du salan biyaniyan bi ser wan de girtibûn û hatibûn. Ji nişkekê ve, û bi dû re jî hêdî hêdî, giran giran.

Û niha ew di şikeftê de dipên; bi dengê dengbêj ronahiya stêrkan diqulipînin ser ronahiya tava sibê, bi dengê çîrokbêj şevên dirêj ên çilê li pey hev rêz dikin û dipên.

Sohbet û axaftinên wan kêm in, peyv û gotinên wan kêm in. Lê dengbêjê wan distrê, çîrokbêjê wan vedibêje. Ne ew, lê dengbêj û çîrokbêjên wan in ku hosteyê gotinê ne; ku xwediyê bi sedan û bi hezaran stran û çîrokên wan ên li ser neçarî, bêgavî, tenêtî, keserkûrî û evîndariyê ne; ku bi awaz û ahenga gotinên pir kevn ên tarîxê, şevên wan ên tarî û qedera wan a reş dineqişînin; ku kilamên balkêş û zîz ruhê wan ê xembar bi rengên kevnare dixemilînin. Bi roj seyd û nêçîr, feq, daf û kemîn e, bi şev stran û destan e. Bi roj ronahiya berf, roj û tavê ye, bi şev ronahiya gotinan e. Bi roj sar û seqemên ba û bahozê ye, bi şev germahiya serpêhatî û vegotinên bav û kalên wan, qedera wan a kevnare ye. Stran, serpêhatî û vegotinên ku li kêleka agirê gur ê êzingan dilê wan li kel dixe, bêdawîn in. Herwekî çemê li ber devê şikefta wan a tarî. Herwekî jiyana wan a şikeftê, wexta wan a binê gelî û newalan.

Di wext û zemanên wan ên bêdawîn de ew dipên; çavê wan li devê şikeftê, li çêm, li quntarên çiyan, li berpalên çiyan, li dar û daristanan, li lûtkeyên çiyan, li esmanan, ew her û her dipên. Li şikefta ku wan bi hilm û bîhna bedenên xwe germ kirine, ew li hêviyê ne ku vegerin koxikên xwe yên gund, vegerin ser erd û zeviyên xwe, bax û bexçên xwe.

Di berbanga rojekê de, çaxa ciwanmerdekî wan, hinekî ji şikeftê bi dûr, li ber devê çêm, avdesta xwe dike, ew di çal û kortan de giyanermikên serîrakirî dibîne. Giyanermik hêşîn hatine; bihar li rê ye, germahî, geşî û hişyarî li rê ye. Tîrêjên tavê kulavê spî yê berfê difirkîne, berf hêdî hêdî dihele û radibe. Baran tê, xunava demsalên germ tê. Av û lehî radibin, qeşa û seqemê, qirş û qalşan didin ber xwe û dibin. Jîn bi reh û rêçên dar û dahlan dikeve, dar kirasekî nû yê hêşinahiyê li xwe dikin. Pel hêşîn tên, kulîlk dibişkovin. Û rojekê jî, çaxa keçên wan ên xama, kûz û cêr di destên wan de, dadikevin ber çêm, refekî teyrên boz û belek ji ber perên avê difirin. Teyrên koçber hatine.

Çem rabûye, diherike. Bêdengiya mehan, xem û kesera mehan li pey maye, çem, tê de masiyên leyistok ên piştbelek, bi coş û heyecan, bi xufexuf, bi rengekî çikî spî, zikê newalan diqelişîne û ber bi jêr, ber bi ronahiyê dere. Çemê ku bi mehan bêtevger, bêlebat bû, niha, bûye kahniya jînê, di bin tîrêjên helesor ên tavê de bûye kah-



www.netewe.com

niya rengên têkel ên jînê.

Jîn li rêvingan vegeriyaye. Ew jî divê êdî li jînê vegerin. Desteyek ji egîdên wan tê pê. Egîd cil û berg û pêlavên xwe yên çermîn dişidînin, çek û pûsadên xwe hildidin û ber bi kaş û lûtkeyên çiyan hildikişin. Ew ê herin gund, li halê gund binihêrin, hewalê dinyê fahm bikin. Heye ku biyanî ne li wir in, çûne. Heye ku wexta vegerê hatiye. Piştî çend rojan, bêyî kêmanî, hin firaq û tiştên pêdivê li ser pişta bergîran, deste vedigere. Wan tu kes nedîtine, tu tevger nebihîstine. Gundên doralî jî hemû vala ne, pergî kesî nebûne. Lê belê welê dixuye ku hin kes hatine gund. Deriyên malan vebûne, sandokên wan şikestine, di argûnan de ar hatiye vedandin, xwarin çêbûye, zad û zexîrên dîz û kûpan kêm bûne, kadîn vala bûne. Bê guman, kesên ku hatine gund, biyanî ne. Lê wan tu biyanî nedîtine. Û bêyî ku kes wan bibîne, ew bi dizîka çûne û bi dizîka hatine.

Rast e, kesî ew nedîtine. Lê egîdekî ji destê tiştekî kiriye; berî ku deste ji gund derkeve, ev egîd li kêleka dîwarekî xaniyekî kevirên reş rûdine û avdesta xwe dike. Paşê jî ew bi kevirekî xwe paqij dike, radibe ser piyan, şapikên xwe hildikişîne, doxîna xwe girêdide, li gulokên germ ên avdesta xwe ku jê dûman radibe, dinihêre û bêyî ku ew bi kevir, ya pel û pûş serê avdestê bigire, ew simbêlên xwe ba dide û bi rê dikeve û xwe digihîne hevalên xwe.. Deste, egîdên destê, bi her kitekitê, behsa çûyin û hatina xwe dikin, lê egîd qala vê yeka xwe nake, heye ku ew hewce nabîne, heye ku şerm dike.

Avdesta vî egîdê hanê yê simbêlbadayî dibe şaşiya wan a dudiyan.

Çi divê? Ew dîsan li hev rûdinin, bi hev dişêwirin, li hev guhdarî dikin. Remildarê wan remil davêje, "ez teyr û tûr û hechecikên ku îsal zû hatine, dibînim" remildar dibêje, "kewroşkên avis dibînim, teyrên eylo li ser çiyayên bilind dibînim... Dinya di dîlanê de ye, ji ber giya, gul û kulîlkên rengîn, ji ber bîhnên xweş, dinya har bûye. Evçend xweşî, evçend bedewî, evçend spehîtî... na, na, bextê me tu carî evçend çê, evçend rind nebûye... na, em divê bi tevdîr bin." Û ew biryareke nû distînin; ew ê li cîhê xwe bimînin û bipên.

Heta niha, bêyî gilî û gazin, bêdeng, wan pa, xwe li ber ba û baranê, berf û bûkê girtin. Bîhna wan, sebra wan, sebata wan mîna çiyayên wan bû; metîn û fireh. Ji roja ku ew hatin vê şikeftê û vir ve, du kalemêr û sê pîrejinên wan wefat kirin. Du xortên wan di bin berfendeyeke bêpayan de man û winda bûn. Egîdekî wan ji kaşekî ket û pişta xwe şikand. Sê zarokên wan, du keç û kurek, hatin dinê. Wan tu carê dengê xwe bilind nekir, serê xwe dan ber hev, li qedera xwe fikirîn, li dengê dengbêj guhdarî kirin û pan. Niha jî ew ê bipên.

Û rojek ji wan rojên payinê tiştekî diqewime. Jiyana rojeke nû, bi tîrêjên tava sibê, dest pê dike. Tîrêj dîsan li ser ava çêm dibiriqin. Xweşiyeke nedîtî, bi rengan, bi bîhnan, hawirdor har dike. Xweşiya bêpayan keç û jinên wan dîn dike. Keç û jin, di nav

cil û bergên rengîn de, kiras, derpê, cil û bergên paqij, di bin çengê wan de, ber bi çêm derin. Ew mîna askekê, bi nazenîn, li ser keviran dipengizin, mîna topeberfekê, nermik, di ser çal û kortan re digindirin. Ew ê serê xwe bişon. Hinekî ji şikeftê bi dûr di daldeyeke quntarên çiyê de, li ber çêm, ew kincên xwe ji xwe dikin, tevî kiras, xwe bi sabûnê, bi ava sar a destê sibê ku mîna cemedê ye, dişon.

Lê hingî dengin tên. Dengine ecêb, mîna dengê ba û bahozê. Dengine ku hufehuf, xirexir dikin, dengine xerîb ku li dengên hawirdor nayin. Ji aliyê bakûr, di ser çiyan re, du tiştên reş ku bi teyrê eylo dişibin, dixuyin. Lê ev du tişt ji teyr gelekî mezintir, girstir in. Di navbera çiyan re, ew ber bi jêr difirin. Ew stûrtir dibin. Ev çi ne, çi tişt in, çi teba ne? Jin û keç li van tiştên ecêb ku ber bi wan dibe, dinihêrin. Mêr û xortên wan jî ji şikeftê, ji şikêr û kendalan derdikevin û li van tiştan dinihêrin. Kesekî ji wan ev tişt nedîtine, nebihîstine. Ew dest li van tiştên firoke dikin, keç û jin cil û bergên destê xwe hêldikin. Tişt di bilindahiyên çiya û geliyan de, di ser wan re difirin û derin. Lê careke din, îcar ji milê başûr, ew vedigerin û di ser wan re difirin. Hingî aqilmendê wan bîr bi tiştên firoke dibe, "balafir..." ew dibêje, "ev balafir in, bi bayê difirin û yên biyaniyan in... bila ew we nebînin, zû xwe veşêrin, xwe bidin alî..."

Lê êdî dereng e. Balafir, mîna teyrê eylo, du caran di ser wan re dizivirin, difirin û winda dibin.

Ev desthêldana wan dibe şaşiya wan a sisiyan.

Di ser firîna balafiran re rojek dibuhure, lê tiştek naqewime. Du roj dibuhurin, sê roj, hefteyek, du hefte, lê tiştek nabe, kes naxuyê. Bi dû hefta sisiyan re, egîdên ku li ser gupikên zinarên devê gelî nobedarî dikin, vedigerin, şivan pez derdixin çêrê, seydvan derin seydê, dengbêj li ber perê çêm li tembûra xwe dixe û keç û jin, dîsan, derin ber devê çêm û xwe dişon. Jiyan, dîsan mîna berê, di bin esmanê zelal û heyv û stêrkên ronî de dewam dike. Hilale û sosin dibişkovin, gul vedibin, dar xwe dineqişînin.

Bi qasî bîst rojên din, jiyana wan, weha bi aramî, dewam dike. Lê piştî bîst rojan, em tên roja dawîn a jiyana wan. Roja dawîn a jiyana wan, em dikarin bibêjin, weha ye; dinya êdî baş germ bûye, êdî mêşên hingivîn li dora şikeftê difirin, marên cû xwe gulok dikin û didin beroşka tava germ. Rojeke nû, bi hemû jîndarî û bedewiya xwe dest pê dike. Tav, bi hêdîka, hiltê. Jiyan li ser ava çêm û berpalên çiyan şewq dide. Ava ku bi tîrêjên tavê diçirûse û diherike, şewqa xwe digihîne ser berpal û kendalan. Roja dawîn bi cumbuşa rengên tebiyetê yên zelal dest pê dike. Ji bilî dengê sivik ê avê û vîçevîça şox a çivîkan tu deng tune. Esmanê dûr û bilind, bi rengekî çîkî kesk, dibiriqe. Tu ewr, tu teyr naxuyin.

Egîdekî xort ê girs, bejndirêj, simbêlbadayî, şal û şapikên risandî yên rengîn lê, di devê şikeftê de dixuye. Bi qasî bihîstekê, ew

www.netewe.com

li der û dora xwe dinihêre. Ew dikene. Ev bêdengî û aramî, ev bedewî, ev spehîtî, ev xweşiya ku xwîna merivan dikelîne, ev war û welat, ev tebiyeta bakîr, hemû, yên wî ne, yên wan in. Ew hinekî xwe dide hev, doxîna xwe dişidîne û bi gavên giran ber bi jêr, ber bi çêm dibe. Li ber devê çêm, li ser du keviran, ew li ser totikan rûdine û destê xwe yê rastê dixe avê. Hemû bedena wî diheze. Destê wî ditevize. Av ewçend hûnik e, ewçend zelal e. Xort, bi hêdîka, bi herdu destan, dest û rûyê xwe, paşstûyê xwe dişo. Ew radibe ser piyan, bi milên şal û kirasê xwe rûyê xwe zuha dike û simbêlên xwe badide. Hingî dengê teyrekî tê. Xort serê xwe radike û li esman dinihêre. Teyrekî belek, jê hinekî bi dûr, di navbera daristan û çêm de, difire. Teyr nade bask û perwazan, mîna ku ew jî dixwaze li gora aramiya vî danê sibê yê zêrîn bifire. Teyr hinekî ber bi xort difire. Xort nikul û çavên biçûk ên teyr dibîne. Belê, teyr baz e, bazekî belek ê van çiyan ku kela dilê nêçîrvanan radike. Xort dikene û ber bi şikeftê dizivire da ku vegere şikeftê.

Lê hingî dengê teqînekê tê. Hingî dengê teqînekê hawirdor vedigire. Hingî dengê teqînekê, car bi car, car bi car, di nav gelî, zinar û çiyan de olan dide. Hingî bi dengê teqînê, bêdengiya hawirdor diqelişe û teyr û tilûr, ji nişkekê ve, difirin û bi dûr dikevin. Hingî şewateke kambax bi hundirê xort dikeve. Pêşî xort fahm nake ka ev deng çi ye û ji kû hatiye. Ew, matmayî, li der û dora xwe dinihêre, lê tu kesî nabîne. Bedena wî germ dibe, giran dibe. Şewatek ku wî hîç nedîtiye, bedena wî vedigire. Tişt ekî germ û şil jê diherike. Ew destê xwe davêje zikê xwe; xwîn e, belê, xwîn jê dere. Ew hewl dide xwe, dixwaze xwe bilezîne devê şikeftê. Ew çend gavan davêje, lê beden giran e, girantir dibe. Nefesa wî diçike. Ew, bi hêdîka, li ser çogan, hildiweşe erdê. Bi qasî kêliyekê ew welê, li ser çogan, dimîne, bi lez û kûr nefes digire û dide, li dar û dehlên rengîn dinihêre, li esmana zelal dinihêre, li devê şikeftê dinihêre. Baz? Baz dikeve bîra wî. Çavên wî li baz digerin. Ew dîsan hewl dide xwe, destê xwe yê rastê datine erdê, bi taqeta xwe ya dawîn, radibe ser piyan û ber bi devê şikeftê dibe. Gavek, du gav, sê gav. Lê hewqas. Teqîneke nû aramiyê perçe dike. Paşê yeka nû. Û yeka nû. Û xort, bi ser rû, hildiweşe erdê. Û xort ji erdê hew radibe.

Hingî çend egîdên din, bi awirekî şaşbûyî, bi rûyê qedîm ê kesertijî, tifing di destên wan de, ji şikeftê derdikevin. Ew li der û dora xwe dinihêrin. Hîç kesekî nîn e, naxuyê. Kê weha kir? Kê hevalê wan, birayê wan, lawê wan ê mîna çiyayekî, di destpêka vê roja ronî de, xiste ser axa reş?

Kî? Çima ?

Ew tifingên xwe radikin û berik dajon devê tifingan û li doralî dinihêrin. Dudo ji wan ber bi xortê li erdê dibin. Lê berî ku ew xwe bi xort bigihînin, dîsan dengê teqînê radibe û olan bi çiyan dixîne. Îcar bi lez, li pey hev, bi hev re, bi dûzan. Îcar dengê teqîna berikên mîtralyozan hawirdor vedi-

gire. Egîd, yek bi yek, dikevin, -bêyî ku ew dest bibin tifingê û berikekê biteqînin. Li kêleka ava ku dibiriqe û bi şewq diherike, niha, xwîn diherike. Ji egîdên ku peregende li erdê ne, xwîn dere. Hinên din hewl didin ku ji şikeftê derkevin, lê hew keys dibînin. Hemû li ser hev, mîna mirîşkên koxikekê, di şikeftê de asê dimînin.

Û ew, yanî biyanî, yek bi yek, qor bi qor, ji paş dar, kevir, pal, bilindahî, şikêr, zinar û kozikên xwe dixuyin. Kincên leşkerî yên hêşîneke vekirî li wan, bi çek, rext û pûsad, hêdî hêdî, dor li şikeftê teng dikin. Ew, bêhejmar, pir in. Her der ew in, biyanî ne. Çend zabît li herdu milên devê şikeftê, ji şikeftê dûr, eskerên bêhejmar îdare dikin. Ji devê şikeftê çend berik diteqin, lê hewqas, jê pê ve, êdî tu teng nayê. Biyanî dengê wan dibirin, nahêlin ew dest bibin xwe. Ji her milî biyanî devê şikeftê gulebaran dikin. Bêwest, bêrawest. Pêşî bi tifingan, paşê bi mîtralyozan û bi dû re jî bi du topên biçûk. Car bi car.

Heta nîvro, heta tav tê û li ser şikeftê radiweste û şewqa xwe ya mîna teyfikekê, bera zikê çêm dide, teqîn dewam dike. Ji hundir, ji şikeftê deng nîn e. Mîna ku ew hîç nejiyane, ne dengek, ne pejnek, ne şopek. Bi tenê çend leyistokên textîn ên zarokan û çend mehfûrên li ber devê şikeftê ku niha jê duman radibin, hebûna wan diyar dikin.

Piştî nîvro esker, hêdî hêdî, ji herdu milan, ber bi devê şikeftê dibin, qirş, rêsî û devî didin ser hev û agir bera wan didin. Devê şikeftê di nav agir, dû û dûmanê de dimîne.

Qirş, qal, rêsî, devî û agir. Qirş, qal, rêsî, devî û agir. Û dû û dûman. Û carina teqîna mîtralyoz û topan.

Agirê boş ê ku ji lûleyên mîtralyoz û topan derdikeve... Du topên ku her yek li milekî devê şikeftê, agir û mirinê dibarînin...

Ber bi êvarê, çaxa ro, bi rengekî sor, xwe digihîne milê din ê newalê, esker disekinin. Esker westiyane. Ji nişkê ve, dinya dîsan dibe aram. Lê hawirdora zelal û bêdeng êdî qulipiye ser qada şer. Bihuşta veşartî qulipiye ser dûjehê. Dar dişewitin, ji doraliyen şikeftê dûman radibe. Leşên pez, dewar û bergîran, peregende, li dorali vegivizîne. Dinya germ e, pir germ. Teqîna tifing, mîtralyoz û topan dinya kiriye kozekî agir. Êdî ne dengê teyr û rawiran tê, ne jî bîhna gul û kulîlkan. Bi tenê bîhna barût, xwîn, xwîdan, dû û dûmanê tê. Bi tenê bîhna mirinê tê.

Zabît û esker, tiliyên wan li ser lingê tebançe û tifingan, hêdî hêdî tên ber devê şikeftê. Lê kes nakeve hundir, ew li wir radiwestin û guhê xwe didin şikeftê. Deng nîn e, ji şikefta ku jê dûman radibe, tu deng nayê. Êdî her tişt qediyaye; êdî ne veşartin e, ne payin e, ne hêvî, ne veger, ne hesret, ne keser, ne guman, ne tirs û ne jî haletên din ên însanên bêgav e. Xelas, her tişt xelas bûye.

Lê piştî bîskekê tiştekî ku di efsanan de tê pê, diqewime; ji nav dûmana devê şikef-

tê reşahiyek dixuye. Cewrikeke biçûk, bi kûzekûzek ku bi zehmetî tê bihîstin, ji nav dûmanê derdikeve. Bi dû cewrikê re jî reşahiyeke din dixuye; zarokekî biçûk ku bi zehmetî gav davêje.

Zarokê ku em ê bibêjin, bi qasî du sal-du sal û nîvî ye, bêdeng, tirs li ser rû û li ser çavan, ji şikeftê derdikeve. Zarok law e. Kirasekî çermîn li lêwik e, porê wî qusiyayî ye. Bîhneke giran a xwîdan, dû û mîzê ji lêwik tê. Rûyê wî biçûk, çavên wî biçûk mîna libên nîskê ne. Gava çavê wî bi zabît û eskeran dikeve, ew destê xwe hildide û dixwaze tiştekî bibêje. Lê bi kîjan zimanî? Deng jê dernakeve. Hingî zabîtekî berik dibe devê demançê û tê li ser lêwik disekine. "Ji wan tu kes, tu şop, tu deng, tu reh, tu rêç divê nemîne" zabît, bi zimane xwe, dibêje. Zabît weha difikire. Haya lêwik ji zabît û fikirên zabît nîn e, ew destê xwe dibe ser pişta cewrika belek û pê re dilîze. Lê zabîtekî din ê simbêlqît nahêle ku zarok bê kuştin.

Zabîtê simbêlqît zarok radike, hembêz dike û bi destê xwe yê rastê, bi ken, serê wî yê hûr mist dide. Zarok jî bi çavên ku tu tiştî îfade nakin, li zabît dinihêre.

Belê, ev zarok, zarokê mirinê yê kurte-çîroka me ye.

Belê, serpêhatiya zarokê mirinê weha dest pê dike, -li cîhê ku kurte-çîroka me xelas dibe. ■



# Pêncsaliya Nûdemê pîroz be!

*Gulîstan Perwer*

Berî her tiştî, ez berpirsiyarê Nûdemê kek Firat Cewerî pîroz dikim. Heta niha pir kêm kovar û rojnameyên kurdî gihîştine pêncsaliya xwe. Ev bi îmkan û bi bîr û baweriyê pêk tê. Riya me dirêj e, ne karê her kesî ye ku heta dawiyê tê de bimeşe. Ez hêvîdar im ku wê xwendevanên kurd vê rastiyê bibînin û piştgiriya Nûdemê bikin.

Nûdem ziman û edebiyata me bi pêş de dibe û kultura me dewlemendtir dike. Divê ev rastî neyê înkarkirin. Serî sax be, em ê piştî pênc salên din jî dîsa Nûdemê pîroz bikin; lê vê carê ne li Stockholmê, li Diyarbekirê, li paytextê welêt…

# Xelatgira Nobêl ya îsal Wislawa Szymborska



Ji sala 1901'ê û vir ve, ji aliyê Akademiya Swêdê ve xelata Nobel ya edebiyatê tê belavkirin. Heta niha ji gelek welatên cihê; ji Ewrûpayê, ji Afarîkayê, ji Asyayê, ji Emerîkayê gelek nivîskar; çi jin, çi mêr; çi cihû, çi komunîst; çi lîberal, çi sosyalîst gelek mirov bûne xwediyê xelata Nobel ya edebiyatê. Digel ku bi navê Nobel gelek xelatên din, mîna fizîk, kîmya, tib û aştiyê tê belavkirin jî, dîsan xelata helî balkêş, xelata Nobel ya edebiyatê ye. Ev xelata navdar, ya ku ji salê carekê çavê hemû dinyayê lê ye, li vî welatê biçûk, li Swêdê tê belavkirin. Her carê, berî belavkirina xelatê



www.mete...e.com

bi çend rojan li seranserî dinyayê spekulasiyonên cihê çêdibin, navên gelek nivîskarên cihê tên zimên. Li gorî anketên ku îsal rojnameyên swêdî çêkirine û ji gelek edebiyatvan û rexnegirên dinyayê pirsîne, bêtir navê romannivîsê portekîzî Antonia Lobo Antunes, şaîrê swêdî Tomas Tranströmer, şaîrê Sûrî-Lubnanî Adonîs, nivîskara swêdî ya pirtûkên zarokan Astrid Lindgren, nivîskara emerîkî Eudora Welty, nivîskarê holandî Cees Noteboom, nivîskarê estlandî Jaan Kaplinski, nivîskarê îtalî Claudio Magris, nivîskarê alman Günter Grass, nivîskarê belçîkî Hugo Claus, nivîskarê meksîkî Carlos Fuentes derketine pêş. Cih bi cih behsa navê Milan Kundera jî hate kirin. Lê belê navê xelatgira îsal Wislawa Szymborskayê pir kêm hate zimên. Ji xwe navê Yaşar Kemal ku di destpêka salên 80'ê de gelekî aktuel bû, îsal qet behs nebû.

Gava sisê oktoberê, saet yekê piştî nîvro, Sture Allén deriyê Akademiyê vekir û navê xelatgira îsal, şaîra polonî Wislawa Szymborska îlan kir, gelek kes ecêbmayî man û navê vê şaîra ku li welatê xwe, di şiîra polonî de xwediyê cihekî taybetî ye, cara pêşî dibihîstin. Herçî ji bo xwendevanên kurd e, Wislawa Szymborska nenas e.

Baş e, Wislawa Szymborska kî ye?

Wislawa Szymborska di sala 1923'an de li Bninê, derveyî Poznanê hatiye dinyayê. Di heyşt saliya wê de malbata wê bar dike Krokowê û ew heta niha jî her li Krokowê dijî. Ew piştî şerê cîhanê yê duwemîn li unîversîteyê dest bi xwendina edebiyatê û sosyolojiyê dike. Ew ji sala 1952'an ta 1981'ê di kovara edebî "Zycie Literackie" de mîna redaktora şiîrê dixebite. Ew şaîreke zêde produktîv nayê hesibandin; wê heta niha bi tenê pênc pirtûkên şiîran weşandine. Her du pirtûkên wê yên pêşî bi realîzma civakî hatine hûnandin, lê hersiyên dawî bi hunera şiîrê dagirtî ne. Herçiqas ew şaîreke kêmber be jî, lê wê di dinyaya edebî de navê xwe hertim aktuel hiştiye.

Şiîrhezên swêdî cara pêşî piştî salên 80'yî pêrgî Szymborskayê bûn. Ji ber ku li Swêdê şiîr hindik tê xwendin, pirtûkên şiîran jî hindik têne firotin. Loma weşanxaneyên mezin xwe nadin ber weşandina pirtûkên şiîran. Pirtûkên Wislawa Szymborska li Swêdê ji aliyê weşanxaneyeke biçûk de hatine weşandin.

Niha, Wislawa Szymborskaya 73 salî, bi berpirsiyariya girtina xelata Nobel ya edebiyatê û bi heft milyon û çar sed hezarên swêdî, li Krokowê di xaniyekî biçûk de dijî... ■

# Pênc salên Nûdemê mîna bahozê buhurîn!

Di pêvajoya pênc salan de, ji şiîrê heta çîrokê, ji romanê heta piyesê, ji hevpeyvînan, ji lêkolîn û gotarên edebî, ji felsefeyê heta ilmê edebiyatê; ji pênûsa bi sedan nivîskarên kurd, Nûdemê bi hezaran rûpel pêşkêşî pirtûkxaneya kurdî kir. Herweha, Nûdemê di vê pêvajoya pêncsalane de, edebiyata kurdî aktuel hişt, hêvî û moral da gelek nivîskaran û gelek keç û xort teşwîqî nivîsandina kurdî kir.

Em li jêr, bi rêzê nivîs û nivîskarên 20 hejmarên Nûdemê didin.

**No: 1 1992, 106 rûpel**


3 ÇEND GOTIN - Firat CEWERÎ
5 RONDIKÊN ÇAVAN, BIHARA HELEPÇE - H. KILIÇ
8 ÇEND WÊNE JI XWELIBAKIRINA HELBESTVANEKÎ ÇAR SALÎ- Ehmed HUSEYNÎ
16 BEYAN - Arthur RIMBAUD
18 MORÎKÊN ŞÎN ... EWR Û DÛRBÛN- Mihemed Efîf HUSEYNÎ
21 EVÎN - Derwêş M. FERHO
24 PERUK - Lokman POLAT
26 ELA'EDDÎN SICCADÎ DI DERHEQA MELEYÊ CIZIRÎ DE - M. MAYÎ
29 TERMÊN EDEBÎ - Rojen BARNAS
37 EDEBIYATA KURDÎ YA SURGUNÊ - F. CEWERÎ
52 CIHEKÎ PAKIJ Û ROHNÎ - HEMINGWAY- werger: Dr. POLOÇO
55 DI BASÊ DE - Hussên HEBEŞ
57 NISÊBÎNÊ - Musa ANTER
58 MEZOPOTAMYA - Edward PETÊŞKA-Werger: Loran CENGÎN
61 ŞEV Û ROJ Û XOZÎ - B. AKREYÎ
65 VICTOR HUGO - Werger: Firat CEWERÎ
68 ŞERÊ AZADIYÊ - Bareş BATTE
71 EHMEDÊ XANÊ - Zeynelabidîn ZINAR
77 YÊN BAWERMEND Û "HINDIYÊN SOR" - Şahînê B. SOREKLÎ
80 BAYÊ PAYIZÊ - Arjen ARÎ
82 KURDINO, BI KURDÎ BIXWÎNIN - Îbrahîm AL
84 ETNOGRAF Û FOLKLORÎST FARUK HAFÎD -Dilower MÊQERÎ
88 QAMÎŞLOKA BAVÊ FELEK - Mervanê KELEŞ
91 YILMAZ GUNEY - Koyo BERZ
100 J.P. SARTE Û EST BÎYAYENI - Faruk YAKÛP
103 KARÎN BOYE - Wergernayişi: Faruk YAKÛP


**No: 2 1992, 110 rûpel**


3 ÇEND GOTIN - Firat Cewerî
6 REMZÎ, RESAMÊ RENGÊ GIRTÎ - Mehmet Uzun
13 NAV Û DABEŞKIRINA XEWNÊN HÎRO - Ehmed Huseynî
17 SIWARÊ HESPÊ KIMÊD - H. Kiliç
23 ÇÎROKA SÊZDEH ROJ Û SÊZDEH ŞEVAN - Arjen Arî
26 TEYRIKÊ ÇEMÊ XERZAN - F. Cewerî
33 PAYÎZ - Şahînê Bekirê Soreklî
37 YÊN RAKETÎ - Husên Hebeş
39 MELE EHMEDÊ CIZÎRÎ - Zeynelabidîn Zinar
52 MIRINA MIRÎŞKA SPÎ- Dr. Cemşîd Bender
55 ŞEVÊN SPÎ - Dostoyevskî - Werger: Firat Cewerî
63 AHMED ARIF - Şîrîn Bozarslan
65 SÎ Û SÊ GULE- Ahmed Arif - Werger: Hatîce Al




www.netewe.com

69 DARA HINARÊ A LI SER GIRIK - Yaşar Kemal- Werger: Dr. Poloço
82 FATIH MEDERES - Dilower Mêqerî
85 ARAMÊ TÎGRAN - Derwêş M. Ferho
89 KEÇIKA KIBRÎTFIROŞ - H. C. Andersen - Werger: Bişarê Segman
92 HEVPEYVÎN BI H. SILÊVANÎ RE - Xelîl Duhokî
97 KAM BÎ EDITH SÖDERGRAN - Faruk Yakup
99 ZEFTÊ KÎ ÇORŞMEYÊ SÊWREGÎ, ÇERMÛGÎ Û ALDOŞÎ, - K. Berz
105 DANASÎNA PIRTÛKAN - Husên Dozen
108 DANASÎNA PIRTÛKAN - Amadekar: E. Huseynî

**No: 3 1992, 112 rûpel**

3 ÇEND GOTIN - Firat Ceweri
6 TIVINGA RÊNCBER - Cemşîd Bender
10 MAHCIR - A. Hicri Îgören
12 BÎRANÎNA CEGERXWÎN - H. Kiliç
20 CEGERXWÎN Û LERZA BÎRANÎNÊ - Ehmed Huseynî
24 ÇAR ŞIÎR JI - Eskerê Boyîk
26 DADMEND - Ferhad Çelebî
28 SIYA EVÎNÊ - Xelîl Duhokî
36 SIBEHA ÎLONÊ - Arjen Arî
39 ESMA OCAK -Husên Dozen
41 NAMEYA KU HATE GUND - Esma Ocak
45 SÎNG Û POSTAL - Mueyed Teyib
46 HEVPEYVÎN BI D. ÎZOLÎ RE - Derwêş M. Ferho
49 AZADÎ - Laleş Qaso
50 ANTON ÇEXOV - F. Ceweri
53 YÊN SERXWEŞ - Anton Çexov
57 EZ GIRTÎ ME - Bareş Batê
58 KURDEKÎ BI RÛMET, YILMAZ GUNEY - Dr. Poloço
61 MÊVANÊ BÊWEXT - Tosinê Reşîd
67 NE TE Û NE MIN - Mervanê Keleş
68 MERCÊN DÎROKÎ Û DERKETINA HAWARÊ - Dr. Husên Hebeş
72 BÎRANÎNA KIRALEKÎ CIWAN - Heinrich Böll Werger: Ş. B. Sorekli
77 XWÎN Û BERF, KOVANIYA TE - Ziya Şeker
78 GEREKE AGAHÎ... - Dilower Mêqerî
82 ZANÎN JI NÛDEMÊ RE ... - Selah Berwarî
84 FEQIYÊ TEYRAN - Zeynelabidîn Zinar
87 DENGNIVÎSARÊ SAZBENDIYA KURDÎ- Nûra Cewarî
89 ŞAR - Şîrîn Bozarslan
93 DI ÇAVKANIYÊN SWÊDÎ DE - Nûdem
96 KURD Û KURDISTAN - Tîmûrê Xelîl
97 R. QUDBEDÎN - Amadekar: F. Pîrbal
100 LE ŞIÎRÎ MEWLEWÎ KURD DA - Ehmed Şerîfî
105 LE SER SAKOYEKÎ SARD DA - Ferhad Pîrbal
108 SIYAMED Û XECÊ - Koyo Berz
112 GEDEDÊ WETATÎ RÊ - Mihem Himbêlij

**No: 4 1992, 156 rûpel**

3 ÇEND GOTIN - F. Ceweri
6 JI BO MUSA BEG - Can Yücel
7 DI STRANÊN KURDÎ DE NAVÇEKE EROTÎK - Rohat
29 STRANA MEZRA BOTAN - Medenî Ayhan
32 EVÎNEKE MELODRAMÎK - Hesenê Metê
38 RIYA HÊVIYÊ - Hazim Kiliç
43 PAYÎZA ÇIYAN BÛKA AGIR - Ehmed Huseynî
46 JI AUSTRALYA ROJBAŞ - Şahînê B. Sorekli
60 KULÎLKÊN BÊRONÎ - M. Efîf Huseynî
62 DARA HINARÊ - Yaşar Kemal Werger: Dr. Poloço
72 LI WELATÊ MIN - Medenî Ferho
73 ŞORBE - Edîp Polat
77 KENGÊ - Eskerê Boyik
78 ÇÎROKA JIYANA MIN - A. Hicri Îzgören, Werger: M. Baran
82 ELIYÊ HERÎRÎ - Zeynelabidîn Zinar
89 TU ÇÛYÎ - Fêrikê Ûsiv
90 XELATA NOBELÊ - F. Ceweri
104 ŞIÎREK JI - Laleş Qaso
105 ÇÎROKA JIYANA MIN - Cemşîd Bender
108 AZAD ŞEWQÎ - Amadekar: D. Mêqerî
110 EV XWÎN - Arvaîn Werta, Werger: Mervanê Keleş
111 KURTEJIYAN Û HELBEST - Derwêş M. Ferho
113 TABLOYEK RENGÎN JI KURDISTANA ŞÊRÎN - Mueyed Teyib
116 APÊ HORO - Husên Hebeş
119 DU ŞIÎR JI - Eric Fylkeson
121 JIYAN Û HEVPEYVÎN - Xelîl Duhokî
124 DUBARE MIRAR BÛNE - Fazil Humer Zalih
126 HEVPEYVÎN BI HAFIZ QAZÎ RE - Revdar Mizûrî
128 GEREK AGAHÎ... - Dilower Mêqerî
132 DI SÎNEMA KURDÎ DE BÛYEREK NAVNETEWÎ -Husên Dozen
135 NÛDEM FORUMA HEMÛ NIVÎSKARAN E - Petra Werzel
136 KOMPETENS - Nûri Aldûr
138 DANASÎNA KOVARAN - Lokman Polat
144 GERAN BUDWAYÎ WELATEKÎ TEZE - F. Pîrbal
150 GEDEDÊ WETDATÎ RE - Mihem Hmbêlij
151 BI ZEHMETEY AMEYO -Koyo Berz

**No: 5 1993, 128 rûpel**

3 EDEBIYATA KURDÎ -Firat Ceweri
10 XERÎBÎ- Eskerê Boyik
12 BÎRA QEDERÊ - Mehmed Uzun
24 EW ROMÎ YE - Medenî Ferho
26 HEVPEYVÎN BI N. ARÎÇ RE - Husên Dozen

www.netewe.com

48 RASTHATINA LI LAÇÎNÊ - Tosinê Reşîd
52 BÎRANÎNA MIHEMED ŞÊXO -Mervanê Keleş
62 NAKOKÎ - Hesenê Metê
66 XEBATÊN HÊJA - Nûrî Aldûr
69 MELE EHMEDÊ BATÊYÎ - Z. Zinar
75 HELEBÇE - Derwêş M. Ferho
84 HUNERMEND... - Siyamend Birahîm
86 HUNERMENDÊ PIRRHÊL, RIZA TOPAL
92 GOTINA PÊŞÎ YA ZERDEŞT - NIETZSCHE
Werger: F. Ceweri
103 XWÎN - Cemşîd Bender
105 ÇAME, O. Paz Werger: E. Huseynî û Mehdî
113 HEVPEYVÎN BI EDÎP POLAT RE
118 ÇEND GOTIN LI SER FÎLMEKÎ BAŞ - Ş. B. Soreklî
122 ŞEFEQ- Husên Arif
124 HEJAR - Amadekar: Ferhad Pîrbal
126 DANASÎNA KOVARAN - Lokman Polat
133 DANASÎNA PIRTÛKAN

**No: 6 1993, 112 rûpel**

3 ENSTÎTUYÊN KURDÎ - Firat Ceweri
5 BERSIV I Kendal Nezan
12 BERSIV II Feqî Husên
17 BERSIV III Derwêş M. Ferho
20 SÊ HELBEST - Rojen Barnas
25 QESRA XEWNAN - Fawaz Husên
31 QURFA PIŞTÊ ŞIKEST - Omer Okumuş
36 HUNER SELÎM - Mehmed Uzun
44 HATINA TE BENDEMANA MIN - Mervanê Keleş
47 MADMAZEL CLAUD - Henry Miller -
Werger: F. Ceweri
55 NÛDEM - Ferhad Pîrbal
56 DESTANÊN KURDÎ- Rohat
76 ROLA EDEBIYATÊ - Mehfûz Mayî
84 DU HELBEST - Bedirxan Epözdemîr
87 LI SER HOZAN Û HELBESTAN - Medenî Ferho
92 HELBESTVANÊ KURD SÎNAN SABRÎ- Ziya Şeker
94 PERTEW BEGÊ HEKARÎ - Zeynelabidîn Zinar
99 SEYDO GORANÎ - Siyamend Birahîm
104 HUNERMENDÊ XWE BINASE - Haviz Qazî
107 MÎRÊ BIÇÛK, A. S. Exupéry - Werger: Şahînê B. Soreklî

**No: 7 1993, 124 rûpel**

3 KOVAR Û ROJNAEYÊN KURDÎ - F. Ceweri
5 BERSIV I - M. Elî
8 BERSIV II - Remzî Bilget
12 BERSIV III - Îkramettîn Oguz
15 BERSIV IV - Sabah Kara
18 SÊ HELBEST - Rojen Barnas
20 YAŞAR KEMAL - Rohat
38 HETAV BÛN - Mervanê Keleş
40 ÇÎROKA EVÎNEKE BÊMIRAD - Felat Dilgeş
44 BENDEWARÎ - Rezoyê Xerzî
45 NEYNIKA BINEFŞÎ -Dilower Mêqeri
51 JACK LONDON Û XWÊDANA ENIYÊ -
Mustafa Aydogan
68 SEYDAYÊ KELEŞ - Bedirxan Epözdemîr
73 ALBERT CAMUS Û BIYANÎ - Fawaz Husên
84 SEDSALIYA MAYAKOVSKÎ -Suleyman Demîr
87 FEDÎ - Edîp Polat
89 ŞEVBUHÊRKEK LI MALA MUSA ANTER-
Jan Dost
93 ŞAHÊ NEXŞEBEND - Zeynelabidîn Zinar
103 STRANA GULANÊ - J. W. Gothe - Werger: Husên Hebeş
105 ŞEREFNAME - Haviz Qazî
110 GORISTANA BÊGOR Û RÛXWEŞÊ ZÎVAR -
Heyder Omer
116 MEHKEMEKIRINA SELEHEDÎNÊ EYÛBÎ -
Ahmed Cantekîn
118 BAYÊ HAVÎN - Latîf Epözdemîr
121 DANASÎNA PIRTÛKAN

**No: 8 1993, 116 rûpel**

3 SEDSALIYA CELADET ALÎ BEDIR-XAN -
Firat Ceweri,
14 MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN - Rojen Barnas
16 ŞAHSIWARÊ QADA ZANÎNÊ - Haviz Qazî
17 ROLA CELADET BEDIRXA • M. Malmîsanij
19 PIYONEREKÎ ZIMANÊ KURDÎ • ROHAT
20 RONAKBÎREKÎ BÊHEMPA, CELADET ALÎ BEDIR-XAN - Mehmed UZUN
21 EZ XWÎNA XWE NADIM TE -Fethula Huseynî
22 PÊNC HELBEST JI - Rojen BARNAS,
26 SÊ RENGÊN KESKESORÊ - Mehmed UZUN
33 AWAZÊN XERÎBIYÊ - Bedirxan EPÖZDEMÎR
35 DI MEM Û ZÎNA EHMEDÊ XANÎ DE ASTRONOMÎ - N. Hêcibî
39 BEHRAM - Zagrosê Haco
41 E. MIZÛRÎ - Xelîl Duhokî
43 RÛPELA DAWÎ DI AVESTA DE - Jan Dost
44 KUŞTINA ROYÊ - Şahînê B. Soreklî
48 DELAVÊ EWRAN - Mervanê Keleş
48 NAZELÎNÊ - Rizoyê Xerzî
49 KURD Û ERMENÎ - Nacî Kutlay
57 TONI MORRISON - Mustafa Aydogan
60 SÊ HELBEST JI - Alî Biçer
62 MEKSÎMÊ HEMO - H. Hebeş
70 YEKÎTIYA NIVÎSKARÊN KURD - Mehfûz Mayî
75 TU ÎSHAQ Î... CEMÎLEK Î - Yilmaz Erdogan
84 ŞÊX EVDILQADIRÊ GÊLANÎ - Z. Zinar
DANASÎNA PIRTÛKAN:
88 Ahmed Cantekîn

www.netewe.com

92 Lokman Polat
97 Dilower Mêqerî
101 Medenî Ferho
103 Ferhad Pîrbal
110 AGORA - Mustafa Aydogan
114 LI MALA OSMAN SEBRÎ - F. Cewerî

**No: 9 1994, 112 rûpel**

3 CÛMHÛRIYETA KURDÎ YA MEHABADÊ - F. Cewerî
7 CÛMHÛRIYETA KURDISTANÊ - Hesenê Qazî
9 CÛMHÛRIYETA KURDISTANÊ - Kerîm Husamî
11 CÛMHÛRIYETA KURDISTANÊ -Mola Ezat
13 NIHA NE WEXTÊ MIRINÊ YE - Rojen Barnas
15 KELA DIMDIMÊ - Haviz Qazî
27 DU HELBEST JI - Xelîl Batî
28 DU HELBEST JI - Şîrîn Bozarslan
29 KEÇA KURD ZENGÊ - Cemşîd Bender
34 SÊ HELBEST JI - Orhan Velî
36 RESAMÊN KURD - Xelîl Duhokî
39 HILKIŞÎNA BAJAREKÎ - Dilowar Mêqerî
40 XALIT AXAYÊ ZÊBARÎ - Z. Zinar
45 ÇIRÛSKIN - Dersêm Memo
48 KEÇIKA BIÇÛK - M. A. Kut
51 DU ŞEHÎD DU JIYAN - Nûrî Aldûr
53 EVÎNDARA JI HELEBÇEYÊ HATÎ - Suzan Samanci
57 JI BO YEZDAN - Medenî Ferho
62 JANA GEL - Sebrî Botanî
67 EM XERÎB IN - C. Alî Bedir-Xan
68 HELBESTÊN EMERÎKA LATÎNÎ - B. Epözdemîr
70 MAHCIRTÎ Û REWŞA KEÇAN - Ş. B. Soreklî
77 DÎWAR - Sartre
92 EVÎN- Mayakovskî
94 SÊ HELBEST JI - J. Espar
98 LI SER SÊ PIRTÛKÊN BEŞÎKÇÎ - Gabar Çiyan
100 KOVARÊN KURDÎ - Lokman Polat
106 AGORA - Mustafa Aydogan

**No: 10 1994, 112 rûpel**

3 REWŞA EDEBIYATA KURDÎ - F. Cewerî
6 DÊMÊ HER EDEBIYATÊ BI PEXŞANA WÊ XUYA DIBE - Tosinê Reşîd
11 FELSEFE EVÎN BI XWE YE - Şerefxan Cizîrî
15 EZ JI BER PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ NE XEMGÎN IM - Nacî Kutlay
19 EDEBIYAT DIVÊ DI NAVA XELKÊ DE BIJÎ- Şahînê Bekirê Soreklî
23 PÊŞEROJA EDEBIYATA KURDÎ GIRÊDAYÎ PÊŞEROJA GELÊ KURD E- Rojen Barnas
26 EDEBIYAT JI NÛ VE AFIRANDINEKE ESTETÎK E - Rohat
28 EDEBIYATA KURDÎ XWE SERAST NEKIRIYE - Hesenê Metê
30 HER STRANEKE KURDÎ ROMANEK E - Mehmûd Baksî
31 ROMAN HUNERA CIVATÊN PÊŞKETÎ Û MODERN E - Mehmed Uzun
40 DU HELBEST JI - Arjen Arî
41 RÊWINGÊ BÊ NAV - Rojan H.
47 TÊ BÎRA TE - Mervanê Keleş
50 MÎR CELADET ALÎ BEDIR-XAN - Sebrî Botanî
53 DU HELBEST JI - Jan Dost
54 PHYTHAGORAS - Mutafa Duzgun
57 SEXTIYAN - Murathan Mungan, Werger: Muhsîn Kizilkaya û M. Uzun
63 FESTÎVALA HELBESTA KURDÎ - Heyderê Omer
71 MALVA SÎMFONIYEKE TARÎ YE - Sîwan A. Mustafa
76 SÊ HELBEST JI - Necîb Balayî
77 EZ Û HEZ - Siûd Kiliç
81 AZADÎ - Kemal Akay
82 MELE MENSÛRÊ GÊRGAŞÎ - Z. Zinar
84 ROJNAMEGERIYA KURDÎ - Mehfûz Mayî
89 TERORÎST - M. Alî K.
94 FEDÎ- Rojhat
95 KARÎKATORVANÊ KURD - M. Hemo
96 DU KLASÎKÊN BI KURDÎ -Medenî Ferho
99 DI FOLKLORA KURDÎ DE SERDESTIYEKE JINAN - Nacî Kutlay
104 SÎMÎRNOF - Xelîl Duhokî
108 KURD Û MÎTOLOJÎ - Lokman Polat
110 ROMANEKE SOSYO-PSÎKOLOJÎK - Rohat

**No: 11 1994, 112 rûpel**

3 MÛSA ANTER - F. Cewerî
15 JI BO KEKÊ MÛSA ANTER - Yaşar Kaya
18 WEYLÊ APÊ MÛSA ANTER - Medenî Ferho
24 HAWARA MIN - Margereta
26 BÎRANÎNA CEGERXWÎN - Sebrî Botanî
40 DU HELBEST JI - Arjen Arî
41 WELLE - Hesenê Metê
45 HELBESTVANEK Û PÊNC HELBEST - M. Bêkes
46 KÛTO - Şahînê Bekirê Soreklî
50 ŞAGIRTÊ JÎR - Kamran Haco
52 ÇEND TEKST JI YUNANA ANTÎK - Werger: Mustafa Duzgun
59 EDNAN ŞÎNO - Xelîl Duhokî
62 VEDÎTIN - Varlin Stansev - Werger: Zagrosê Haco
64 BÊDENGIYA KEVIRÊN DEMÊ - Mervanê Keleş
66 BAYÊ AZADIYÊ - Rojhat Azadî
69 MARKS Û EDEBIYAT - Paule Lafargue- Werger: Dr. Poloço
72 HEVPEYVÎN BI FEQÎ HUSEYN RE - Bedirxan Epözdemîr
76 QÎZA GENERAL - Xelîlê Çaçan

80 SED Û DU NIVÎSKARÊN KURD - Z. Zinar
84 ALAV ALATLI - Abdullah Keskîn
94 TEVGERA HUNERÎ LI ZAXO BEHDÎNAN - Beşîr Botanî
96 HEVPEYVÎN BI XORTEKÎ 75 SALÎ RE - F. Ceweri
100 BÎBLÎOGRAFIYA HAWARÊ - Ferhad Pîrbal
109 SIWARÊN ÊŞÊ - Rohat
110 SAZEK JI ÇAVÊN KURDISTANÊ RE - Fethulla Huseynî
111 PALA BÊŞOP - Lokman Polat

**No: 12 1994, 112 rûpel**

4 NÛDEM BÛ SÊ SALÎ - Firat Crewerî
6 REXNE Û EDEBIYAT - N. Zaxuranî
11 HELBESTEK JI - Taha Xelîl
13 BÎRA QEDERÊ - Mehmed Uzun
32 BARAN - M. Sait Alpaslan
33 ÎNTELLEKTUELÊN KURD Û POLÎTÎKA - S. Suleverî
38 HELBESTEK JI - Necîb Balayî
45 NIMÊJA SER BALGÎ - Tosinê Reşîd
52 XELTGIRÊ NOBELÊ YÊ ÎSAL , Kenzaburo Oe
53 HÎVÎ BERWARÎ - Xelîl Duhokî
56 ÎNTELLEKTUELÊN KURD - Cemîl Gundogan
60 CEJNA XIDIRNEBÎ - Aza Ozmanya
64 PÛŞKÎN - Suleyman Demîr
70 XELGIRÊ NOBELÊ YÊ PÊŞÎ Sally Prudhomme
71 YÊ MEKSÎKÎ - Jack London
92 HELBESTEK JI - Mervanê Keleş
93 GIRTIYÊ ŞEVA REŞ - Firat Cewerî
103 ŞÊX MEMDÛHÊ BIRÎFKENDÎ - Z. Zinar
107 ÇEND NAMEYÊN KAFKA
112 BERD - Mehabad Qeredaxî
114 XEWN - Tengezarê Marînî

**No: 13 1995, 114 rûpel**

4 BERPIRSIYARIYA NIVÎSKAR - Firat Cewerî
6 SEREDANÎ - Seydoyê Kûso
7 SÎNOR u Tosinê Reşîd
10 MALCOLM X - Mihemed Dehsiwar
18 SELÎM BEREKAT - Mervanê Keleş
21 MÊRXASIYA BI TIRSÊ VE RAPÊÇAYÎ - M. Aydogan
31 GUNNAR EKELÖF - Werger: M. Alî Kut
35 BEND Û METELOKÊN KURDÎ - Haviz Qazî
37 DEMA RONAHIYÊ - Şerefxan Cizîrî
44 DIVÊ TURKIYE... - Werger: Şefîk Kaya
46 ROMANA THE DIPLOMAT - Sebrî Botanî
48 BILA ZULMA TE ZÊDE BIBE - YAŞAR KEMAL
59 BÊJINGA GÛMANAN - Rûxweş
60 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVÎSÎNE - Mayakovskî
65 ÇAR MIST XWELÎ - Şahînê B. Soreklî
69 ŞÎRETÊN EHMEDÊ XANÎ - Nûredîn Zaza
70 SÊ JINÊN KURD - Zeynelabidîn Zinar
78 EMPEDOKLES - Mustafa Düzgün
84 HEVPEYVÎN BI CAN YÜCEL RE - F. Cewerî
95 DILÊN ŞIKESTÎ ... - Xelîl Duhokî
102 KOVARÊN KURDÎ LI SÛRIYÊ - Lokman Polat
105 TEFSÎRA QURANÊ YA BI KURDÎ - Z. Zinar
107 ... DANASÎNA PIRTÛKAN

**No: 14 1995, 114 rûpel**

4 KA EM Ê KENGÎ VEGERIN - Firat Cewerî
6 DO - Felat Dilgeş
7 DERPIYÊ SOR Û ALA TIRK - Edîp Polat
11 CAN YÜCEL - Werger: Mahmûd Lewendî
14 EZ DIFIKIRIM LOMA EZ HEME - Şerefxan Cizîrî
20 MILKÊ EVÎNÊ - Rojen Barnas
21 MAHATMA GANDÎ - Mihemed Dehsiwar
40 DIVÊ - Latîf Özdemir
41 PINÎKÊR - Mustafa Aydogan
53 EVÎNA CIZÎRÎ Û CEGERXWÎN - Heyderê Omer
58 EZ Û BAZ - Xemgînê Temê
61 HEVPEYVÎN BI VEDAT TÜRALÎ RE - F. Cewerî
69 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVÎSÎNE - Mayakovskî / Werger: Süleyman Demir
75 MELE SEÎDÊ KURDÎ - Zeynelabidîn Zinar
81 HÎZAR - Nacî Taha Berwarî
82 MAMOSTA BÊRENG - Şahînê B. Soreklî
94 HOZAN Û MUEYID TEYIB - Haviz Qazî
97 LI BENDA GODOT - Zehra Îpşîroglu / Werger: Şefîk Kaya
101 GIRTÎ - Husên Duzen
106 NÛREDÎN ZAZA Û KURTEÇÎROKÊN WÎ - F. Cewerî

**No: 15 1995, 114 rûpel**

4 BÎRANÎNÊN MEZINÊN KURDAN - F. Cewerî
6 PÊNC HELBEST - Rojen Barnas
12 MÎR KAMIRAN ALÎ BEDIR-XAN - Rojan Hazim
26 ÇÎROKA BÛNA MIN - Mehfûz Mayî
28 GALILEO Û GALILE - Şerefxan Cizîrî
32 JI WE RE - Can Gülşenoglu
33 EHMEDÊ XANÎ - Felat Dilgeş
56 HELBEST JI - Mervanê Keleş
60 ÊZIDIYÊN ÇIYAYÊ SINCARÊ - Ingmar Karlsson - Werger: M. Dehsiwar
69 SEYDAYÊ TÎRÊJ - Şefîk Kaya
74 SEBRIYE HEKARÎ - Xelîl Duhokî
76 ROMANSEKE ÇILMISÎ - F. Cewerî
81 ŞIÎREK JI - M. Emîn Pencewînî
84 DEMEKE KU HATE KUŞTIN - Suleyman Demîr

103 HIŞÊ XWE PÊŞ DE BIBIN - Ezîz Nesîn - Werger: M. Aydogan
106 HELBESTEK JI - Hoşeng Biroka
108 PÊWÎSTIYA PISPORIYÊ - Lokman Polat
110 REWŞEN BEDIR-XAN - F. Cewerî
114 SEROKÊ KARÊ DIYANETÊ - Sabah Kara

**No: 16 1995, 114 rûpel**

4 NÛSALA WE PÎROZ BE - Firat Cewerî
6 SEYÊN ME HENE - Rojen Barnas
7 MONSIEUR ET MADAME N. - Hesenê Metê
12 TOVREŞÎN IM - Arjen Arî
13 GENERAL ŞERÎF PAŞA - Rohat Alakom
27 YILMAZ GÜNEY - Mihemed Dehsiwar
40 LI SER GÜNEY - Baran Fundermann
46 RADYOYA YERÎVANÊ - Wezîrê Eşo
49 LI WÊ DERÊ - Seydoyê Kûso
50 FÎLOZOFÊ DESTHILATÊ - Şerefxan Cizîrî
54 DU ŞIÎR JI - Can Gülşenoglu
55 RASTHATIN - Tosinê Reşîd
60 JINA KURD - Xelîl Duhokî
62 TIRSA MIRINÊ Û KEÇA MUXTÊR - B. Şahîn
67 HEVPEYVÎN BI GINA JAKOBI RE - Hesenê Qazî
70 HEVPEYVÎN BI GULÎSTAN RE - Nûdem
76 HEVPEYVÎN BI MERZIYE RE - Mustafa Cizîrî
78 HEVPEYVÎN BI NASIR REZAZÎ RE - M. Cizîrî
81 HEVPEYVÎN BI TEMO RE - Derwêş M. Ferho
84 HEVPEYVÎN BI SEÎD YÛSÛF RE - Nûdem
91 NE TU BÛ - Abidîn Azad
92 ÇEND NAMEYÊN NÛREDÎN ZAZA JI F. CEWERÎ RE
96 EV JI BER XWE WILO YE - Mayakovskî
97 ZERDEŞT PÊXEMBER - Zeynelabidîn Zinar
112 HEVPEYVÎN BI RONALD HARWOOD RE - Ş. B. Soreklî
114 XELATGIRÊ NOBELÊ YÊ ÎSAL SEAMUS HEANEY

**No: 17 1996, 114 rûpel**

4 ŞIÎRA KURDÎ - Firat Cewerî
6 HEREKOL - Arjen Arî
7 ŞIÎRA KURDÎ LI YEKÎTIYA SOVYETÊ - Tosinê Reşîd
10 HELBESTA KURDÎ LI SÛRIYÊ - Heyderê Omer
16 BEHDÎNA HÊLÎNA HELBESTA KURDÎ YE - Mehfûz mayî
22 GOTIN Û PEYIVÎNA BEDEW, ŞI'R - Rojen Barnas
27 HELBEST ÇI YE, HELBESTVAN KÎ YE? - A. Balî
30 KEÇIK - N. Hikmet Werger: B. Epözdemir
31 SÊ STÊRÊN GEŞ - Xelîl Duhokî
36 TU ÇAWA YÎ - Î. Omerî
37 HELBEST Û HELBESTVAN - Can Gülşenoglu
40 MIROV ÇAWA HELBESTAN DINIVÎSÎNE - Mayakovskî Werger: Suleyman Demir
60 HEVPEYVÎN BI Şêrko Bêkes re
71 HEVPEYVÎN BI Kemal Burkay re
76 SÎNORÊ GIRTÎ - Haviz Qazî
78 METODEKE ZANYARÎ YA EDEBIYATÊ - Şerefxan Cizîrî
83 AVAKIRÊ KURDISH ROCK - Ciwan Haco
87 LI AZADIYÊ BIGERE - Sharock Kamyab
87 WERGER Û WERGERVANÎ - Derwêş M. Ferho
92 DU HELBEST JI Alî Biçer Werger: M. Uzun
94 TIRS - Kekê Xêlit
98 HÊ DÊRSIM - H. Sefkan
100 YILMAZ GÜNEY II - Mihemed Dehsiwar
110 CÎHANA YÊ MEKSÎKÎ - Şefik Kaya
113 CÎHANA WEŞANAN

**No: 18 1996, 114 rûpel**

4 GIRÎNGIYA ZIMANÊ KURDÎ - Firat Cewerî
6 DU ŞIÎR JI - Rojen Barnas
8 FERHAD SHAKELY: "ŞIÎRA BAŞ ..."
22 AZADÎ - Suleyman Demir
24 MIN BI TENÊ NEHÊLIN - Sidqî Hirorî
41 BIRÇÎ - Bûbê Eser
47 ARÎF DAMAR: "EZ DOSTÊ MÛSA ANTER BÛM"
52 SÊ XWIŞK - Edith Södergran
53 CELAD - Gunnar Ekelöf
54 DILÊ DINYAYÊ - Karin Boye
55 ROMANA KURDÎ - Nacî Kutlay
65 REFÎQ SABIR - Xelîl Duhokî
78 SEYDAYÊ TÎRÊJ - Konê Reş
80 SENFONIYA ME - Beyhanî Şahîn
81 PISÎK JÎ XEWNAN DIBÎNIN - Şahînê Bekirê Soreklî
78 J. J. ROUSSEAU - Felat Dilgeş
93 MARTIN LUTHER KING - Mihemed Dehsiwar
107 JÎNENÎGARIYA CEGERXWÎN - Şerefxan Cizîrî
113 JI WEŞANÊN NÛ

**No. 19 1996, 114 rûpel**


4 ÎNTELLEKTUELIYA KURDÎ - Firat Cewerî
12 RONAKBÎR Û RONAKBÎRÎ - Rojan Hazim
22 ÎNTELLEKTUEL Û ÎNTELLEKTUELÎZM - Şahînê Bekirê Soreklî
27 ÎNTELLEKTUEL... - Edîp Polat
32 ROLA REWŞENBÎRIYÊ - Derwêş M. Ferho
36 PIRSGIRÊKA ÎNTELLEKTUELIYA KURDÎ - Cemşîd Bender
40 REWŞENBÎRÊN POLÎTÎK - Şerefxan Cizîrî
46 BÊDENGÎ MIRINA REWŞENBÎRAN E - Medenî Ferho
50 ÎNTELLEKTUEL - Riza Polat
52 ŞIÎREK JI - Yawer
55 KOMUTAN - Serdar Roşan

59 ŞIÎREKE SÊWÎ
60 XEWNA ÇELENGÊ KOÇER - Sebrî Botanî
63 HEWÎ - Xemgîn Temê
69 MAMOSTE, MAMOSTE! - Nizar Agirî
71 HEMESEÎD HESEN - Xelîl Duhokî
87 NELSON MANDELA - Mihemed Dehsiwar
99 AZAR MAHLOUJIAN - F. Cewerî
102 60 SALIYA WEZÎRÊ EŞO -
Têmûrê Xelîl û Emerîkê Serdar
107 XEZAL - Lokman Polat
109 ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ - Adil Dûran
112 ÇÎROKÊN SUZAN SAMANCI...

**No: 20 1996, 185 rûpel**

4 NÛDEM u Firat Cewerî
6 SÊ ŞIÎR JI - Rojen Barnas
9 RIYA NÛDEMÊ RAST E Û QENC E -
Wezîrê Eşo
11 PANORAMA - Hesenê Metê
18 ŞIÎREK JI -u Hîvî Berwarî
21 DÎROKA EDEBIYATA FRANSÎ - Fawaz Husên
33 HEY SULTANÊ FÎLAN, EZ ZIMANÊ XWE DIX-
WAZIM! - Mustafa Aydogan
41 SILAV LI NÛDEMÊ - Rojan Hazim
42 TOLSTOY u Carolina De Maegd
Werger: Derwêş M. Ferho
47 LI ÇANDA XWE XWEDÎ DERKEVIN - Nûra
Cewarî
53 MILPANÎ - Sidqî Hirorî
59 SIGMUND FREUD - Laleş Qaso
63 KEÇA TUMAS - Migirdîç Margosyan
Werger: Zinarê Xamo
68 NÛJENTÎ Û NÛDEM - Cemîl Gundogan
70 DEMSALA NEQIŞANDÎ - Abbas Alkan
77 DI WARÊ KOVARVANIYÊ DE MERHALEYEKE
NÛ - Zana Farqînî
79 DU ŞIÎR JI - Arjen Arî
81 ESPERANTO - Lars Forsman û Süleyman Demîr
87 VEGERE WERE - Tosinê Reşîd
87 GEOTHE WEK PEDAGOGÊ ZIMÊN - Gunnar
Hård Werger: Mustafa Cizîrî
95 XEMGÎN Û XEMÊ - Şefîk Kaya
104 NELSON MANDELA - Mihemed Dehsiwar
117 HER BIJÎ NÛDEM - A. Balî
118 EZ Û ŞALÛL - Abbas M. Abbas
120 20:EMÎN HEJMARA NÛDEMÊ PÎROZ BE! -
Weşanên Sarayê
121 ŞELALE - Müslüm Yücel
122 RONIYA BI PÎVANA RONAHIYÊ - Sabah Kara
123 LÊRMANTOV - Husên Hebeş
127 AFRÎKA... - Werger: Şahînê B. Soreklî
131 PÊNCSALIYA NÛDEMÊ PÎROZ BE! -
Kemal Görgü
132 MÎLÎTARÎZEKIRINA SOSYALÎZMÊ -
Şerefxan Cizîrî
139 LETÎF HELMET - Xelîl Duhokî
156 EDEBIYAT XEMILA ZIMAN E - Rojan Hazim
162 KOÇ, MIRIN Û ZAYIN - Mehmed Uzun
176 PÊNCSALIYA NÛDEMÊ PÎROZ BE! -
Gulîstan Perwer
177 XELATGIRA ÎSAL WISLAWA SZYMBORSKA -
Nûdem
178 BÎST HEJMARÊN NÛDEMÊ

# Bibe Aboneyê Nûdemê!





Ger hewesa te li ser helbest, çîrok, roman, hevpeyvîn, lêkolîn, huner, sînema û hwd. hebe, pêşniyazeke me heye; bibe aboneyê Nûdemê! Ger tu dixwazî ji tevgera huner û edebiyatê ya her çar perçeyên welêt haydar bibî û edebiyata dinyayê ya kevnar û nûjen bi zimanê kurdî bixwînî, dîsan bibe aboneyê Nûdemê!

Nûdem dixwaze ji avakirina edebiyata kurdî re bibe alîkar, tu jî alîkariya wê bike, bibe abone!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdî re bibim alîkar. Ji kerema xwe re min bikin aboneyê Nûdemê.
Ji bo Swêd salek 190 Sek, welatên din 50 $

**Nav û paşnav**.........................................................................

**Navnîşan**.............................................................................

Vê karta jor dagirin û fotokopiya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin.

www.netewe.com

"Xorto! Armanca te rizgarî ye. Rizgariya welat û miletekî ye. Navê armanca te kurd e, kurdanî ye, Kurdistan e. Armanca te li ber te sekiniye. Di şiklê miroveki de ye. Tu lê dinihêrî, ecêbmayî dimînî. Herê tu dibînî, dest, ling, mil, pol, parsû, parhan, her tiştên wî hene. Lingê wî yê rastê berepêş, yê çepê berepaş diçit. Laş di cihê xwe de ye. Xwe ne dide pêş, ne jî paş. Ji ber ku ji alîkî ve pêş ve, ji aliyê din paş ve tête kişandin. Tu zanî çira xorto? Lewma ko her du ling ne yek in. Navbera wan de yekîtî nîne. Divêt, tu bixebitî van her du lingan bi alî-kî ve bilivînî"

*Celadet Alî Bedir-Xan*

www.neverok.com